# Mehmed Uzun

# SİYA EVÎNÊ



Roman

**Orfeus**

*Mehmed Uzun*

# SİYA EVÎNÊ

Roman

***Orfeus***

Pirtûkên Mehmed Uzun:
Tu 1985, Mirina Kalekî Rind 1987

Wêne: Ingela Jondell
© Mehmed Uzun 1989
Tîprêzî: Weşanxana Orfeus
ISBN 91 87074 16 8
Orfeus Bokforlag, Vanadisvagen 18 2tr.
113 46 Stockholm - Sweden

Ji bo bîranîna YILMAZ GUNEY

Devra felekê li ser me kin e,
Bextê me reş e, kezeb birîn e;
Mesken ji me re niha nivîn e,
Binve kezeba min binve loyî loyî

Ne mar û ne saxî û ne rahet,
Talan kirine hemî ji mihnet;
Dişwar e gelek belayê xurbet,
Binve kezeba min binve loyî loyî

Emîn Alî BEDIRXAN - 1906

# Lİ SER RİYA KOÇA DAWÎN

1976, payiz.

Koç. Bi dû payiza jiyanî re koça dawîn. Bêdeng, bêpejn. Wext naxuye, cîh û war naxuyin. Yan jî ew dixuyin, lê tevlihev. Hem ev der û hem ew der. Hem niha, hem do û pêr. Hem nêzîk, hem dûr.

Koçeke rengîn, xweş, bêdawî, bê lez û bez, bê teşqele, bê westan û xwîdan. Koçeke ji hesûdî, pexîlî, dijminahî, xirabî, kiretî, fetbazî, xwînrêjî bi dûr. Koçeke xweş li gor daxwaza dilên xweş. Koçeke mirazkirî.

Memduh Selîm beg.

Kalemêrê hêja Memduh Selîm begê Wanî koç dike. Li ser textê xwe dirêjbûyî. Çavvekirî. Rûken. Lê kerr û lal.

Çavên wî yên stûr ewçend vekirî ne ku ew weke du lûlûyên stûr dixuyin. Bîbûkên reş yên çavên wî, bê hereket, li jor dinihêrin. Weke xewnekê. Rûyekî aram. Qermîçekên salan lê. Porekî spî û nîvweşiyayî. Lêvên guvaştî. Çermê vekişiyayî yê rû. Stûyê qermiçî.

Merivekî kal, bi qasî mistekê.

«Memduh beg, Memduh beg...»

Ew nabihîse. Ew tu tişt nabihîse êdî, bi rê ketiye, koç dike. Li dorê, jina wî Wildan xanim û çend xort.

Li ber serî jî pise pisa pîrejinekê. Pîrejin Qur'an dixwîne.

Çar aliyên dîwêr bi refên kitêban ve tijî. Kitêb, kovar, rojname û kaxiz. Li ser refina çend lewheyên zerbûyî; du sûret û du bergeh. Di navenda odê de jî ew; Memduh Selîm beg.

Ew di nav xewnekê de koç dike. Ew bi xwe, li ser cîhê xwe dirêj bûye û ber bi cîhekî nare. Lê, tişt, cîh û wextên têkel bi ser wî re tên. Ew di nav tişt, cîh û wextên têkel de koç dike. Rabirdû û niha ketine nav hev; deşt, çiya, zozan newal, daristan bi hev re bûne yek; derya û asman gihîştine hevûdu, meriv, heywan, lawir û celeb bi celeb mehlûqat reng û rûçik diguherînin, dikevin dewsa hev. Lê tirs tune, sarî û germî tune, heyecan tune, hîs û pejn tune. Deng jê dernakeve, nefes lê naçike, qîrîn jê ranabe, pîqîn pê nakeve.

Ew dere.

Deverekî rengîn. Heye ku daristaneke xweş, yan jî zozaneke hûnik e. Memduh Selîm beg li ser deverê rengîn. Der û dorên wî tijî kew û kevok. Ew di nav kew û kevokan de li jêr, li deverê rengîn dinihêre. Du kewên spî, li her du aliyên wî, difirin. Kew her gav nêzîkî wî ne. Reng, bask, perwaz, nikul û çavên kewan baş dixuyin. Çavên wan weke dilopên avê zelal û xweş. Ew bêdeng difirin. Memduh Selîm beg, carina li kewa kêleka rastê, carina jî li ya çepê dinihêre. Kewên din jî ref bi ref difirin. Reng û stûrahiyên wan têkel in. Ew difirin. Memduh Selîm beg jî hem difire, hem nafire; hem dimeşe, hem nameşe; hem li jêr, hem li jor e.

Lê belê, tiştê herî balkêş bêdengî ye. Hawirdor bi bêdengiyê hatiye vegirtin. Perda bêdengiyê bi ser her tiştî re hatiye kişandin.

«Memduh beg, binihêre, xortê hêja Gurgîn jî hat...»

Wildan xanim, bi hêdîka, li ber guhê wî dipeyive û destê wî yê rastê dixe nav lepê xwe û dest mist dide.

Deng nagihên wî. Perda bêdengiyê nahêle ku deng xwe biguhezînin wî. Memduh Selîm beg hem li nik wan e, hem jî na; hem dijî, hem jî najî; hem li vê dinê ye, hem jî na.

Xort cot bi cot tên û li ber serê wî rûdinin. Wildan xanim, di nav kincên xwe yên reş de, her li ser serê wî ye. Wan, xort û Wildan xanim, hêvî heye ku Memduh Selîm beg dev ji koça dilsoj berde û li wan vegere.

«Apê Memduh, bavê min, mala xalanên min û Kurdên bajarê Qamişloyê silav li te dikin û ji Xwedê şîfa dixwazin...»

Memduh Selîm beg di koça xwe de, niha jî, bajarekî dibîne. Ji dûr ve. Na, carina ji dûr, carina ji nêzîk ve. Lê ew tu carî nakeve nav bajêr. Dora bajêr bi sûran hatiye rapêçandin. Çend bircên fireh li ser sûran dixuyin. Sûr û bircên spehî û stûr. Ji kevirên reş û stûr. Hin aliyên sûran hilweşiyayî ne. Hin qulên mezin jî di bedenên wan de vebûne. Bi dû sûr û bircan re, banên xaniyên bajêr dixuyin. Çend avahiyên mezin ber bi jor, ber bi asmên hildikişin. Piraniya xaniyan bi kevirên reş hatine lêkirin. Hin jî bi kevirên spî. Li dora sûran jî hêşinahî û av dixuyin. Lê, tu tiştê jîndar naxuye. Ne meriv, ne teyr, ne masî, ne heywan û ne jî mehlûqatên din.

Bajar weke hêlekanekê dere û tê, dûr û nêz dibe. Bajar di dewsa xwe de dihreze. Bajar carina mezin, carina biçûk dibe. Ew avahiyên mezin û dirêj carina pir, carina jî kêm dibin. Hişinahî û av carina ji sûr û bircan vediqetin û bi dûr dikevin û carina jî tên pê re yek dibin. Memduh Selîm beg hewl dide ku bajêr binase, bizanibe ka ew kîjan bajar e, li kû ye. Lê nabe. Bajar jê bi dûr e.

Bi tenê bajarekî carina biçûk, carina mezin, lê bi sûr û birc.

«Apê Memduh, me kitêbên te, yek bi yek, ji nû ve, rêz kirin. Binihêre, kitêbên bi zimanê kurdî li ser van refan in. Hemû ev alî jî ji bo kitêbên bi zimanê tirkî ye. Ev çar refên aliyê çepê jî ji bo kitêbên fransizî ne. Refên mayî jî yên kitêbên bi zimanên erebî, farisî, îngilizî û rûsî ne... Me rojname, kovar û tiştên din jî xistin van sandûqan. Helbet, bi dûzan.»

Memduh Selîm beg, hosteyê xewnan, di nav xewneke rengîn de ye. Koça wî di eynî wext de xewnek e jî. Lê ev xewnên niha ne weke xewnên berê ne. Berê xewnên xoftijî, xewnên malkambax şevên wî dikirin jahr. Ew di nav xwîdanê de dima û bi qîrîn hişyar dibû. Carina jî xewnên xweş bi ser wî re dihatin. Wî, dilgeş, kêfxweş û mesûd, xwe berdida nav pêlên xweş.

Lê xewnên vê koça dawîn ji yên kevn pir cihê ne. Ew ne xweş in û ne jî xirab û xoftijî. Ew çawan in? Salixdan ne hêsan e. Bi kurtebirî, ew xewnên koça dawîn in.

Niha jî ew li deşteke fireh, bêser û ber e. Deşt di nav rengekî zer de ye. Aso û deşt bi hev re bûne yek. Deşt dibiriqe û carina leylan dide. Di deştê de girên hûr hene. Lê Memduh Selîm beg tênagihê ka ew çi gir in û ji çi hatine pê. Rengê giran, cîh bi cîh, diguherin. Gava ew reng diguherin, rengên nû, hêdî hêdî, bi ser yê kevn re tên û lê hukim dikin. Rengên giran weke rengên keskesorekê dixuyin. Erdê deştê jî diguhere. Carina ew dibe qûm, carina giya û hêşinahî, carina zevî, carina erdê qiraç. Ji dûr ve, li nik giran jî rawirên ecêb dixuyin. Ew wan jî nas nake. Rawir jî, weke tiştên din, diguherin. Ew carina dibin rawirên dirende û kerî bi kerî digerin û carina jî ew dibin rawirên firende û ref bi

ref difirin. Di deştê de tu dar û av naxuyin.

Di deştê de tiştê herî xweş dengê musikê ye. Dengê musikeke têkel ji dûr ve, ji ew niqteyên ku aso û deşt bi hev re dibin yek, tê. Baş fahm dibe; deng dengê musikê ye. Lê kîjan musik? Ev yeka fahm nabe. Carina ew bi senfoniyeke babilîska 18-an ya Ewrûpayê dişibe, carina bi straneke gelêrî ya kurdî, carina bi soneteke xweş ya piyanoyê, carina bi musika klasîk ya erebî û carina jî bi şi'îreke farisî. Guherînên deştê û musîkê li gor hev in. Ax, rengê hawirdor û rawir li gor musikê diguherin. Lê belê, dengê musikê jî pir ji dûr tê. Yanê, di nav bêdengiyê de dengekî weke dengê musikê...

«Memduh beg, xwe bilivîne, tiştekî bibêje, behsa rojên Wanê û Stembolê bike, ji kitêbên xwe tiştina bixwîne, bikene, bigirî, biqîre, behsa xwişka xwe bike, behsa rojên Anteqiyayê bike... Ji bo Xwedê tiştekî bibêje...»

Maliya wî, Wildan xanim li kêleka wî rûniştiye, li rûyê wî yê kal dinihêre û dipeyive. Çavên Memduh Selîm beg jî li wê dinihêrin û lêv jî dixwazin vebin û bikenin. Lê nabe. Bi tenê çavên vekirî û bi ken lê dinêrin.

«Mamo, mamo! tu min dibihîsî? Ez ji bajêr têm. Kurdên Şamê halê te dipirsin... Iro dinya pir xweş e, tav germ e. Ez penceran vekim?»

Memduh Selîm beg di koça xwe de pencereyek dibîne. Pencereyeke pir stûr di navbera erd û asman de. Pencere hêdî hêdî vedibe. Bi dû pencerê re deryake zelal û şîn dixuye. Deryake stûr di navbera erd û asman de. Tîrêjên tavê li ser ava zelal diçirûsin. Tu pêl li ser avê naxuyin. Deng tune, her tişt di nav bêdengiyê de ye. Ew li avê û tavê dinihêre. Ew hem di nav avê de ye, hem jî li ser avê. Lê ji nişkekê ve, av li ber wî diqelişe û jê coteke kevokên spî radibin û bi firê dikevin. Kevok

weke pembû spî ne. Kevokên xweşik, çend car, li ser deryayê difirin û paşê jî, hêdî hêdî bi dûr dikevin û winda dibin. Bi dû kevokan re, av dîsan diqelişe û jê keçikeke tahzî radibe û bi firê dikeve. Keçikeke tahzî, pir xweşik, pordirêj û bedew. Keçik şil e û tîrêjên tavê li bedena wê ya spî dikevin û dilopên ku di bedena wê re diherikin, dibin weke lûlû û elmas. Serê memikên wê yên vekişiyayî dibiriqin. Bedena wê bi rengekî helesor diçirûse. Bejna keçikê carina dirêj dibe, carina jî weke bejna zarokekî, kin. Keçik ber bi Memduh Selîm beg difire û tê nêzîkî lê dike. Lê belê, tu carî ew xwe nagihîne wî. Ew, çend car, li dor Memduh Selîm beg, ber bi jêr û jor, xwe ba dide. Lêvên wê jî dilizîn, lê Memduh Selîm beg dengê wî nabihîse. Paşê jî, keçik, rûyê wê ber bi wî, bi paşkî difire û winda dibe.

Bi dû windabûna keçikê re, derya jî winda dibe. Naxêr, ew winda nabe, lê di derekî de xelas dibe. Dîsan pencereyeke stûr li ber Memduh Selîm beg vedibe. Pencereyeke ewçend stûr ku erd û asman jê hatiye pê. Li pey pencerê jî di nav bêdengiyekê de tişt, meriv, cîh û deverên nezelal dixuyin.

Memduh Selîm beg, ji pencerê, li wan dinihêre ku bizanibe ka ew çi ne û kî ne...

# TAYA WELATÊ XERÎBİYÊ Û TAYA EVÎNÊ

# 1

Sal 1922. Pencereyekê û merivekî li ber. Kî? Rûyekî gulover, çavên reş weke komirê, porê kin û şehkirî, eniyeke fireh, guhên stûr, bîvileke xweşlihevhatî, simbêlê zirav û lêvên kentijî. Kî? Bejneke zirav, kincên xweş, qiraweta hewreşîmî û dûmana cixarê. Kî? Fikir û guman, bîr û şik. Kî?..

Memduh Selîm. Ronakbîrê kurd, bîrewerê gelê bindest û evîndarê xweşiyan Memduh Selîm beg. Nivîskar û berpirsiyarê kovara «Jîn»ê Memduh Selîm begê Wanî.

Belê, sal 1922, ji rojan 25 ê îlonê. Na, ne 25 ê îlonê. Berî sê saetan 25 ê îlonê bû. Niha 26 e. 26 ê îlonê, destê sibê. Galata, Stembol. Memduh Selîm beg, mêrê têrbejndirêj, li mala xwe, li oda rûniştinê rawestaye û li kolanên teng yên Galatayê dinihêre. Çi diqewime? Kurd, Tirk, gelên din, dewleta Osmanî, Babialî, Mistefa Kemal û hevalên wî û dinya ber bi kû de diçin? Ev geremola piştî şerê cîhanê dê zelal bibe? Hingê?

Berî çend saetan Memduh Selîm beg li Kadikoyê, li mala sekreterê giştî yê rêkxistina Kurdan «Kurd Tealî Cemiyeti» Emîn Alî Bedirxan bû. Sibê, na îro, piştî çend saetan, kurên Emîn Alî beg Celadet û Kamuran beg dê ji Stembolê derkevin. Ew dê herin Alemanyayê, Munîxê. Bi dû wan re jî Emîn Alî beg bi xwe. Ew dê jî, tevî pîrek û keça xwe, here Misirê, nik kurê xwe yê mezin Sureya beg. Emîn Alî beg û kurên wî ku ji serok û pêşengên tevgera kurd in, dev ji Tirkiyê berdidin.

Çi dibe?

Pêlên siûdê li ser Kurdan qulipîn? Ew dîsan, weke her carî, di bin girane û zompên qehr û kulan de man? Marên kor, gurên malkambax û şeytanên sererd û bin-

erd dîsan li wan hatin xezebê? Dîsan cîh li wan teng bû? Çi diqewime?

Peymana ku li Sevresê, 1920, hat pê û rê dida ku Kurd jî, gav bi gav, ji xwe re dewletekê ava bikin, bû qetqetî, yanê riziya. Li dewsa wê niha peymaneke nû tê pê ku tê de behsa mafên Kurdan nabe.

Memduh Selîm Beg li der dinihêre. Asman hê jî tijî stêrk in. Stêrka Kerwankujê ji rojhelatê, li Memduh Selîm Beg dinihêre. Stêrkên Leyl û Mecnûn, yek ji rojava, ya din li rojhelatê, li Memduh Selîm Beg dinihêrin. Ew jî li wan dinihêre û dikene. Keneke kin û kurt. Di kena kurt de xem û keser dixuye. «Ma Leyl û Mecnûn, ma ev stêrkên ku bi rengê zêrîn dibiriqin, dê tu carî negihên hevûdu?» Ew li stêrkan dinihêre û weha difikire.

2

Sersala 1923-an. Şev. Stembol, bajarê hezar neteweyî, hezar kulturî û zimanî kêf dike. Berf hêdî hêdî lehifeke spî radixe ser bajêr. Zû bi zû li Stembolê berf nabare. Lê îsal berf dil heye Stemboliyan şa bike. Kuçe, kolan, aşxane, meyxane û kerxane tijî ne. Meriv xem û derdê xwe, wê şevê, ji bîr kirine û kêf dikin. Dewr û dewran diguherin, lê jiyan jî weke her carî, bê ku li kesî guhdarî bike, diherike. Qiral, keysar û împarator çûn. Bijî yên nû. Agir bi xarîtên kevn ketin, ew çûn. Yên nû li rê ne, ew tên.

Kurd û welatê wan?

«Monsieur Memduh Selîm, est-ce que vous ne voulez pas un peu de vin?»

«Non, merci.»

Na, spas, Memduh Selîm Beg şarab venaxwe. Ew ji araqa spî hez dike. Masayeke dirêj, li ser her texlît

xwarin û vexwarin, dûmana cixare, qelûn û nêrgilê, xeberdan, çend Fransiz, çend Tirk, çend çerkez, çend Kurd û Memduh Selîm Beg. Ew bi hev re rûniştine û sersala nû pîroz dikin. Memduh Selîm Beg, wê şevê, xwe û derdên xwe ji bîr kiriye û kêf dike.

Musik... trayyylaaaalaaaayyy... Musik, kemançe. Dengê kemançê Memduh Selîm Beg sermest dike, ruhê wî geş dike. Wî ji hevalên xwe tika kiriye. Ew dê wê şevê deriyên dilê xwe, bi tenê, ji dengê kemançê re vekin.

Xeberdan, bi fransizî, tirkî û kurdî. Li ser her tiştî, bi her awayî. Guh li ser dengê kemançê, serî germ û ziman şîrin in. Memduh Selîm Beg ji cacixa li ber xwe kefçiyekê dibe devê xwe û bi dû re, dibêje, «Mîrê min, bi xêra çar dengan jîn hê jî jîn e; dengê dil, jin, musik û avê.» Ew tiliyên her du destên xwe bi ser hev re dibe û nermik nermik dipeyive. Weke her carî, porê wî dîsan şehkirî ye; rasika por weke xêzekê dixuye. Mûjan û qermîçekên eniyê hêdî hêdî dilîzin. Ne bi tenê serî, herweha bîbûkên Memduh Selîm Beg jî germ in; ew dikenin.

A votre santé, şerefinize, noş... ji bo jîneke serfiraz û bextiyar!.. Qedeh li hev dikevin, gewrî dişewitin, deng radibin hev. Dengê Memduh Selîm Beg, bi nermî xwe diguhezîne Fransizê hember. «Monsieur, xweziya me bi we. Hûn azad û xweser dijîn, we demokrasiya xwe ji mêj ve ye aniye pê. We hay ne li me ye. Tirsa min ew e ku dûzana nû ya dinyayê piştî şer, dîsan li ser neheqiyan ava bibe. Rê divê li vê yekê were girtin. Xelkên belengaz divê li ber lingan nerin, Dîsan dinya li wan teng nebe... Prensîbên Wîlson, monsieur, prensîbên Wîlson... ew pir girîng in.»

3

Eynî şev, lê ne eynî roj. Roja yekemîn ya sala 1923-an. Destê sibê. Berf hê jî hêdî hêdî dadikeve. Kuliyên gulover yên berfê ber bi jêr dibin. Memduh Selîm Beg hemû heval û dostên xwe bi rê kirin. Ew, bi seriyekî germ, ber bi malên xwe çûn. Memduh Selîm Beg jî, bi seriyekî germ, li Galatayê, ber bi mala xwe dere. Ew ji Galatayê hez dike... «Li vî bajarê(li Galatayê) hijdeh taxên muslimanan, heftê taxên Rûman, sê taxên Frenkan, taxeke Cihuyan û du taxên Ermenan hene... Bajar û rûniştevanên wî her gav di nav kêfxweşiyê de ne...» (*) Galata ranezaye. Galata wê şevê qet raneziyaye. Ji penceran roniya çiran dixuye.

Kêfa Memduh Selîm Beg di şûnê de ye. Her der spî ye. Ronahiya lampên kuçan diçirûsin. Kuliyên berfê di bin roniyê de weke pêtên agir dixuyin. Kulî bi ser wî re tên. Niha porê wî ne şehkirî ye, ew tev li hev e. Li ser eniya wî perçemekê ber bi jêr dibe. Kulî li ser perçemê dihelin û weke dilopên hûr ji cênik û navbera mûjangan re diherikin. Berf dibare, lê hewa ne hişkesahî ye.

Memduh Selîm Beg derketiye nêçîra kuliyên berfê. Ew li pey kuliyên berfê ye. Ew destê xwe vedike û kuliyekê nêçîr dike. Kulî di nav lepên wî de, bi hilmekê, dihele. Paşê dor tê kuliyeke nû. Eger Memduh Selîm Beg keys hebe, ew dê tu kulî nehêle, hemûyan nêçîr bike.

Di nêçîra kuliyan de, Memduh Selîm beg, ji nişka ve keçikeke hûr dibîne. Keçikê pişta xwe daye dara lampayekê. Kincine tenik li ser wê ne, hinarikên wê sor

---

(*) Ewliya Çelebî, sedsala 17-an

bûne û ew dicirife. Di destê keçikê de elbikekê û tê de kulîlkên çilmisî. Bîrkokên çavên Memduh Selîm Beg çend car tên girtin û vedibin. Gelo ev xewn e? Gelo keçika kibrîtfiroş ya H.C. Anderson ji Danîmarkê bi firê ketiye û hatiye Galatayê?

«Kizim, tu kî yî, tu çi kes î?» Memduh Selîm Beg bi awakî nermik, bi tirkî, jê dipirse, «tu çi dikî li vê derê, çima tu narî mala xwe?»

«Bi tenê çend kulîlkên min man Apo, ez dê wan jî bifiroşim û herim mal. Bi tenê çend kulîlk Apo, bi tenê çenddd...»

Lêv li hev digerin. Çav dixwazin bikenin lê nabe. Çavên bi rengê genim. Guliyên zerik û dirêj. Di bin roniya lampê de hinarik, gep û lêvên sor. Di bin hinarik û poz de siya rebeniyê. Dest û tiliyên zirav û dirêj. Lê, bê lepik.

«Keça min, tu van kulîlkên xwe bifiroşe min. Ma nabe?» Ew destê xwe davê bêrîka paltoyê xwe û cizdana xwe dertîne. Di cizdanê de perên wî yên sê mehan hene. Perên heta meha Adarê. Ew divê sê meh bi van peran îdare bike. Pêşî hinek, paşê jî hemû pere ji cizdanê derdikevin. «Van peran bigire keça min. Ez hemû kulîlkan dikirim.»

«Apo, ev pere pir in!..»

Memduh Selîm Beg dikene, best lê rabûye, «ne xem e, keça min, tu van bigire.»

Keçik jî, li nêzîk, li Galatayê rûdine. Memduh Selîm Beg dev ji nêçîra kuliyên berfê berdide. Ew paltoyê xwe ji xwe dike û davê ser keçikê. Palto ji erdê re dere. Di destekî de kulîlk, di destê din de destê hûr û zirav yê keçikê, Memduh Selîm Beg keçikê ber bi mala wê dibe.

Li ber mala keçikê, tu deng tune. Çavên hûrik û

xweşik niha dikenin. Henarik, gep û lêvên sor niha bi ken tijî ne. Keçik paltoyê wî bi şûn de dide. Ew, car bi car, destên Memduh Selîm Beg radimûse, wî hembêz dike. «De here keça min, de here û bikeve nav xewa şêrîn. Bila perwazên xewê te hilgire û bibe cîhên germ û xweş... keça min, tirkiya te ne ewçend baş e, tu kî yî, dê û bavê te ji kû ne?»

«Apo em Çerkez in.»

4

Destpêka payiza 1923-an. Şerê cîhanê yê yekemîn li pey maye. Eşkere ye ku dewleta Osman-î Alî, ew dewleta bê ser û ber, têkçûye, ji hev ketiye. Serokê Tirkan yê nû Mistefa Kemal û hevalên wî ku li pey dewleteke nû ne, bi ser ketine. Ew komareke nû ava dikin û gav bi gav ber bi Stembolê tên.

Pelên daran diweşin. Tebîet rengîn e. Peravên Stembol û Galatayê rojên rengîn dijîn. Stembol reng diguherîne. Meriv, kom bi kom, dev ji welatê xwe berdidin. Keştî her roj komên merivan ji Stembolê bi dûr dixînin. Mabeyn, yanê saraya dewleta Osmaniyan bi dûr ket. Piraniya rojnamevan û nivîskaran bi dûr ketin, yên mane li rê ne. Demokrat û lîberal bi dûr dikevin. Kurd bi dûr dikevin.

Rê ber bi welatê xerîbiyê ye.

Memduh Selîm Beg?

Memduh Selîm Beg xewn dibîne. Di şeveke çiksayî ya payiza 1923-an de ew xewn dibîne: Keçikekê. Weke kulîlkên henarê rengîn û narîn. Weke şîr spî, weke xezalekê çavxweşik, weke heyva çardehê şevê awirxweş, weke hingûrekê hinariksor û weke Zîna bedew ya dastana Memê Alan bejnzirav. Cihne tenik û hewreşimî lê. Lêvên wê stûr û tijî. Rûyê Memduh Selîm Beg bi ger-

miya lêvan dihese. Lêvên şil ber bi çavên Memduh Selîm Beg dibin. Lêv çav radimûsin, car bi car, hêdîka radimûsin. Bi dû re, lêv ber bi guh dizivirin. «Begê min, mêrê ziravbihîstiyar... ma şev, bi tenê, ji bo xew û xewnan in? Ma çirûsk û pêtên jînê jî jê re navên? Mêrê dilpak... evîn û hezkirin divê di bin siya şevên dirêj de weke devî û dar bibişkivin.»

Memduh Selîm Beg xewn dibîne. Xewneke weha?

Di van rojên qafilqeda û mahşerê de ev xewn? Li milekî ruhistîn, zebanî û şeytan, li milekî jî ev xewn...

Belê, Memduh Selîm Beg zewac divê. Xwendegeha Darulfunûn ya Stembolê û dersên felsefe û siyasetê li pey man. Memduh Selîm Begê niha şevên geş û germ divê. Şevên bi çirûsk û pêtên êgir ve tijî. Wî jinekê divê. Jineke ku weke dilopeke şîr, dilopeke xwîdan, dilopeke hêsirê çavan e. Jê re kahrikên hûr, yanê zarok, malraxistin û li qerexa gola Wanê xaniyekî spehî, biçûk û xwedî bexçe divê.

Memduh Selîm Beg pir tişt divê. Bi kurtebirî, jiyaneke nû divê. Eger rê ne ber bi welatê xerîbiyê be...

Di şeva çiksayî ya payizê de Memduh Selîm Beg xewn dibîne.

## 5

Hê jî destpêka payiza 1923-an e. Galata. Keştî. Baran. Meriv. Hêstirên çavan. Destmal. Dilên keserkûr. Kona sirgûniyê, kona macîriyê tê vegirtin. Şeytanên sererd û binerd di kincên serdest û karmendên nû yên Tirkiyê de hatine xezebê. Ew ketine pey kes û hêzên ku li dijî tevgera wan bûn. Li her aliyê welêt sêdar hatine daçiqandin. Meriv tên girtin û kuştin. Yên mayî direvin.

Rehmet hûr hûr dibare. Dilop li ser kevirên reş yên

peravê diçilkin. Dilop diçilkin ser pêlavên Memduh Selîm Begê... Ew li pêlavên xwe dinihêre. Pêlavên nû, piştî wê xewnê, hatibûn kirîn. Ew niha şil in. Memduh Selîm Beg, nîvkenek li ser rû, li der û dora xwe dinihêre. Paşê jî li bav û xwişka xwe. Xwişka wî digirî, bavê wî kelgirî ye. «Hûn qet meraq mekin, xem mexwin... ev rêwîtî kurt e, piştî demeke kurt ez dîsan li vê derê me. Lê hûn divê hingê jî li vê derê, li hêviya min bin, hûn divê werin pêşiya min.»

Memduh Selîm Beg rêwî ye. Rê lê vebûye. Lê heyhat,.. ne ber bi qeraxên gola Wanê. Ew li ser riya welatê xerîbiyê ye. Ber bi deverên dûr.

Prensîba hezar salan bi car tê; kesên serketî yên binketî bi dûr dixînin.

«Xwişka min ya delal, bêgavmayin xirab e, qelsî ye. Her gav divê me hêvî hebe. Ev rojên reş û mûsîbet dê zû derbas bibin.»

Dûûûttt... dûûtt... wext hat. Çûyin divê. Hembêz li hev vedibin. Germiya dil diguhezin hevûdu. Hêstir ji hinarikan gêr dibin. Dest tên guvaştin. Lêv bi ken dilivin.

Di destên Memduh Selîm Beg de du çante, ew ber bi keştiyê dere. Di çantekê de kinc û tiştên wî yên şexsî û di ya din de Ehmedê Xanî, Firdewsî, Omer Xayam, Montaigne, Descartes, La Fayette, Rousseau, Shakespeare, Voltaire; yanê rojhelat û rojava bi hev re.

«Li mal û kitêbên min miqayite bin. Ez dê vegerim, ez dê vegerim...»

Dest hêldibin, destmalên şil hêldibin.

Av diqelişe. Keştî, giran giran, bi dûr dikeve. Baran dibare. Hawa tarî, aso girtî ye. Li pêş, ji mij û dûmanê pê ve tu tişt naxuye.

## 6

Iskenderiye. Bajarê Kavafis. «Tu dê nikaribî welate-

kî nû bibînî, tu dê nikaribî deryake nû bibînî.»Kavafis weha dinivîse. Ew niha di vî bajarê fîrawûnan de çi dike?

Şev. Bêdengiya destpêka 1920-an. Piştî şerê cîhanê û dinya westiyayî. Iskenderiye di bin ronahiya heyvê de dest bi xewa şêrîn dike. Bajar dere xew, xewa şevên bêdeng.

Memduh Selîm Beg, bi tena serê xwe, li qeraxa deryayê digere. Ji dûr, ji nik keştiyan dengine tên û ronahî diçirûsin. Stêrk di govendê de ne. Pêlên hîsên têvel; dûrahî, hêvîdarî, hewcedarî, rêwîtî, xerîbî, xweşî, xemgînî... Pêlên hîsên têvel bi ser Memduh Selîm begê re tên. Pêlên avê bi ser qeraxê re tên. Car bi car. Şevereş. Pêşî tarî ye. Ew pêşiya xwe baş nabîne. Çavên wî nikarin perda tarî ya şevê biqelişîne. Ew bi şûn de vedigere. Ew dê here navenda bajêr. Cîhê ku razan jê bi dûr e.

Di kuçeyên teng û biçûk re bûrîn. Zêdebûyina ronahiya lampan. Meydana Munşiyê. Pêlên merivan; Ereb, Ecem, Tirk, Ermen, Kurd, Yewnan, Ingiliz, Fransiz, Italî. Li her aliyê meydên devê kuçeyên teng û dîsan meriv. Rû û rûçikên nas? Naxêr. Silaveke germ? Naxêr. Germiya coteke çavên dost? Naxêr. Pêlên hîsên têvel û pêlên merivan bi ser Memduh Selîm beg re tên.

Xaniyên spehî yên textîn. Bi dû wan re deverên Remle. Koşk û qesrên mezin û spehî, tê de merivine ziktêr, halxweş û ji xerîbiyê bi dûr. Wan hay li Memduh Selîm Begê heye? Ew û xewnên wan yên şêrîn. Di xewnên şêrîn de dengên şêrîn; gujîna avê, hûfe hûfa pêlan, hîrîna hespan, pîrqîna keç û jinan, kalîna berxan, qebqeba kewan, çîvçîva bilbilan, teptepa dilan û nalîna bedenan. Baş e, niha kî di xewna xwe de Memduh Selîm beg dibîne?..

Bila bajarê hozan Kavafis jê re be. Memduh Selîm Begê ev bajar navê.

7

«Allah-û ekber, Allah-û ekber...» Ezana destê sibê. Dengê dîkan û kûzîna segan. Memduh Selîm Beg nikare razê. Bîhntengî lê hatiye xezebê. Berî çend salan wî hêvî hebû ku Kurd dê xwedî dewlet bûna. Lê niha jî ew di nav pêlên xerîbiyê de ber bi derine dere. «Xwelî li serê te be dinyayê, xwelî li serê te be!..» Memduh Selîm Beg dide xwe, radibe û di çend deqîqan de cilên xwe werdigire. Ew dê ji oda xwe ya otêlê derkeve û here bajêr.

Kahîre.

Evîndarê Nîla delal hişyar dibe. Ro hê hilnehatiye, lê tîrêj bi rengê zîvîn li pey Nîlê dixuyin. Memduh Selîm Beg ber bi Siwarsî dere. Hembal dilezînin. Tramway xwe dilivînin. Jinên rûpêçayî di nav kincên reş de ber bi derine derin. Ew meydana Siwarsî dibihure û dadikeve kolana Qesr el-Nîl. Lampayên stûr hê jî vêketî ne. Welatê îslam, lê avahiyên Ewrûpayî. Bişûndemayin. Nezanî.

Ax nezanî!

Memduh Selîm Beg, di nav fikr û hîsên têvel de, bê ser û ber digere. Rojên Fransayê, Parîsê ne weke van rojan bûn. Ew jî rojên xerîbiyê bûn, lê ne weha. Weha nabe! Memduh Selîm Beg nikare weha weke serseriyekî li welatê xerîbiyê bigere. Tiştine dê di welêt de biqewimin. Ilam. Hingê ew dê li kû be?

Ling wî ber bi Şarî Maxribî dibe. Li aliyê milê rastê meydana Operayê. Ronahiya lampan. Erebeyên spehî. Meyxanên hûr. Bexçeyê Ozbekiyê. Li doraliyên meydên kuçeyên teng û tarî. Di devê kuçeyan de keç û jin.

Ling ber bi kuçeyekê derin.

«Sabah-ul xêr.»

Jin silav didin mêrê bejnzirav. Ew silavê li wan vedigerîne. Ew li wan, jin jî li wî dinihêrin. Bi ken, bi dilgeşî. Jinên nîvtahzî, jinên bedensivik, jinên pêsîrmezin, jinên hêtfireh, jinên pordirêj. Ew li hev dinihêrin û dikenin. Memduh Selîm Beg ji dil dikene. Lê kena jinan? Keneke derewîn û edetî?

«Mêrê çeleng, were em herin jor, odê kahweyekê vexwin...»

«Na, spas. Ez dixwazim bi tenê li we û xweşikiya we binihêrim, li dengê we guhdarî bikim... min bêrî lê kiribû.»

Ew, bêdeng, lê ken li rû, hêdî hêdî li kuça teng digere. Di bin siya xaniyên bi lampayên rengîn de ew li rû, ken, por, çav, bejn, pêsîr, beden û lêvên jinan dinihêre, li dengê wan guhdarî dike.

Belê, ew ji çar dengan hez dike; dengê dil, jin, musik û avê. Lê ka dengê dil? Ew li kû ye? Ew dizane; dil bi bîhna welêt û merivên welêt û bi tahma xweşiyên welêt hildavê. Ka ew bîhn û tahm?

Dengê dil divê. Jiyaneke bi dengê dil divê. Cîhê ku jê dengê dil dertê, divê. Memduh Selîm Beg cîhekî weha, ji bo jiyînê, divê.

## 8

«Monsieur Memduh Selîm, me mînet e ku hûn dixwazin li Sûriyê bi cîh bin. Ji ronakbîrekî weke we re, her gav, cîhê me heye. Hûn dikarin li her derê Sûriyê cîwar bibin. Li vê derê, Helepê, yan jî li derekî din. Hûn bi kêfa xwe ne, hûn li kû dixwazin li wir...»

«Monsieur, ez mînetdar im.»

«Bi tenê me şertekî heye monsieur Selîm; hûn divê

xebata siyasî nekin. Dewleta Tirk ya nû gelek zor dide dewleta Firansê da ku em rê li Kurdan bigirin ku ew li ser tixûb nexebitin. Bawer bikin... em dizanin Kurd di çi halî de ne, lê hûn dê çi bikin! Dewletbûyin jî ne hêsan e, meriv divê her gav mafên dewletê li ber çavan bigire...»

«Oui monsieur, ez we têdigihêm.»

Memduh Selîm Beg li rûyê zabîtê Fransiz dinihêre û dikene. Ew ji kerba dikene. Ji ber bextê reş dikene. «Dewletbûyin ne hêsan e...» Ew bi dengekî bilind dikene.

Eger di rojên pêş de Memduh Selîm Beg keys hebe, ew dê li ser celebên kenê nivîsareke dirêj binivîse. Ev yeka pêwist e.

«Monsieur, Heleb jî ji welatê min bi dûr e. Ez dixwazim nêzîkî welatê xwe bim, li nik merivên welêt bim.»

«Hûn bi qîma xwe ne, monsieur Selîm... bi tenê me agahdar bikin.»

Memduh Selîm Beg kêfxweş e. Wî gaveke nû avêt; wî biryar da ka ew dê li kû bi cîh be. Heta ku ew dîsan bizivire welêt, ew dê li vî aliyê tixûbê, li nik hemwelatiyên xwe bijî. Serdestên Sûriyê Firansiz rê li vê yekê nagirin. Jixwe ev jiyana derbeder ya xerîbiyê dê zêde dirêj nebe. Dewr û dewran dê biguherin. Ew dê dîsan vegere welatê xwe, nik merivên xwe yên ezîz û qedirgiran. Ew dê xaniyekî biçûk li nik gola Wanê ava bike. Stêrkên zêrhelî dê li ser serê wî re biçirûsin. Felek dê li ber wî govend bigire. Bextê çê dê lê bizivire.

Ji kêfa Memduh Selîm Begê re payan nayê dîtin.

Dused û pênce giram fistixên Helebê. Li ser kolanên bi kevirên spî rêveçûn. Girsa merivan. Şênî. Rûyên esmer, simbêlên dirêj û badayî, kiras, fîstan û qutikên di-

rêj, jinên rûpêçayî. Qîre qîr, xire cir. Feqîrî, rebenî, belengazî. Parsekên li koşeyên kuçan. Avahiyên spî û spehî.

Memduh Selîm Beg dê li Helebê, li Hotel Central bimîne. Ew dê heval û dostên xwe bibîne, bi wan bişiwêre da ku li cîhekî, li Sûriyê, cîwar bibe.

Ew, rûken, li Helebê digere. «Digel her tiştî, tevî her celeb mirdarî, qirêtî û nizmahî, dîsan jî, jîn xweş e, dinya xweş e.»

9

«We bihîstiye ka kî hatiye bajarê me û bi cîh bûye?»

«Dibêjin, alîmekî ji Mabeynê, ji Saraya Osman-î Alî hatiye...»

«Na, na, ne ji Mabeynê. Dibêjin ew şoreşgerekî ye, şoreşgerekî mutexes.»

«Ne alîm, lê hozan.»

«Na, ne hozan, lê nivîkar û musiknas.»

«Ne nivîskar, lê siyasetçî...»

«Axirrr... Dibêjin, merivekî pak û rind e.»

«Belê, me bihîstiye.»

«Merivekî bejnnavîn, zirav,»

«Asîl.»

«Belê, me jî bihîstiye.»

«Nermik, rûken, xweşsohbet.»

«Dibêjin, porê wî her gav şehkirî ye, simbêlê wî zirav, bedena wî lihevhatî ye. Pêlavên wî her gav dibiriqin. Kincên paqij û gomlegên spî li xwe dike. Saeta wî zîvîn e, qirawatên wî xweşik û destmalên wî bi bîhna rehanê ne...»

«Belê, belê.»

«Heval û dostên wî li bajêr hene. Li gor gotina wan,

ew ji araq, cacix û çerezê hez dike.»

«Ji însanan jî.»

«Dibêjin ku ew Kurd e.»

«Baş e, hingê çima ew neçûye û li bajarekî Kurdan, mesela li Qamişloyê cîwar nebûye?»

«Dibêjin, pê re nexweşî heye. Ew nikare xwe li ber germa havînê ragire.»

«Belê, belê...»

«Hûn dizanin ka ew her roj di saet çaran de çi dike?»

«Çi dike?»

«Ew, her roj, ber bi dana êvarê, dadikeve parqa Zîrahiyê û li wê derê qahwe vedixwe.»

«Rast?»

«Belê, rast e.»

«Hingê, gava ew ji ber derî re, li kolanê, derbas bû, em lê binihêrin.»

«Belê, belê, em lê binihêrin.»

«Ermenekî kal ku dengbêj bû û bi kurdî jî dizanîbû, li ser merivên weha, straneke weha digot:

Mêro, mêro, bejnziravo
Xweziya min bi dilê teyo,
Rûgeşo, rûşêrîno,
Dilên keçên xama pê re yo...»

10

Teq, tuq; teq, tuq...

«Xwedê umrê wî dirêj bike.»

Teq, tuq; teq, tuq...

«Xwedê wî ji xirabî û pîsîtiyê bisitirîne... Xwedê mirazê wî bîne dewsê.»

Teq, tuq, teq, tuq... weke dengê saeteke dîwêr. Ewçend bi dûzan, ewçend rehet. Belê, Memduh Selîm Beg

kuçeyên Antaqiyayê dihejîne. Havîna xweşik dest pê kiriye. Saet piştî nîvroyê 3.45 e. Ew ji mal derketiye û dere bexçê. Kevirên reş yên kuçeyan di bin pêlavên reş û çermîn de deng didin.

Derî û pencere, bi hêdîka, bêdeng, vedibin. Bi qasî bihustekê, ne zêde. Perde tên vekişîn. U çav; çavên reş, şîn, belek lê dinihêrin.

Dinya germ e, lê wî çakêt, yêlek û qirawatê xwe ji xwe nekiriye. Ev yeka ne li gor edetan e. Ne li gor edetan e ku meriv «pîrût û çîprût» bigere, li der û dora xwe binihêre, bilezîne, di rêveçûnê de bifikîne. Ne li gor edetan e ku...

«Efendiyê bejnzirav.»

«Mêrê qenc.»

Ew, serî li ber, hêdî hêdî dimeşe. Lê ew dizane, na, ew nizane, lê pê dihese ku li pey derî û penceran çav li wî dinihêrin.

Parq, bexçe. Giya û hêşinahî. Darên têkel; yên bi ber û yên bêber. Pelên hêşîn û xemilandî. Dengê çivîkan. Tava germ. Bayê sivik û hûnik. Bîhn; bîhna dar û pelan, bîhna hêşinahiyê, bîhna çêm.

Çemeke hûr û zelal li ber wî diherike. Di bin siya daran de ava zelal rengîn dixuye. Rengên kesk, şîn, gewr û zer ketine nav hev. Av reh, rêç û pelên daran hembêz dike. Darin stûr xwarî avê bûne. Dilê Memduh Selîm Begê hildavê. Hîn zûtir û hîn xurttir. Weke ku dengê avê û dengê darê digihên hevûdu, dibin yek.

Ew kursiyekê dikişîne bin xwe û li kêleka çêm rûdine. Lawikê dezgedar yê bexçê dilezîne nik wî, radigihê masayeke biçûk û tîne ber wî datîne û serê masê paqij dike. «We îroj çi divê, nêrgile?»

Ew, bi ken, li lêwik dinihêre, «La, şukran.»

«Weke her carî?»

«Belê, weke her carî.»

Bexçe tenha ye. Jin û mêrekî û du zarok li nêzîkî wî rûniştine û çay vedixwin. Du zabîtên firansizî, ji wî hinekî bi dûr, rûniştine û bi dengekî bilind dikenin. U hinek kesên din ku li bexçê rûniştine.

Lawik, di destan de misîna qahwê û du fîncan, dîsan tê nik wî. Ew fîncanekê ji lêwik werdigire. Fîncan tijî qahwe dibe. Dûman ji qahwê radibe. Ew hêdî hêdî qahwê bîhn dike, çend car fîncanê di destê xwe de dilivîne û bi dû re jî vedixwe. Oxxx... Fîncan dîsan tijî dibe. Oxxx... Dîsan. Oxxx...

«Spas.»

Di qahwevexwarinê de Memduh Selîm Beg tiştekî ku ne li gor edetan e, dike; qahwa tahl divê du caran were vexwarin, lê ew sê caran vedixwe. Qahwe divê hindik be, lê ew dixwaze ku bila fîncan tijî be.

Ew li dora xwe dinihêre. Xweşî... Zarok di navbera maseyan de dibezin, çivîk difirin û li ser daran distrên. Av, hêşinahî. Ew ji bêrîka hundirîn ya çaketê xwe penûs û deftera xwe dertîne. Penûs. Penûsekî murekebî û reş, pir xweş.

Heş bi firê dikeve. Ew roj... Ew roja xweş û hêvîtijî. Ew roja ku qet ji bîr nabe. Roja ku wî û hevalên wî dest bi weşandina kovara «Jîn»ê kirin. Stembol. Şênî, heval û dost. Kêfxweşî, şahî, bawerî. «Em dê bi ser kevin. Em dê bi ser kevin... Iroj kovereke xweş, sibê roj jî rojnameyeke rengîn û dewlemend... Gava em weha bi hev re bibin yek, bi hev re bin, tu tişt nikare xwe li ber me ragire. Em dê bi ser kevin.» Kurdiyê Bêtlîsî. Yanê bi navê rastî Xelîl Xeyalî. Nivîskar û zaneyê kurd. Hevalê dilsoz, merivê hêja û merd. Di destê wî de penûseke reş û murekebî. Penûseke pir spehî.

Hevûdu hembêzkirin. Hêstirên kêfxweşiyê. Best û

dostî. Coşeke bêhempa. Memduh Selîm Beg jê penûsê werdigire. «Ez dê vê penûsê veşêrim û vê roja xweş ji bîr nekim.»

Memduh Selîm Beg niha li bexçê Zîrahî yê Antaqiyayê rûniştiye û di nav pêlên xatiran de li penûsê dinihêre. Bi dû re, ew li ser rûpeleke vala ya deftera xwe ya biçûk, bi penûsa yadîgar, navên kitêbên ku jê re divên dinivîse. Jê re pir kitêb divên. Ma ne çêtir e ku ew kitêbên xwe jî bide anîn? Hingê karê wî dê hêsantir bibe. Ew nikare ji bo deynkirina kitêban bireve vê derê û wê derê. Belê, çêtir e ku kitêb werin. Gava roja vegerê, vegera welêt hat, ew dê kitêbên xwe, dîsan, bi xwe re bibe welêt.

Ma weha ne çêtir e?..

## 11

Bi qasî du mehan, bi dû wê roja ku wî navên kitêban nivisî. Eynî cîh, eynî wext. Lê çend mase ji maseya wê gavê bi dûr.

«Weke her carî?»

«Belê, weke her carî.»

Baş bû ku Memduh Selîm beg hat û li vî bajarê biçûk bi cîh bû. Bajar li ser deryayê ye. Der û dora wî xweş e û di ser de jî ew li ser tixûb e. Hewayê bajêr li Memduh Selîm Begê tê. Ji ber ku ew li ser tixûb e, gelek kes tên û derin. Xeberên Tirkiyê û welêt zû dihuhezin bajêr. Merivên bajêr weke hemwelatiyê wî ne. Edet û tore wekhev in. Ziman jî ne zehmet e. Jixwe ew hinekî bi erebî dizane... Baş bû, baş bû.

Çîve çîva çivîkan dîsan hawirdor vegirtiye. Çivîk bi firê dikevin û vedinişin. Lê di wê navberê de dengekî... Dengekî tîz û zirav. Vîçe vîça çivîkekê. Weke ku ew li bin guhê Memduh Selîm Begê vîçe vîç dike. Memduh

Selîm Beg li dora xwe dinihêre. Vîçe vîç ji kû tê?.. Belê, ji bin dara kêlekê. Di bin darê de çivîkeke pir biçûk. Li ser darê, di nav şax û pelan de hêlîneke biçûk. Rebena çivîkê! Çivîk diperpite ku bifire. Lê ka perwaz? Perwaz hê baş li hev nehatine.

«Çima tu ji hêlîna xwe bi dûr dikevî?»

Memduh Selîm Beg radibe, ber bi çivîkê dere. Vîçe vîç. Du çavên hûrik, nikuleke rindik, pûrtên nermik. Çivîk di nav lepên wî de diperpite. Tirs. Tirsa malkambax. «Na, na metirse, ji apê te tu xirabî nayê, metirse.»

«Şebabbb...»

Lawikê çayxanê dibezîne û tê nik wî.

«Rebena çivîkê ji hêlîna xwe ketiye, ew nikare bifire. Me jê re alîkarî divê.»

Lawik, pir ecêb, li wî dinihêre. Carekê li wî, carekê li çivîkê. Carekê jî li darê. «Dar bilind û asê ye.»

Yanê çi? Memduh Selîm Beg, bi ken, lê vedigerîne, «xortê hêja, em nikarin vê çivîka reben weha berdin. Ew dê bimire. Ma ne guneh e?.. Tu divê hilkişî darê û çivîkê deynî hêlîna wê.»

«Hilbikişim?.. Ji bo vê çivîkê?..»

«Belê, hilkişî... belê, ji bo vê çivîkê.»

Temaşegeh. Şêniyên çayxanê li dor wan dicivin. Lawik bêçare ye. Ew hêdî hêdî hildikişe. «Bijî xorto.» Çîve çîv. Çepikên zarokan. Memduh Selîm Begê serfiraz û biserketî. Rûyê wî bi ken. Çivîk niha di hêlînê de ye, di stariya xwe ya germ û nas de.

Çepik, qîrîn, şahî. Lawik dadikeve. Lawikê serfiraz û rûken.

«Xortê çak, ji bîr meke; her kes di hêlîna xwe de kêfxweş û dilşa ye, çivîk jî di hêlîna xwe de...»

Şênî belav dibe. Memduh Selîm Beg li şûna xwe vedigere û rûdine, bi kêfxweşiya tiştekî rind biserxistinê.

## 12

Ronakbîrê kurd Memduh Selîm niha bûye monsieur Memduh Selîm. Monsieur Memduh Selîm yê xwendegehan. Mufetîş û mamoste monsieur Memduh Selîm. Wext lê diqulipe. Roj, meh, sal lê diqulipin. Niha payiza 1926 an e. Simbêl niha hîn dirêjtir, lêv û çav jî dîsan bi ken in. Lê belê, di eynî wext de, bi derd û keser.

Li ser bibûkên çavên wî siya derd û keseran.

Dîsan Sûriye, dîsan Antaqiye.

Ew li mala dostekî xwe yê çerkez rûniştiye û pê re dipeyive. Hevalê wî jî, herwekî wî, derbeder e. Wî jî, di 1923 an de, dev ji karê xwe, rojnamevanî, berdaye û ji Tirkiyê reviyaye. Pêşî Lubnan û Urdin û niha jî Antaqiya. Dostê wî... Merivekî çawan? Kirasên hewreşîmî yên çerkezan, bejneke dirêj û zirav, rûyekî dirêj û zirav û asîl, çavên xweş û bi rengê genim, simbêlên dirêj û ber bi jor badayî.

Merivekî nerm û zane. Dostekî dilsoz û dijminê dijminan.

Odeke mezin; li gor edetên çerkezan raxistî. Li ser dîwaran çend xençerên zîvhêlî ku bi awakî çaprazî hatine hildayin. Du qafên xezalan. Xalîçeyeke rengîn û çend refên kitêban. Kitêbên nerêzkirî û tevlihev. Piraniya wan kitêbên îlmî û edebî. Kitêbên têvel.

Li ser masê jî araq; araqa spî, cacixa spî û xwarinên têkel.

Wan şîva êvarê xwarine û niha jî ew qesta felekê dikin. «Mîrê min, dîsan çi bû, bi me, bi xelkên belengaz û bindest bû. Dîsan em ketin bin bêjingê.» Memduh Selîm Beg, weke her carî, tiliyên destên xwe bi ser hev re dibe û bi nermî dipeyive. «Heq, hûqûq, demokrasî û mafên merivahî tên xeniqandin, tên fetisandin... Par li Kurdistanê qetlîameke mezin çêbû. Tirkan gelek bîre-

wer, rênas û pêşewayên me bi dar ve kirin...»

Gava ew behsa par dike, ji çavên wî çirûsk difirin. Dengê wî di nav qîrîna dilê wî de difetise. Bîhn lê diçike. Ew, kelgirî, li ber xwe, li qedeha araqê fedike.

«Di nav wan de gelek hevalên min jî hebûn. Gelek hevalên min jî hatin bidarvekirin...»

Bêdengî. Hingê bêdengî. Di şîna bêdengiyê de dengê dil û qultên ku ji gewrî dadikevin. Rabûna qedehan. Hinekî cacix. Şewata gewriyan. Dîsan qedeh. Dîsan şewat. Ji nû ve, dest bi xeberdanê kirin. Beden li vir, heş li welêt. Di çavê macîriyê de were! Derd, kul, kerb û xezebên macîriyê... û bûyerên welêt. Yek ji yekî xirabtir, yek ji yekî kirêttir. Bîhntengî, qedeh. Şewat. Cacix. Keserkûrî...

Lê?

Trayyy... laaaa... laaayyy... trayyylaaaylaaayyy...

Memduh Selîm Beg vedicinîqe. Musîk. Kemançe. Dengê kemançê. «Dengê kemançên Stradivarius... belê, ev deng, dengê kemançên Antonio Stradivarius e... Ev deng bi tenê dikarin ji kemançên wî derkevin!..»

Xeberdan tê birîn. Guh li ser kemançê ne. Çav li jor, li banê dinihêrin. Ji dengê kemançê pê ve, her deng, her pejn rawestiye.

«Memduh Beg...»

«Mîrê min, tika dikim...»

Ew xeberdana dostê xwe dibire. Beden bi hêdîka diheze, ruh diheje. Dengê delal yê musîkê têkel e. Memduh Selîm Beg xwe dieşîne ku dengan ji hev derxîne. Musîk bi dengine bilind dest pê dike û bi qasî bîskekê wisan didome, paşê ji nişka ve, bi carekê deng nermtir, pir nermtir dibe û paşê dîsan ji nişka ve dengine bilind tên. Tev li hev. Tevlihevî. Lê tevliheviyeke xweş û durist. Di nav dûzaneke lihevhatî de tevlihevî. Yanê ne li

gor qaîde û prensîbên kevn. Ne li gor klasîkên 1700-1800'î. Ji bervajiyê, şoreşgerî, nûbûn û nûkirina babilîska 20 an. Heyama teze ya destpêka 1900'î.

Xeberdan, vexwarin, xwarin rawestiye. Tilî, li gor musîkê, bi dûzan li ser pişta qedehê radibin û dadikevin. Trayyy... trayyy... trayyylalayyy... laaaay... Musîk weha, bi qasî demekê, dom dike. Perçeyên cihê tên ceribandin. Destên ku li kemançê dixin û bi kewana kemançê digirin, hal û hewalê kemançê dizane. Ne ewçend bi hostehî, lê dizane.

Di pey musîkê re bêdengî. Memduh Selîm Beg li dostê xwe dinihêre. Çavên wî bi ken in. «Mîrê min, ez bûm serxweş.»

«Belê, me pir vexwar.»

Memduh Selîm Beg dikene. Niha jî ji çavên wî ken diçirûsin. «Na mîrê min, ne ji ber vexwarinê ye, ji musîkê ye, ez ji ber musîkê bûm serxweş. Ji mêj ve bû ku min dengê kemançê nebihîstibû.»

Ken. «Keça min e, Memduh Beg.» Şinginiya qedehan. «Sagliginiza!..» Ji bo siheta we...

«Ez nizanim, lê dengê kemançê bi dengê kemançên Stradivarius dişibe. Ma ev kemançe ne kemançeyeke ji yên wî bû?»

«Memduh Beg, Memduh Beg... we hay ji kemançan jî heye! Rast e, gava ez di destpêka şerê cîhanê de li Italyayê bûm, min ev kemançe bi dest xist û ji keça xwe re kirî. Ji ber bextê min'ê rind, ew ne zêde buha bû jî. Tu dizanî, evîna zarokan li ser her tiştî re ye. Me bi tenê zarokekî heye. Ew her tiştê me ye...»

Zarok? Delalî? «Keça min»?

Kî? Keçikeke çawan? Meraq. Lê Memduh Selîm Beg şerm dike ku vê yekê ji dostê xwe bipirse. Ne li gor edetan e. Lê belê, carina ji dan û standina fikir û hîsan

re peyv û qise navên. Dostê wî radibe pê û ji odê derdikeve. Memduh Selîm Beg, sermest, li dora xwe dinihêre. Dengê kemançê bû dilopeke ava hûnik û xwe berda ruhê wî yê tî û zuhabûyî.

Dinya dijîtî û berberiyan careke din xwe ber bi çav dike. Berî bîskekê keser û xemgînî, niha sermestî û serxweşiya xweşiyan. «Dilo, dilo, çi bi te diqewime? Tu çima weha xwe bi carekê dihurînî?» Ma jiyana Memduh Selîm Begê dê weha di navbera dijîtî, berberî û tevliheviyan de derbas bibe?

«Memduh Beg, keça min Ferîha...»

Ferîha.

Xwedeyo! Xwedeyo!..

Xezal. Heyva çardehê mehê. Kew. Dilop: dilopeke av, dilopeke xwîdan, dilopeke hêstir, dilopeke spehîtî û xweşî. Jiyan. Kahniya jiyanê.

Li milekî jî awirê teyrê baz.

Bav û keç li ber masê ne. Memduh Selîm Beg radibe pê. «Dengê kemança we ez sermest kirim.» Dest digihên hevûdu. Germiya bedenan digihên hevûdu. Memduh Selîm Beg bawer dikir ku keça dostê wî biçûktir bû. Lê li hember wî niha keçikeke xama, li wî dinihêre.

«Spas.»

Dengê delal xwe digihîne dilê Memduh Selîm Begê. Dil bi xurtî hildavê, ew dê ji qefesa xwe derwere. Ax dilo. Dengê dil... Dilê wî ewçend pihêt hildavê ku ew ditirse, bav û keç dengê dilê wî bibihîsin! Lêvên wî, bi ken, dilivin, -weke ku ew li pey ramûsanekê bin.

Gewrî lê zuha bûye. Ew bi destan kursî nîşan dide da ku bav û keç lê rûnin.

Ew; bejneke dirêj weke mehînan, stûyekî dirêj, delal û spî, hêtên zirav û xweşlihevhatî, guliyên zer û dirêj

heta pişta bedew, çavên germ, şêrîn û genimî. Çavên wê; li ser riya bihuştê du derî.

«Hûn baş li kemançê dixînin.»

Keneke şermok. «Bi xêra Bavo. Eger ez îro li kemançê dixînim, ev yeka bi xêra Bavo ye. Wî ez teşwîk kirim.» Bavo jî, maxrûr, dikene.

«Ji deng dixuye,.. kemança we pir xweş e.»

Dîsan keneke şermok. «Bavo ew ji min re kirî.»

Keça bavê xwe. Delalî, delaliya Bavo!

«Ew perça ku we lêdixist, ya kê bû?»

«Ew ya Eugêne Ysaye bû. Ez nizanim baş li perçên wî xînim, lê kêfa min jê re tê.»

«Belê, min navê wî bihîstiye. Gava ez li Parîsê bûm, behsa wî dibû.»

Çavên delal, bi heyret, vedibin. Çav, bi qasî bîhnekê, li çavên Memduh Selîm Begê dinihêrin. Germ û melûl. Lê bi meraq.

«Sonata duwemîn bû...»

Çavên germ yanê deriyên bihuştê germiyekê bi ser bedena Memduh Selîm Begê re wer dike. Ew nikare xwe li ber nêrîna çavên germ ragire. Ew li dostê xwe vedigere. «Mîrê min, xweziya min bi te, dengê kemançê ji mala we radibe.»

Piştî bîhnekê, ew dîsan dixwaze xwe bide ber beroşka çavên germ. «Hûn bijîn, we xweş lêxist.»

## 13

«Şûx û şengê zuhrerengê dil ji min bir, dil ji min
Awirê heybetpilingê dil ji min bir, dil ji min
Wê şepalê miskîxalê dêmdûrê gerdanşemalê
Cibheta bîskan sema lê dil ji min bir, dil ji min.»

Memduh Selîm Beg xwe spartiye şi'îran û ew şi'îra

Melayê Cizîrî «Dil Ji Min Bir» dixwîne. Wî deriyê dilê xwe ji aheng, xweşî û spehîtiya şi'îran re vekiriye. Ji kêfa dil re payan tune. Dil bi firê ketiye û ew li ser ewrên spî govend digire.

Gelo ew çirûskên evînê ne?

Memduh Selîm Beg şi'îr nanivîse, lê dixwîne. Ew xwendevanekî dilsoz yê şi'îran e. Li gor wî, dilê ku deriyê xwe ji şi'îr û germiya şi'îran re venake, dilekî nîvmirî ye. Dilekî weke çoleke zuha, erdekî qiraç, deverekî bêbergeh û tahtekî hişk û zuha. Li gor wî dil û şi'îr; yekitiya herî xweş, yekitiya zanîn û hîsan.

Memduh Selîm Beg li bexçê Zîrahî rûniştiye û deriyê dilê xwe ji şi'îran re vekiriye. Li ser masa wî, li milekî Hafiz û Xeyam, li milekî jî Melayê Cizîrî.

Tiştekî pê qewimiye. Lê çi? Ev çend roj in ku kêfxweşiyeke tenik, perde bi perde, bi ser wî re tê. Memduh Selîm Begê navsal niha xwe hîn xorttir hîs dike. Derd û keserên xerîbî û sirgûniyê hinek, bi tenê hinek, ji wî bi dûr ketine. Weke ku ew di nav xewnekê de ye. Ew li şi'îra Melayê Cizîrî dinihêre û dikene; «xwezî ev xewn weha dewam bike...»

## 14

Li bexçê Zîrahî.

Ew.

Ew, tevî çend jinên din, ji deriyê bexçê dixuye. Çend jinên bedenfireh û gilover, di nav kincine reş û girtî de, li pey wan jî ew; Xezal.

Belê, Xezal. Ji îroj pê ve, navê wê Xezal e.

Roj li ber avabûnê ye. Tîrêjên wê yên neqehîm li ser giyayên parqê diçirûsin. Giya li ber lingên wê leylan dide. Li dor wê jinên qelaw, bi îhtimaleke mezin dê, met, xaltî, nas û cîran. Di nav pezkoviyan de xezaleke

nazdar. Xezal, hêdî hêdî, bi nazdarî dimeşe: kincine rengîn û guliyên dirêj ku heta ser hêtan tên. Eniyeke fireh. Bejneke dirêj. Tîrêjên sor yên rojê xwe digihînin wê. Tîrêj li enî, kezî û guliyan diçirûsin.

Xwedeyo!

Memduh Selîm Begê ku weke her carî, dana êvarê, li bexçê rûniştiye, wê dibîne. «Xwedeyo!» Best lê radibe.

Ew tên û çend mase ji Memduh Selîm Beg bi dûr, li dor maseyekê rûdinin. Pişta wê bi Memduh Selîm Begê ye. Stûyê dirêj weke sitûn, guliyên dirêj, pişta zirav û hêtên xweş û vekişiyayî.

Bejndirêjê, pordirêjê, bedenziravê!..

Çima? Ma wê Memduh Selîm Beg nedît ku weha pişta xwe dayê, rûyê xwe jê zivirand? Yan? Heye ku nazdarê naz dike. Heye ku tiştên ku Memduh Selîm Beg hîs dike, ew hîs nake. Yan jî heye ku Nazdarê hay ji xewna şêrîn ya Memduh Selîm Begê heye û dil dike bila xewn hîn bêtir bi heyecan be.

Rûyê pezkoviya mader yanê diya wê, ber bi Memduh Selîm Begê ye. Ew wî dibîne. Çav li hevûdu dinihêrin, rû dibişirin. Ew kitêba destê xwe, bi hêdîka, datîne ser masê, nik kitêbên din, bi hêdîka radibe pê, xwe dide hev, qumçikên çakêtê xwe digire, qirawata stûyê xwe rast dike û ber bi wan dere.

«Iyi gunler, nasilsiniz? Mirim afiyetde mi?»

Yanê, rojbaş, hûn çawan in? Mîrê min di afiyetê de ye? Bi tirkî, bi hurmet. Bersîva dê û çend peyvên din. Bi tirkî. Hingê Xezalê serî ber bi jor dike û li jor, li Memduh Selîm Beg dinihêre. Stûyê vekişiyayî û çav û lêv û rû û kena li ser rû.

Binevşa Narîn, dastana Binevşa Narînê... Hingê ew dikeve bîra Memduh Selîm Begê. Ew nizane çima, lê

ew keça bedew ya dastanan dikeve bîrê. Xezalê û Binevşa Narîn... «Lawo, ev Binevşê qîzekê pir bedew e, bedewbûn ji kesî re nehîştiye. Wexta ko radibî ser sî û sê çîv dikevin bejna wê. Çavin reş li ser in mîna hibra ser qaxetê; eniya wê fireh e mînayê gokmeydanê heyvê, bêhna sî û sê dermanê etara ji neqeba sêng û berê wê tê...»

«Kek Memduh, hûn çawan in?»

Dengê nerm û zelal jê dipirse. Zarşêrînê!

Kek? Çima kek?

«Spas Ferîha, ez baş im.» Ne xwişkê, bi tenê Ferîha. «Tu çawan î, baş î?» Ne hûn, bi tenê tu. «Nabêna te û kemançê çawan e? Tu li kemançê dixînî?»

«Spas, ez jî baş im. Belê, lê dixim. Kek Memduh, hûn dizanin, meriv divê her gav, her roj lê xîne da ku meriv bibe hoste. Kemançe tiştekî welê ye ku gava meriv her roj lê nexîne, meriv nikare nêzîkî li wê û dengên wê bike.»

Ken li rû. Lêvên şil vedibin, diranên spî dixuyin. Çavên bi kil dikenin. Lê gep sor in. Şermok? Şermokî?

«Mutlaka te hay lê heye... Fransizekî heye, Claude Debussy... min bi xêra sonatên wî ji kemançê hez kir.»

«Belê, belê, ez bi çend sonatên wî dizanim. Ne pir xweş, lê dizanim. Kek Memduh, welê dixuye ku hûn şarazayê musîk û kemançê ne.»

Bêdengiyeke bi ken. Dan û standina çavan. Keneke weke kena zarokan li ser rûyê wê.

«Ma we nedixwest ku hûn li nik me rûnin?»

Dengê pezkoviya mader ne bi daxwaz e. Dengekî sar. Lê digel vê hindê jî, eger Memduh Selîm Begê şerm nekira, ew dê li wê derê, li nik wan rûnişta. Lê nabe, ev yeka ne li gor edetan e.

«Spas, jixwe ez dê rabûma û biçûma. Bimînin di

xweşiyê de. Gelek silavên min ji mîrê min re hene. Bi xatirê we.»

Memduh Selîm Beg careke din li Xezalê dinihêre û ji wan vediqete.

## 15

Rê li Memduh Selîm Beg vebû. Ziyaretên wî bûn zêdetir. Bi kêmanî heftê rojekê, du roj ling ber bi mala çerkezan derin. Xewn divê dewam bike, winda nebe.

Sebebên çûyina mala çerkezan pir in; serîlêdan, kitêbekê, xebereke nû, mizgîniyeke xweş, vexwarina çayekê, bîhntengî, şêwirîn, deynkirina tiştekî. Yanê hincetên çûyinê. Hincetên nêzîkî li Xezalê kirin...

Niha jî, Memduh Selîm Beg, dîsan, bi xebereke nû hatiye mala wan. Rejîma nû ya Tirkiyê qanûnên nû anîne pê û rejîma reş û çavsor hîn têkûztir û xurttir bûye.

«Mirim, rejîma nû, gav bi gav, xurttir dibe. Hem li welêt û hem jî li derveyî welêt. Dewletên Ewrûpê jî alîkariyê dikin.»

Têkûzbûna rejîma Tirkiyê mirina hêviyên Memduh Selîm Begê ye, rê li vegera wî girtin e. Ew ne merivê welatê xerîbiyê ye. Ew li welatê xerîbiyê mêvan e, bi tenê mêvan. Ew xwe weke mêvanekî dibîne û li hêviya roja vegerê ye.

Ew dipê. Bêsebr, bê cîh û war. Lê bi hêvî, bi baweriya siûda qenç.

«Memduh Beg, qet xem mexwe, ev rejîm dê hilbiweşe. Ew çi dike, bila bike, xelasbûna wê tune.»

«Xwezî...»

Xwarin, vexwarin, qise û gotin. Karên rojane jî di ser de. Şev? Gelo şevên dirêj û xedar yên welatê xerîbiyê dê çawan derbas bibin?..

Evîn û bihuşta evînê? Ew li kû ne, xwe li kû veşartine? Memduh Selîm Beg dê wan li kû bibîne?

Ew... Ew û diya wê. Ew jî tên û li dor masê rûdinin. Karên wan yên mitbaxê xelas bûne. Wan bîhnvedan divê. Diya wê li kêleka Memduh Selîm Begê, ew jî li kêleka bavê xwe rûdine.Ew û Memduh Selîm Beg, bi çeprastî, li hember hev in. Ew; stêrikeke ronî û li hember Memduh Selîm Begê rûniştî. Roniya çirê li ser rûyê wê diçirûse.

Keçikeke weha... evçend xweş û tendirust.

Piştî ku ew rûdinin, Memduh Selîm Beg û hevalê wî xebardana xwe didomînin. Gava bavê wê dipeyive, ew jî rû û serê xwe yê ronî ber bi aliyê bavê xwe xwar dike. Lê çav li ber wê, li masê dinihêrin. Gava Memduh Selîm Beg dipeyive, eniya wê hinekî ber bi jor dibe û çav li dest û tiliyên Memduh Selîm Beg yên bi pirç dinihêrin. Ew bêdeng rûdine û li gotinan guhdarî dike. Hebûna wê germiyekê dide odê û tiştên odê. Hebûna wê dilê Memduh Selîm Begê germ dike.

Çavên wan zêde bi hev nakevin. Ew li masê, Memduh Selîm Beg jî, zêdetir, li bav û diya wê dinihêre. Lê carina, gava ew gotinên hevalê xwe lê vedigerîne û jê pirsina dike, hingê ew li her siyan dinihêre. Hingê çav li hev dinihêrin, germ û xweş.

Lê belê, digel germî û xweşiyê, nêrîneke çawan? Weke nêrîna keçikeke biçûk û mamê wê? Weke nêrîna xwişka biçûk û birayê mezin? Weke nêrîna du dostên dilsoz? Yan jî nêrîna du evîndaran?

Nêrîneke çawan?

## 16

«Pîroz be Memduh Beg, Xwedê şênahiyê ji mala te kêm neke.»

«Te biryareke pir baş da Memduh Beg, pîroz be. Biryara te di cîh de ye.»

«Spas.»

«Memduh Beg, hûn bijîn, bi xêr û xweşî be... Hevalno, em divê hem sersal û hem jî vê bûyera rind pîroz bikin. Qedehan ji bo Memduh Selîm Beg, ji bo salên çêtir, xweştir û serfiraztir hildin.»

Sersal. Sersala 1927 an. Antaqiye kêf dike. Heval û dostên Memduh Selîm Begê kêf dikin. Memduh Selîm Beg kêf dike. Ew ji halê xwe razî ye, ken ji rû kêm nabe.

Memduh Selîm Beg; por û simbêlên şehkirî, rîhê xweşkurkirî, kincên reş û nû, pêlavên reş û spehî, saeteke piyan ya zîvîn û spas, spas, spas. Spas ji Yezdanê mezin re, ji dinya û jiyana xweşik re, ji heval û dostan re, ji «Bavo», bavê Xezalê re,.. spas.

Belê, Memduh Selîm Beg îşev, şeva sersalê, destgirtî dibe. Qewl tê birîn. Gaveke nû ber bi heyameke nû tê avêtin. Bi kê re? Ma ew dikare bi kê re destgirtî bibe?

Bê guman, bi Xezalê re. Bi gula nûbişkovî Ferîha re.

Daxwaza dilê wî hat dewsê. Di welatê xerîbiyê de, wî ji dilê xwe re stariyekê peyda kir. Bi vî awayî, ew dê derd û keserên welatê xerîbiyê kêmtir bike, derd û kulên xwe derman bike. Ew dê bikaribe, di welatê xerîbiyê de, -jî- serfiraz û kêfxweş bijî.

Hay lo gidiyo hay looo!..

Memduh Selîm Beg û heval, dost û nasên wî li mala bavê Ferîha'yê, li mala xwezûrê xwe yê pêşerojê rûniştine û sersala nû û nîşana Memduh Selîm Begê pîroz dikin. Maseyeke pir dirêj û li dor wê jî merivên rûken. Bi tirkî û kurdî musîka welêt. Çend dengbêj û sazbend. Her texlît xwarin û vexwarin. Bê guman, araq jî.

Tiştê kêm; di nav dengan de dengê kemança Xezalê.

Memduh Selîm Beg û hevalê wî yê çerkez li hember hev rûniştine. Hevalên kevn dê, di demeke kurt de, bibin zava û xwezûr.

Jin ne li nik wan in. Jin jî li maleke din rûniştine. Li gor edetan divê weha be.

Li nik Memduh Selîm Begê hevalekî wî yê kurd rûdine. Hevalên kevn yên Stembolê bi hev re qesta felekê dikin û dipeyivin. Li ser her tiştî. Lê Ferîha û welat navenda xeberdanê ne.

«Memduh Beg, hûn jîr in. Li gor gotinan, destgirtiya we gelek xweşik e...»

«Mîrê min, hûn dizanin, tu pîvanên xweşiyê tune. Ew li gor kesan diguherin. Salixdana xweşiyê jî ne ewçend hêsan e. Piraniya caran ne di cîh de ye jî. Yanê meriv nikare xweşî û spehîtiyê bi qise û peyvan salix bide... Ez çi bibêjim? Ez nizanim tê bîra we, li Stembolê jî, em li ser vê meselê gelek dipeyivîn. Hûn dizanin Homeros ji bo vê meselê mîsala herî baş e. Di derekî de, ew ji bo sê jinan weha dibêje; Nireus xweşik bû, Akhileus hîn xweşiktir bû, Helena xwedanxweşikiyeke nedîtî bû... Mîrê min, hûn dibînin... kin û kurt; xweşik, xweşiktir û xweşikiyeke nedîtî. Destgirtiya min jî carina xweşik e, carina ji her carî xweşiktir e û carina jî xwedanxweşikiyeke nedîtî ye. Kin û kurt, ew rind e, mîrê min...»

Ken. «Noş mîrê min, ji bo serfiraziya me û welêt.»

Welat.

Welatê siûdxirab. Welatê bêkes, xirbe û kavil. Şewitî. Nezan û bindest. Welatê perçekirî, jihevxistî. Hêstir, xwîn, şîn. Sêdar û sehpayên li pey hev rêzkirî. Girtîxane û zîndan.

Welat.

Memduh Beg, me xebat divê. Welat li hêviya me û

xebata me ye. Piraniya bîrewer, ronakbîr û şerwanên ku ji welêt reviyane, niha li Sûriyê û Lubnanê ne. Em divê bicivin ser hev.»

Welat...

«Rast e, mîrê min, rast e. Me şermeke mezin e ku em weha destgirêdayî li malên xwe rûdinin. Me xebat divê.»

Sersala 1927 an. Kêf, henek û ken. Şênahiya sersalê. Dawet û dîlana nîşanê. Xwarin û vexarin... û welat.

«Hevalno! Noş... ji bo selametî û serfiraziya Memduh Selîm Begê.»

«Mîrên min, Noş... ji bo selametî û serfiraziya welêt...»

## 17

Destpêka bihara 1927 an. Dana êvarê. Parq. Memduh Selîm Beg, Ferîha, diya wê û du merivanên wê. Hûnikayiyeke sivik. Hawirdor hêşîn dibe. Tov zîl didin, kulîlk dibişkovin.

Gava Memduh Selîm Beg dixwaze destgirtiya xwe bibîne, keriya pezkoviyan jî pê re ye. Edet weha ye. Ew, Ferîha û keriya pezkoviyan, li gor edetan, li bexçê, di bin siya dareke henarê rûniştine. Jin û xanimok çay vedixwin, ew jî, weke her carî, qehwa tahl.

Kulîlkên rengîn yên dara qehîm dibişkovin. Mase tijî ne. Zarok di navbera masan de dibezin. Şênî bi coşa biharê, ji malên xwe derketine. Çavên Memduh Selîm Begê di navbera kulîlk û zarokan de derin û tên. Çav li nik pîrejinan şerm dikin li çavên xweşik û genimî binihêrin. Jê re hênceteke divê ku lê binihêrin.

Ew radibe pê û ji dara henarê kulîlkeke nûbişkovî jêdike. «Kêfa min pir ji kulîlkên henaran re tê. Ev reng, rengê jînê ne.»

Ew niha li çavên genimî dinihêre. Çav ji kêfxweşiyê dibiriqin.

«Ez jî jê hez dikim. Bavo û Yadê jî. Ma ne welê ye, Yadê?»

Kulîlka rengîn ya Bavo û Yadê...

«Hûn darên henaran yên Wanê bibînin! Rebiyo, ew çi darên xweş in, ew çi kulîlkên spehî ne! Niha der û dorên Wanê bi rengên xweşik, ji nû ve vedijin. U tahma henarên Wanê... Libên mezin û gulover yên henaran di devê merivan de dibin şekir.»

Jin û xanimok serên xwe dihejînin.

«Bi xêr, gava em vegerin welêt, min dil heye ku xaniyekî li kêleka gola Wanê ava bikim. Hingê ez û Ferîha dikarin li wê derê bi cîh bibin. Hûn jî dikarin werin serîdana me. Ma ne wisan e, Ferîha?»

Rebenê. Çav carekê li Menduh Selîm Begê û carekê jî li pezkoviyan dinihêrin. «Eger Xwedê qismet bike...»

«Hingê me bexçeyekî hûr jî divê. Bexçeyekî xweşik. Em dikarin di bexçê de çend darên henaran jî biçinin.»

Wan, Gola Wanê, kêleka avê, xanî, Bexçe, jin, zar û zêç, xweşî, serfirazî, rindî... Memduh Selîm Beg li Antaqiyayê, li parqê rûniştiye û xewn dibîne. Ew, dîsan, xewn dibîne. Xewnên rojê, xewnên rojane. Xewnên ku li ser bextê dijmin, qismeta Xwedê û dilkirina Bavo û Dayê ava bûne.

# DENGÊ DİL Û DENGÊ MÊJÎ

## 1

Destpêka payiza 1927an. Beyrût, bihuşta Rojhelata Navîn. Meydana Bircê. Meydaneke fireh û dirêj. Di meydanê de parkekî gul û kulîlktijî. Memduh Selîm Beg li parqê rûniştiye û li hêviya hevalekî xwe yê kevn e. Eynî weke parqê Antaqiyayê, aveke biçûk di vî parqê re jî dibihure. Ava zelal hêdî hêdî diherike.

Çavên Memduh Selîm Begê li kuçeyên meydanê ne. Li meydanê kuçene fireh dixuyin. Girsa merivan li hev gêr dibin, derin û tên. Evçend meriv! Her celeb, her texlît. Ev meriv çi dikin, çi difikirin, bi çi karî mijûl in? Ew çi dibin bila bibin, lê belê, ma ev hemû ne wekhev in? Ma ew nizanin ka evîn û hezkirin çi ye? Ma ew nizanin ka rebenî, belengazî, xemgînî, dilsojî çi ye? Belê, ew dizanin. Her meriv bi van yekan dizane. Meriv hosteyê hîsan in. Hîs û nefs ji bo merivan in. Hingê?.. Hingê meriv wekhev in. Digel her celeb dijîtî û ferqî, ew wekhev in. Hingê meriv divê li pey biratî û merivahiyê bin. Meriv li kû dibin, bila bibin, çi dikin bila bikin, çi difikirin bila bifikirin, lê eynî tiştî dibihîsin, eynî tiştî hîs dikin û dijîn. Hingê çima ev hilweşandin, jihevûduveqetandin, zulim û xeniqandin?

Hevalê Memduh Selîm Begê dê ji kuçeyekê bixuye. Hevaltiya, dostiya kevn. Ew rojên Stembolê. Xebat, best, daxwazî. Hêviya Kurdistaneke xweser û yekgirtî. Dan û standinên dîplomatîk; îngiliz, fransiz, îtalî, ermen û yewnan. Salên piştî şerê cîhanê. Salên 1916-17-18-19 û 20an... Hevaltiyeke pak, dilovan û dilsoz. Meyxanên Galata û Beyogluyê. Jinên spehî, dîlberên rûm, îtalî, rûsên spî, ermen û fransiz. Zimanên têkel û cûrbecûr. Jiyaneke rengîn û heyecantijî. Robara Salên 1918 û 1919 ku kovara «Jîn» diweşiya. Salên ku Memduh Selîm Beg berpirsiyar û nivîskarê kovarê bû. Civînên kovarê. Babetên ku li ser dihatin peyivîn; ziman, yekitiya kurdan, yekitiya jinan, medeniyet û kurd, klasîkên kurdî, Ehmedê Xanî, şerê cîhanê, perçebûna dewleta Osmanî, biratî û yekitiya urdan, yekitî, yekitî, yekitî... Memduh Selîm Beg û hevalên wî. Ew û hevalê wî.

«Memduh Beg, birayo, tu berpirsiyarê kovarê yî. Hûn divê ji bo alfabeya nû bixebitin. Me û zimanê me herfên latînî divên. Alfabeya erebî û herfên erebî ne li gor zimanê me ye. Sibê roj, dema dewleta me ava bibe, em divê herfên latînî bi kar bînin... Ma ne wilo ye, birayo?»

«Belê, mîrê min, belê...»

Ji 1922an vir ve ye ku Memduh Selîm Beg hevalê xwe nedîtiye. Ew şeva çiksayî hê jî tê bîra Memduh Selîm Beg. Kadikoy, Stembol. Her du bira dê bi hev re biçûna Alemanyayê, Munîxê... 1922 û niha jî 1927. 5 sal in ku wî hevalê xwe nedîtiye. Ew jî, weke Memduh Selîm Beg, tevî bav û birayên xwe, di welatê xerîbiyê de, şerpeze û aware bûn. Siûd li wî jî qulipî. Bavê wî par li Misirê çû rehmetê. «Rehma Xwedê lê be.» Birayê wî Safter li Alamanyayê li ber mirinê ye. «Heyf, hezar

heyf.» Bapîrê wî, mîrê mîrîtiya kevn ya Cizre-Botanê Mîr Bedirxan li welatê xerîbiyê, li Şamê wefat kir. Ew û birayên wî Sureya û Kamuran niha li Beyrûtê ne. «Ez hêvî dikim ku siûda wan nabe weke siûda bav û kalikê wî...»

Xelk, weke ava ber Memduh Selîm Begê, li meydanê diherikin. Gava Memduh Selîm Beg dil dike ku li saeta xwe binihêre, di devê koşeyekê de, hevalê wî dixuye. Ew Memduh Selîm Beg nabîne, li dora xwe dinihêre. Eynî weke xwe, rûyê esmer, eniya fireh, çavên reş, bejna dirêj, asalet û dilovaniya li ser rû. Eynî weke berê.

«Mîrê min, Celadet Beg, mîrê min!..»

«Memduh Beg, birayo, hevalo!..»

Hevûdudîtina wan dibe weke hevûdudîtina axa zuha û baranê. Dest û rû radigihên hevûdu, ew hevûdu hembêz dikin, radimûsin. «Birayo Memduh Beg», «mîrê min», «hevalo Memduh Beg», «mîrê min.»

«Memduh Beg, welê dixuye welatê xerîbiyê li te hatiye, tu baş dixuyî.»

«Ji kû mîrê min, ji kû... ma te li tu derî dîtiye ku welatê xerîbiyê li merivan hatiye?»

2

Eynî şev. Meyxaneke Beyrûtê. Dengê musîkê. Reqasên spehî. Dil û mêjî germ dibin. Qedehên araqê bi hesreta çend salan radibin. 5 sal û berhemên wan; derd, kul, qahr û keser. «Birayê Memduh Beg, ma te hay lê hebû ku em dê, rojekê, di deverên xerîb de, weha neçar û bêgav bimana?»

Memduh Selîm Beg li hevalê xwe dinihêre û dikene. Wî mînet e ku ew xwediyê hevalekî weha ye. Meriv di-

kare bi hevalên weha re her tiştî bike, pê re here her derî, jê re her tiştî bibêje. «Mîrê min, Celadet Beg, dilê min bi firê ketiye.»

«Gidiyo birayo! Min hay ji bûyerên dawîn nîne, hele bibêje ka çi bi te qewimiye?»

«Mîrê min, ez çi bibêjim? Wisan dixuye ku ez bi taya evînê ketime.»

«Birayo tu çi dibêjî! Kî ye, çi kes e, li kû ye?»

Ken, kêfxweşî, pirs, bersîv, salixdan, henek û xeberdaneke dirêj, nerm û germ.

«Xweziya min bi te, birayo. Xwezî dilê min jî weha bi firê biketa.»

Di bin siya araqa spî de xeberdan hîn dirêjtir dibe; hal û hewal, heval, bira, dost. Bav û bapîr. Welat û nîştiman. Ewrûpa, Alamanya, bûyerên wê derê. Babilîska lez û bezê. Bişûndamayina xelkê kurd û welatê Kurdistanê. Baş e, çi divê?

Çi divê?

«Mîrê min, ka te simbêl û rî çi kirin?»

«Min ew kur kirin. Lê ew dê dîsan serî hildin. Ji nû ve... bi awakî hîn xweştir û geştir. Birayo, em dê dest bi xebatê bikin. Xebateke xurt, nûjen û bi rêk û pêk. Her tişt divê nû be, her tişt divê modern be. Her tişt birayo, her tişt. Herweha simbêl û rîh jî. Me wekî din çare tune...»

## 3

Dotira rojê. Memduh Selîm Beg, Celadet Alî Bedirxan û gelek kesên din, li Beyrûtê, li hev civiyane. Hinek ji welêt, hinek ji Ewrûpayê, hinek ji Iraq û Misirê û Memduh Selîm Beg jî ji Antaqiyayê hatine. Pêşewayên kurdan. Merivên şerpeze, peregende, dilbirîn û keserkûr. Lê pêtên best, daxwazî û hêviyê li dor wan diçirû-

sin.

«Xebat divê.»

«Serîhildan divê.»

«Yekitiya kurdan divê.»

Divê, divê, divê... her tiştê pêwist, her tiştê xweş, her tiştê ku kêm e, divê.

«Dewleta Tirkiyê welatê me hildiweşîne, dike kavil, xirbe û çol. Wan zimanê me jî qedexe kiriye. Wan bi hezaran meriv kuştin... weha nabe.»

«Xelk û welat li hêviya me, li hêviya ronakbîr û pêşewayên xwe ne.»

«Em nikarin gelê xwe bi tenê bihêlin.»

«Me xebateke bi rêk û pêk û yekgirtî divê.»

«Berî her tiştî jî em divê bersîva vê pirsiyarê bidin; çima xebat?»

Sebebên xebatê; bûyerên welêt, siyaseta dewleta Tirkiyê, perçebûna welêt, serîhildana 1925 an, şikestin, qetlîam, bêdengî, mij û dûmana ku ji welêt radibe, malên hilweşiyayî, jinên bpekes û xemgir, zarokên tahzî û stûxwar, zarokên ku digirîn, zarokên sêwî, zarokên...

Yanê dastana dîlketinê. Trajediya welatekî jihevketî.

4

Civîn didomin. Iroj jî roja biryaran e. Ew yanê Memduh Selîm Beg dipirse; «baş e, mîrên min, em dest bi xebatê bikin... Em dikarin ji hal û hewalê welêt dest pê bikin. Hal û hewalê me li welêt çi ye? Xelk bi me re ye? Çend hêzên çekdar hene, ew li kû ne, em dê xwe çawan bigihînin wan?»

Xeberdaneke dirêj, geş û bi saetan. Lihev û jihevpirsîn. Lêhûrbûn. Li ser kaxizan nivisîn.

«Baş e, rewşa Ewrûpayê çi ye? Halê kurdan li wê derê çi ye? Kî dikarin bi me re bixebitin? Kîjan dewlet dikarin alîkarî û piştgirtî li me bikin?»

Dîsan xeberdaneke dirêj, bi saetan. Pirs û gotinên piralî û li ser kaxizan nivisîn.

«Li Kurdistana Iraq û Iranê rewş çi ye? Bê guman, me li wan deran jî xebat divê. Em dikarin bi kîjan hêzan re bixebitin? Kî dikarin li wan deran bibin niwênerên me? Kîjan heval dikarin herin wan deran?»

Dîsan xeberdaneke dirêj, bi saetan. Pirs û gotin. Lêhûrbûn û li ser kaxizan nivisîn.

«Em divê rêkxistineke nûjen û bi rêk û pêk ava bikin. Me dan û standinên fireh divên. Me îmkanên mezin divên. Dan û standin bi cîranên me re, yanê bi ermen û ereb, fars û tirkên li dijî dewletê re jî pêwist in. Em van dan û standinan bi çi awayî ava bikin?»

Dîsan xeberdaneke dirêj û boş. Lihevpirsîn. Lêhûrbûn. Nivisîn. Kêfxweşî û heyecana dest bi xebatê kirinê. Xwîdana xebateke 14-15 saetan, dilopên hêviyê û pîrozbahiyê.

«Ji îro pê ve, di jîna gelê me de heyameke nû dest pê dike. Bila yekitiya me, partiya me ji gelê me re, ji welatê me re pîroz be!»

Bijî, spas, bi hêviya biserketin û serfiraziyê.

«Bila navê partiya me XOYBUN be. Yanê heyin, yanê hebûn. Yanê hebûna gelê me, hebûna welatê me, hebûna jîna gelê me, hebûna hêviyê...»

Memduh Selîm Beg di nav koma merivên rûken de xwe bextiyar hîs dike. Gava yekemîn hat avêtin. Xwedê ji yên din re kerîm e. Ew ji kêfxweşiyê, ji awayê wê derê kelgirî ye. Hevalên wî jî. Ew hevûdu hembêz dikin, daxwaziya serfiraziyê li hev dikin.

Ew dikenin. Keneke ji dil, keneke bêhempa.

«Bila Memduh Beg û Celadet Beg, bi hev re, bi fransizî, îngilizî, elmanî, tirkî, erebî û kurdî danezaneke resmî binivîsînin da ku em ji dinyê re nîşan bidin ku kurd namirin.»

Belê, kurdên nemir û Memduh Selîm Beg...

«Her bijî...»

5

Li otêlekî Beyrûdê. Odeyeke fireh û xweşraxistî. Du nivîn, çend kursiyên spehî, maseyeke fireh û textîn, li erdê xalîçeyeke stûr û rengîn, li ser dîwaran çend neynik, lewhe û tablo. Li ser masê, li ser nivînan û li erdê kitêb, kovar û rojnameyên têkel. Li ser masê xwelîdankeke tijî û cixare.

Bi odê ve balkoneke fireh. Li pêşiya otêle derya bêdawî. Derya û aso bi rengekî şîn dibiriqin. Roj hê hilnehatiye. Berbang. Li dûr, li ser deryayê çend keştî weke niqtikên hûr û reş dixuyin. Li rexên avê jî pêlên spî yên deryayê. Di balkonê de jî maseyeke dirêj û di her du kêlekên wê de du kursî û li ser kursiyan jî du ronakbîrên dilsoz; Memduh Selîm Beg û Celadet Alî Bedirxan Begê Botî. Li ser masê qedehên araqê, fîncanên qahwê, tomarên kaxizan, xwelîdankên tijî û kitêb, kovar, rojname.

Xew hê neketiye çavên wan. Ji êvar de ye ku ew rûniştine û li ser belavokan dixebitin. Belavok ji bo dinyê û Ewrûpayê, belavok ji bo Rojhelata Navînê, belavok ji bo dewletên tacîrker û nemaze Tirkiyê, belavok, ji bo gelên cîran û belavok ji bo gelê kurd.

«Kurdên ezîz, ji bîr mekin ku hûn jî ferdên milettê kurd in û berpirsiyariyên we yên tarîxî hene. Eger em, hûn berpirsiyariyên xwe bi cîh neyinin, hingê em, hûn dibin kesên xirab û gunehkar. Çar hezar sal in ku mille-

tê kurd li ser erdê xwe, li welatê xwe dijî. Lê îro, di vê gava tarî û reş ya tarîxê de erdê milletê me, welatê wî hatiye perçekirin, wêrankirin. Welatê me îro di nav şînê de ye. U hukumeta Tirk ya xaîn êrîşên xwe yên hov roj bo roj zêdetir dike. Wan dil heye ku welatê kurdan bikin tirk...

Di vê rewşa ha de we çi divê? Xwe ragirin, kirasê laqaytî û bêdengîyê ji xwe bikin, çekên xwe hildin...»

Memduh Selîm Beg, penûs di dest de, li belavokan dinihêre û dikene. Carina ew li ser peyvine radiweste, wan xêz dike û li kêlekê peyvine nû, çêtir dinivîse. Penûsa yadîgar di nav pêçiyên wî de weke bûkekê dixuye. Pêçiyên dirêj, qelaw û bi pirç penûsê dilivînin. Penûs, bi awakî pir sivik, dilive û li ser kaxizên spî tîp, peyv û hevokan tîne pê. Penûs ewçend bi hêsanî û rehetî fikrên Memduh Selîm Begê li ser kaxizan direşîne ku meriv bawer dike, tilî û pêçî ji bo pêgirtina penûsan hatine afirandin. Bi tenê ji bo pêgirtina penûsan...

Memduh Selîm Beg, yek bi yek, li belavokan dinihêre, tiştine li kêlekê dinivîse û wan, yek bi yek, dide Celadet Bedirxan Begê... û dikene.

«Mîrê min, belavokên me baş lêhatiyî ne.»

Hevalê wî jî serê xwe dihejîne û dikene.

Belê, li balkona oteleke Beyrûdê, li ser derya zelal, bedenên westiyayî. Çavên sorbûyî, binçavên werimî. Porên tevlihev, rîhên nekurkirî. Lê digel vê yekê, tevî herçendî ken. Ken û heyecana xwe bikêrhatî hîskirinê. Ken û heyecana gaveke nû, xebata welêt û gel. Ken û heyecana ruhên geş û mesûd.

Ax! Ev ken û heyecan her bidomiya, her bêdawîn bûya! Ew perde bi perde firehtir bûya, dil û ruhê her kesî dîl bigirta û guherînên xweş bianiya pê!

«Mîrê min, em pir westiyan. Ma em bedenên xwe

yên westiyayî, hinekî, bernedin nav xewên şêrîn?»

«Belê birayo, em berdinê. Lê pêşî em cixareyeke din jî bikişînin.»

Tiliyên zerbûyî radihên cixaran. Çend nefesên kûr. Dûman. Dinya germ û ava zelal. Dengê pêlên deryayê. Dengê erebe û faytonên Beyrûdê. Dengê bajarê nûhişyarbûyî. Hevalên kevn, hogirên gava nû, cixare di destan de, bêdeng, li dûr, li deryayê dinihêrin. Di serên wan de bi sedan fikir, guman û pirsiyar. Di dilên wan de hêvî. Hem yekîtî û hem jî dijîtiya dil. Fikir, pirsiyar û hêviyên şexsî, neteweyî û merivahiyê.

Cixare û dûman.

«Mîrê min, min dil heye ku em hinekî bêtir li ser belavoka ji bo dinyê û Ewrûpê bixebitin. Ew wê çêtir bikin.»

«Rast e, birayo. Ez jî pê ne qaîl im. Cimleyên me dirêj û tevlihev in, ew baş li hevûdu nehatine girêdan û baş fahm nabin. Peyvên ku me nivisîne, ne bi dilê min in. Ew baş nehatine helbijartin û hinekî jî hişk û tûj in.»

«Belê, min jî ev tirs heye. Ne hewce ye ku em qiseyên tûj, qelaw û sert yên siyasî helbijêrin. Em siyasetê ji ewrûpayiyan hîn bûn. Ji ressamekî yekta re behsa lihevhatina rengan kirin abes e. Çêtir e, meriv behsa germiya rengan bike, behsa ew rengên taybetî yên welêt bike. Mîrê min, em divê bang li wîjdanê wan bikin. Herçend derd û belayên ku tên serê me, ji rûyên wan bin jî, me li wîjdanê wan xîtapkirin divê...»

Wîjdan... Memduh Selîm Beg behsa wîjdanê dike, lê ew bi xwe jî bi qisê xwe ne bawer e.

Wîjdan; peyveke germik û nermik. Peyveke zêrîn, qedirgiran. Peyveke ku her kes, bê qeyd û şert her kes, rêz û rêdarî lê dike. Lê ew li kû ye? Li cîhanekê ku

dengê tanq, top, pere û neftê hawirdor vegire, cîhan bibe seyrangeha musîbetan, jiyan ji bo merivan bibe kemîneke xedar û malkambax, hingê dengê wîjdanê li kû dimîne? Li cîhanekê ku durûtî, sextekarî, tawan û tawanbarî bibin tiştine hêja û giranbuha û li milê din jî biratî, alîkarî û merivahî di goristanên kavil û bêdeng de şîna reş girêbidin, hingê meriv dikare li kû wîjdana sihêrîn peyda bike?..

Wîjdan; kurte-çîrokeke xweşik, lê di nav rûpelên zer yên kitêbeke kevnar de jibîrbûyî. Wîjdan; sonateke nermik û melûl, lê li ser piyanoyeke bi torên pîrhevokan rapêçayî û sonata musîknasekî kal, tenê û jibîrbûyî. Wîjdan; bîranîneke nezelal ji rojên rabirdû, mûyekî şikestî ji firça wênekêşekî dîn...

«Birayo Memduh Beg, min qebûl e, em bang li wîjdanê ewrûpayiyan bikin, lê tu divê hay lê hebî, îro kes ne li pey wîjdanê ye. Cîh li merivan teng bûye, wext kin û kurttir bûye. Her kes li pey menfeeta xwe ye. Roj roja hevûduxwarin û çavderxistinê ye. Masiyê stûr yê hûr dixwe û ev yeka jî weke qaîdeyekî normal tê zanîn. Tu dizanî, berî niha bi demekê ez li Elamanyayê bûm. Te dê ew der bidîta! Te dê bidîta elaman bi çi awayî hevûdu dixwin. Elamanya pir bi lez ber bi cîhine tarî gêr dibe. Ew di şerê masiyan de, ji xwe re, li cîhekî digere. Belê, şerê cîhanê xelas bû, lê şerê masiyan her berdewam e û ew hîn xurttir dibe. Birayo, me ev yeka hanê divê; em nebin masiyê biçûk. Nebin nêçîr.»

Hey gidî dinyayê hey! Hey gidî dinya nêçîr û nêçîrvanan hey!

Hey gidî dinya masiyên stûr hey!

## 6

Belavok hatin nivisîn, lê ji Partiyê re hîn gelek karên

esasî divên. Berî her tiştî bername û destûrek, dan û standinên siyasî û xebatên rêkxistinî divên. Heta ev tişt hinekî xwerû nebin, dev ji Beyrûdê berdan nabe. Dil û mêjiyê Memduh Selîm Begê her roj, her saet bi firê dikevin, ber bi jor, ber bi tixûb dibin, derin maleke çerkezî û li wê derê, li ser milên keçikeke pordirêj vedinişin.

Dil û mêjî bûne weke kevokên evînê; ew dixwînin, difirin, hal û hewal dipirsin, radimûsin, hez dikin. Dil û mêjî, kevokên evînê, cîh û wext nenasin. Gava best li wan radibe, hesret nefes li wan diçikîne, ew dest bi xwendinê, dest bi firê dikin.

Niha jî dîsan, wisan e. Kevokên evînê dixwînin û ew bi firê ketine. Memduh Selîm Beg û hevalên wî rûniştine û li ser bûyerên dawîn û hêzên li welêt dipeyivin. Ew dê, li gor biryarên civînê, meriv bişînin welêt.

Zimanê kevokên evînê û ew zimanê ku ew pê dipeyivin, ne wekhev in. Ew ji hevûdu pir bi dûr in. Yek li ser dengên beden û ruh, yê din li ser prensîb û qaîdeyên siyasî û eskerî ava bûne.

Yekitiya zimanan divê. Lê çawan?

Piştî têkçûna serîhildana 1925 an, hêzên çekdar yên kurd ji hev ketin, belav bûn. Ew niha, bela wela, bê serî û serokatî li dijî dewleta tirk şer dikin. Ew li her aliyê welêt hene. Eger ew bicivin ser hev, hêzeke mezin dê were pê. «Di bin serokatiya Partiyê de yekitiya van hêzan divê.» Ji bo hêzbûyin, ji bo şoreşeke fireh, gelêrî û nûjen ev pêwist e. Ev yekitî gava yekemîn e. Lê çawan?

«Memduh Beg, çawan?»

«Mîrên min, yekitiya zimanan... li min biborin... yekitiya hêzan bi du awayî dikare ava bibe...»

Rûyê Memduh Selîm Begê sor dibe, ew li ber xwe

dikeve, şerm dike. Kevokên neb'xêr divê, di rojên weha de, bihewin, ber bi cîhine nelivin û wî eciz nekin.

«Me esker, zabît û kumandar divên. Eger em dixwazin, bi rastî, li dijî dewletê şer bikin, hingê kesên ku hoste ne, şareza ne û bi hewalê şer dizanin, divê serokatî bikin. Ez nikarim vî karî bikim. Axa û serokeşîr jî nikarin bi vî karî rabin...»

Rûyên esmer û cîddî. Ken û henek çûne welatê efsane û çîrokan. Ji yekî, Celadet Alî Bedirxan pê ve, hemû bi simbêl. Simbêlên cihê, lê qedereke wekhev. Eniyên fireh û qermûçektijî. Li pey wan mirin û sêdar, li pêş wan mij û dûman. Ba û bahoza babilîska 20 an. Ba û bahoza jiyaneke zincîrkirî. Ba û bahoza navsaliyê. Ba û bahoza xwedanmesûliyetiyê. Derd û kulên welatê xerîbiyê. Yanê babilîska lez û bezê û ev desteke meriv.

Merivên bargiran.

Hevalên Memduh Selîm Begê hay li rewşê heye. Ew dizanin ku berpirsiyariya qedera milletekî binpê ketiye ser milê wan. Pir kes ji hevalên wan hatin kuştin. Ew jî di bin siya şûrê Ruhistîn re bihurîn.

Belê, şûrê Ruhistîn. Şûrê Ruhistîn li ser milê wan û milletê wan hilawistiye.

Ew şûrê Ruhistîn e ku rê li pêşveçûna tarîxa wan girtiye. Ew şûrê Ruhistîn e ku tarîxeke nû, tarîxeke derewîn aniye pê û li ser wan ferz kiriye.

«Rê divê lê were girtin. Ev gava me, ev gava ku em niha davêjin, divê tarîtiya ku dijmin li tarîxa me vegirtiye, biqelişîne û ronahî bireşîne ser tarîxê.»

Ji bo «reşandina tarîxê» jî piralîbûn. Ji her îmkanî, ji her fersendî destkewtîbûn. Di her warî de, li ser her babetî xebatkirin. Belê, şer bi qaîdeyên şer tê qezenckirin. Her çekê ku dikare tesîr li şer bike, divê bi kar were.

## 7

Beyrûd. Navenda çand û zimanên têkel. Pira navbera rojhelat û rojavayê. Gelên têkel. Ol û baweriyên têkel. Yanê dewlemendiya dil. Bêsînorbûna daristana rengîn ya fantaziyê. Comerdî û nefsbiçûkiya meriv. Keskesoreke rengîn di Rojhelata Navîn de, -di şergehê lîstik, plan, dek û dolaban de. Eger Memduh Selîm Beg li Beyrûdê bi dengê dil bihesiya, yanê hesretê lê bîhn neçikanda, ew dê li vê derê cîwar bibûya. Lê, ew niha mîvan e. Ew bi armanc û daxwazine giranbuha hatiye vê derê.

Rojên Beyrûdê jî, wekî Beyrûdê, ji bo Memduh Selîm Begê rengîn in; kar û xebat, erkên ji her tiştî girîngtir, ji her tiştî muqedestir. Şevên bêxew, carina ji bo xebatê, carina ji bo qesta felekê. Dengê kemançe û keçên xama yên yewnanî. Dîtina heval û dostan. Name ji bo derina. Dîtina karbidestên Lubnanê, fransizan.

«Monsieur Memduh Selîm, vous ne voulez pas un peu de pernod?»

«Oui, merciez Monsieur... Ez ji bo serîlêdana heval û dostan û kêfê hatime Beyrûdê. Ne ji bo tiştekî din. Hûn dizanin, hemû rêgehên Rojhelata Navîn ji Beyrûdê derbas dibin. Dil li vê derê geş dibin.»

Ew li nik karbidestan e. Karbidest dixwazin bizanibin çima ew li Beyrûdê ye.

Lê di dilê geş de hesret. Hesret nefes lê diçikîne. Hesret kevokên evînê bi firê dixîne.

Xezalê.

Rûyê xweşik û bi ken. Rengê germ û zêrîn yê por. Porê dirêj. Yekitiya por û tîrêjên tavê. Çirûsk û şewq. Çavên masûm û kentijî. «Eger tu rastî min nehatibûyayî, min dê çawan xwe li hember evçend mûsîbet û belayan rabigirta?..

Li ser dilekî navsal û şewitî çirûskên evînê.

Bi dilekî geş û bi seriyekî germ û xweş, di şevên ronî yên Beyrûdê de rêveçûn. Bihust bi bihust Beyrûdê, sir û esrarên wê keşfkirin. Bi heval û dostan re qesta felekê kirin. Bê guman; araq, cacix, meze û dengên xweş. Bê guman; dengê kemançê.

Traaay laaa laaaay trayyyy...

8

Di şeveke ronî ya Beyrûdê de gazînoyeke mezin. Şev bûye nîvê şevê. Reqaseyên ereb bedenên xwe yên zarîf ba didin. Ji reqaseyan bi dûr, maseyeke fireh û li dor masê Memduh Selîm Beg, Celadet Bedirxan Beg û çend hevalên din. Serê masê tijî ye. Hejmara şûşeyên vala pir bûye. Şevên weha ji bo wan bûye stariyekê. Gava ew diwestin, nefes li wan tê birîn, barê zimanê eskerî pir giran dibe, ew xwe dispêrin şevên weha da ku nefeseke kûr bigirin.

Celader Bedirxan Beg li ser Alemanyayê dipeyive; welatê endustriyê, welatê pole, karxane û fabrîkên bêhejmar, musîka klasîk, opera, merivên xwedandîsîplîn, jinên wekî hespan, aloziya aborî, «dolarekî amerîkî, belê, bi tenê dolarekî bi sedhezaran marq e...» û şerê Sosyal Demokrat, Komunîst û Nasyonal Sosyalîstan. «Min tirs heye ku welatê Geothe û Beethovenê bin av be.»

Maseyên doralî tijî ne. Ereb, bi kirasên xwe yên spî û dirêj. Fransiz, bi kincên xwe yên eskerî. Jinên fransewî yên zirav û narîn.

U di nav maseyan de jinepîrekê. Jinepîrekê bi elbikeke gultijî. Jinepîreke gulfiroş. Hevalekî Memduh Selîm Begê, ji masê, bang li jinikê dike. Jinik, bi kêfxweşî, tê û elbika xwe datîne ser masê da ku ew gul helbi-

jêrin. Hevalê ku bang li jinikê kiribû, guleke stûr û nûbişkovî heldibijêre û bi ken wê dide Memduh Selîm Begê.

Heval hemû dikenin. Memduh Selîm Beg jî dikene. «Mîrê min, gelek spas, lê çima, bi çi hêncetê?»

«Memduh Beg, ji dilê ku bi firê ketiye re, gul divê. Ew dilê bextiyar her li pey gulan e.»

Ken. Careke din pîrozbahî. Dîsan kevok. Dîsan firîna kevokên neb'xêr. Xezalê. Heval û dost. Guloka kêfxweşiyê di gewrî de. Gewrî û zimanê zuha. Qedeh. «Noş ji bo serfiraziya me û welatê me.» Kefçikeye cacix. Qedeh. «Noş ji bo Memduh Begê.»

«Memduh Beg, te qet behsa destgirtiya xwe nekir...»

«Ez çi bibêjim, mîrên min? Gava we wê dît, jixwe hûn dê bi xwe bibêjin ka ew însanekî çawan e.»

Memduh Selîm Beg ji bikaranîna qiseyên zêde û xweşik hez nake. Ew wan û bi wan difikire, lê wan di xeberdanên xwe de bi kar nayine. Niha, dîsan xortiya wî û ew kitêba şiîran tê bîrê. Hingê wî kitêbeke biçûk ya şiîran xwendibû. «Navê wê kitêbê çi bû?..» Di kitêbê de salixdan û pesndana keçikeke weke melayikan hebû; ji serî heta dawî qise û gotinên xweş, cimleyên zêrhêlî, peyvên neqişandî. Lê vala û bêruh. Lê bêdeng û pejn. Yanê qise û gotinên zêde ku xweşî û spehîtiyê têk dide.

«Ew jina herî xweşik bû... ew bexçê zerafetê bû...Latîf, narîn, hurme, bedew...» û qise û gotinên weha.

Wî di jiyana xwe de qiseyên evçend xweş, lê di eynî wext de salixdanên evçend tewş nedîtibû. Hinekî mabû ku wî ji xweşiyên jiyanê rû bada. Ji wê rojê û vir ve ye ku ew di salixdana xweşiyan de bi dîqet e. Ew kêm dipeyive, lê ne zêde.

«Mîrên min, rojekê ber bi min werin, hingê hûn dê

destgirtiya min jî bibînin. Ew xweşik e, mîrên min, xweşik. Ez, bi tenê, evçend dibêjim; xweşik. Her tişt di tahma xwe de xweş e. Meriv divê tahmê lê heram neke.»

## 9

Teq, teq, teq.

Dengê derî. Dengê deriyê oda otêlê ya Memduh û Celadet Began. Dana êvarê. Ro li ser deryayê, di niqta yekbûna aso û avê de bûye weke agireke gulover. Ro, bêdeng, diçe ava. Beyrûd di nav haziriya şevê de ye. Dostên dilsoz, bi hev re, li balkonê rûniştine û li ser raporekê dixebitin. Raporeke li ser rewşa kurdan û neheqiyên ku li wan dibin. Ji bo Koma Milletan.

Ew li hevûdu dinihêrin. «Gelo kî ye?»

«Kî ye?»

Wan bihîstiye ku dewleta Tirkiyê mêrkuj û sêxur xistine pey wan. Ew dîsan li hev dinihêrin. Ew ji balkona odê, bi hêdîka, tên nava odê. Dest derin bin bahlîfan. Debançeyên reş û stûr. Gule di dêv de ne. Ew bi hev re, ber bi derî derin. Giran , giran. Tilî li ser tetikan in.

Teq, teq, teq...

«Birano! Em in, em in...»

Dengên nas. Keneke li ser rûyê Memduh û Celadet began.

«Fermo, werin hundir.»

Rûyên nas. Hevalên hebûn û nebûnê. Hevalên rojên qeda û belayê. Di destên wan de pakêtine mezin. Germiyeke boş. Rehetiyeke ji dil. «De fermo, kursî bikişînin û werin em li balkonê rûnin. Hûn rûnin, ez herim ji me re qahwe bibêjim.» Memduh Selîm Beg dibezîne jêr, îdarexana otêlê.

Gava ew vedigere odê, heval hê jî li odê, li pê ne. Ew

li Memduh Selîm Begê dinihêrin û dikenin. Çi bûye çi qewimiye? Hewayê odê nîşan dide ku tiştekî heye. Lê çi? Niha Celadet Bedirxan Beg jî dibişire.

«Qey we dil heye ku ez ji meraqan dîn bibim! De bibêjin ka mesele çi ye!»

Pakêt. Pakêtên li ser masê. «Fermo Memduh Beg, wan veke.» Pakêta herî mezin. Li ser navine fransizî. Paris. Ew ji Fransayê hatiye. Vekirina pakêtê. Tê de kinc. Reş û xêzkirî. Çakêt, pantolon û êleg. «Pakêta din jî veke.» Li ser vê pakêtê jî eynî nav. Du gomlegên spî û çar qirawatên hewreşîmî. Ew dibiriqin. Memduh Selîm Beg dê niha çi bibêje? Tu tişt. Bi tenê ew li hevalên xwe dinihêre. Bêdeng. «Memduh Beg, pakêta dawîn jî veke.» Pakêteke hûrtir. Li serê eynî navên fransizî. Tê de coteke pêlav. Coteke pêlavên çermîn û reş. Pêlav dibiriqin.

«Hevalno, ax hevalno...»

Memduh Selîm Beg şa ye. Ew wekî zarokekî şa û mesûd e. Rû û hinarikên wî sor bûne. Ew xwe radigihîne hevalan û wan yek bi yek hembêz dike. «Hûn çi hevalên qedirgiran in!..» Ew vî tiştî nabêje, lê lê difikire.

Ew dikenin.

Lê hê du pakêtên din jî hene. Ew jî li ser cîhê Memduh Selîm Begê hatine danîn. «Ew jî ji bo xwişka me ne.»

Xwişka me... yanê destgirtiya Memduh Selîm Begê. Yanê Ferîha.

Xezalê.

«Hevalno!»

## 10

Oda otêlê. Destê sibê. Xewa şêrîn. Di xewa şêrîn de

xewnên neşêrîn. Pêlên derya xewnan bi ser Memduh Selîm Begê re tên. Reng, tişt û bûyerên têkel. Xewn.

Du kevok. Du kevokên spî wekî berfê. Kevok ji derekî dûr, ji pencereyeke nenas bi firê dikevin. Şev e, heyveron e. Stêrk bi hev re dipeyivin û dilîzin. Kevok berz, pir berz difirin. Stêrk dest li wan dikin. Ew gelî û newal, der û dever, çol û çiyan li pey xwe dihêlin. Wisan dixuye ku kevok dizanin, ew ber bi kû de derin. Ew ewçend dûr û dirêj difirin ku hawirdor reng diguherîne. Stêrk û heyv ji wan xatir dixwazin û diçin ava. Ji aliyê rojhelat, li pey çiyayên asê tîrêjên rojê silav li wan dikin. Ro hêdî hêdî li wan hiltê.

Ew difirin. Perwazên wan hêdî hêdî radibin û dadikevin. Ew xwe naêşînin, nermik nermik, di nav asmana bêdawî de sînga ewran diqelişînin û difirin.

Ew niha gihîştine rêzeke çiyayên asê. Di bin wan de zinar û kortal dixuyin. Serê çiyan di nava mij û dûmanê de ye. U berf. Niha jî çiyayên nas. Cîh û warê bav û kalan. Kevok niha di deverên nas de ne. Ew nizmahî li çiyan dikin, nizm, pir nizm difirin. Lê çiya jî hêdî hêdî li pey wan dimînin. Golekê. Yan jî deryakê. Piştî çiyan goleke stûr dixuye. Gol pir mezin e.

Belê, gola nas, Gola Wanê ye.

Tîrêjên rojê li ser avê dibiriqin û rengeke zêrîn tînin pê. Di nava Golê de giraveke hûr. Kew ber bi giravê difirin. Çend xaniyên kevnar û xirbe. Giraveke kavil. Kew tên û li ser xaniyekî hilweşiyayî vedinişin. Cîhên nas. Ew avahiyên spehî niha bûne xirbe. Girava şêrîn niha bûye çoleke bêdeng.

Kevok li hevûdu dinihêrin, bi nikulên xwe yên biçûk stû û perwazên xwe şeh dikin û dîsan bi firê dikevin. Ber bi aliyê rojhelat yê Golê. Ber bi hêlîna rojê. Roj niha li ber wan e û ew her ku dere stûrtir, germtir dibe.

Rojeke nû. Roja germ, ava zelal, ewrên spî. Her tişt, her tişt di nav xweşiyeke bedew de ye.

Qeraxa avê û daristana li rex avê dixuyin. Daristaneke hêşîn û bêser û ber. Kevok ber bi daristanê dadikevin. Ew niha ewçend ji nizm difirin ku carina perwazên wan bi pêl û şaxên daran dikevin. Ew bi qasî bîskekê li ser daristanê difirin. Bi dû re tiştekî nû dixuye; di nav daran de xaniyekî hûr û xweşik. Kevok ber bi xênî dibin. Niha fahm dibe; kevok li pey vî xaniyê bûn. Xaniyekî du qat û spî. Bexçeyeke gul û kulîlktijî li ber.

Di bexçê de jinekê. Jineke bedew û pordirêj. Rûyekî nas. Çav? Belê, çavên nas. Çavên bi rengê genim. Çav bi kevokan dikevin. Kêfxweşî. Dest hildibin. Kevok şa û serfiraz, li hev dinihêrin. Belê, ev der bû ku ew dê bihatinayê. Belê, ev jin bû ku wan dê silav lê bikirina û li ser milên wê venîştina... Ew gihîştin cîhê xwe. Bi tenê du perwaz mane ku ew venişin ser milên jinikê.

Lê!..

Agir, şewat.

Ji nişka ve agir bi daristanê dikeve. Agireke gur û boş. Kevok vediciniqin. Ew, bê hemdê xwe, ber bi jor dibin. Daristan dişewite. Jinik? Xanî? Agir hemû daristanê radipêçîne. Zû, pir zû. Pêtên êgir digihên xênî jî. Agir bi xênî dikeve. Jinik, tirs li ser rû û veciniqî, li dora xwe dinihêre. Ew nizane çi bike. Çi divê? Agir dor lê digire. Çavên tirstijî li kevokan digerin. Ew dest li kevokan dike. Hawar, hawarrrr...

Kevokên reben çi bikin? Ew dikarin çi bikin? Ew hewl didin ku perda êgir biqelişînin û xwe bigihînin wê. Lê nabe. Mixabin. Ax. Careke din. Careke din. Na, nabe. Kevok bêgav dimînin û xwe bi şun de vedikişînin. Gulokên êgir stûrtir û berztir dibin. Jinik direve vî derî, wî derî. Lê nabe. Egir dor lê girtiye. Ax... Kevok

difirin vî derî, wî derî da ku riyeke felatê bibînin lê agir rê nade wan.

Di nav vê cehenema sor de tiştekî din jî diqewime; ji her aliyê asmên teyr dixuyin. Teyrên goştxwar, yanê dijminên kevokan. Teyrên reş, hulîlik, baz, sipîr, doxan. Teyr, ref bi ref, bi ser kevokan re tên. Agir, teyr, jinik, bêgavî, tirs, mirin, germiya dijûnê. Na, na, na. Lê teyr tên. Ew qîje qîj dikin û tên.

«Na, na, na!..»

Xewnên neşêrîn bi ser Memduh Selîm Begê re tên. Ew vedicinique. Celadet Bedirxan Beg jî bi dengê wî vedicinique. Kirasê şevê yê Memduh Selîm Begê şil e. Ew di nav xwîdanê de maye. Ew diheze.

«Birayo, çi bû, çi qewimî?»

«Qet mepirse mîrê min, xewnên neşêrîn dev ji min bernadin, ji min nahewin.»

Ew radibe pê, çirê pê dixîne, «li min bibuhure mîrê min» û ji paketê du cixare dertîne. Yek ji xwe re û yek jî ji hevalê xwe re.

## 11

Dotira rojê. Memduh Selîm Beg rûnuştiye û name dinivîse. Ji hevalê xwe yê çerkez, xwezûrê xwe yê pêşeroj re. Di esasê xwe de wî dil heye ji destgirtiya xwe re binivîse. Lê ev yek hê ne li gor edetan e. Herçend mal û malbat têgihîştî û bîrewer bin jî. Ew niha, piştî şeva bihurî, pir dil dike ku hebûna xwe, dengê xwe biguhezîne mala xwezûran û Xezalê.

Lê ka keys?

Ew çi binivîse? Serî û mêjiyê wî, îroj, wekî kitêbxaneyeke wêranbûyî ye, peyv, qise tê de bûne tev li hev. Ew, penûs di destan de, li kaxiza spî dinihêre. Nêçirvanî? Belê, wî nêçirvaniya peyvan divê.

Ew dikene, rojên bihurî bi bîr tîne. Ew sersala Stembolê. Berf û kuliyên berfê. Lez û beza wî li pey kuliyan. «Sersaleke xweş bû.» Memduh Selîm Begê, eynî wekî wê sersalê, niha jî nêçirvanî divê. Lê ne nêçîra kuliyên berfê, nêçîra peyv û qisan da ku mane, bîr û bawerî li ser kaxiza spî bixuyin. Da ku Xezalê û bav û diya wê bi wî, bi dengê dilê wî bihesin.

Name divê bi rêk û pêk be. Ne kurt û ne jî dirêj. Ne zêde germ û ne jî zêde sar. Ne qiseyên qelaw û xweş, ne jî qiseyên jar û qels. Bi pîvan û li gor edetan; edebeke edebî.

Lê tu peyv nayên ser devê penûsa xweşik. Ew penûsa ku her gav, bi rehetî, li ser kaxizên spî direqisî, niha kulek e. Eger ev name rast bi rast ji Xezalê re bûya, niha ji zû ve bû ku kaxiz tijî bûbûn. Hingê ji kêfa penûsê re dê payan tunebûya. Lê niha?

«Mîrê min'ê ezîz,»

Paşê?..

Na, nabe. Fikir û guman tev li hev in. Mêjî nikare nameyeke xweş biafirîne. Bi tenê silav û kilam. Hal, hewal, xatir. Xweşiya Beyrûdê. Bêrî li wan kirin. «Halê min baş e, kêfa min li şûnê ye. Vegera min nêzîk e. Ez dê piştî demeke kin vegerim.» Dîsan silav û kilam. U? U «pir silav li Ferîhayê dikim û ji çavên wê yên xweşik radimûsim.» Cîhê herî giring yê namê. «Çavên wê yên xweşik.» Xweşik? Na, peyva xweşik zêde ye, ew divê ji namê derkeve.

Piştî keft û lefta çend saetan name bi vî awayî tê nivisîn, bê ku tu peyvên li ber dilê Memduh Selîm Begê ezîz in, li ser kaxizê bibiriqin.

## 12

Rojên dawîn yên Beyrûdê. Mala Xelîl Ramî Begê

Bedirxanî. Apê Sureya, Celadet û Kamuran Began. Kurê serîhildana 1840-an ya Mîr Bedirxan. Milletperwerê kurd. Merivdewletê Osmanî. Waliyê kevn yê wîlayeta kurdî Meletyayê. Dijminê serokkomarê Tirkiyê Mustafa Kemal û hevalên wî. Yek ji ew 150 şexsiyetên ku di sala 1923 an de bi destê rejîma Mustafa Kemal, ji welêt hatin bidûrxistin. Dilbirîndarê welatê xerîbiyê. Hevalê kevn yê Memduh Selîm Begê.

Kesên ku Partiyê şandibû welêt, vegeriyane. Yezdanê mezin, îcar, pişt li wan banedaye. Kar û bar bi cîh bûne. Navîn û qerergaha serîhildana nû û qumandarê serîhildanê bi rû bûne.

Navenda serîhildanê; çiyayê serîbilind Agirî, yanê Ararat.

Qumandarê serîhildanê; sereskerê serîbilind Ihsan Nûrî.

«Mîrên min, niha hêviya min bi şoreşê pir e. Min baş hêvî bi şoreşa me heye. Eger meriv li heft dewêlan jî bigeriya, dîsan nikaribû ji Ihsan Nûrî çêtir fermandar bidîta.»

Agirî û Ihsan Nûrî. Serbilindiyên kurdan. Li ber şûrê Ruhistîn du pizotên pole. Du helqeyên esasî yên zincîra siûda Memduh Selîm Begê. Bûyer û wext wekî peykervanekî şekil û form didin jiyana Memduh Selîm Begê. Niha Agirî û Ihsan Nûrî jî dest pê dikin û di siûda wî de cîhên xwe werdigirin. Bûyer û wext, yanê tarîx û siûd. Ji milekî ve tarîx tora xwe ya rengîn dihûne û ji milekî ve jî siûda Memduh Selîm Begê dineqişe.

Pêta hêviyê niha li ser çiyayê Agiriyê pêketiye. Kes û hêzên çekdar yên kurd ber bi wê derê derin.

«Welat dikele. Millet bidarvebûna Şêx Seîdê gorbehîşt û 50 hevalên wî ji bîr nake. Xelk li pey tolhildanê ye. Li hember tirkan kîn û nefreteke boş heye. Lê

herweha tirs jî heye.»

Xeberdan bi vê şêweyê dirêj dibin. Plan û hesabên nû çêdibin. Kêfxweşî û hêvî, wekî lewheyeke xweşik, li wê derê, li oda rûniştinê ya Xelîl Ramî Begê hilbûye.

Bi dû xeberdana çend saetan re heval û hogir, hemû bi hev re, ji mal derdikevin da ku bi hev re şiva êvarê bixwin. Lê berî derketinê, li ber derî Xelîl Ramî Beg ji dostê xwe yê kevn Memduh Selîm Begê tiştekî ku herkes lê difikire, dipirse.

«Memduh Beg, ka zewac kengê ye? Em dê kengê di daweta te de govendê bigirin?»

Zewac û dawet?

Deriyê yekbûna bedenan. Kona hezkirin û şehwetê. Wargeha abadîn ya domandina nifşan. Tora tovê. Edeta herî kevn ya merivahiyê. U ji bo Memduh Selîm Beg jî; yekbûna kevokan û Xezalê, ji şevên sar û neşêrîn rizgarbûn, bihûşteke hûrik li ser vî rûyê dinê avakirin û xwe -bi alîkariya xweşiyê- li hember derd, kul, bela û mûsîbetan ragirtin.

Lê kengê?

Memduh Selîm Beg divê guhdarî li dengine bike. Ew pêşî guhdarî li dengê dilê xwe dike û paşê jî li dengê mêjiyê xwe dike. Dengên dil û mêjî; berberiyeke stûr, berberiyeke malkambax. Kîjan deng? Ew bêtir li kîjan dengî guhdarî bike? Deng tên ber hev. Ew tên wezinandin.

«Mîrê min, ez jî nizanim, bi rastî nizanim... Em weha bê ser û ber, ketin ber pêlên xerîbiyê... û dever, meriv û dan û standinên nas şûna xwe berdan ji yên nenas re. Ez nizanim... pêşiya me nexuyaye. Bê mij û dûmanê ez tu tiştî nabînim... û me niha dest bi xebateke nû û hêja jî kiriye.»

Memduh Selîm Beg ewçend hêdî dipeyive ku Xelîl

Ramî Beg bi zehmetî dengê wî dibihîse.

«Lê Memduh Beg, xebata te rê li zewacê nagire.»

«Ez dizanim, mîrê min, dizanim. Lê ez naxwazim, qet naxwazim bikevim gunehê kesekî...»

Memduh Selîm Beg hem dizane, hem jî nizane. Ew weha dipeyive, lê dilê wî diguvişe. Ew niha guhdarî li dengê mêjiyê xwe dike, ne li dengê dilê xwe. Mêjiyê wî ye ku niha dipeyive, ne dilê wî. Ew dil û mêjiyê ku piraniya caran bi hev re yek in, niha ji hev veqetiyane, her yek tiştekî daxwaz dike. Berberiyeke nexweş.

Çima û heta kengê?

## 13

«Niha dor ya Iskender Beg e.»

Kar û xebatên pêşîn yên damezrevanên Partiya Xoybûnê xelas dibin. Gava yekemîn hat avêtinê. Ji bo gavên nû kar û bar li wan parve bûn. Ew dê, sibê, piştî nîvroyê, bi rê kevin. Herkes dê here cîhê xwe, bi hêviyeke nû, bi berpirsiyariyên nû û ji bo xebatine nû. Ew niha dîsan li hev civiyane da ku berî jihevûduveqetînê, ew qiseyên xwe yên dawîn bibêjin.

Herwekî Memduh Selîm Beg carina dibêje; hawayê civînê hîsî û sentimentale ye. Xelîl Ramî Beg xeberdaneke nerm û germ kir. Gotara kalekî dewr û dewrandîtî; tecrubeyên kevn yên destpêka 1900'î, nezanî û neyekbûna gelê kurd, barên giran û daf û kemînên li ber pêşewa û şerwanên kurdan. «Hûn divê hay li xwe bin. Ji we pê ve tu kesên vî milletê, vî milletê belengaz û bextreş tune. Ji bo milletê me hûn, her yek ji we, wekî stêrkekê ne.»

Niha Iskender Beg dê bipeyive. Iskender Beg?

Iskender?

Iskenderê mezin. Şagirtê Aristoteles. Keysarê Yew-

nan û Mekedonyayê. Hosteyê şer. Şerbazê cîhanê. Hem dost û hem jî dijminê keysarê Iranî Dara. Dostê ziman û kulturên îranî. Hîmdarê bajarê Iskenderiyeyê. Serdestê Babîlon, Susa û Persepolîsê. Hukimdarê welatê Iranî. Mêrê keça bedew, xezala Iranê Roxane, yanê mêrê keça keysar Dara. Damezrevanê yekitiya kulturên yewnan û îranî. Pireke zêrîn di navbera Rojava û Rojhelatê de.

Iskender Beg?

Delaliyê bav û kalikê xwe. Xortê bejnzirav yê bajarê kevn û rengîn Wanê. Efendiyê xortên kurd yên Stembolê. Pêxasê meyxanên Galatayê. Dilovanê dengên xweş. Hosteyê araqvexwarinê. Yek ji damezrevanên Komela Xwendekarên Kurd li Stembolê, HEVI, 1912. Nivîskar û berpirsiyarê kovara JIN'ê, 1918-19. Yek ji damezrevanên rêkxistina kurdî Teşkîlatê Içtimaiye û Kurd Tealî Cemiyetî. Aware û derbederê welatê xerîbiyê. Dildarê evînê. Xwediyê kevokên aşqê. U niha jî yek ji damezrevanên partiya Xoybûnê. Ronakbîrekî nûjen di navbera Rojhelat û Rojava de.

Yanê Memduh Selîm Beg.

Memduh Selîm Beg niha bûye Iskender Beg. Navê Iskenderê mezin niha li wî bûye. Damezrevanên Xoybûnê ji xwe re navine nehînî hildiçinin da ku ew û xebatên wan yên siyasî neyên zanîn û dijmin wan û xebatên wan nenase. Ew niha, her yek ji wan, dibin du kes. Memduh Selîm Beg jî dibe Memduh Selîm Beg û Iskender Beg.

«Iskender Beg!»

Iskender Beg, kincên nû lê, radibe pê û ber bi masê dere. Di wê navberê de, berî ku ew bigihê masa xeberdanê, rojeke ji rojên Stembolê di serê wî de ji nû ve vedije. Heş wî dibe Stembolê... Tarîx tora xwe dihûne, lê

carina bi eynî rengî. Sal 1913. Stembol, Şehzadebaşi. Xaniyê komela kurd HEVI. HEVI komcivîna xwe çêdike. Salon tijî ye. Tevî gelek milletwekiliyên Osmanî yên bajarên kurdan, pir mêvan jî hatine. Memduh Selîm Beg, bi sifatê sekreterê komelê, radibe û dipeyive. Ew di gotara xwe de rexne li mezinên kurdan jî digire ku ew alîkarî li doza Kurdistanê nakin. Milletwekiliyên kurd li dijî wî radiwestin. Xeberdan û munaqeşe germtir dibin. «Xwendevan jî wekî her kesî, divê bi doza milletê xwe ve rabin...» «Na, xwendevan divê bi tenê bixwînin û pozê xwe nexin nav tiştan...»

Gava weha tê peyivîn, Memduh Selîm Beg destê xwe dibe pozê xwe û dikene. «Pozê reben... Ma tu ne ji zû ve ye, di nav tiştan de yî?»

Di wê navberê de Xelîl Ramî Beg jî radibe û dipeyive. Xelîl Ramî Beg hatiye guh bide xortan. Piştî xeberdana milletwekiliyan, ew xwe ranagire û radibe, dipeyive. «Memduh Selîm û hevalên wî rast dibêjin. Em divê piştgirtî li wan bikin. Ew payebilindiya milletê me ne.»

Niha sal 1927. Berî bîskekê Xelîl Ramî Beg peyivî û niha jî ew dê bipeyive. 1913 û 1927. 14 sal; xwîn, bi hezaran mirî, kuştî û şehîd. Rojên tarî. Rojên şeytanên sererd û binerd. Rojên şûrê Ruhistîn. Şerekî cîhanê û du serîhildanên kurd. Şikestina hêviyan. Bi hezaran, bi milyonan derew. Derewên stûr û qelaw yên dewletên serdest.

Digel ku tarîx carina tora xwe bi eynî rengî dihûne, dîsan jî, tê de guherînin tên pê. Carina guherînin xuyayî, carina nexuyayî. Yên nexuyayî li alîkî, yên xuyayî; ji roja komcivîna HEVI'yê heta roja îroj piraniya ew xortên ku bi heyecaneke germ li komcivînê beşdar bûbûn, hatin kuştin, hejmara «payebilindan» her ku çû

kêmtir bû û yên man, îroj, li Beyrûdê bi firê ketin û bûn «stêrk.» Memduh Selîmê wê rojê niha bû Memduh Selîm Beg û bi dû re jî Iskender Beg. Avdayên spî ketin porê wî û qermiçekên rû û enî bûn kûrtir û pirtir.

Poz? Poz jî bû dirêjtir û kete nav pir tiştan.

U tiştekî din; ji wê rojê û vir ve, xeberdanên Memduh Selîm Begê bûn nermtir, germtir, bêtir kemilandî, hîs û henektijî.

Niha jî ew bi gotareke weha ve rabûye. Ew, her du destên wî li ser her du koşeyên masê, hinek xwarbûyî, rûbiken, li hevalên xwe dinihêre û peyvan nermik, nermik, li pey hev rêz dike. Peyvên bijarte, wekî ji destê zêrîngerekî hoste afirî bin, germiyeke xweş direşîne ser odê.

Axaftina wî dûr û dirêj, rengîn û mîsaltijî ye. Tê de her celeb tişt, her celeb meriv hene; sixurên Sultan Ebdulhemîd, şerwanên Seleheddînê Eyyubî, qahpikên Marki de Sade, îxaneta Brutus û gladyatorên Roma kevnar, pezkoviyên çiyayê Sîpanê û Xecê û Siyabend, hostetî û zêrîngeriya Ehmedê Xanî, mîrasên Mîr Bedirxanê Cizîra Botan, Ubeydullahê Nehrî, kurê Ubeydullahê Nehrî Seyid Evdulqadir Beg û Şêx Seîdê rîhspî û di dawiya axaftinê de jî çend rêzên Zerdeşt:

> Berî her tiştî di fikirînê de du cewher afirîne ku cêwik in
> Yek rindî ye, ya din jî xirabî, hem di fikirîn, hem di axaftinê de
> Kesê zane rindiyê heldibijêre di kar, fikirîn û gotinê de

14

Roja dawîn.

Bargeheke xweş. Hîmdarên Xoybûnê, kincên wan

yên herî nû û paqij lê, li tenişta hev rêz bûne. Wekî zarokên ku bi hev re derketibin meydana cejnê. Rawestîna wan jî wekî zarokên cejnê ye. Rawestîneke sert, awirekî hişk û cîddî. Eger merivekî nenas ji derve were û li wan binihêre, pîrqîn dê pê bikeve.

Ev merivên mest û mezin, ev merivên navsal çi dikin? Ew li hember sûretkêşekî rêz bûne û sûret dikişînin. Yanê, xatirayeke ji rojên xweş yên Beyrûdê. Ispatekî jîndar ji gotina «kurd namirin.» Sûreteke ji çandina tovên nû yên hêviyê. U bê guman, bîr bi vê gotina Osmanî birin: «Geçmiş zaman olur ki hayali cihana bedel.» Yanê, wextine bihurî hene ku bi bîranîna wan bi cîhanekê ye.

Wext hê li wan nequlipiye. Iroj hê nebûye do, hê nebûye «rabirdû» û wexteke bihurî. Lê ew ji tecrubên xwe dizanin; îhtimala ji nişkekê ve ji dinê û ji jiyanê xatirxwestinê her heye. Prensîb û qaîdeyên xebata ku ew pê rabûne, weha ne. Mayin û neman. Helbet, şer ji bo mayinê ye. Lê belê, yan jî mixabin, şerê mayinê, her gav, îhtimala nemanê jî dihundirîne. Ev komeke meriv baş hay ji vê yekê hene. Ji lewre jî, ew dil dikin ku li pey xwe xatirayeke nemir berdin.

Evana, ev koma...

Hin ji wan bîrewer û ronakbîr, hin jî axa û şêx. Hin ji wan ji nîşandeka babilîska 20 an, yanê ji bajarên mezin û hin jî ji gund û şikeftên ji dinê bêhay. Hin ji wan hê nû bi taya evînê ketine, hin jî, bêyî ku ew hay li taya evînê hebin, xwediyê zar û zêç. Her yek ji alîkî. Her yek bi awakî. Roj û meh wekî aveke zelal herikîn. Niha ew ji hevûdu vediqetin. Her yekî bêrî li tiştekî kiriye; zarokên çavreş, jinên stûna mal û konan, axa avis, hesp û mehînên rehwan, tifing û demançên zêrhêlî, spêdê çiyayên serîbilind, memikên berfîn yên keçên

bedew, ayet û hadîsên kitêbên muqeddes, bîhna murekebê û dinya kitêb, kovar û rojnameyan, calvadosa fransizî û Quartier Latin ya Parîsê.

U porê dirêj û çavên genimî...

Ew dê, îroj, piştî nîvroyê, di bin çengan de kar û barên nû, ber bi cîh û warên xwe herin.

«Birayo, Memduh Beg, fermo were li nik min rûne.»

«Na mîrê min, spas, şûna min baş e.»

Ew bûne du qor. Qoreke li pê û qoreke rûniştî. Memduh Selîm Beg li pê rawestiye. Celadet Bedirxan Beg dil dike ku ew here û li qora pêşîn, li qora rûniştî rûne. Lê, na, spas. Kêfa Memduh Selîm Begê nefsbiçûk ji qorên pêşîn re nayê. Hoste, dezgedar, hesabdar, remildar, lê belê, gavekê li paş, di qora li pê de.

Ji bo wî ya herî girîng rêveçûna kar û xebatê ye. Serfirazî û biserketin e.

«Bila her tişt bi dilê me be!»

«Bila Yezdanê pak û dilovan bi me û milletê me re be!»

# Dİ BİN SİYA EVÎNÊ DE

## 1

Traaay la laaay, traaay, traaay, laaay...

Dengê melûl. Dengê ku bêrî lê hatibû kirin. Çend roj, çend meh bihurîn? Wekî ku babilîskekê bihurîbe! Axir... Cihêbûn û hesret li pey man. Dengê germ, hêdî hêdî, dîsan guh û dil vedigirin.

Bajarê biçûk: Antaqiye. Di bajarê biçûk de taxa biçûk. Di taxa biçûk de xaniyê biçûk. Dana êvarê.

Memduh Selîm Beg li ber derî ye. Deriyê mala bavê Xezalê. Deriyê ku vedibe mekana porê dirêj, bedena spehî. Bi qasî bîskekê li ber derî rawestan. Di dest û bin çengan de pakêt û tişt. Dinya bi mij û dûman. Hewa girtî. Erd û kolanên şil. Rehma zivistanê.

«Ew dê min ji nû ve binasin?»

Hîs û pirsiyarên têkel. Şik, tirs û heyecan.

Teq, teq, teq...

Vebûna derî. Na, ne ew e. Diya wê ye. Jina dîndar. Birca stûr ya edet û toreyan. Siya Xezalê, per û baskên wê. Gakoviya mader. Bi çavên meraqtijî li mêvanê bêwext fekirîn. «Wê ez nasîm?» Keneke gulover li ser rûyê gulover. «Memduh Beg, Memduh Beg!..» Kêfxweşiyeke rasteqîn. «Fermo were hundir. Dinya sar e, li ber

derî mesekine.»

Derî, dîsan, li Memduh Selîm Begê vedibe. Hewayê germ yê hundir. Bîhna şîveke germ. Dê li pêş, ew li paş, bi hev re, derin odeya rûniştinê. Oda nas. Her tişt wekî xwe, wekî berê. Deriyên girtî yên odeyên din. Hal û hewal. Xweşî û rindî. Dewr û dewran. Lubnan û Beyrûd. «Memduh Beg, ev bû demeke dirêj ku tu li wan deran î. Me nema bawer dikir ku tu vegerî.» Henek. Henek? Hinek henek, hinek rastî û hinek jî tehdît û îxtar. Li pey perda kena gulover awirê xwesuyan.

Ew jî baş in. Hal û hewalê wan jî di şûnê de ye. Cîh li wan, hinekî, teng bûbû. Mêvanên wan hebûn. Ji deverên dûr, ji Stembolê. «Mîrê min?» Ew jî baş e. Ew jî divê niha were. Mamostayî wî, hinekî, diwestîne. Lê xurbet, derd û bêgaviyên xurbetê!..

Pîrejin... rê lê vebûye. Ew dikare, bi vî awayî, bi saetan, bi rojan bipeyive.

Hê jî dengê musîkê. Ma ew pê nehesiya ku Memduh Selîm Beg hatiye? Deng wekî aveke zelal dewam dike. Bîhntengî. Dîsan edet û tore. Nabe ku Memduh Selîm Beg bang lê bike, wê bîne û li kêleka xwe bide rûniştin. Pezkoviya devlêvebûyî! «Ax Memduh Beg, ev xerîbî.» Xelkê bajêr û cîranan nasnekirin. Ziman û dijwariya zimanê erebî. Nereheti û ecizkirina fransizan. Tengbûna mitbaxê. Kevnbûna tiştên malê. Buhatî. Nebûna zad, zebze û fekî. «Ax, Memduh Beg, ax, ka ew bazar û sûkên Stembolê ku tê de her tişt hebûn!»

Bêdengiya Memduh Selîm Begê. Awirê vala. Li dîwaran, li xençerên ser dîwêr, li masê, li kursiyan, li xalîça li erdê raxistî nihêrîn. Li ser masê jî pakêt û tiştên ku Memduh Selîm Begê bi xwe re anîbûn.

«De rûnin, ez ji te re qahwekê dayinim ser êgir. Jixwe şîva me jî li ser êgir e.»

«Gelek spas, eciz mebe, ez'ê herim.»

Di bidûrketin û ber bi mitbaxê bûnê de bore bora wê; «na, na qet nabe, em te nahêlin tu cîhî.»

Jineke xwedanzept û rept. Jineke xwedanqise û bixwebawer. Qumandar. «Xwedê me jê, ji demên wê yên pizotpêketî star bike.»

Xêzên ronahiyê. Di odeyên din de çira. Perda tarî ya êvarê dadikeve. Di oda tarî de bitenêbûn. Hîsê bitenêbûnê, hîsê jibîrbûyinê... Pencere û kuçe û kolanên hûr. Lezandina kesina. U di vê dana êvarê ya tarî û şilî de dengê musîkê. Lê kemançe ji nişka ve radiweste. Pise pis. Bi qasî bîskekê dengine; dengê feraqan, dengê lingan û rakirina tiştan.

Ew.

Di destan de lampayeke ronî, ew dikeve oda rûniştinê. Memduh Selîm Beg, ji cîhê xwe, radibe pê. Ew hêdî hêdî ber bi wî û masê tê. Siya ku bi dû wê re tê, hêdî hêdî mezintir dibe. Rû. Rû di nav ronahiyeke nedîtî de ye. Roniya çirê li ser mûjang, birû û por diçirûse. Rû li ber roniya çirê wekî binevşeke sor dixuye. Binevşa sor, Binevşa Narîn û Xezalê. Binevşa Narîn, yara Cembeliyê Hakkarê tê bîra Memduh Selîm Begê. Niha şerekî dijwar di navbera roniya çirê û porê zer de heye. Keneke dilovan li ser lêv û bîbûkên çavên wê ye.

Ew.

«Kek Memduh, tu bi xêr hatî.»

«Di nav xêrê de bî, Ferîha.»

Piştî ku ew çirê li ser masê datîne, destên wan digihhên hevûdu. Ev dem. Demeke kin û kurt, lê bi xweşiyyên bihuştê tijî. Dest çend car dihejin, wekî ku ew dixwazin ev dema şêrîn dirêjtir bibe. çavên kentijî li hev dinihêrin. Lêv dihezin.

Germiyekê bi ser Memduh Selîm Begê re gêr dibe. E-

ger diya wê, birca stûr ya edet û toreyan, hema xwe negihanda nik wan, Memduh Selîm dê ew hembêz bikira. Bi her du destan. Pihêt. Hişk. Bi daxwaz û evîn.

«Memduh Beg, fermo, qahwe... Qahweya tahl. Tu dibînî, min ji bîr nekiriye ku tu ji qahwa tahl hez dikî.»

Ken. Her sê bi hev re. Her sê bi hev re li ser kursiyan rûniştine. Memduh Selîm Beg hal û hewalê wê dipirse. Bersîva hergavî; başî û rindî. Ew hal û hewalê wî dipirse. Ne bersîva hergavî; kêfxweşiyeke boş wekî şelaleyan, sihhetxweşiyeke rind wekî pole, seyehateke xweş li Beyrûdê, li bajarê ku di nav ronahiyê de ye, bi elektrîk e. Ew kolanên fireh û dirêj, bexçeyên rengîn, derya zelal, şêniyên pir, moda nûjen, maxazeyên mezin yên fransiz, ermen û yewnanan ku li Beyrûdê ne...

Dora xeberdanê niha ya wî ye. Wî dor ji birca stûr girt. Peyvên herî xweş li pey hev rêz dibin. «Hevalan ji min re kinc û pêlavên nû kirîn... Wan ev pakêt jî ji bo te şandin.»

Çav li pakêtan vedigerin. «Kek Memduh, pir spas, ez ji hevalên te re spas dikim.»

«Ma hevalên te çima ev zehmetî xwarin, ne hewce bû.»

Stûna malê jî divê tiştekî bibêje. Naxwe ew dê çawan bibe birca stûr ya edet û toreyan? Ew tiştekî dibêje, lê tiştekî din qest dike. Bê guman, ew jî kêfxweş e, lê belê, ew kêfxweşiya xwe weha, bi qiseyên nerast nîşan dide. «Ne hewce bû...»

«Memduh Beg, Memduh Beg!..»

Bav jî hat. Bîvileke stûr û simbêlên ber bi jor badayî. «Monsieur simbêl.» Navê wî dikaribû weha bûya jî. Dostê hêja, merivê dilsoz. Dîsan, ji nû ve, hal û xatir. Bi awakî kin û kurt.

Bav, dê, keç û zavayê pêşeroj. Tablo temam e. Ren-

gên cihê. Lê tabloyeke xweş û lihevhatî. Vebûna pakêt û tiştan. Pêşî pakêta Xezalê. Fîstaneke hewreşîmî. Dirêj û rengîn. Çar cot goreyên dirêj yên jinan. Spehî. Şaleke bi dest hûnandî ya ecemê û coteke guharên zêrîn. Ne bi tenê evçend; kitêbekê jî ji aliyê Memduh Selîm Begê. Kitêbeke fransizî li ser tarîxa kemançe, texlîtên kemançê û tevî bi qasî buhîst sonatan, şêweyên lêxistinê.

«Kek Memduh, kitab pir xweş e, lê ez bi fransizî nizanim.»

«Mîrê min dikare, carina, ji te re bixwîne.»

«Hay lo, ez dê, di vî umrê xwe de, li ber coga keça xwe rûnim û jê re behsa kemançan bikim? Hay lo...»

«Hingê ez dikarim, carina, ji te re bixwînim.»

Kitab û musîk. Riyên zîvîn yên sermestbûna ruhê merivan. Zimanên nêzîkbûna dilan. U hêncetên bihevrebûnê? «Bi vî awayî, ez dê fransiziya xwe jî, di warekî din de, pêş bixînim.»

Ji pakêt û tiştan para bavê Xezalê qelûneke reş û stûr e. Qelûneke ku dûmana wê ji dûmana tifikekê bêtir e. Diya wê, birca stûr? Tisbîheke nod û neh libî. Ji bo dua, ayet, hedîs, nimêj û niyazan. «Memduh Beg, Xwedê ji te razî be, Xwedê bi te re be.»

Bi dû vebûna pakêt û tiştan re, civat, wekî her carî, dibe du bir. Jin ber bi mitbaxê, mêr jî ber bi hevûdu. Tiştên ku ew li ser bipeyivin, pir in.

«Hanim, Menduh Bey bu gece misafirimizdir.» Yanê, Memduh Beg îşev mêvanê me ye. «Piştî şîvê jî em dê araq vexwin. Ji niha ve cacixa wî çêkin.»

Tiştên ku ew li ser bipeyivin... Çi? Bê guman, Turkiye, rejîma nû, bûyerên Turkiyê û xebata li dijî rejîmê. «Berî niha bi demekê, mêvanên me ji Stembolê hatibûn. Muthiş, Menduh Bey, muthiş... Li gor ku mêva-

nên me digotin, tişt û pere li piyasê naxuyin. Xelk birçî ye. Her roj çend kesên muxalîf winda dibin, yan jî bi dar ve dibin. Mustafa Kemal her tiştî li gor xwe eyar dike. Ew bûye dîktatorekî wusan ku Siltan Ebdulhemmîd li nik wî melayike dimîne. Xelk jê ne razî ye.

«Mîrê min, em kurd jî li hev dicivin. Me dest bi xebateke nû û bi rêk û pek kiriye. Ji niha ve eşîr, malbat û bi hezaran kesên kurd ber bi me, ber bi xebatê dibin. Min hêvî pir e. Icar em dê tiştine xweş bînin pê. Veger nêzîk e, mîrê min, pir nêzîk e. Em dê vegerin welatê xwe.»

2

Anteqiye. Bajarê biçûk. Li bin bîvila Turkiyê. Wekî çîroka keçika biçûk û gurê devgirêz. Turkiye li bendê ye ku bajarê biçûk vegire nav tixûbên xwe û bajêr daqultîne.

Antaqiye, bajarê tarîxî. Warê Rom û Bîzansan. Yek ji navendên medeniyetên fille ya Rojhelata Navîn. Bajarê rengîn; ereb, ermen, suryan yewnan, tirk, çerkez û kurd. «Beldeyê Selametê.» Xiraxa deryayan. Deriyê deşt û zozanan. Çavnêrê fransizan. Di wextê xwe de, havîngeha Iskenderê mezin.

Warê jiyana Iskender Begê kurd, warê jiyana xerîb.

Çar taxên mezin, mizgefteke mezin, çend dêrên biçûk, keleheke hilweşiyayî, kolanên fireh, aşxane, meyxane û qahwexanên hûr û parizgeha Zîrahî. Yanê bajarekî biçûk...

Di bajarê biçûk de meyxana biçûk û xweşik; «meyxana ermenan.» Mase û kursiyên textîn. Lê, neqişandî û cîlakirî. Li erdê xalîçeyên Wanê. Xalîçeyên ji deverên Memduh Selîm Begê. Li ser dîwaran lewhene spehî. Bi zimanên fransizî, erebî, tirkî û ermenî rêzên bi-

çûk. Li ber maseyan nêrgile û qelûn. Li ser maseyan xwarin û vexwarin. Bilûrvanekî li ber dezgê rûniştiye. Bi kincên netewî yên ermenan. Bi dengê bilûrê musîkeke giran û melûl ya ermenan. Dûmana cixare, qelûn û nêrgilan. Ken, zimanên têvel.

U Memduh Selîm Beg û hevalê wî yê çerkez. Ew bi hev re rûniştine û vedixwin. Lê, ne araq. Tiştekî din yê balkêş; konyak. Konyaka ermenan. Xwediyê meyxanê ermeniyekî kal e. Ew ji deverên Wanê, dostê Memduh Selîm Begê ye. Jê re, ji Erîwanê konyakeke giranbiha hatiye. Ew jî dostê xwe yê ezîz Memduh Selîm Begê diezimîne.

Xwezûr û zavayê pêşeroj li hember hevûdu rûniştine û ji hev re tiştine dibêjin. Xwezûrê wî dil kiribû ku ew bihatina meyxanê. Wî dixwest -hinekî- bi Memduh Selîm Beg re bipeyiviya.

Çi?

«Memduh Beg, tu dizanî, berî niha bi demekê, mêvanên me hebûn...»

«Belê mîrê min, we behs kiribû, mêvanên we ji Stembolê, ji bo serîdana we hatibûn.»

«Rast e, Memduh Beg. Lê mesele ne bi tenê serîdan bû.»

Yanê çi, hingê çi bû?

Memduh Selîm Beg napeyive, jê pirs jî nake. Ew, di dest de qedeh, bêdeng, li dostê xwe dinihêre.

«Lawekî wan heye. Wî nû xwendina xwe kuta kiriye û niha jî di eynî zanîngehê de, dest bi mamostetî kiriye...»

Memduh Selîm Beg qedeha destê xwe hêdî hêdî dibe devê xwe, çend qult ji konyaka xwe vedixwe û paşê jî, ji zeytûnên li ser masê du lib digire û davêje devê xwe.

«Lêwik zimanê almanî xwendiye. Ew xortekî jîr e.

Dema em li Stembolê bûn, tevî bav û diya xwe, ew dihat mala me.»

Memduh Selîm Beg dest davêje pakêta cixarê, «Mîrê min, tu jî dixwazî?»

«Na, Memduh Beg, spas... Memduh Beg... gotina min ev e; bav û diya lêwik hatibûn ku keça me, Ferîha'yê ji lawê xwe re bixwazin...»

Bêdengî. Bêdengiya mêjiyê Memduh Selîm Begê. Çi? Ferîha'yê xwestin?.. Ber bi Xezalê bûn? Daxwaza nêçîra Xezalê? Ji cixarê çend gulm. Çend qult konyak. Ew guliyên dirêj, ew porê zêrîn di nav destên hinekên din de! Lëvên biyanî li ser çavên germ, destên biyanî li ser bedena bedew!.. Na, na, nabe... Baş e, we çi got? We çi dil kir? Hûn çi difikirin? Mêjiyê Memduh Selîm Begê, bêdeng, pêl dide.

Memduh Selîm Beg, bêdeng, li dostê xwe dinihêre. Nêrîneke nerm. Nêrîneke rêz û rêzdarî û hawartijî.

Hawar...

«Memduh Beg, tu hal û hewalê civata me dizanî. Gava keçikeke xama li mala dê û bavê xwe be, xelk tê û wê dixwaze.»

Memduh Selîm Beg dil nake ku devê xwe veke. Lê şewata meraqekê bi canê wî ketiye; wan ji dê û bavê lêwik re çi gotin?

«Ne ku keça min e û ez ji ber vê yekê dibêjim, lê Ferîha keçikeke narîn û delal e. Di cihên biçûk, wekî van deran de, keçên weha pir ber bi çav in. U kesên ku çav berdidinê, pir in.»

Dengê bilûrê. Dengê bilûra kalemêrê bilûrvan. Dengekî giran û melûl. Dengê derd û kulan. Dengê serpêhatiyên malkambax. Dengê bextreşî û şînê. U konyaka germ. Di demên weha de, hîs û heyecanên tenik û zîz dilê Memduh Selîm Begê vedigirin. Ew dibe melûl û di-

lovan. Kelgirî. Çima di meyxanê de musîkeke weha tê lêxistin? Ma li serê cîhanê meyxaneyeke din jî heye ku tê de bilûr lêdikeve?..

Memduh Selîm Beg, niha jî, bi awakî melûl û dilovan, li şûşe û qedeha ber xwe û li dostê xwe dinihêre.

«Memduh Beg, bê guman, me, bi zimanekî xweş, ji wan re da zanîn ku Ferîha destgirtî ye û me tu daxwazên weha ne qebûl in. Lê ne bi tenê ew, herweha gelek kesên din jî tên û Ferîha'yê dixwazin. Em, nemaze diya keçikê bi vê yekê eciz dibe. Jixwe, wê xwest ku ez werim û bi te re bipeyivim. Tu jinên me dinasî... Ew her şev tê û li ber guhê min pise pisê dike. Ew dixwaze ku mesela zewac û mahrbirînê rojeke zûtir hal bibe...»

Belê, ew deqîqe, ew gav jî hat. Gava ku Memduh Selîm Beg hê jî nedipa... Hevûdudîtin, taya evînê, firîna dil, destgirtîbûn û niha jî gava nû; zewac. Wekî her tiştî, evîn jî xwedanqaîde ye. Ji wan qaîdan revîn nabe. Evîneke bêsînor, bêqaîde... Ev yek ne li gor edetan e. Ne li gor edetan e ku keçikeke ciwan, bi dirêjahiya salan, li mal be.

Baş e, niha?

«Mîrê min, ma ez naxwazim? Ferîha li ber dilê min pir ezîz e. Ez jî dil dikim ku em rojeke zûtir zewaca xwe bi ser xînin... Ez kar û şuxilên xwe bidim hev, hinekî bîhn li min fireh be û ez der û dorên xwe bibînim, hingê em dê vê meselê jî çareser bikin.»

Memduh Selîm Beg bi dilekî germ û seriyekî germbûyî dipeyive. Lê peyvên wî ne zelal in. Kar û şuxil, bîhnfirehî, der û dorên xwe dîtin... Yanê çi? Heta kengê? çiqas?

## 3

Mal; du ode, saloneke dirêj, mitbaxeke biçûk. Tiştên

tê de; li salonê maseyeke dirêj û çend kursiyên textîn, li erdê xalîçeyeke fireh ji Kermanşahê, li quncikekê du doşegên fireh û çend bahlîf li serê, li ser dîwêr lewheyeke keleha Wanê, lewheyeke bircên Stembolê û di navbera her du lewhan de, hinekî ji wan jor, du sûret, yek ya Şêx Seîdê Pîranî û yek jî ya Kemal Fewzî ku her du jî berî du salan, li Diyarbekirê bi dar ve bûn. Li koşa binê lewhe û sûretan qenepeyekê û li nik qenepê jî dolabeke hesinî. Li oda razanê texteke fireh ji bo du kesan, li ser dîwêr du xalîçeyên rengîn û biçûk, li nik textê maseyeke biçûk û li ser masê kitêb û kovarin. Ji çend kitêb, kovar û rojnamên ku peregende dixuyin pê ve, li oda din tu tişt tune. Ode ji bo kitêb û weşînan hatiye veqetandin. Lê, ode hê vala ye. Li mitbaxê jî çend firaqên pêwist dixuyin.

Maleke feqîr û sade. Li welatê xerîbiyê maleke xerîb. Maleke ku destê jinan pê neketiye. U tekberên malê yên sade û feqîr.

Memduh Selîm Beg li mala xwe rûniştiye. Li ser masê name, rojname, kitêb û bi tomaran kaxiz.

Jiyana rojane, jiyana siyasî û jiyana evîn û evîndariyê; ev her sê bûne helqeyên zîncîra jiyana Memduh Selîm Begê. Hemû tomarên kaxiz û kitêbên li ser masê di derheqên van helqan de ne. Nameyekê bi fransizî ji muduriyeta navîn ya terbiye û perwerdeyî hatiye. Name kurt û hişk e; «Monsieur Memduh Selîm, li gor agahiyên ku gihîştine me, Hûn di navbera van tarîxan de(tarîx bi reqemên romî) li ser karê xwe nebûne. We ji bo du hefteyên pêşîn karbidestên xwe agahdar kiriye. Lê, ji du hefteyên pêşîn û pê ve, tu agahî negîhane destê karbidestan... Me ji bo vê yekê agahî divên... Ji lewre, em ji We daxwaz dikin ku Hûn di demeke kurt de sebebên li ser kar nebûnê, bi niviskî, ji me re bidin

zanîn...»

U silav û daxwaziyên serfiraziyê. Bê guman, silav û daxwaziyên derewîn. Di esasê xwe de, daxwaza çavnêrî û îdarekirinê.

Memduh SelîmBeg divê bersîva namê bide. Ew divê erkê xwe yê rojane bi cîh bîne. Ji bo ku helqeyên din neyên şikestin, têk nerin, ew divê helqa jiyana rojane pihêt pêgire û wê ji destê xwe bernede. Ji bersîva namê pê ve, ew divê beşdarî li çend civînên mamostan jî bike û raporekê li ser nûkirina xebata mamostetî û perwerdeyiyê binivîse.

Di nav tomarên kaxizan de bi qasî 20-30 navnîşan. Navnîşanên kurdên ku li Ewrûpa û Amerîkayê dijîn. Wan jî agahî divên. Xebera pîroz divê bigihê wan jî. Ruh û mêjiyên wan jî divê bi xebera xweş were vejandin. Bi kurtebirî, ji wan re name divê. Nameyên wekhev. Germ, xurt, xweş û pêlbilind. Pîrozbahî, agahî li ser Xoybûnê, destpêka xebata muqeddes, pêwistiya xebata li ser riya serfirazî û rizgariya welêt û millet...û alîkarî li xebatê kirin. Ew divê van nameyan jî bi tirkî û fransizî binivîse.

«Hevalê hêja û qedirgiran... pîroz be, çavên te ronî bin... Zarokê ku em li hêviyê bûn, hat dinê. Zarokê ku me, millet û welatê me bicivîne ser hev, dest bi jînê kiriye. Zarokê ku namûs û şerefa welatê me biparêze, îroj li ser piyan e. Ev zarok heyina me, hebûna me ye. Ev zarok XOYBUN e... lê xwedî derkeve, alîkariyê bike, di kar û xebatên wî de beşdar be...»

U bi dû van gotinan re jî erk û xebatên ku divê bi cîh werin.

Ji nameyan pê ve, ew divê çend nivîsar jî li ser rewşa welêt binivîse da ku Partî, yanê Xoybûn wan nivîsaran ji hukimatên Ingiliz, Fransiz, Italî û Amerîkî re bişî-

nin... Erkên helqa jiyana siyasî îroj, bi tenê îroj, ev in.

Helqa jiyana evîn û evîndariyê?

Evîn... Çar tîp: E-V-I-N. Peyveke hûr. Lê jiyaneke, dinyake ewçend stûr, ewçend dewlemed ku emr têra wê nake. Peyv têr nakin ku wê bidin zanîn. Mêjî tênagihê ka ew çi tişt e. Dil, bi tenê dilê reben, wê dijî, wê dilop bi dilop vedixwe, wê dide ber beroşk û germiya rehên jiyanê.

Evîn, dil û peyv. Peyv divê ji bîr nebin... ew kinc û libasên xweşiyan in. Ew xwe, her û her, diguhezînin dilê sermest û wî geş dikin.

Memduh Selîm Beg bi vê hunerê dizane. Ew dizane ka dan û standina dil û peyvan çawan e. Ji ber vê yekê jî, ew her li pey wan peyvan e ku dil pê geş dibe.

Niha? Işev? Gelo di nav tomarên kaxizan de peyvên weha jî hene? Çawan tune! Celeb bi celeb. Bi her zimanî. Ev sê kitêbên li ser masê jê re, ji Fransê hatine; Novembre, L'Education Sentimentale û Madame Bovary. Sê kitêb, sê çapên nû ji nivîskarekî frensewî yê sedsala 19 an; Gustave Flaubert. Sê roman ku dil pê geş dibe, pê perwerde dibe. Ew li ser masê, li benda dengê dilê Memduh Selîm Begê ne.

Sê helqe, sê stûnên jiyanê. Keft û leftên rojê. Dengê dil û kevokên evînê û welat. U welat, sebebê hebûna her tiştî.

Dinya ecêb, jiyana tev li hev. Daxwazî û hîsên têkel. «Way li min!.. Çerxa dinê û felegê... daf û kemînên jiyanê... way li min.»

Ma çima ev dinya malkambax her roj, xwe bi hêstirên çavan dişo û xwe bi nalîn û hawarên dilsoj zuha dike?..

«Wisan dixuye ku çerxa felegê şikiyaye, dinya, bi lez û bez, ber bi derina gêr dibe... û em jî divê xwe bigihînin vê lez û beziyê... Çima?»

## 4

Sersaleke nû. Sersala 1928 an. Sersalên welatê xerîbiyê. Ev bûn çend sersal? Hîn çend sersalên din divên?

Xwezûr, xwesî, bûk û zava. Yanê monsieur simbêl, gakoviya mader, Xezala çavgerm û evîndarê xweşî û rindiyan. Sersala nû bi xeberên nû û xweş dest pê dike; kitêbên Memduh Selîm Begê ketine rê û ber bi Anteqiyayê tên. Bav û diya Xezalê dê herin Urdinê, nik merivanên xwe. Xezalê dê, li mal, dest bi xwendina fransizî bike. Li gor biryara Muduriyeta Navîn ya Terbiye û Perwerdeyî, Memduh Selîm Beg dê karê xwe bidomîne.

Xwezûr dil hebû ku wan şeva sersalê bi hev re derbas bikirina. Memduh Selîm Beg dê, di esasê xwe de, biçûya Helebê, nik hevalên xwe. Lê li ser daxwaza hevalê xwe, ew li Anteqiyayê ma. Wekî her carî, bav û dê li hember hev û Memduh Selîm Beg û Xezalê jî li hember hev rûniştine. Xwarinên herî xweş li ser sifrê ne. Bê guman cacix û tebûleya Antaqiyayê jî ku Memduh Selîm Beg jê pir hez dike.

Memduh Selîm Beg kincên xwe yên nû li xwe kiriye, -ew kincên ku hevalên wî dabûnê. Xezalê jî kincên nû li xwe kiriye.

Kêfa Memduh Selîm Begê di dewsê de ye. Evîna wî, sewda xweşik li hember wî rûniştiye û ronahî direşîne ser masê û odê. Ji vê xweştir çi heye? Ew hay lê ye; di jiyana wî de rûpelên nû vedibin û ew ber bi derên nû gêr dibe. Carina wî dil dikir ku jiyana wî wekî riyeke rast bixuya. Wekî riyeke rast di deşteke hêşîn û ronî de. Yanê riyeke rast û têkûz. Ne zîk-zak, ne kort û çal, ne xaçerê. Lê pêlên xerîbiyê riya jiyana wî, ji binî, tev li hev kir, daxwaza wî qurmiçand. Di ser de jî, di welatê xerîbiyê de, ew rastî xezaleke çerkez hat. Pêşî taya welatê xerîbiyê û paşê jî taya evînê. Yanê du ta-

yên pir ji hev cihê ew sermest kir. Ji wê rojê û vir ve ye ku riya jiyana wî wekî riyekê ku di nav daristan, zinar û newalan de dibihure ye. Yanê riyekê ku di nav rengên têkel de ye.

Ew niha li ser wê riyê ye û her dere. Ber bi hem amanc û hedefên rojane û hem jî yên dûr û dirêj. Ber bi serfiraziyê, ber bi azadiyê, ber bi serketina dil. Lê belê, li milê din, mij û dûmanê riya wî vegirtiye. Dar û daristan, çiya, zinar û şikeft li ber wî ne. Ev rêwîtî dê li kû û çawan biqede?..

Ma niha wexta pirs û gumanên weha ye! Rûyê ronî û çavên stûr lê dinihêrin. Germiyekê ku bi demeke dirêj jê bi dûr bû, bi ser wî re tê. Ew dipeyive, tiştina dibêje. Lê peyvên wî ewçend bi best in ku wekî ku ew ji kûrahiya dil tên. Peyvên wî wekî kahniyeke boş, germ û zelal diherikin. Rûyê ronî bîhnvedanek, ferrehiyek, rehetiyek, sermestiyeke xweş bi ser wî de tîne û beden û zîhnê wî bi vê yekê vedije, zînde dibe.

Ev çavên li hember, ev rû û bedena li hember dilê wî vedigire. Belê, êdî baş dixuye, êdî eşkere ye; Xezala li hember rûniştî pê li deriyê dilê Memduh Selîm Begê dike. Ew dê bibe stûna mala wî. Ew dê ronahî bireşîne ser jiyana wî. Di rojên teng û reş de, ew dê were û pişt bide Memduh Selîm Begê, jê re bibe alîkar, heval, hogir û yar.

## 5

Kitêb. Dinya kitêban. Dinya bi sihêr û keramet. Rê û xaçeriyên ku di nav rûpelan de dixuyin. Zane, qehreman, tirsok, şerwan, qeşmer, parsek, hukimdar, qahpik, xweşik, fetbaz, nexweş, dîn, xwînrêj, gêj, fêsad, sêwî, keçel, alîm, evîndar û dilsojên ku ji nav rûpelan derdikevin û tên bi xwendevan re dipeyivin. Cîh û wa-

rên ku di nav rûpelan de diçirûsin. Ziman, edet, tore û çandên biyanî ku ji rûpelan, ji xwendevan re dibişirin... Tîpên cihê; erebî, latînî, kirîlîkî. Peyv û cimle. Rêz. Nav, sername. Xwendin; ji aliyê rastê ber aliyê çepê û ji aliyê çepê ber bi aliyê rastê. Xwendin; di nav rûpelên rengîn de rêveçûneke bêwestan û bêpîvan.

Kitêb. Yara bêhempa. Dosta bêziman. Hogira zanînê.

Belê, kitêbên Memduh Selîm Begê hatin. Ew ji Stembolê bi rê ketin û piştî bi dehan macere û tehlûke, wan xwe gîhandin Antaqiyayê. Dostên kevn, Memduh Selîm Beg û kitêb gihîştin hev. Ew oda ku vala bû, hew stûxwar e. Ode dê bi kitêb, kovar û rojnaman bineqişe. Gava kitêbên Memduh Selîm Begê di nav telizan de wekî girtiyan hatin, wî hema baz da û çû nik necarekî. Jê re, ji kitêban re, ji dostên abadîn re ref diviyan.

Ref çêbûn û hatin odê. Niha Memduh Selîm Beg divê kitêban, yek bi yek, ji taritiya telizan rizgar bike û wan rêz bi rêz dayine ser refan. Ew hêdî hêdî xwar dibe û destê xwe dixe telizekî û jê kitêbekê derdixe; cîldekî Ansiklopediya Diderot, bi fransizî. Piştî ku ew cîldê Ansiklopediyê bi paçê şil yê destê xwe, xweş paqij dike û wê datîne ser rêf, ew destê xwe davêje telizekî din; cîldekî Dîwana Hafiz, bi farsî, lê bi şerhên fransizî. Telizekî din; kovarên ROJI KURD, cildkirî, ku di sala 1913 an de, li Stembolê weşiyabû. «Ax... ka ew roj li kû ne?» Kitêb, kitêb, kitêb. Bîhna wan ya taybetî. Toza wan ya taybetî û tenik.

«Hezar hemd û spas ji Yezdanê pak re. Hezar hemd û spas ji bextê rind re...»

Iroj ji kêfa Memduh Selîm Begê re payan tune. Iroj yek ji wan rojan e ku ew xwe evçend mesûd, bextiyar û serfiraz hîs dike. Ew ji kitêbên xwe, penûs û kaxizên xwe yên spî hez dike. Ev hemû tişt alet û hacetên wî

yên xwenasîn û zanînê ne. Ma ne ev kitêb bûn ku ew jê hîn bûbû ka ew kî ye, ka bav û kalên wî Med, Kardûk, û Kurd kî ne? Belê, kitêb bûn ku alîkarî lê kiribûn. Ew ji kitêban hîn bûbû ku merivahî, dilovanî, welatparêzî û welatevînî bi ser her tiştî re ye. Ew ji kitêban hîn bûbû ku ronakbîrekî sedsala 20 an divê dil û mêjiyê xwe bixe bin xizmeta welêt, millet û merivahiyê. Bi xêra kitêban e ku ew dizane ka ferqên dengê bilûrê û dengê kemançê çi ne, ferqên dastaneke kevnar û romaneke nûjen çi ne,.. (Ew hem ji dengê bilûrê û hem jî ji dengê kemançê, hem ji dastaneke kevnar û hem ji romaneke nûjen, hem ji stranên dengbêjekî û hem ji resîtalên opareteke hez dike. Lê ew bi xêra kitêb û tecruban ferqên wan jî dizane.) Ew ji kitêban hîn bûbû ku meriv, li her derê cîhanê, çi bigire eynî tiştî dijîn û hîs dikin, lê bi kincine cihê yên netewî û herêmî. Bi xêra kitêban ew têgihîştibû ku dastanên yewnanan, aztek û ankan, çîn û japonan, sorik û reşikan û yên kurdan wekhev in. U ew ji kitêban -baş- hîn bûbû ku meriv dikarin hem bibin zane, şareza, jêhatî, comerd, qedirgir û qedirgiran û ziravbihîstiyar û hem jî bibin namerd, nizm, sextekar, cahîl, durû, kirêt û dijminê merivahiyê.

Hoste û mamostayên wî niha li mala wî, li nik wî ne. Ew dê, niha, dîsan, bi hev re bijîn. «Xwediyo, çi kêfxweşiyeke mezin!..»

Lê digel kêfxweşî û bextiyariyê, siya xemgîniyê jî di odê de dixuye. Kitêbên Memduh Selîm Begê jî, wekî wî, neçar û bêgav man. Wan jî, wekî wî, dev ji welêt berdan, cîhên nas li pey xwe hîştin û ketin ber pêlên malkambax yên welatê xerîbiyê. Ew jî niha, wekî wî, bûn xerîb û bêkes. U ya herî girîng, bi hatina kitêban, benekî din ji wan benên ku peywendiyên wî bi welêt re tînin pê, şikest. Ev benên hanê roj bi roj teniktir û

kêmtir dibin. Li milekî hesret zêdetir dibe, li milekî jî benên peywendiyê kêmtir û teniktir dibin.

«Ma ev siûd, siûda kesên ku ji ber bêgaviyê derketine welatê xerîbiyê, ye?..»

Hê gelek zû ye ku Memduh Selîm Beg, niha, bersîva vê yekê bide û bibêje «erê» yan jî «na». Ji bo bersîvdanê wext, tecrubên nû, bûyerên nû divên. Mij û dûmana ku li ser riya wî ye, divê belav be û hawirdor, hinekî, zelaltir bibe...

Lê belê, niha pirsa esasî ev e; ew dê kitêbên xwe çawan li ser refan rêz bike? Li gor zimanan? Li gor nivîskaran? Li gor babetan? Li gor tîpên erebî û latînî, bi gotineke din, li gor xwendina ji aliyê rastê yan jî ji aliyê çepê? Li gor çi? Pirseke dijwar... Ji bo vê yekê jî payin û wext divê. Welê baş e ku ew kitêban ji telizan derxîne, wan paqij bike û bi awakî peregende li nik hevûdu rêz bike. Paşê jî, gava wî biryara xwe da, ew dikare wan li gor qaîdeyekê, ji nû ve, rêz bike. Niha kitêban, bi tenê, ronahî û hewa paqij divê. U wî jî wan ji nû ve dîtin...

«Hosteyên min, dostên min, zarokên min...»

6

Memduh Selîm Beg, di destan de hejmarên kovara ROJI KURD, li mal rûniştiye û difikire. Rûpelên kovarê ji niha ve zerbûyî ne. Rûpelên qedirgiran û bi xatiretijî. Di rupelan de nivîsarên nas, xwediyê nivîsar û bendan navê nas. Nivîsarên wî bi xwe. 4 Hejmar. Bi kurdî û tirkî. Bi tîpên erebî. Dewreke xweş, geş û hêvîtijî.

Ew di nav fikir û gumanan de ye. Derd û keser dor lê girtine û bi ser wî re tên. Şopên qermîçekên derd û keseran niha li ser rû û eniya wî hiltên. Çav kelgirî ne. Ew li rûpelên kovarê, li kitêban, li odê dinihêre, nefeseke

kûr digire û dide û bi dû re jî, ew bi firê dikeve û dere rojên rabirdû .

Stembol, 1912. Fîzîna baya azadî û serbestiyê. Hişyarbûna gelên bindest yên dewleta Osmanî. Dewleta Osmanî ya nexweş. Di nav fîzîna baya azadî û serbestî de kurd. Gire girên kurdan. Malbatên kurd yên herî mezin; malbata Ubeydullah Nehrî, malbata mîrê Botan Bedirxanî, malbata mîrê Kurdistana başûr, Şarezor û Sulêymaniyê, Baban. Hemûyan jî li dijî dewleta Osmanî serî hildane, bi ser neketine û ji welatê Kurdistanê hatine bidûrxistin. Hemû jî, niha, li Stembolê, di bin çavnêriya dewletê de dijîn.

Stembol. Pira navbera Ewrûpa û Asiyayê. Warê îlim, îrfan û zanînê. Xortên kurdan. Xwendevanên ji malên dewlemend. Qahwexana Ebdullah Çawişê Erxeniyî. Xeberdan û munaqeşe. «Ma kurdan jî ji awayê azadî û serbestî sûd wergirtin navê?» Ronakbîrê kurd Xelîl Xeyalî û Zanîngeha Zîra'tê ku Xelîl Xeyalî lê kar dike. Çend kurdên din; Qedrî, Ekrem û Omer Cemîlpaşazade, bajariyê Memduh Selîm Begê Fuad Temo, Cerahzade Zekiyê Diyarbekirî û Memduh Selîm Beg.

Havilê hevûdîtin, xeberdan û munaqaşan; Komela Xwendevanên Kurd HEVI. Roja damezrandinê; «HEVI, hêviya me ye.» «HEVI, hêviya pêşeroja welatê me ye...»

Bi alîkariya bijîjkekî kurd, Memed Şukrî Sekban, cîhekî ji bo komelê. Li Sirkeci'yê, li hember postaxana nû, di xaniyê Erzurimiyan de. Kêfxweşî û serbilindî. Geşbûn û pêşveçûn. Dîsan xeberdan, munaqaşe û pirs. Pirsiyarên nû. «Ma kurdan weşîn û kovar û rojname navên?..»

ROJI KURD.

Ew rojên rengîn yên weşîna ROJI KURD. Destpêka

havîna 1913 an. Doxtor, profesor, nivîskar, rojnamevan, mîr, axa, şêx, karker û xwendekarên kurdan. Dr. Abdullah Cevdet Beg. Rûyekî pak, rîhekî spî, eniyeke stûr û vekirî. Idarexana kovarê. Her du destên dr. A. Cevdet Beg tijî ne; di destekî de çend hejmarên kovara ku ew diweşîne, IÇTIHHAD û di destê din de jî nivîsarekê ji bo hejmara yekemîn ya ROJI KURD. Ew hê nû ji Ewrûpayê, ji warê xwe yê xurbetê hatiye. Kincên li serê ewrûpayî ne. Gava ew nivîsara xwe dide berpirsiyaran, ew bi dengê xwe yê gur weha dibêje; «Filhakika, her hal ve şartta Kurt munevver ve muteffekirlerinin varligini cihana gostermek mecburiyetindeyiz.» Ew bixwe kurdê Arabgirê ye, lê bi kurdî nizane. Loma ew bi tirkî dipeyive. Ew dibêje; «Rastî ev e ku em divê di her hal û şertî de nîşanî cihanê bidin ku ronakbîr, zane û alîmên kurdan jî hene.»

Nivîsara wî bi tirkî ye. Nivîsareke kin û kurt, lê pir xweş, baş lihevhatî û manetijî.

«Hem berhemên penûsê, hem berhemên fikir, li dinyayê tu eser û berhemên mezin tune ku bi alîkariya cesaret û xurtiyeke mezin nehatibe pê. Ez bi dil û can 'prensîba' hanê ji xortên kurdan re tawsiye dikim. Em di dema xwedanşexsiyetbûn û xwenasîna milletan de ne... gava neteweyekî ne xwediyê şexsiyetekî xurt be, hingê 'navê wî nayê xwendin', ji heywanekî xwedanziman pê ve, ew nikare tu tişt be. Ji bo merivan fikirîn û bîrbirin çi ye, tarîx jî ji bo neteweyan ew tişt e... Sedsala me, ne henek e, sedsala 20 an e...»

Dr. Abdullah Cevdet Beg...

U Kemal Fevzî... Dostê giranbuha. Meriv. Tîmsalê merivahiyê. Wekî stêrka Kerwankuj ronî, wekî ava Firatê zelal û xurt. Ew û Memduh Selîm Beg. Piştî nivisîn û raxistina rûpelên kovarê, bi hev re, ber bi meyxa-

nên Galatayê çûyin. Rêveçûnên destê sibê. Bi kêf û henek. Bi ken. Bi mehan li nik hev mayin. Dostî û biratiyeke zêrîn... Kemal Fewzî.

1912-13 û 1928. Dr Abdullah Cevdet û Kemal Fewzî niha li kû ne? Dr. Abdullah Cevdet li Stembolê, li mala xwe, bêdeng rûniştiye û ji derd û keseran, xwîn vedirişe. Kemal Fewzî jî li gorê, di bin axa sar û reş de dinale. U hevalên din?..

Memduh Selîm Beg, di destan de hejmarên kovara ROJI KURD, li welatê xerîbiyê, li mala xwe rûniştiye û difikire. Di nav bêdengiya hawirdor de, çend hêstir, hêdî hêdî, ji çavên wî ber bi jêr dibin û direşin ser rûpelên ROJI KURD. Rûpelên zerbûyî bi hêstirên çavên wî şil dibin.

## 7

Teq, teq, teq... Dengê derî.

Ew.

Tep, tep, tep... Dengê dilê Memduh Selîm Begê. Ew ber bi deriyê derve dilezîne. Derî vedibe. Ew, Xezalê. Siûda rind. Kê dizanibû, kê remil avêtibû û gotibû ku Xezala Memduh Selîm Begê dê, rojekê, bipengize û were ber deriyê wî?.. Ev cara yekemîn e ku Xezalê pê li sûkûna deriyê mala wî dike. Ne li gor edetan e ku keçikeke xort, bi tena serê xwe, were mala destgirtiyê xwe.

Rûyê wê yê bi ken û şermok. Gum û henarokên sor. Por bi tûleke reş girtî, beden bi çarşefeke reş pêçayî. Li der, li ser sînga kolanan govenda baranê. Derî baş vedibe û ew, bêdeng, lingê xwe yê rastê davêje mala Memduh Selîm Begê.

«De zû were hundir, tu şil bûyî.»

Çarşev û tûla reş jixwekirin. Li dor xwe nihêrîn.

Memduh Selîm Beg, destgirtiyê wê, merivekî rind û dilpak. Lê belê, ji vê yekê pê ve? Ew kî ye, di vê malê de bi tena serê xwe çi dike? Ew çi dil dike? Ew çi difikire? Çend pirsiyarên ku ew lê difikire û hênceta ku lingên wê ew aniye ber deriyê wî. Xezalê jî Memduh Selîm Begê, ji nêzîk ve nasîn divê.

«Fermo, were salonê û xwe bide ber êgir. Mixabin, mal sar e.»

Li nik dolaba hesinî, li erdê mankaleke hesinî û tê de çend lib komir ku diçirûsin. Memduh Selîm Beg radihişe du kursiyan û wan tîne ber mankalê. Ew li her du rexên mankalê, li hember hevûdu rûdinin. Di destekî Xezalê de kitêba ku Memduh Selîm Begê dabûyê, heye.

«Dinya sar e, baran jî nasekine. Lê li gor radiyoya fransizan, bi dû baranê re, hayameke xweş û germ dê were... Rast ji bav û diya te çi xeber hene?»

«Belê, berî niha bi du-sê rojan, me ji bavo û dayê nameyekê wergirt. Halê wan baş e. Hawayê Urdinê li wan hatiye... Silavên wan ji te re jî heye...»

«Bavo û dayê» çûne Urdinê. Piştî çûyina wan, du metên Xezalê hatin mala wan û ew niha li nik Xezalê dimînin heta ku «bavo û dayê» vegerin.

«Ma metên te dê li te nepirsin?»

«Ew çûne serîdana cîranan. Ew her gav li nav malan digerin.»

«Belê, belê, aha feqîrxana min jî weha ye... ev oda rûniştinê ye. Li kêleka vê odê, oda min ya razanê û li kêleka wê jî oda kitêbên min hene. U mitbaxeke hûr..»

Xezalê radibe ser piyan, hêdî hêdî, li der û dorên xwe dinihêre. Ew çi bibêje? «Mala te xweş e, kek Memduh.» Dîsan kek! Heyran, çima kek? Kincên tenik û rengîn lê ne. Di nav kincan de beden wekî birca keleha

Wanê spehî dixuye.

Çavên wê, niha, li ser lewhên dîwêr in. Çar lewhe. Dudu hinekî li jor yên din in.

«Ma hewce ye ku ez bibêjim, ev lewhe li ber dilê min pir ezîz in?.. Yek keleha Wanê ye. Warê bav û kalên min. Warê ku ez lê xwedî bûm, zarotiya min tê de bihurî. Ya din sûr û bircên Stembolê ye. Cîhê ku min xwe tê de nas kir, ez bûm peya, min xwend û dest bi xebatên xwe yên siyasî, civakî û çandî kir... Herçî ev her du lewhên din in, ev kalê rîhspî û rûbinûr Şêx Seîdê gorbehîşt e. Berî niha bi sê salan, ew li Diyarbekirê hat bidarvekirin. Ew însanekî ewliya û serek û pêşewayê serîhildana me kurdan ya herî mezin bû. Hezar heyf ku min tu carî keys nedît ku min ew binasiya... Ev sûret jî ya dostê min'ê ezîz, birayê min, dilê min, ruhê min Kemal Fewzî ye. Bi salan em bi hev re bûn. Em, bi hev re, tî û birçî man. Me, bi hev re, her celeb xweşî tahm kirin. Ew jî... ew jî, tevî Şêx Seîd, hat bidarvekirin...»

Bêdengî. Dengê hîsên bêziman. Dengê bedenan.

Xezalê, bêdeng, tê nik Memduh Selîm Begê, bi dilovanî li bîbûkên çavên wî dinihêre, her du destên wî dixe nav lepên xwe û wan radimûse.

## 8

Met li nav malan digerin, Xezalê jî li mala Memduh Selîm Begê. Bi hênceta kitabxwendinê, ew xwe dilezîne mala destgirtiyê xwe. Li mal jî, agirê mankalê hîs û dilê wê germtir dike û ew hîn bêtir nêzîkî li Memduh Selîm Begê dike.

Iroj jî dersa ew dê bixwînin, di derheqê Eugêne Ysaye de ye. Memduh Selîm Beg ji kitêba fransizî dixwîne û jê re, hê dî hêdî, dide zanîn.

«Ferîhayê, Ev Eugêne Ysaye ji wan kesan e ku di warê musîkê de şoreş çêkiriye. Ew yek ji niwênerên sedsala me, sedsala reform û şoreşan e. Tarîxa jidayikbûna wî 1858 e. Wî li Bruksel û Parîsê, li Vieux Temps'ê xwendiye û bi dû re jî koma Societê des Coucerts Ysaye aniye pê. Ew bû serokê koma kraliyetê ya musîk li Belçîkayê. Ew bi qasî 7-8 salan li Engilistan û Amerîkayê jî ma. Ew niha li Belçîkayê dijî. Tu kes wekî wî, nikare li kemancê xîne. Musîka wî, hem ji aliyê teknîkî û hem jî ji aliyê ritm, harmonî û dengan yekta ye.»

Çavên Xezalê li ser dest, lêv, simbêl û çavên Memduh Selîm Begê ne. Di nav van çend rojên dawîn de, Xezalê tiştekî têdigihê; Memduh Selîm Beg hêdî hêdî dipeyive, ew gotinên xwe pir vekirî, sade û bi rêk û pêk, li pey hev rêz dike, pir zû bîr bi tiştan dibe, pir zû hay li rewş û mercên tevlihev dibe û wekî brûskekê, zû tiştan têdigihê. Çavên wî bi ken in, lê kena li ser çav nikare derd, keser, endîşe û meraqên ku ji rû dixuyin, veşêre. Carina bala wî, ji nişkekê ve, ji merivên kêlekê bi dûr dikeve, ew pê re dere û dikeve nav xem, xeyal, fikir û gumanan.

Xezalê ji cîhê xwe radibe û tê li ber wî, li ser totikan, rûdine, destên wî digire û radimûse.

Nêrîna Memduh Selîm Begê. Xezalê. Çavên xweşik, kena çardehê heyvê, diranên lûlû, lêvên gul li ser bişkivî. Heyineke hûrik, tenik, xweşik û ziravik. Destên Memduh Selîm Begê li ser porê wê ne. Porê wê yê nerm û germ wekî herîr. Dest hêdî hêdî guliyên por vedikin. Ronahî li ser por pêl dide. Porekî nedîtî.

Deng tune. Her du jî ditirsin. Ew welê bawer in ku eger ew devê xwe vekin, ev awayê rengîn û bi sihêr dê winda bibe.

Memduh Selîm Beg bi dest nîşan dide ku ew rabe pê

û li dor xwe bizivire. Hêdî hêdî. Li dor xwe. Li dor êgir. Li dor serfirazî û evînê. Li dor Memduh Selîm Begê. Por difire. Por diçirûse. Por û beden Memduh Selîm Begê sermest dike.

Ew jî radibe pê, çend gav ji mankalê bi dûr dikeve, pişta xwe dide dîwarê sar û li kevoka bêbask dinihêre. Agir û por diçirûsin. Dilê Memduh Selîm Begê û por difirin. Porê zêrîn li gor rîtmên musîka bêdengiyê govend girtiye.

Piştî demeke dirêj, Memduh Selîm Beg xwe dilivîne, ber bi wê dere, wê dide sekinandin û bêdeng, ji porê wê avdayeke dirêj dikişîne. Avdayeke dirêj, zer, zêrîn. Ew avda radimûse û paşê jî datîne ser masê û li Xezalê vedigere. Çav. Ramûsanekê. Ramûsaneke din. Çav. Mûjang. Dûvkaniya çav. Serkaniya çav. Çermikên çav. Bîrkok. Birû... Çavê din. Ramûsaneke din. Enî. Por. Rû. Bêvil. Poz. Ramûsan. Her du hinarik. Gep. Guh. Guhîjk, nermika guh. Ramûsan, ramûsan.

Lêv; du libên tiriya Sorê Mîranî... Serlêv.

Dest pihêt bedena wê hembêz dike. Dest li ser bişkovên fîstana wê. Dest bişkov, yek bi yek, vedikin. Dest wê dizivirîne. Pişta wê. Wekî pişta masiyekê. Bîhn, bîhna misk û emberê. Bişkov vedibin. Dest alîkarî lê dikin ku ew fîstên ji xwe bike. Pî radibin. Fîstan hêdî hêdî jê dibe û dikeve erdê. Kirasê tûlîn û şefaf. Di nav kirasê zelal de bedeneke bedew û gewher. Di nav kirasê de melayika xweşiyê. Dest radihîşin kirasê û wê jî jê dike. Gewda, bedena nerm, spehî û tahzî diricife. Mûyên zerik yên bedenê tîj bûne. Bedena wê diheze, dilerize.

Bedena wê. Wekî behîfekê. Spî, tenik û nerm.

Binçeng û berzik. Daristanên veşartî, rengîn, bi sir û

sihêr. Memduh Selîm Beg wê û sir û sihêrên bedena wê dinase. Ew nêzîkî li dinya sir û sihêran dike. Ew jî dest û lêvên Memduh Selîm Begê dinase. Dest porê zer mist dide. Por wekî lehiyeke boş û zêrîn di nav destan de diherike. «Porê zêrîn, bedena zêrîn, keça zêrîn.» Lêvên wê yên sor, stûr û goştîn. Kena li ser bîbûkên çavan, lêv û diranan. Govenda kenê. Govenda kêfxweşiyê.

Stûyê wê. Lêvên Memduh Selîm Begê yên germ ber bi stû dibin. Ew wekî kewroşkekê, na, na, wekî xezalekê diperpite. Ew ber bi Memduh Selîm Begê dizivire. Ew lêvên xwe dibe bin gewriya wî û wekî bimêje, gewriya wî radimûse. Şewat. Şewat bi dilê Memduh Selîm Begê dikeve. Niha Memduh Selîm Beg diperpite, di nav pizotên êgir de dişewite, wekî pelekî rengîn yê payizê, li ser pêlên avê ber bi jor dibe, bi firê dikeve û dere û dere û dere...

Ax Xezalê... Ax tu, Xezala ber dilê Memduh Selîm Begê...

9

Memduh Selîm Beg di çola kiraç ya welatê xerîbiyê de ji xwe re daldayekê, siyekê peyda kiriye; siya evînê. Çaxa derd û kul lê leylan didin, germî û qije-qija mesele û zehmetiyan bi ser wî re tên, ew xwe davêje bin siya evînê. Ew dil û ruhê xwe dide bin hûnikahiya siya evînê.

Siya evînê. Warê rehetî, dilxweşî û bextiyariyê. Warê lîstikên xweş û sirrî. Warê dengê dil û bedenan. Di nav çeperên berberî, dijîtî û dijminahiyan de kozika herî metîn.

Memduh Selîm Beg serê xwe datîne bin siya evînê...

Xezalê jî serê xwe datîne ser coga wî. Roj li pey hev

diherikin. Met li nav malan, Xezalê jî li mala Memduh Selîm Begê. «Bavo û dayê» dê di nav çend rojan de vegerin. «Em binihêrin ka çi dibe, Xwedê mezin e...»

Dest li ser por digerin. Peyvên xweş û nerm. Dinyake ji çîrok û dastanan. Bergeheke ji xewnan.

«Tu dizanî, gava min tu dîtî, çi hate bîra min?.. Binevşa Narîn û stranâ Binevşa Narînê. Ez nizanim çima, lê ew hat bîra min... Hezar heyf... kurdiya min, yanê zimanê min'ê zikmakî ewçend ne xurt e. Zimanê min'ê xwendin û nivisînê tirkî ye. Lê digel vê yekê, ez hê jî bi çend stran û dastanên kurdî dizanim. Dapîra min ew fêrî min kiribûn. Yek ji wan jî 'Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê' bû...»

Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê... Dastanên ku Memduh Selîm Beg pê dizane. Çend ji dastanên kurdan yên evînî. Dastanên bi nav û deng. Dastanên devê dengbêj û bilûrvanan. Dastanên evîna merivê kurd, evîna dilsoj û bextreş. Dastanên dilên pak, lê şikestî, bedenên ciwan û bedew, lê bêmiraz...

Dastanên carina bi mirad, carina bêmirad, carina mesûd û bextiyar, carina jî bi mirin û kuştin.

Peyvên dilsoj yên dastanan...

«Ferîha, hele guhdarî li van peyvên hanê bike.»

«Binevşê ban dikir, digo 'Şivano, serê bi qurbano, emrê mi bi heyrano, dilê min, dilekî dibê ye çeqeyse galgal û gotinê te ji min re gotin, xeberê te timam min efû kirin, min avêtin binê qonderê ye.' Binevşê go 'Şivano, madam tuê li cim Cembeliyê Hekkarê nîvan bû, tu werî ji min re basa Cembeliyê Hekkarê bike, ji min re çêtir î ji mal û mulkê dinyê ye, hesretî xirab e, bela bi min re nerî diyarê rehmetê axê gorê ye; derdê Cembeliyê Hekkarê li min ketiye, ez ne dimirim û ne dimî-

nim pê ye...»

Memduh Selîm Beg, tiliyên destê rastê di nav porê Xezalê de, hêdî hêdî dilorîne. Bi kurdî. (Ew dê, paşê, jê re, bi tirkî, şerh bike.) Ew, hêdî hêdî, daxwazên dilên bi evînê şewitî tîne zimên. Ew, hêdî hêdî, bi stranê re, dere dinya abadîn ya evînên bêhempa.

Xezalê jî, serê wê li ser coga Memduh Selîm Begê, di xew re dere.

## 10

Teq, tuq; teq, tuq...

«Lê binihêrin, lê binihêrin... ew dîsan dere...»

«Bi kû de, ber bi kû?»

«Wîî li min, ma hûn nizanin? Kulîlkên spî yên darên behîfan û kulîlkên rengîn yên darên henaran bişkovîn. Teyrên terlan xebera bihara hêşîn anîn. Giya, stirîh, zîl û darên bexçê bajêr, dîsan, serî hildan. Hişinahî bi bexçê ket. Tîrêjên tavê guhezîn bexçê. Ma hûn nizanin ku ew ber bi bexçê, ber bi parqê dere?»

«Mala minê... çi peya ye!»

«Peyayê dilnerm û dilovan...»

«Peyayê dilbirîn û dilşewat.»

«Dibêjin, derdên wî pir in.»

«Binihêrin, binihêrin... hûn dibînin, ew çawan bi rê ve dere... Derd û keseran stûyê wî xwar kiriye. Fikir û gumanan perdeke reş kişandiye ber çavên wî.»

«Ferîha reben bi agirê evînê disote.»

«Gula zer, roj bi roj, diçelmise, lê çavên wî vê yekê nabîne.»

«Guhên wî nalînên Ferîha'yê seh nakin.»

«Ev mêrê delal, ev peyayê bejnzirav çima wê mahr nake?»

«Em jî pê nizanin, diya min, em jî. Xwezî me bizanibûya!»

«Ev merê rûken û porşehkirî li benda çi ye? Ew çi dipê?»

«Ma ew nabihîse ku mêr bi navê Ferîha'yê dikevin xew? Ma ew nabîne ku lêvên simbêltijî bi navê wê dilivin?»

«Gelo ew nabîne ku deriyê mala bavê Ferîha'yê nayê girtin? Mêvanekê dere û mêvaneke nû tê. Xelk tên û wê dixwazin.»

«Lê, lê Ferîha'yê, bedewê, stûna mala bavê xwe, mala çerkezanê.

Lê, lê xwişkê, zarşêrînê, pordirêjê, ezîza ber dilê Memduh Selîm Begê...»

«Lê binihêrin, heyran lê binihêrin, çawan ew bi ûsil û bi edeb dimeşe...»

«Belê diya min, belê... ew xweş dimeşe. Lê ez'ê çi bikim bi meşa vala?..»

«Şeytan pê dilîze, diya min, şeytan...»

«Hele lê binihêrin, hele Xwedê dihebînî lê binhêrin.»

Teq, tuq; teq, tuq...

Wekî dengê saeteke dîwêr. Ewçend xweş, ewçend bi rêk û pêk. Tav hawirdor vedigire. Dinya û tebîet vedije. Jin û keç, li pey derî û penceran, li Memduh Selîm Begê dinihêrin û dipeyivin. Wî jî tava germ daye ber xwe, dimeşe û kolanên Antaqiyayê dihejîne.

## 11

Du pismam. Du dost û heval. Du hogirên qederê. Du peyayên rûgulover, simbêlbadayî. U siûdeke wekhev; zaroktiyeke di nav şîr û şekir de, qesr û koşkên bajarê qedîm Diyarbekirê, malbateke stûr û xwedantov, dewlemediyeke bêpîvan, tovên kurdayetiyê. Li xwe vege-

rîn. Xwenasîn. Heysiyet û şerefa kurdbûnê, pesna welatê Kurdistanê.

Xortî û Stembol. Dîsan her du bi hev re. Salên xwendinê. Fakulta Zîr'atê. Qahwexanên kurdan. Kombûn û civîn. Komela Xwendevanên Kurd HEVI. Her du bi hev re. Çend kurdên din û Memduh Selîm Beg. «Em di babilîska milletperweriyê de dijîn. Iro her kes li xwe vedigere û dil dike ku ji dewleta Osmanî veqete û dewleta xwe ya mîllî bîne pê... Çima em dê jî weha nefikirin? Ma kevir û kûçên Xwedê li ser serê me barîne? Em jî divê wekî xelkên din bifikirin.»

1913. Ber bi Awrûpayê rêwîtî. Lozan. Avenue Lumen de Pansion Solieye. Dîsan her du bi hev re. Xwendin. Fikir û bîr û baweriyên ewrûpî. Hînbûn. Şarezayî. Di welatê rojava de du kurd. «Hûn kî ne, çi ne? We çi ziman heye? We çi stran, dastan, kinc, edet, xwarin û vexwarin hene?..»

Pirsiyarên ewrûpayiyan.

Şerê cîhanê. Rojên xwînî. Çelqîna dinyê. Dinya di hêlekana xwînê de. Stembol. Dîsan her du bi hev re. Di refên ordiya Osmaniyan de şerkirin. «Piştî vî herbê dê bûyerên pir girîng yên siyasî werin pê. Me kurdan hazirî divê...»

Heyhat...

1923, damezrandina Komara Turkiyê. 1925, serîhildana kurdan. Pêşewa Şêx Seîdê Pîranî. Biserneketin, şikestin. Yan jî biserketina tirkan. Girtîxana Diyarbekirê. Dîsan her du pismam bi hev re. U rêberên kurdan. Siya sêdaran. Nefesa Ruhistîn li ser stû. Loriya zarokan. Hawara jinan.

Mixabin...

Bidarvebûna pêşewayên kurdan. Şêx Seîdê kal û rîhspî û hevalên wî. Yek bi yek.

Para pismaman; ji bin sêdarê, bi şûn de, ber bi girtîxanê vegerîn. Ceza. Salên ku li zîndanan buhirin.

U niha jî binê xetê, yanê Sûriye. Dîsan her du bi hev re.

Du jiyan û siûdeke wekhev. Di nav çend rêzan de salixdana siûdeke kerserkûr û malkambax. Ew, du pismam; Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa... Wan, bi hev re, pişta xwe dan agir û tofanê û berê xwe dan bawerî û hêviyê. Ew hatin Sûriyê.

Destpêka Nîsanê, 1929. Antaqiye. Mala Memduh Selîm Begê. Ew û du pismam. Ew hatine serîdana Memduh Selîm Begê.

Hevalên kevn, hevaltiyeke germ.

«Ax mîrên min, ax... Ev bûn çend sal, ev bûn çend sal ku me hevûdu nediye? Hûn bi xêr û xweşî hatin... bi xêr û xweşî.»

Ew dikenin. Jixwe, Qedrî Beg, her gav, bi dengekî bilind dikene, henek dike. Ew di tiştê herî cîddî de jî şopên henek û kenê hiltîne. Ew tiştên balkêş bi zimanekî xweşik û kêftijî tîne zimên û hawayekî tenik yê kêfxweşiyê direşîne ser civêt. Merivekî niktezan û niktebêj.

Memduh Selîm Begê carina pirûz û carina jî rûbiken, li Stembolê, dil dikir ku wî jî wekî Qedrî Begê bikaribûya henek bikirina, niktan li pey hev rêz bikirina... Lê mixabin, ew nizane xweş bike. Ew nizane, bi alîkariya henek û qirfan, mij û dûmanên endîşe, xem û keseran ji xwe bi dûr xîne, ew awayê malkambax yê cîddîyetê, bi henek, dîlan û stranan, bixeniqîne...

Carina Memduh Selîm Beg dil dike, pir dil dike ku ew bibe qeşmerekî rengîn û fetbaz û şênî lê bicivin û wan bide kenandin.

Qedrî Beg, mîrê min... tu qet neguheriye. Ken dîsan

li ser rû û çavên te ye. Tu dîsan kêf û henek diçinî dora xwe.»

«Na birayê hêja, na. Pir tişt qewimîn., pir tişt hatin serê me. Aha ev du însan, xwediyên van lewheyên ku li ser dîwarê te ne, însanên qedirgiran Şêx Seîd û Kemal Fewzî û hevalên din li ber çavên me hatin bidarvekirin... Hukimeta tirkan agir berda welêt. Memduh Beg, welat dişewite û em jî pê re...»

«Hele bîhna xwe bigirin, westa xwe bigirin, mîrên min. Em dê, hêdî hêdî, van tiştan, digel her kit-kitê, bipeyivin.»

12

«Memduh Beg, ew rojên eskerî yên Erzurimê tên bîra te? Tu bibûyî zabîtekî jêhatî. Lê pantol û qapûtê te yên zivistanê ewçend stûr bûn ku tu di nav de winda dibûyî. Ew ji erdê re diçûn...»

Rojên şerên cîhanê yê dijwar. Di eniya Rohhelat ya Osmaniyan de li dijî ordiya Qeysarê Rûs şerkirin. Du seresker; Memduh Selîm û Qedrî Cemîlpaşa. Sar, serma û pûka Erzurimê. Bereqe û konên eskerî.

«Memduh Beg, ew şeva ku me di di qerergehê de votka rûsî vexwar... Naxwe tê bîra te?.. Me ew votka delal, bi dizî, ji dijminên xwe, ji eskerên rûsan kirîbû. Cewdikên me tijî votka bûn. Wekî niha tê bîra min, bi temamî deh cewdik tijî votka bûn. Di dewsa avê de, cewdik bi votkayê tijî bûbûn. Heta destê sibê, me votka bi ser serê xwe re kir û me zik li xwe kirin def. Me ewçend vexwar ku em ji xwe bihurîn... Baş e, paşê me çi kir, heee... Memduh Beg, me çi kir?»

Haaa, hooo, haaa, hooo... Işev best li Memduh Selîm Begê rabûye. Kena wî -dîsan- bêpîvan e. Ew ji kena, nikare bipeyive.

«Tu dizanî birayê Ekrem, paşê jî ez û Memduh Beg, bi hev re, çûn mitbaxa qerergahê. Bi dizî. Me hinekî xwarin diviya. Memduh Beg, îcar ne bi tenê pantol û qapûtê te, tu bi xwe jî ji erdê re diçûyî... Axir, em bi hezar zehmetî gihîştin mitbaxê. Lê me nizanibû ka xwarin li kû ne. Nobedarên mitbaxê jî nedixuyan. Kê dizanibû wan li kû vedixwarin! Memduh Beg, te bawer dikir ku di dolabên herî jor yên mitbaxê de xwarin, fekî û sebize hebûn. Bejna me nedigihîşt dolaban. Ez nizanim te ji kû dît, lê ji nişkekê ve, te nêrdîwanekê peyda kir, te ew danî ber dîwêr û hilkişiyayî ser da ku xwe bigihînî dolaban. Heta pêpinga paşîn her tişt baş bû. Tu wekî pilingekî hilkişiyayî ser nêrdîwanê. Lê çi bû, di pêpinga paşîn de bû... koşeke qapûtê te ket bin lingê te û tu şemitî û li xwe qelibiyî... U şinginî û reqîn bi firaqan û mitbaxê ket...»

Hahaha, hohoho...

Memduh Selîm Beg û du pismam. Ew li mala Memduh Selîm Begê rûniştine û di bin ronahiya qels ya çirê de qesta felegê û rojên kevn dikin. Memduh Selîm Beg bi destên xwe sofre bi dar xistiye. Eynî wekî sifreyên wan yên kevn yên rojên Stembolê. Tevî xwarinên têvel, araqa spî, cacix, selete, sebze, fekî, tebûleyê Antaqiyayê. U dûmana cixarê. U ken û henek. U germiya hevaltiyeke qenc, metîn û dilovan.

«Mîrên min, me bihîstibû ku we dil hebû, hûn dakevin bin xetê. Di çend rojên pêşîn yên meha yekemîn ya îsal de, ez li Helebê, li nik hevalan bûm. We bi navê Rifat efendî zilamekî şandibû. Min ew li Helebê dît. Wî behsa we kir...»

«Em bêgav man, Memduh Beg... Me hew îmkan hebû ku em bimana. Em dê bihatina kuştin... Hukimeta

Turkiyê, pir bi zanîn, rê nade ku munewerên kurdan di nav xelkê xwe de bijîn. Ew muneweran dikujin, yan jî ji welêt bi dûr dixînin. Ew welat dikin kavil û wêran.»

«Lê belê, mîrên min... hê jî her tişt xelas nebûye. Çirûska hêvî, serîhildan û biserketinê, ji nû ve, hatiye pêxistin. Li gor xeberên ku ji me re tên, xelk hêvî bi Xoybûnê û serîhildana çiyayê Agiriyê heye...»

«Ax birayê hêja ax, jixwe em jî ji bo vê yekê hatin Sûriyê. Me şer divê, Memduh Beg, me çekhilgirtin û liberxwedan divê...Agirî, yanê hêvî divê hilneweşe...»

13

Stembol. Memduh Selîm Beg û Xezalê. Ew kincên ku hevalên wî dabûn, li ser wan. Piyê Xezalê yê rastê di nav piyê Memduh Selîm Begê yê çepê de. Porê şehkirî yê Memduh Selîm Begê dibiriqe. Zîncîra zîvîn ya saeta wî ya zîvîn ji bêrîka êlegê dixuye. Xezalê, çavên kîlkirî dibiriqin. Porê rengîn li ser stû pêl dide. Mesûd û kêfxweş.

Stembol. Ew vegeriyane Stembolê. Welatê xerîbiyê li pey wan maye. Her du evîndar di piyên hevûdu de, li bajêr digerin.

«Guh bidêrin niqtê aşiqan
Da ez bixwînim vê xetê
Hemd û senaya Xaliqê
Sibhan ji Şahê Qudretê»

«Ferîha, ev rêz yên Feqehê Teyran in. Gava mezinên me dest bi tiştên xweş dikirin rêzên weha dixwendin..»

Ji kêfa wan re payan tune. Li Stembolê ger û meş... Ma kê bawer dikir ku ew dê bikaribûna vegeriyana?.. Ji erdê bîhna biharê radibe. Bahara Stembolê. Vegera bihuştê. Hilavêtina dilên evîndaran. Vebûna deriyê dilan. U vebûna deriyên kevnare yên avahî, keleh û bir-

cên Stembolê.

Memduh Selîm Beg, niha, qewlekî xwe yê kevn bi cîh tîne. Ew deriyên kevnare yên Stembolê, yek bi yek, nîşanî Xezalê dide.

«Deriyên sûr û bircên Stembolê pir in. Tu dizanî, sê aliyên Stembolê av e. Di van aliyan de derî ne zêde ne. Xwediyên Konstantinopolîsê, yanê Stembolê, hewce nedîtine van aliyan bi derî bineqişînin. Lê aliyê bejiyê ne weha ye. Ji vî aliyê re derî û sûrên metîn diviyan da ku bajêr bikaribûya xwe biparasta... Di çaxa Bîzansiyan de derî, her gav vekirî nebûn. Evarê derî dihatin girtin. U meriv bi çire û qandîlan li bajêr digeriyan... Galata, warê min jî, jixwe, bi sûran dorgirtî, bi serê xwe bajarekî biçûk bû... Axir, li gor ku ez ji kitêban hîn bûme, deriyên Stembolê di navbera 40 û 45 an de ne.»

Tarîx. Deriyên tarîxî. Stembola do, Stembola kevnare. Memduh Selîm Beg û Xezalê. Kevirên spî, stûnên reş. Neqşên têkel. Tîpên romiya kevn; şahîdên tarîxeke xwînrêj.

«Kek Memduh, te bawer dikir ku em dê weha li van deran bigeriyana?..»

Kê bawer dikir?

Deriyê Silîvrî. Deriyê herî xweş û şêrîn. Deriyê derve û hundir. Tê de avahiyeke xweş û biçûk. Neqş, sûret û tîp. Pi tîpên romiya kevn «Peges.» Yanê navê derî, bi bîzansî. Yanê bi bîzansî masî. Li nik derî dêreke kevn û goristaneke hêşîn. Tê de gorên patrîkên bîzansî.

«Ez ji vî cîhê hez dikim, pir caran hatime vê derê. Gava bîhn li min diçikiya, derd li min dihatin xezebê, hingê min xwe davêt vê derê û di goristanê de digeriyam. Ez nizanim çima, lê ez ji goristan û bêdengiya wan hez dikim... Çîrokeke vê derê jî heye; di wan roj-

ên ku tirkan êrîş anîne ser Konstantînopolîsê de, keşîşekî li vêderê, li ser êgir, masî sotandine. Gava keşîş bihîstiye ku tirkan bajar vegirtiye, masî vejiyane û xwe avêtine nav avê. Bîzansî û romiyên kevn dibêjin masiyan ji qahran welê kirine û tirk jî dibêjin ji kêfan.»

Xêreke din ya kitêban; Memduh Selîm Beg bû şahîdekî yekta yê tarîx û guherînên tarîxê û wî tûrika xwe ya zanînê bi çîrokên weha tijî kir.

Piyê Xezalê di piyê wî de û serê wê jî li ser milê wî. Tevî serê wê, du kevokên spî wekî berfê jî hatine û li ser her du milên wî veniştine. Ew, hêdî hêdî, dimeşin. Giyayên hêşîn yên ber lingên wan rê didin wan. Tava germ, giyayê hêşîn, derî û goristanên kevnare, azadî û serbestî, Xezalê û kevokên evînê.

Xewnek ji xewnan.

Lê belê... ji nişkekê ve ji koşeyên goristanê polîs û eskerên tirk dixuyin. Bazên xwînî, dijminên kevokan. Şeytanên devbigirêz. Di destên wan de demançe û tifing. «Na, na, weha nabe!..» Ew ber bi Memduh Selîm Begê û Xezalê tên. Dest, pî û dev dilezin.

«Nihayet seni yakaladik!..»

Yanê, di dawiya dawîn de me tu girtî!..

Dinya li ber Memduh Selîm Begê reş dibe. Tav dibe hûtekî xwînxwar. Giya dibin marê reş û kor. Qebrên goristanê dibin hirçên reş. Deriyê spehî dibe teyrê terlan. Ji avahiya hundir jî şêr diorin. Her tişt li wan tê xezebê. Her tişt bi ser wan re tê.

«Ferîha zû, Ferîha baz de!»

Ew direvin. Li pey wan erîn, gurîn, feşîn, gujîn, hîrîn, kufîn, kûrîn, qîjîn, qîrîn... û wîzîna berik û gulan. Ji nişkekê ve Xezalê radiweste. Xezalê dukile. Xezalê hildiweşe û dikeve erdê. «Na, na,..»

Na...na...na...

Memduh Selîm Beg vedicinîqe. Ew, bi qîrîn, hişyar dibe. Oda tarî. Textê wî yê fireh. Kirasê wî yê şevê lê. Şil. Anteqiye. Ne Stembol. Mala wî. Ne deriyê Silîvrî.

Yanê dîsan xewn. Xewneke ji xewnên şevên tenê yên bajarê biçûk.

Xewneke ji xewnên malkambax.

14

Civîn. Li Helebê. Di odeke stûr ya Hotel Central de. Serokatiya Xoybûnê. Celadet Bedirxan, Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa, Memduh Selîm û yên din... Rojên giran. Rojên ji bûyerên nû re avis. Rojên biryarên nû, gavên nû.

Biserketin û biserneketin. Serfirazî û têkçûn. Zafer û şikestin. Dîlan û nalîn. Bihuşt û dûjen. Du aliyên rûpela qederê... Kîjan aî?

U ji bo aliyê dîlan, govend û stranan çi divên?

Rojeva civînê; Agirî. Rojeva welatê Kurdistan û merivên kurd; şoreşa li ser çiyayê Agirî. Rojeva hilavêtina dilan; çirûskên hêviyê yên Agirî. Yanê rojeva biryardana li ser aliyekî ji aliyên rûpela qederê; Agirî.

«Ev bûn çar sal ku alaya azadiya kurdan li spêdên Agiriyê hildibe... Şerwanên kurd xwe li dora Agiriyê digirin. Navçeyên Erzurim, Beyazid, Wan, Mûş û Bêdlîsê bi dengê şoreşê hesiyane...»

Hilbûna alaya kurdan, şerwanên kurd, pêşveçûna şoreşê... lê belê, li milê din jî bêgavî û neçariyên mezin. Nebûna îmkanên aborî. «Carina di bêrîka me de pere tune ku em pê ji Helebê herin Beyrûdê.» Zext û zorên fransizan. «Bernadin bavo, fransiz bernadin, em gav bavêjin. Em diçin kû, ew li pey me ne, tên li me dipirsin, rê li me digirin.» Dîplomasiya dewleta Turkiyê û peywendiyên wê bi dewletên Iran, Yekitiya Sowyetî û

Fransê re.

«Em dê niha çi bikin, çi divên?»

Hevalên Memduh Selîm Begê. Ewana, jiyana wan û welat. Jiyan û welat bi hev re bûne yek. Her tişt ji bo welat. Her celeb daxwaz winda bûye. Bi tenê welat, daxwaza welêt. Di welatê xerîbiyê de, ew bi agirê welêt disotin. Wekî din tu rê jî li ber wan nemaye. Ew divê di riya ku wan daye ber xwe de, her bimeşin. Digel her celeb zehmetî û neçariyê...

«Begên min, em divê, berî her tiştî, li ser hin tiştan biryar bigirin... Mesela yekemîn Yaşar Xanim e. Jina Ihsan Nûrî. Ew niha li vir, li Helebê ye. Hûn dizanin, ew li Turkiyê, di destê tirkan de bû. Lê piştî ku Ihsan Nûrî zor da wan, ew jî bêgav man ku Yaşar Xanimê berdin. Em divê wê, niha, bişînin nik mêrê wê, yanê bişînin Agiriyê.

Mesela duwemîn jî cîhê Partiyê ye. Hevalno, Beyrûd dûr e. Yanê ji welêt dûr e. Cîh û serokatiya Partiyê divê nêzîkê welêt be... Qedrî û Ekrem Beg hatine û li Hesiçeyê bi cîh bûne. Hesiçe li ser tixûb e. Ma ne çêtir e ku em serokatiya Partiyê jî bibin Hesiçê?

Mesela sêyemîn xire-cira fransizan e. Ew dil nakin ku em weha her gav werin Helebê. Gilî li me dibin. Eger weha bi serbestî, em herin û werin, ew dê rê li me bigirin. Em divê jê re çareyekê bibînin.

U meseleyeke din jî ev e ku Ihsan Nûrî Paşa dawe li me kiriye ku em ji serokatiyê hevalekî bişînin Agiriyê. Ji bo kar û barên siyasî. Welê dixuye ku ew, bêtir, bi karên eskerî û rêkxistinî bilî dibe û wan, wî û hevalên wî wext tune ku karên siyasî, bi awakî xweş, bimeşînin. Em divê ji nav xwe hevalekî bişînin nik serokatiya tevgerê...»

Agirî û Ihsan Nûrî... Her du bi hev re, gav bi gav, nê-

zîkî li Memduh Selîm Begê, jiyan û siûda wî dikin. Wî şoreşeke weha dil dikir û ji bo şoreşeke weha dixebitî. Lê şoreş û çirûskên şoreşê jê bi dûr bûn. Niha, germiya çirûskên şoreşê xwe digihînin wî jî. Şoreşa ku li dûr bû, niha, her ku dere, nêzîkî li wî jî dike.

Hevalên wî li ser meselan dipeyivin. Ew jî difikire. Li ser siûda xwe û siûda welatê xwe. Eger ew ne kurd bûya, siûda wî dê, dîsan, weha bûya? Siûda fransizekî, erebekî, tirkekî, îngilizekî çawan e? Ferq di navbera siûda kurdekî û siûda merivekî din de çi ne? U tiştê herî girîng, ew dil dike ku bibe xwediyê siûda fransizekî?

«Memduh Beg, tu çi dibêjî?»

«Çi?»

«Bila kî ji me here Agiriyê, îmkanên kê hene?»

«Mîrên min, hûn li ser biryar bidin. Ya muhîm, çûyina hevalekî ye. Bila hevalekî, heta eger hewce be, çend heval herin. Eger kesekî din nikaribe, ez bi kêfxweşî derim... Em divê daxwazên şerwanên Agiriyê bi cîh bînin. Ew li wê derê şer dikin. Eger mirin jî li ser rê be, em dîsan, divê piştgirtî li wan bikin...»

Agirî; navenda jiyanê, daxwazên dilsoz, best, siûd û mirin.

## 15

Piştî rêwîtî û civîna Helebê, dîsan Antaqiye. Şeveke vekirî ya Antaqiyayê. Kolanên vala, kahwexanên tijî. Li ser kolanan teq û reqa hesp û faytonan.

Memduh Selîm Begê westiyayî li ser rê ye. Ber bi mala xwe. Bîhntengî. Bîhntengiyeke bêtarîf. Macîrî, xerîbî, bêgavî, bêkesî, bêhêzî, neçarî, jiyana tevlihev, nezanî û belengaziya xelkê kurd, jihevketin, kirdeyên tirkan û di ser de jî rênedan û zehmetiyên fransizan. «Ev halê me'ê çi bibe?»

Mala Memduh Selîm Begê û mala «xwezûranên» wî. Çend tax ji hevûdu bi dûr. Sibê, piştî kar, ew divê here mala wan. Ev bûn çend roj ku wan hevûdu nedîtine. Dostê wî, monsieur simbêl, jî êdî kal dibe. Ew jî bêhêvî ketiye. Çerkezan jî dixwestin tiştine li dijî Mustafa Kemal û rejîma nû ya Turkiyê bikirina. Lê nebû. Bêgavî, neçarî, bêpiştî û bêîmkanî ew ji hev xistin. Her bi awakî peregende, belav bû û çû derekî. Dostê Memduh Selîm Begê jî, niha, bi hêviya vegera Turkiyê dijî.

Xezalê? Ma ew bi hêviya çi dijî?

«Tu hê pê nizanî ka ew bi hêviya çi dijî?»

Memduh Selîm Beg kilîta destê xwe, bi hêdîka, dixe mifta derî û deriyê mala xwe vedike. Mala bêkes û bêjin... Lê, li aliyê hundir, li erdê, li nik derî zerfekî spî. Nameyekê. Li ser zerfê, bi tirkî, lê bi tîpên erebî «Memduh Selîm Beye...» Yanê, ji Memduh Selîm Begê re... Li ser zarfê tu pûl naxuyin. Welê dixuye ku xwediyê (yan jî xwediyên) namê ew bi destan avêtine hundir.

Ew derbasî oda hundir dibe, namê datîne ser masê û çira gazê vêdixe, misteke ronahî direşîne ser kirasê şevê. Çira di destan de, ew dere oda razanê û xwe li ser textê xwe dirêj dike. Mista ronahiyê jî li ser sandûqa nik textê wî ye. West wî dîl digire. Perda xewê bi ser wî re tê û çavên wî tên girtin.

Li Antaqiyê jî ew bi tenê ye. Ji monsieur simbêl pê ve tu kes tune ku ew bikaribe jê re dilê xwe veke. Nasên wî yên kurd, tirk, ermen û fransiz hene, lê dan û standinên wan bi mesafe ne. Jixwe ew ne merivekî welê ye ku bikaribe, bi carekê, peywendiyên germ bi me rivên dora xwe re bîne pê. Jê re wext, best û daxwaz divê.

Bi dû demeke dirêj, çend saetan re, çavên wî vedibin.

Xeweke şêrîn ya çend saetan. Şeva tarî û mista ronahiyê. Mala sar. Bi tenê. Bîhntengî. Birçî.

Mitbaxa wêran. Li ser masê çend firaqên neşuştî, du xwelîdankên tijî, şûşeyeke vala, qedeheke nîvraqîtijî. Li koşeyeke mitbaxê çend şûşeyên din. Vala. Li ser dîwaran çend ref û tê de, bi awakî peregende, firaqine. Li koşeyekê du dolab, li nik hev. Li her alî toz. Mitbaxeke bêdûzan û gemarî.

Çend lib zeytûn. Du serî penêr û pariyeke nan. U av li ser tifika gazê, ji bo çay. «Hele ez tiştekî têxim ber dilê xwe, paşê Xwedê kerîm e...»

Name... Ew ji hundir, ji oda rûniştinê namê tîne û bi hêdîka wê vedike. Bîhneke xweş. Bîhna wê! Kaxizeke spî û li serê çend rêz. Bi tirkî. Bi tîpên erebî. Destnivîsa wê! «Te çi dil heye, Xezala ber dilê min?» Destpêka namê, wekî her carî, «Memduh abi...» Yanê kek Memduh. Di nama taybetî û şexsî de jî kek Memduh. Piştî nasîna bedenan jî, dîsan, kek Memduh. Çima?

«Li min bibihure ku ez weha vê namê dinivîsim û wekî dizekî, têm û di bin deriyê te re davêjim hundir... Lê belê, herwekî tu jî dibînî, me zêde wext nabe ku em bi tenê bimînin û bi hev re bipeyivin. Ez dil dikim, pir û pir dil dikim ku bi te re rûnim û bi saetan, bi rojan bipeyivim. Lê nabe...

Sevgili abîm,

Tiştê ku min eciz dike û ji ber vê yekê jî ez te eciz dikim, ev e; pir kes tên mala me û min dixwazin... U kesên tên pir dipeyivin û pir tişt dibêjin. Ez pir pê diêşim... Bavo zêde guh nade hatin û çûyina xelkê. Lê dayê ne welê ye. Ew li gotinan guhdarî dike... na, ez çawan bibêjim?.. Ew li gotinan guhdarî nake, lê gotin tesîr lê dikin... Huzûra malê reviyaye û ez xwe di vê yekê de mesûl dibînim. Wekî ku ez bûme barekî giran li ser

milê wan. Ez çawan bikim? Tu çi difikirî?

Careke din li min bibihure ku ez te eciz dikim. Tu di xêr û xweşiyê de bimînî...»

U di bin rêzê namê de jî navê wê; Ferîha. Bi tenê Ferîha. Ne kêm, ne zêde. Li ser kaxizê spî rêzine dilsoj û hawartijî.

«Tu çi difikirî?..»

Memduh Selîm Beg çi difikire? Nan û penêr di destan de, li pê rawestiye û difikire da ku bizanibe ka ew çi difikire. Tiştên ku ew lê difikire, pir in. Yan jî ji bervajiyê, ne tu tişt in. Hem pir tişt, hem jî ne tu tişt. Lê tiştekî aşkere heye; wî heq tune ku ew xirabî li kesekî din bike. Wî heq tune ku ew Xezala dilpak eciz bike, dinya wê reş bike. Na, nabe.

Name. Nan, penêr û zeytûn. Şeva reş û misteke ronî. Careke din namê xwendin. Bîhntengî. Careke din. «Sevgili abim,..» Dengê hawarê. Daxwaza alîkariyê. «Tu çi difikirî?»

«Eger hatin û çûyin û gilî û gotin nedabûya dilê wê, wê ev name nedinivisî... na, na nedinivisî.»

Çaya germ. Hêdî hêdî. Nan û penêr. Pirûz, bêkêf, pojandî, xemxwar, xulqteng.

Ew deriyê dolabeke mitbaxê vedike û jê şûşûyeke tijî derdixe... Belê, biryar divê. Weha nabe. Biryar, rêkûpêkî û xweragirtin divê. Bîhntengî nefes lê diçikîne. Ew divê bi hinekan re bipeyive, bi hinekan bişêwire, sohbet bike. Lê kî? Bi kê re?

Şûşa araqê. Qedeh. Hinekî av. Rengguherîna araqê. Rengê berfê; spî... Di şeva sar ya Antaqiyayê de Memduh Selîm Begê bîhnteng biryar dide ku jê re, ji jiyana wî re biryar divên.

Biryarên ku pêşeroja wî ronî bike.

Belê, biryar...

## 16

Icar jî dora Memduh Selîm Begê ye. Icar jî ew hevalê xwe yê çerkez diezimîne. Li Meyxanê. Di nav tişt û bergehên ermenî de. Bi qesta rindî û xweşiyê. Bi kêfxweşî.

Tu guherînên nû naxuyin. Meyxane her wekî xwe ye; maseyên tijî, xeberdan û pîqe pîq, dûmana cixare, qelûn û nêrgilê û bilûrvan û dengê bilûra wî. Li koşê, maseyeke biçûk û li her du aliyên masê Memduh Selîm Beg û dostê wî. Xwarin li ser masê. Bê guman araq jî. Xwediyê meyxanê, dostê Memduh Selîm Begê yê ermen, bi destê xwe xwarinên wan hazir kiriye. Bi kêfxweşî û best. U li gor kitêba xwarinên ermenan; Miftah -i Tabbâhim. Yanê Mifta Çêştkeran.

«Mîrê min, xwarinên dostê min Kevork bi nav û deng in. Lê ew bi xwe, zû bi zû, li meyxanê xwarin çênake. Heta tiştekî taybetî nebe, ew ranahîje firaqên mitbaxê. Berî çend rojan min jê rîca kir ku ew ji bo îşev xwarinin çêke. Wî kerem kir ev xwarinên ser masê hazir kir. Mesela ev meze, xwarineke navdar ya ermenan e. Navê wê topik e. Ew ji nok çêdibe û jê re hostetî û wext divê. Bi kêmanî sê roj...»

Ji wê şeva ku Memduh Selîm Beg name dît, ew xwend û biryar da ku jê re biryar divên û pê ve, ew xwe çêtir hîs dike. Ew dipeyive, henekî dike, dikene, dixwe û vedixwe. Bi kêf û xweşî. Ji wê şevê û vir ve ye, wî hin biryarên din jî girtin; ew dê erebiya xwe çêtir bike û li serê bixebite, ew dê bi qasî 20 kitêbên fransizî ji Lubnanê bide anîn û ji du kovarên fransewî re bibe abone, ew dê hinekî pere deyn bike û ji xwişka xwe re bişîne, ew dê ji malê re du xalîçeyên erzan bikire, ew dê bûyerên piştî 1923 an wekî notên biçûk binivîse... û her weha...

«Mîrê min, ma wext nehat ku em daweta xwe bi dar xînin?..»

«Memduh Beg! Malava, ma tu ji min dipirsî? Em hemû li hêviya te ne.Tu divê biryar bidî.»

Kêfxweşiya li ser rûyê monsieur simbêl. Rehetî. Vebûna deriyeke xêrê. Bersîva pirs û gumanan. U bersîva stûna malê.

«Memduh Beg, tu nizanî, ez li malê, ji destê maliya me çi dikişînim. Ew dê jî niha rehet bike û pise pisa xwe bibire... Memduh Beg, daweta me divê welê be ku devê dost û dijminan vekirî bimîne...»

Belê, daweteke germ, stûr, abadîn. Pir meriv. Bi şev û roj musîk. Xwarin û vexwarin. Dîlan û govend. «Bila dengê defê bigihê tixûbê Turkiyê.» Daweteke li gor edetên kurd û çerkezan. Kincên neteweyî, şûr û xençerên zêrhêlî yên çerkezan, govend û stranên kurdan. Biratî û dostiya du xelkên bindest û belengaz. Daweteke welê ku kesên ku bi salan hevûdu nedîtine, bi hev re nepeyivîne, werin nik hev û bi hev re govend bigirin.

Lê...

Daxwaz û hîsên Memduh Selîm Begê; bêkesî û neçariya welatê xerîbiyê, bindestiya welêt, zordestiya tirkan... «Mîrê min, helbet tu çêtir dizanî, lê min dil tune ku em dîlaneke wisan mezin bi dar xînin. Em merivên feqîr û belengaz in. Me ne îmkan û ne jî pere hene. U me şîn girêdaye, welatê me di nav êgir de dişewite, em tên kuştin, xelk xwîn digirî... Ez nizanim, lê di heyameke weha de, ez bawer im, daweteke sade û bêdeng çêtir e. Lê dîsan hûn dizanin... Hûn çawan bixwazin, em'ê welê bikin...»

«Em li ser bifikirin, Memduh Beg. Ez vê xebera pîroz bigihînim maliyê û Ferîha'yê jî. Em binihêrin ka ew çi dibêjin.»

Sade, bêdeng, ji teq û reqê bi dûr, ziravî... Çend aliyên Memduh Selîm Begê nefsbiçûk. U bê guman, evîn. Ew rojên zarotiyê, ew rojên evîntijî yên Wanê, qiraxa gola Wanê. Ew û xwişka xwe. Evîn... Evîna vebûna kulîlkên behîfan. Kulîlkên spî û xweş. Mêşhingiv. Ew û xwişka xwe. Ew li ber kewarên mêşhingivan disekinin û li wan dinihêrin. Bi saetan. Di biharan de hechecik tên. Ew û xwişka xwe li hêlînên wan dinihêrin. Bi saetan. Ew ji hechecik û hêlînên wan hez dikin... Bi best û evîneke zelal û sade.

«Bila sade be mîrê min...Tu bi Ferîha û diya wê re bipeyive.»

«Baş e, Memduh Beg, em daweta xwe kengê bi dar xînin?..»

Kengê? Pirsiyareke girîng. Gaveke nû. Bi dû biryara dawetê re, biryareke nû. Dawiya biryaran nayê. Bi dû biryarekê re, yeka nû tê. Biryar li pey hev dizên.

«Ez nizanim kengê. Lê bi tenê, min dil bi tiştekî heye; ez dixwazim, bav, xwişk û xalê min jî werin dawetê. Hatina xalê min ne mesele ye. Ew li Şamê dijî, kengê be, ew dikare were. Lê ji bo bav û xwişka min ewçend ne hêsan e. Ez divê ji wan re binivîsim û ji wan bipirsim ka ew dikarin werin û kengê. Ez dê, hema, ji wan re binivîsim û xebera dawetê biguhezînim wan. Ew dê pê pir kêfxweş bibin...»

Şeveke bi ken û kêfxweşî. Digel xwarin, vexwarin û musîka ermenan, xeber û biryarên xweş.

«Memduh Beg, ji bo xebera pîroz...noş... Işev, te ez şad û mesûd kirim.. Xwedê ji te razî be.»

## 17

Piştî xeber û biryara pîroz, xebereke nû; «Memduh Beg, Agirî di nav agir de ye, were Helebê. Silav.» Tel-

grafeke biçûk. Ji hevalên wî.

Piştî telgrafeke weha çi divê? Bê guman, rêwîtî. Ber bi Heleba kevn, bajarê tarîxî.

Ew, niha, li Helebê, li nik hevalên xwe rûniştiye û bi destmalê bîvila xwe paqij dike. Di destekî de destmal, di destê din de jî telgraf.

«Ez fahm nakim, hûn çawan dikarin telgrafeke weha vekirî bişînin? Ma hûn evçend bi fransizan bawer in?.. Ez ji we re bibêjim, ew niha baş pê hesiyan ka em bi çi bilî dibin...»

Memduh Selîm Begê hêrsbûyî nexweş e jî. Wî serma girtiye. Bîvila wî tê, gewriya wî dişewite, bêhal e. Lê digel vê hindê jî, ew li Helebê ye. Erk û mesûliyet bi ser her tiştî re ne. U meraq. Çi qewimiye? Çima telgrafeke weha dilsoj?

Bi dû biryara baş re, ev telgraf û serma. Siûd. Qeşmeriya siûdê. Hema piştî wê şeva meyxanê, ew rahiştibû penûsê û ji bav û xwişka xwe re nameyeke dirêj nivisîbû û bi alîkariya fransizekî name, bi destan, şandibû Stembolê. Ew li hêviya bersîvê bû da ku roja dawetê belî bûya. Lê di dewsa bersîvê de ev telgraf hat.

«Mîrên min, mesele çi ye?»

«Memduh Beg, Ihsan Nûrî dîsan xeber şandiye. Ji aliyê eskerî halê wan baş e. Ew xwe dirêjî Wanê, Erzurimê dikin. Xelk tên û tevî wan dibin. Lê ew nikarin agirê şoreşê gurtir bikin û wê firehtir bikin. Welê dixuye ku wan kadir û îmkanên siyasî tune. Heke çend kesên din wekî Ihsan Nûrî li wê derê bin, em bawer in, rewş dê, bi temamî, biguhere. Ji ber vê yekê, em divê xwe bigihînin Agiriyê. Jixwe berê jî, me qerareke weha hebû. Lê belê, tu kes ji me nikare here. Hin ji me bêpaseport in, hin ji me jî nû hatine û di bin çav de ne. Ji bo ew hevalên ku bêpasaport in, em li Beyrûdê bi hin er-

men û fransizan re peyivîn. Heta du-sê mehan çend pasaport dê hazir bin... Memduh Beg, me dil hebû ku em ji te bipirsin ka te îmkan û daxwaz heye... ji bo du-sê mehan... heta em, çend heval, xwe digihînin Agiriyê... Tu merivdewletên Antaqiyayê baş nas dikî... heye ku ew pasaportekê bidin te û tu bikaribî xwe, ji ser Iranê, bigihînî Agiriyê...»

Agirî... û Memduh Selîm Beg. Memduh Selîm Beg li ser Agiriyê! Tiştê ku qet nedihat bîra wî. Rê û xaçeriyên siûdê. Li ser riya zewacê xaçeriyeke nû; Agirî. Ji nişkekê ve.

Ew çi bibêje?

Dîsan du deng; dengê dil û dengê mêjî. Dîsan şer. Şerekî bêhempa. Çi divê? Çawan? Kîjan rê?

«Mîrên min, ez bi kêfxweşî derim. Lê ez nizanim ka ez dê, li wan deran, bi kêr werim... Hûn jî dizanin, ez ne peyayê çiyan im...»

Berberiyeke malkambax; «ez derim...» Lê... «lê»yeke pirstijî. Bi dengekî ketî û nexweş.

«Hele em binihêrin... Ez divê bi merivdewletên Antaqiyayê re bipeyivim. Bi hênceta çûyina Awrûpê... Heta hefteyekê ez xeberekê digihînim we...»

## 18

Rêwîtî. Şeva berî rêwîtiyê.

Mala xwezûran. Her çar. Bêdengî. Awayekî zîz. Qalır. Şîva êvarê. Şeva dawîn. Dotira rojê rêwîtî.

Her kes li ber xwe dinihêre û şîva xwe dixwe. Saetên dawîn û paşê veqetîn. Bi tenê ew dizanin ku Memduh Selîm Beg dê, ji bo du mehan, ji wan veqete. Lê ew nizanin ber bi kû de. Sibê, di berbangê de, Memduh Selîm Beg dê ber bi deverine bi rê keve. Bi dû biryara zewacê re, niha, ev rêwîtî. Wekî ku sêleke xişor bi ser dil

û hinavan re wer be.

Memduh Selîm Beg nabêje ka ew dê ber bi kû here. Ew jî napirsin. Lê ew bîr lê dibin. Ma weha ji nişkekê ve, Memduh Selîm Beg dikare ber bi kû here? Ma çi dikare evçend girîng be ku ew ji ber deriyê zewacê bi şûn de vegere û dest bi rêwîtiyeke dirêj bike?

«Hûn haziriyên dawetê bikin... piştî du mehan, ez li vir im. Hingê em dê daweta xwe, bi kêf û xweşî, çêkin.»

Kes nakene. Kes nabêje belê. Deng ji kesî dernakeve. Bi tenê, ew li wî dinihêrin. Bi çavên keserkûr û meraqtijî. Wekî ku şîn ketibe dewsa dawetê.

Ew çi bike? Ew dest bi qîrîn û zarîneke dilsoj bike?.. Na, nabe. Şerm e. Ne li gor edetan e. Şîva germ û tîkeyên biçûk yên goştê ji gewriya nesax dadiqultin. Agir bi gewriyê, bi dil û kezeb ketiye. Dil dibihure.

Ew. Xezalê. Çavên kentijî niha nakenin. Carina çav bi nêrîneke dilsoj û kelgirî li Memduh Selîm Begê dinihêrin. Çav jê dipirsin; tu çi dikî? Çima tu min li van deran dihêlî? Te hay ji xwe heye?

Ka ew çavên germ? Ew rojên li mala Memduh Selîm Begê, yekitiya beden û çavan, çavên germ û ronî û niha jî ev çav... Fer di çavan de nemaye. Bîbûkên xweşik yên çavan di bin bîrkok, mêjang û mijgulan de dilîzîn. Lê giran, giran. Westiyayî. Li ser bîbûkan ew xweşî û rindiya her gavî dixuyin. Lê perda xemgîniyê jî...«Rebenê... rebenê!..» Ev çav, ev hinarok, ev lêv, bi kurtebirî, ev rû di bin ronahiya çirê de wekî rûyê melayikekê dixuye.

Germiya evînê jî bi ser Memduh Selîm Begê re tê. Dil di şewateke yaman de ye. Gelo ew çi bike?.. rabe pê û wê hembêz bike, ramûse, ji destê wê bigire û bi xwe re bibe? Çi bike? Ew nikare xwe li ber nêrîna van çavên

kelgirî ragire. Tiştekî divê. Xezalê divê fahm bike ku ev rêwîtî ne rêwîtiya mirinê ye. Ev rêwîtiyeke mecbûrî û kin e. Bi tenê du meh. Bi dû du mehan re jî kêfxweşî, yekîtî, dilgermî û serfirazî.

«Qet meraq mekin, piştî du mehan, ez têm. Ez malê jî teslîmî we dikim. Ji kerema xwe re carina herin û lê binihêrin... Mîrê min, bav û xwişka min dê name bişînin. Piştî ku name hat, tu dikarî xeberekê bişînî û ji wan re binivîsî ku em dê daweta xwe piştî du mehan bi ser xînin...»

Keneke ne ji dil. «Baş e, Memduh Beg, ez'ê xebera dawetê bigihînim wan.»

Di bin perda bêdengî û xemgîniyê de şeva dawîn û xatirxwestin.

Xatirxwestin, veqetîn û rêwîtiyeke du mehan. Piştî du mehan jî daxwaza dilan...

Lê siûd? Henekî û qeşmeriyên siûdê?

# TARÎX Û SIÛD

1

Agrî, Agrî tu agir bûyî
Li nav ketî, serbilind bûyî
Li ser Kurdistanê çira bûyî
Hilbe Agrî, hilbe Agrî

Agirî. Çiyayê serbilind. Di nav kirasekî spî de rapêçandî. Serî bi mij û dûman. Agirî, çiyayê berz û kevnare. Ziyaretgahê dîndar, evîndar, derwêş û bîreweran. Warê şervanan. Kaniya xurtî û mêraniyan. Navenda serîhildanan. Agirî, çiyayê ji agir. Çiyayê serî di asmanan de. Keleha parastina xweyiyê. Keleha Xoybûnê.

Li ber quntaxên çiyê şervanên kurd. Çekdar. Dengdar. Strana Agiriyê. Bi dengekî. Hemû bi hev re. Li nik wan kumandarên wan. Ihsan Nûrî Paşa, Biro Heskî Tellî Paşa, Temirê Şemkî, Şefdîn Beg, Ferzende Beg.

U li hember wan jî Iskender Beg. Yanê Memduh Selîm Beg.

Alaya kurd ya rengîn li zinarekî hildibe. Dinya sar e. Berf ketiye çiyê. Spêdê çiyê di nav berfê de, kirasê spî lê ye.

Agirî...

Agir dirijand ser seran
Ronahî direşand her deran
Erd dihejand car caran
Hilbe Agrî, hilbe Agrî

Marşa şervanên kurd. Dastana serîhildana kurd ya Agiriyê. Xeşm û xezeba çiyayê Agirî.

Şervanên kurd xêrhatin li Iskender Begê dikin. Iskender Beg, çend kurdên Iranê û du ermen li şervanên kurd dinihêrin. Bêdeng. Bi ken. Dilê wî wekî dengê çiyayê Agiriyê hildavê. Germ û bi lez. Heyecaneke boş dil û mêjiyê wî vegirtiye. «Xwediyo! Tu qadir î. Ma min dê ev roj jî bidîtina?..» Leşkerên kurd, kumandarên wan, alaya kurd axa rizgarkirî... Jiyaneke ji nîr û zordariyên xerîban bi dûr...

«Iskender Beg û gelî hevalan... Hûn bi xêr û xweşî hatin. Em, esker û kumandarên şoreşa kurd a çiyayê Agiriyê silav li we dikin. We em kêfxweş û serbilind kirin... Bi xêr be.»

Dengê Ihsan Nûrî. Dengekî xurt û hişk. Dengê serleşkerekî.

Iskender Beg kelgirî ye. Ji kêfxweşî û heyecanê. Deng jê dernakeve. Ew dizane, eger ew devê xwe veke, ew dê bigirî. Tu carî tiştekî weha neqewimîbû, ew evçend bi agirê heyecanê nehatibû sotandin, pêtên heyecanê tu carî, evçend bi xurtî, bi ser wî re nehatibûn.

Li ber çavên hemûyan, Memduh Selîm Beg tiştekî dike; ew çogên xwe datîne erdê, ber jêrî erdê dibe û axa reş radimûse. Sê car. Giran, giran. Bi dû ramûsandina axê re, ew misteke ax dixe nav lepên xwe û axa reş bîhn dike. Dirêj, dirêj. Ew li ax, ala, çiya û şervanên kurdan dinihêre. Dirêj, dirêj.

Ihsan Nûrî Beg tê û wî ji erdê radike. Ew, bi ken, li

hev dinihêrin û hevûdu hembêz dikin. Pihêt. Car bi car. Bi dirêjahiya deqîqan. Paşê jî ew, bi hev re, ber bi kumandar û şervanan derin. Ihsan Nûrî Beg wan, yek bi yek, bi Memduh Selîm Begê dide nasîn. Ew jî wan, yek bi yek, hembêz dike. Bi qasî 70 kesan. Yek bi yek. Ihsan Nûrî Beg û ew du ermen jî li nik.

«Begê min Ihsan, ez dixwazim alaya serbestî û azadiyê jî ramûsim. Ji min re vê çêyiyê jî bike, ji kerema xwe re, wê bîne, ez wê ramûsim û bîhn bikim. Bîhna serbestî û azadiyê bigirim...»

2

Ihsan Nûrî. Ihsan Nûrî Begê Cibirî. Bêdlîsî. Seresker. Jiyana wî ya bûyertijî; zaroktiyeke şêrîn li Bêdlîsê, li taxa kevn Elî Kolî, xortiyeke bi keft û left, xwendin û hînbûn li Stembolê, salên xwendegeha eskerî «Harbiyê» li Stembolê, bi kurdan û rêkxistinên kurdan re xebat, hêviya yekîtî û azadiyê, seresker û zabît, di şerê cîhanê de kumandar, kumandarê leşkerên Osmanî yên bajarê nik çiyayê Agirî Bayzîdê, destpêka hevaltiya wî û çiyayê Agiriyê, li dijî leşkerên ordiya Qeyserê Rûs şerkirin, piştî damezrandina Komara Turkiyê li dijî siyaseta tirkan xebatkirin, yek ji hîmdarên rêkxistina kurdî Komîteyî Istîklalê Kurdîstanê, di sala 1924 an de, tevî hevalên xwe, li dijî dewleta tirk serîhildan, şikestxwarin û rev, endamê Xoybûnê, serokê leşkerî yê Xoybûnê û Agiriyê.

U kumandarê serîhildana Agiriyê.

Ew û Memduh Selîm Beg bi hev re. Di qerargahê serîhildanê de. Bi dû salên dirêj, xirab û musûbet re. Dostên kevn. Hogirên riya man û nemanê. Şirîkên tarîxeke bextreş.

Du şexsiyetên ji hevûdu pir cihê. Lê di eynî wext de

jî wekhev. Di rûpelên kitêbeke kevnare. Rûpelek ji serî heta binî tijî. Bi rêzên dirêj û bi tîpên pir biçûk. Lê xweşnivisî û bi rêk û pêk. Rûpela din neqişandî. Tê de bi tenê çend rêz. Peyvên kin û kurt. Lê baş lihevhatî û manetijî. Her du rûpel jî balkêş. Her du jî yên kitêbekê; Ihsan Nûrî û Memduh Selîm.

«Mîrê min, me pir bêrî li te kiribû. Çaxa em heval li hev diciviyan, me bi tenê qala te dikir. Qala te û qehremaniyên te... Pir spas Ihsan Beg, pir spas... te em serbilind û serfiraz kirin. Te welatê me vejand...»

«Bi xêra we Memduh Beg, bi saya Partiyê... min tiştekî nekiriye. Ji erkên kurdbûnê pê ve tu tişt. Ez yek ji lawên heqîr û biçûk yên vî milletê bextreş im. Ma ez nexebitim, kî dê bixebite?»

Di nav xaniyekî yekçavî û tarî de peyvên germ û dilsoz. Xaniyekî bi kevirên reş lêbûyî. Di bin kozika kendalekî de. Ji çavên neyar bi dûr. Xaniyekî sade. Na, ne sade, belengaz. Tê de doşegin pûştijî, bahlifin li ser, li quncikekê mankaleke stûr û li quncika hember jî çend cot rext, pûsat û tifing.

Li ser Ihsan Nûrî Beg jî kincên germ yên leşkerî. Li ser sîngê jî, ji her du milan, du rext. Bi awakî çaprazî. Li ser rextan malxelîtikine. Li piştê jî cewdikekî çerm û tê de debançeyeke stûr.

Li her cîhî, bi her şeklî, nîşandekên şerê.

Rewş?

«Iskender Begê ezîz... Çêtir e ku em bi vî navê bang li te bikin. Bila tirk nizanibin ka tu kî yî... Rewş ne zelal e. Ev dibe zivistana çaran ku em şer dikin. Bi hêzeke pir kêm û ji îmkanên herî pêwist bêpar. Lê digel vê hindê, em li ber xwe didin, êrîş dibin ser dijmin û warê şoreşê firehtir dikin. Tirk baş têgihîştine ku dijminên wan bêtirs, şarezayên şer û navçê ne. Ji ber vê yekê,

wan ji aliyê Turkiyê esker anîne û li navçê civandine. Wan dil bi çend tiştan heye; 1- Bi zor û hovîtî çavê xelkê tirsandin û peywendiyên xelkê û şoreşê birîn, 2- Xelkê û nemaze wan eşîrên ku dostên dewletê ne, li dijî şoreşê rakirin, 3- Bi dan û standinên dîplomatîk ji dewletên cîran, yanê ji Yekitiya Sowyetê û Iranê alîkarî wergirtin û bi vî awayî riyên şoreşê birîn, 4- Dor li şoreşê girtin û şoreşê vegivezandin... Dek û dolabên wan hemû ji bo vê planê ne...»

U xeber... xeberên tahl û nexweş. Xeberên xweş û çê. Kurdên xayin ku libasên şervanan li xwe kirine û çûne êrîş birine ser qereqolên Iranê, ji bo ku Iranê li dijî serîhildanê derxin. Li dijî van kurdan şer bûye û serokê wan hatiye kuştin. Belavokekê li ser van bûyeran hatiye nivîsîn. Bi navê Navendiya Xoybûnê. «Pêwist e, nîştimanperestên kurd kelkên siyasî û aborî yên dewleta Şahenşahî ya Iranê ragirin, biratiya manewî û siyasî û bêlayenî ya dewleta Şahenşahî bi dest bînin...» Balafirên tirkan bi agirê mîtralyoz û bomban êrîş birine ser gundan. Du eşîrên mezin hatine û tevî serîhildanê bûne. Şervanên kurd xwe dirêjî Wanê kirine. Şêx Mihemedê Hesesorî ku peyayê tirkan bû, di gund de hatiye kuştin. Desteyeke şervan du mifrezeyên tirk ji çek kirine û çekên wan wergirtine. Leşkerên tirk çarde gund ku nêzîkî warê serîhildanê ne, kavil kirine û şêniyên gundan şandine Anatoliyê. Li deştê şerekî mezin qewimiye, ji dijmin gelek kes hatine kuştin, ji kurdan jî çar kes, şervanan bi qasî 20 leşkerên tirk jî dîl girtine.

Herweha... Ji her alî xeber û nûçeyên şer. Her cîh bi agirê şer dişewite. Kuştin, mirin, êrîş, agir, dîlgirtin, tirsandin, çek, balafirên bombebaranê, tanq û bombe... peyvên ku car bi car bi guhên Memduh Selîm Begê dikevin. Ev cîhan, cîhaneke taybetî ye ku ji êgir avabû-

ye. Di nav cîhana bêdeng û westiyayî de cîhaneke ji agir... Belê, Agirî di nav agir de ye. Telgrafa ku hevalan ji Memduh Selîm Begê re şandibû, rast digot.

Memduh Selîm Beg û Ihsan Nûrî Paşa bi hev re. Bi tena serên xwe. Lê, gelek kes tên û derin; ew nameyekê didin Ihsan Nûrî Paşa, jê tiştine dipirsin, xebereke nû diguhezîninê, jê fermaneke nivisandî dixwazin.

Memduh Selîm Beg li ber xwe dikeve. Ev peyayê xebatkar û fedakar, ev şerê mirin û mayinê û Memduh Selîm Beg û hevalên wî... Ew li Antaqiyayê, Helebê, Şamê, Beyrûdê, Kahîrê, Iskenderiyeyê, Suleymaniyê, Parîsê û Londonê çi dikin? Ma meriv dikare xebatên wan û xebatên van canfedayiyan bide ber hev? Memduh Selîm Beg, niha, têdigihê; ev cîhana şer û xwînê û cîhana derve, wekî rengên reş û spî, ji hevûdu cihê ne. Li vê derê kar û bar pir in, tiştên ku divê werin kirin, bi hezaran in.

Memduh Selîm Beg dikare di nav van du mehan de çi bike?.. Mixabin, tiştên ku ew bikaribe bike, ne zêde ne. Heta radeyekê alîkarî ji bo xurtkirina teşkîlata Xoybûnê û civînên siyasî bi serokên serîhildanê û komikên teşkîlatê re. U heye ku alîkarî li rojnama serîhildanê «Agrî»yê kirin. «Iskender Beg, ka tu bizanibî em vê rojnamê çawan derdixin!.. kaxiz bi qasî ku têr bike tune. Ji ber vê yekê, ew kêm derdikeve. Me tu çapxane jî tune. Ji lewre, ew bi dest tê nivîsîn, û hinekî jî bi jelatînê kelandî û sarkirî...»

Serîhildaneke pêwist. Lê di nav kesp û kosp û neçariyan de.

## 3

Dawiya payiza 1929 an. Destpêka zivistanê. Spêdê çiyayê Agiriyê di nav berfê de ye. Dengine jê tê. Dengê

ba û bagirê. Nalîna çiyayê serîmij. U li jêr jî, li ber lingê çiyê, strana dengbêjê dilsoj. Nalîna çiyê û dengê dengbêj; dastana serîhildanê. «Ax lo bira, lo bira, lo bira, lo bira...»

Evar. Agirekî xurt. Şewata êzingan. Agirê şeva Agiriyê. Li dor êgir şevanên westiyayî. Dengbêj. U Memduh Selîm Beg. Hemû li dor êgir rûniştî. Pêtên êgir; ber bi jor, ber bi asmên. Govenda pêtên êgir. U bê guman, strana dengbêj. Giran giran. Siya sor ya pêtên êgir li ser rûyê Memduh Selîm Begê. Di bin ronahiya sor de rûyekî sor. Dest li ber germiya êgir. Çav vekirî. Li ser çavan çirûsk. Guh li ser stranê. Peyv û gotinên stranê yên li ser bûyerên nû, lê rîtm û awayekî kevnare. Rîtm û awayê dastanên sedsalan. «Ax dilo!..» Dilê bi coş û heyecan. Dilê westiyayî û bi hesret.

U ewana. Di bin ronahiya sor de rûyên wan yên sor. Eniyên qermîçektijî. Simbêlên badayî. Kinc û libasên wan. Li ser sîngan rext. Li ber piştan kêr û xençer. Tifingên reş, bi awakî çeprastî, li nik wan. Piranî gundî. Ji ser zevî û bênderên xwe hatî. Lawên eşîran. Hevalên deşt, zozan, newal û çiyan. Zarokên tebîetê. Xurt wekî pole. Zû û pihêt wekî berika tifingê. Nîşanker wekî pilinga li pey nêçîrê. Ewana; her yek ji derekî. Ji gundên doraliyê Agirî û Bayzîdê, ji aliyên din yên tixûba Iranê, ji deşt û newalên Wan, Mûş, Melezgirt, Hekkar, Qers, Erzurim û Dêrsimê. Lê belê, hemû wekhev. Wekî ku hemû ji dayikekê. Tiştê ku bi yekî qewimiye, bi yê din jî qewimiye... Jiyaneke wekhev. Hîsekî yekgirtî. Şirîkên qederekê. Qedera wan; rebenî, belengazî, neçarî û bindestî.

Şoreşa wan; li dijî vê qederê serîhildan.

U ew. Dengbêj. Di bin ronahiya sor de rûyekî gulover û sor. Dengekî berz, lê melûl. Hêdî, hêdî. Bi rêk û pêk

Gotin û qise li pey hev rêz dibin. Wekî rêzên gulên sor. Her qise dibe guleke sor. Her gotin dibe novikeke nû ya rêzeke dirêj ya gulan. Di bin nalîna çiyayê serîbilind de, li dor agirê gur, rêzên gulan. Yekitiya dengan; dengê ba û pûkên çiyayê Agirî, dengê şewata êzingan û dengê dengbêj.

U ewana; xwediyên şoreşê, xwediyên serîhildana kurdan ya Agiriyê.

Memduh Selîm Beg... mêvanê wan. Bi wan re. Ihsan Nûrî û kumandarên din çûne cîhine. Wan Memduh Selîm Begê ezimandine. «Bi ser serê min... bi kêfxweşî.»

Dilê Memduh Selîm Begê hildavê. Dil bûye wekî kelekekê. Kelekekê ku li ser pêlên avê hêl dibe. Ew li ser axa azadkirî rûniştiye û di bin êvara azad de azadiya rastî dadiqultîne. Qult bi qult.

4

Zivistan. Sar, serma, pûk. Berfê bi kirasê xwe yê spî hawirdor vegirtiye. Rê hatine girtin. Şer, hatin û çûyin kêm bûye. Ordiya tirkan xwe spartiye bajarên mezin. Kurdan jî xwe spartine gundên nêzîkê Agiriyê. Memduh Selîm Beg jî xwe spartiye odeyeke germ. Na, ne ode, şikefteke germ. Ew û serokatiya serîhildanê, tevî mal û zarokên xwe, di şikeftan de bi cîh bûne. Şikeft di qelaşeke kuntarên çiyê de ne û ew ji dinya derve, ji ba, bahoz û bagirê berfê veşartî ne. Dijmin jî nikare xwe bigihîne şikeftan. Ew di nav kortalekê û di dawiya bihureke asê de ne. Ji teyran pê ve, tu kes, bêyî rêdanê, nikare xwe bigihîne wan. Dinyake taybetî. Di nav dinya stûr û tevlihev de dinyake biçûk û jibîrbûyî... Tu kêmaniyên şikeftan tune; di her şikeftî de girekî ji êzingên hişk, di nav kedik, meşk, tûr, têr, teliz, dîzik û kûpan de xwarin, terzad û zexîre, li quncikekî şikefte-

kê firax, libasên eskerî yên germ, postalên berfê, mankalên stûr, gaz, tifik û çire, kulavên qehîm yên hiriya meşîn, çek û cebirxane... û li şikeftekê jî tawleyeke hespan, kadîneke mezin û bêr, qazme, sepet, sêlik.

Memduh Selîm Begê «şervan.» Di şikefta xwe de. Tevî çend kesên din. Li kêleka mankalê. Li serê libasên germ yên leşkerî, li ser milên wî kulavekî şivanan, di lingan de jî goreyên rengîn û neqişandî yên rîs. Rîhdirêj. Jarbûyî. Bêdeng. Pojandî. Di destan de penûs û kaxiz. Rêveçûneke dijwar di nav fikir û gumanan de. Pîqe-pîqa hevalên nik wî. Ji dûr, ji şikeftekî din kûzekûza seg û tahjiyan.

Ew du mehên ku qelw lê hatibû dayin, bihurîn. Lê ne Memduh Selîm Beg zivirî Sûriyê û ne jî kesine hatin Agiriyê. Rê li wan hatiye girtin. Zivistan, berf, serma, ordiya tirk ku li dor navçeyê serîhildanê ye û Iran. Iran jî ji serîhildanê eciz e û zehmetî nîşan dide. Yanê, veger hê jî dûr e. Memduh Selîm Beg jî, zêde, qala vegerê nake. Ji şerman û dudilîbûnê. Ew dê van merivên fedakar li vê derê, di nav xwîn, agir, barût, berf, serma û mirinê de bihêle û here!.. Fikirandina vî tiştî bi xwe şermeke mezin e. Ma çi yê wî ji van merivan zêde ye? Çima ew dê here û ev dê bimînin?

Mêjiyê wî weha dibêje, weha deng dike. Lê dil? Dengê dil?.. Wî ji Xezalê û malbata Xezalê re gotibû du meh. Bi tenê du meh. Li milê din, li ser qewlê xwe nesekinîn jî şerm e. Derewkar derketin jî xirab e... Lê digel her tiştî, kêfxweşiyekê jî pê re dixuye ku ew li nik şervanan maye, nan û ava wan parve kiriye û bûye şirîkê qedera wan, bi kurtebirî, bûye yek ji wan

Lê belê, ew divê, bi awakî, xeberekê jî biguhezîne Xezalê û bavê wê. Kaxiz û penûs di destan de, ew rûniştiye û dil dike name binivîse. Hem ji bavê Xezalê re

û hem jî ji wê bi xwe re. Heta niha, wî, tu carî, jê re name nenivisiye. Lê ew dê, niha, edet û toran bide bin lingên xwe û jê re binivîse. Çima na?.. Belê, nameyeke dirêj û germ. Bi hal û hewal tijî. Bi zimananîna hesretê. Bi qedr û qîmet.

U bê guman, bi hêviya ku name bigihên destê wan. Ne ew, ne jî kesekî din dikare bizanibe ka name dê bigihên cîh. «Xwedê dizane!» Lê wî hêvî heye ku name dê bigihên cîhê xwe. Ew dê pêşî bigihên Bayzîdê, ji Bayzîdê bigihên Stembolê, ji Stembolê bigihên Helebê û ji Helebê jî Antaqiyayê. Riyeke dirêj. «Çavê bêgaviyê kor be!..»

5

Siûda Memduh Selîm Begê! Ew dîsan nexweş e. Di vê berf, baran û sermayê de. Ew dîsan bi zekemiyê ketiye û serma girtiye. Ew diricife. Jiyana şervaniyê... Zehmetî û neçarî. Ne bi tenê li dijî dijmin şerkirin, herweha li dijî kesp û kospên tebîetê û hezar texlît bêgaviyên din jî şerkirin. Çaxa meriv nexweş e, ji bêgaviyê, meriv xwe davêje hawara Xwedê. Xwedê divê alîkarî bike. Bijîşk tune. Derman kêm e. Nexweşxane tune. Bi kurtebirî, dinya şervanan; dinyayeke taybetî ji tunebûnan.

Ma Memduh Selîm Beg bi vê yekê nizane? Belê, ew dizane, baş dizane. U ji ber ku ew dizane, ew xebata siyasî dike, li dijî dewleteke jixwerazî radibe, tê warê şervanan û di warê wan de nexweş dikeve.

Yanê tarîx û siûd... yekitiya tarîx û siûdê.

Tarîx çi ye? Axureke peregende û bêhîs û bêpejn ya heywanan? Yan jî bexçeyekî rengîn, gul û kulîlktijî yê merivan? Çi? Kîjan? U tarîx û meriv... Kî di xizmeta kê de? Meriv di xizmeta wê de? Yan jî ew di xizmeta

meriv, jiyan û kirdeyên merivan de? Çi? Kîjan?.. Pirsiyarên ku mêjiyê Memduh Selîm Begê pê bilî dibe. Ji rojên xwendegehê û vir ve. Li gor wî tarîx do, îroj û sibe ye. Yanê rabirdû, niha û pêşeroj. U di navenda wan de jî meriv. Eger meriv, hêz, quwet, ked û daxwaza wî ya pêkanîn û afirandinê nebin, hingê tarîx çi ye? Tiştê ku Memduh Selîm Beg ji tarîxê fahm dike; li rabirdû xwedî derketin, gava nû zanîbûn û her gav pêşketin, nûkirin, zêde-çêtir-xweştirkirin. Gava pêşketin, nûkirin, çêtirkirin tunebe, hingê tarîx jî nabe. Fikir, guherîn û tarîx, ev her sê bi hev re mihorên wextê ne. Tarîx, tarîxa merivan e. Tarîx xizmetkara merivan e, ne li bervajiyê. Lê belê, bi şertê ku meriv jî bikaribe tesîr lê bike. Eger meriv dixwaze xwediyê tarîxeke taybetî be, eger meriv naxwaze wekî heywanekî bêtarîx bimîne, hingê meriv divê xîret bike û hewl bide ku tesîr li tarîxê bike.

Memduh Selîm Beg di nav cîhê xwe yê germ de dirêj bûye û li tarîxê difikire. Ew rojên xwendegehê û xeberdan û gotarên felsefî tên bîra wî. Xwediyo ew çi roj bûn! «Tarîx ne axura bavê kesî ye... Tarîx ne tîkeyên goştê pijirandî ye ku meriv lê rûne û daqultîne... Hevalno, tarîx tê afirandin. Digel her bela, zor û zehmetiyê ew tê afirandin. U em ji bîr nekin... sedsala me sedsala afirandina tarîxên milletên mazlûm e.»

U xeberdanên zimanzanan li ser peyva tarîxê!.. Gava ew niha wan xeberdanan bi bîr tîne, pîqepîq pê dikeve. «Birano!.. ev çi ye, hûn dibêjin tarîx, tarîx... Ma hûn nizanin ku peyva tarîxê erebî ye. Çima hûn nabêjin dîrok? Dîrok peyveke xwerû kurdî, zelal û xweş e...»

Ax ew rojên xweş, lê ji rastiyên jiyan û tarîxê bi dûr!

Rastiyên jiyanê; warê şerên tarîxê. Rastiyên jiyanê;

şerekî dijwar, bêhempa û bêrawestan. Kî di vî şerê malkambax de bi ser keve, ew dibe hukimdarê rastiyên jiyanê jî. U herweha tarîxê.

Tiştekî balkêş. Memduh Selîm Beg, niha, di nav şikefteke tarî de, li hember kozên êgir yên mankalê, dirêj bûye û bi taya sermayê diricife. Lê mêjiyê wî bi firê dikeve û dere rojên kevn. U gava ew rojên rabirdû dikevin bîra wî, pîqepîq pê dikeve. Digel ku halê wî yê niha ne tu hal e. Ma ev yeka bi xwe jî nîşan nade ku tarîx lehiyekê ye? Lehiyekê ku her ber bi pêş diherike. Lehiyekê ku xwediyê kahniyekê ye. Lehiyekê ku li ser riya derya stûr, zelal û xweş e.

Belê, welê ye; rabirdû, rojên bihurî di kûrahiyên mêjî de dijîn. Ew li ser dil veniştî ne. Dilê Memduh Selîm Begê carina bi kêfxweşî û carina jî bi jan û keserên wan hildavê. Ew tu carî ji wî bi dûr nakevin. Belê, rast e; ev rojên ku Memduh Selîm Beg dijî jî, ne rojên hêsan in. Rojên zehmettijî, rojên giran, rojên bi keser û hesret in. Lê belê, eger rabirdû ji bîr bibe û îroj neyê jiyîn, hingê meriv dê çawan bikaribe tesîr li tarîxê û li pêşerojê bike? Ew dizane, niha, edalet, serfirazî û kêfxweşiya hem şexsî, hem neteweyî li ser spêdê çiyayê Agiriyê ye. Ronahî li pey çiyê ye. Ji bo ku ronahî, edalet, serfirazî û kêfxweşî bi dest kevin, digel her celeb zehmetiyê, meriv divê hilkişe ser spêdên çiyayên serbilind û wan vegire. Mixabin, hezar mixabin ku tarîx ev e û evçend dijwar û zehmet e.

Ji niha ve, ew nizane ka rojên pêş dê çi nîşanî wî bidin û pêlen tarîxê dê wî ber bi kû bibin. Lê, ew dizane ku gava tarîx tora xwe dihûne, meriv jî divê alîkarî lê bike.

Tarîx tora xwe dihûne. U li nik tarîxê jî siûda Memduh Selîm Beg, hêdî hêdî, dineqişe

Ihsan Nûrî Beg, Yaşar Xanim û Memduh Selîm Beg. Her sê bi hev re, di şikefta Ihsan Nûrî û Yaşar Xanimê de. Ihsan Nûrî Beg kêfxweş e. Wan bi qasî duwanzde telefon bi dest xistine û jê re sîm jî peyda kirine. Ihsan Nûrî Beg bi xwe, tevî desteyeke siwar, sîm bi dest xistiye. Wan xwe dirêjî Bayzîdê, ordîhegê tirk kirine û ji ber mala reîsê riya hesin, bi qasî pêwist, sîm wergirtine û anîne. Di wê şeva tarî de, nobedarên tirk dîtine ku ew sîm bar dikin, lê ji tirsan dengê xwe nekirine û rûyê xwe badane û çûne hundir. Niha, bi alîkariya telefonan, ew dikarin çêtir bi gundên doralî re peywendî dayinin.

Yaşar Xanim. Jineke xweşik, bîrewer û qedirgir. Jineke tirk, lê pîrek û evîna Ihsan Nûrî Begê. Dostî û hevaltiyeke kevn di navbera herduyan de. Ji rojên Stembolê heta îroj. Hevala Ihsan Nûrî Beg ya qederê. Ihsan Nûrî Beg li kû, ew jî li wê derê. Niha jî di nav agir, berf û sermayên Agiriyê de. Evîndareke yekta.

Berî niha bi demeke kin, tirkan Yaşar Xanim li Turkiyê girtibûn û dixwestin, bi hênceta Yaşar Xanimê, xwe biginînin Ihsan Nûrî Beg da ku ew dev ji serîhildanê berde. Çi xewn! Çi kirêtî! Hukimeta tirk heyeteke fireh ji payitextê, ji Ankarê dişîne da ku bi Ihsan Nûrî Beg û serokên serîhildanê re bipeyivin. Du parlementer, qumandarê tumena tirk ya Agiriyê, fermandarê jandarmên Bayzîdê û çend zabît. Kurdan qebûl e ku ew heyeta tirkan bibînin... Li ser tixûbê Iran û Turkiyê civîn çêdibe. Heyeta tirkan û kurd. Kurd; Ihsan Nûrî Paşa, Biro Heskî Paşa, Ferzende û Xalis Began û bi qasî 20 siwarên herî baş yên desteyên leşkerî yên kurdan. Çavpêketineke ecêb. Çavpêketinekê di navbera agir û avê de. Daxwazên heyeta tirk; «1- Agirî divê aram

be. 2- Kurd divê dev ji rêgirtin û xirabîkirinê berdin. 3- Tiştên ku şervanên kurd bi dest xistine, divê bi şûn de werin dayin. 4- U ji her tiştî zêdetir, Ihsan Nûrî divê ji Agiriyê derkeve, bi her şertê ku ew bi xwe bixwaze... û herweha tu xirabî dê bi rûniştevanên Agiriyê nebe, dewlet dê alîkarî li wan bike û rehetiya wan temîn bike...»

Ihsan Nûrî û hevalên wî li hember van daxwazan dikenin. Keneke xweş li ser rû û çavên Ihsan Nûrî û hevalên wî. Bi qasî bîskekê. Fen û dolabên dewletê. «Diyar e, dewlet dixwaze me bixapîne!..» Ew daxwazên heyetê red dikin. «Azadiya Kurdistanê!..» Dewlet dizane ka şervanên kurd çi dixwazin. Alaya sêrengîn ya azadiya Kurdistanê divê li spêdê çiyayên welêt hilbe. Ji kurdan bêtir, baştir û çêtir tu kes nikare welatê kurdan îdare bike. Dewlet divê, êdî, bi vê yekê bihese!..

U Yaşar Xanim. «Jina min bişînin Helebê...»

Rêwîtiya dirêj û bi xeter ya Yaşar Xanimê. Pêşî Heleb. Bi dû Helebê re Iran û paşê jî Agirî. Lê li ser riya hatina Yaşar Xanimê, li Iranê xetereke hîn mezin... Ihsan Nûrî Beg bi xwe dere Iranê, bajarê Xoyê. Ji bo anîna hevaljina xwe, Yaşar Xanimê. Pêşî ew yekî dişîne bajarê Xoyê. Lê digel ku demeke dirêj, bi qasî deh rojan dibihure, ew tu xeber nagire û meraq dike. Bi dû deh rojan re, ew û kurdekî bi navê Silo derin bajêr. Cilên kevn û peritî yên kurdî lê. Tifing li ser mil. Peyatî. Li bajêr jî li mala feqîrekî ew mêvan dibin. Yaşar Xanim hê ji Tebrîzê nehatiye. Ew li wê derê dimîne û yekî dişîne pey Yaşar Xanimê. Kesê çûyî venagere. Piştî çend rojan, rojekê Ihsan Nûrî Beg dadikeve bajêr. Kumekî pehlewî li ser serî. Ji nişkekê ve dengine. «Efendî efendî!» Leşkerên iranî. «Min gazî te kir, çira nesekinî?» Leşkerekî îranî, rûtirş, bihêrs, jê dipirse. «Te e-

fendî, efendî, gazî dikir, ez çi dizanim efendî kî ye. Ez tu efendî nîn im...» Leşker û zabît. Ji Ihsan Nûrî Begê pirsine. Bi hev re, ber bi Tehwîlê Dijban(polîsê leşkerî) çûyin. Li ser rê dûkanekê. «Ezê cixara xwe agir kim.» Di dikanê de. Dikancî. Rûyekî nas. Nêrîna çavan. Dikancî Ihsan Nûrî Beg dinase! Berî çend salan, di zivistanekê de, dîsan, li Xoyê. Ihsan Nûrî Beg û hevalên wî yên zabît, Rasîm û Tewfîq. Hingê navên wan sirrî û nerast bûn. Navê Ihsan Nûrî Begê Hacî Mihemed bû. Hingê ew diçûn û dihatin vê dikanê. Niha dîsan eynî dikan û eynî dikancî! «Hacî, bi xêr hatî! Hevalên te li ku ne?» Ew çi bibêje. Rewşeke xirab. Xirabî li ser xirabî. «Hacî kî ye, hevalên min kî ne?» Lê, dikanciyê înadkar!.. «Ez te rind nas dikim; hûn sê mirov bûn dihatin dikana min.»

Bi dû lavan û xeberdaneke dirêj re, ji dikanê derketin. Ihsan Nûrî Beg û leşker. Bi hev re. Li ser riya Tehwîlê Dijban. Fikir û guman. «Min mirov şandiye Yaşar bîne, evana ez girtime, min nas nakin, heke bêjim jî 'Ihsan Nûrî me' bawer nakin û mimkin e bidim Tirkiyê...» Bêhêvîtî. Bi serê xwe. Dayira leşkerî. Ketina hundir. Çend dua. Ji devê Ihsan Nûrî Begê. Melayekî Agiriyî Ihsan Nûrî Beg hînî duana kirine. Sedem; «çaxa diçî cem mezinek pisiyader, ev duan li serê wan bixwîne, bikeve hundir, her çi bixwazî qebûl dike.» Reyisê dayirê. Li hevûdu nihêrîn. «Tu kî yî?»

«Xulamê Yûsif Ebdal Axa me.»

«Navê te çi ye?»

«Wezo!»

«Çira hatiy Xoy?»

«Saeta zîvî ya Axa kar nedikir, min anî da saetsaz ku çê ke.»

Dîsan, bi qasî kêlîkê li hevûdu nihêrîn. Bi fikir û

guman. Bi şik û tirs. U bi hêvî.

«Here zû saetê bigir û bizivire!»

Kêfxweşî û şadî. Bîhngirtin. Rehetiyeke boş. «Xwedê îcar jî ez xelas kirim!»

Bi dû çend rojan re jî Yaşar Xanim tê. Li ser hespekê. Serbilind, rûken û kêfxweş. Evîndar, di dawiya dawîn de, digihên hev, hevûdu hembêz dikin û Ihsan Nûrî Beg xêrhatin lê dike. U tirk jî, bi awayê xwe, xêrhatin lê dikin; hê heftekê li ser hatina wê re nebihuriye, balafirên tirk li asmanên Agiriyê dixuyin û bi agirê mitralyozan ew gulebaran dikin.

Niha, di vê şikefta tarî de, gava Ihsan Nûrî Beg behsa wan rojên bi tirs dike, ew her sê dikenin. Ew roj jî, êdî, bûne xatirayeke tenik ji xatiran. Hevalên hev yên jiyanê, Ihsan Nûrî Beg û Yaşar Xanim li hev dinihêrin û bi xatirayên xwe dikenin.

Memduh Selîm Beg? Hevala wî ya jiyanê?

«Memduh Beg, tu behsa destgirtiya xwe nakî... çima?»

Yaşar Xanim dipirse. Gava ew li Helebê bû, wê bihîstibû ku Memduh Selîm Beg dike bi keçikeke çerkez re bizewice.

«Ez çi bibêjim?.. Bi xêr, gava ez vegerim, em'ê bi hev re bizewicin.»

Gotineke bi ken. Bi şerm. Hêdî. Ji çaya germ ya ku Yaşar Xanimê çêkiriye, çend qult vexwarin û bêdeng li keçika pordirêj fikirîn.

«Memduh Beg, Yaşar Xanimê bihîstiye... destgirtiya te pir delal e... û tiştekî ku bala min dikişîne... Çima munewerên kurdan keçên çerkez mahr dikin?.. Tu divê pê bizanibî.»

«Na, mîrê min, ez pê nizanim...»

Rast, çima bi keçikeke çerkez re? Siûs, qeder. Ne tiş-

tekî din. Bi tenê siûd. Xezalê ne çerkez bûya jî, ew xezaleke bedew bû. Memduh Selîm dê, dîsan, bi taya evînê biketa.

Lê digel vê hindê jî, hin tiştên ku qewimîne, lê niha, bi zehmetî bi bîr tên. Mesela çîroka wê kitêbokê... Sal 1914, destpêka şerê cîhanê. Memduh Selîm Beg li kitêbxanên Stembolê digere. Di kitêbxaneyeke Beyoglu de kitêbokekê; Osmanli Alem-i Ictimâiyesinde Çerkes Kadinlari. Yanê, Jinên çerkez Di Civata Giştî Ya Osmanî de... Bi tirkî. Bi tenê 63 rûpel. Ji aliyê Mehmet Fitkerî Şûenû nivisandî. Kitêbeke hûr li ser jinên milletekî hûr. Kitêbokeke balkêş. Lê Memduh Selîm Beg pere tune ku wê bikire. Bêgavî. Dermana bêgaviyê; dizî. Bi hêdîka. Bi hezr û dîqet.

Kitêbok; hawara niviskarekî çerkez. Gazinc li qedera reş ya jinên çerkez kirin. Wesf û salixdana wan. Bi hênceta jinan li bîr û baweriyên çerkeziyê vegerîn. «Bu bir hazan-i milliyedir...» Nivîskar diqîre û weha dibêje; ev qîrîneke neteweyî ye. U çend tiştên din ji kitêbokê ku niha, bi zehmetî tên bîra Memduh Selîm Begê; «keçên bedew yên çerkezan ku di 365 rojan de bi tenê sê sed peyv bi kar tînin,.. saffiyet-i ahlakiye û nesliyye-i pak... jinên bi hî, edeb, bi vîjdan û dilovan...»

Li milê din, ew keçika biçûk ya kulîlkfiroş?.. Sersal. Şeva berfîn. Galata. Ew şev û ew keçik jî niha tên bîra Memduh Selîm Begê.

«Ihsan Beg, mîrê min... dilên bindest zû bi hev dihesin û ji hevûdu fahm dikin. Heye ku ev jî sebebek e ku kurd û çerkez bi hev re dizewicin...»

## 7

Çiyayê mezin Agirî. Di nav ewr û asmanan de. Bi kumekî spî ji berfê. Delaliyê efsane û dastanan. Efsa-

newî. Çiyayekî xweş û spehî. Mezinahiyeke bêpîvan.

Agirî... Yanê Ararat. Yanê Kuhî Nuh, bi farisî Çiyayê Nuh. Yanê Masis, bi ermenî. Yanê Cebel el Haris, bi erebî. Agirî, warê keştiya herî kevnare ya merivahiyê. Di Tewratê de weha dinivisî; « U keştî di meha heftan, hufdeyê mehê de li ser çiyayên Araratê sekinî...» Agirî... lawê Huriyan, mezinê Urartuyan û bapîrê kurd û ermenan. Ziyaretgahê Zerdeştiyan. çiyayê evîn û agirperweran.

Agiriyê mezin. Li nik wî jî Agiriyê biçûk. Tendûrek. Xwişka Agiriyê mezin. Li spêdê wî de cîhekî wekî tenûr heye ku jê hilmeke germ radibe. Şîfagehê kurdan. U niha jî şahîdê şerekî dijwar.

Havîn, 1930. Lehî û çemên Agiriyê, bi awakî boş, diherikin. Xwîn bi awakî boş diherike. Şer germ e. Her roj, her saet. Kurd hilkişiyane bilindahiyên çiyê û di zozanan de kon vedane. Ew ji germa tavê, mêş û kelmêşan bi dûr ketine.

Dewleta tirk 120 hezar leşker civandiye navçê. Edî aşkere ye ku ew nikarin kurdan bixapînin. Niha wan dil heye serîhildanê bifetisînin. Ew bi balafir, tanq, top û leşker êrîş dibin ser kurdan. Kurd jî êrîş dibin ser wan. Li her alî şer, kuştin û mirin.

Memduh Selîm Beg?

Ew hê jî li Agiriyê, li nik şervanan e. Çûyin tune. Rê girtî ne. Li milekî şer gur bûye û li milê din jî xebata dîplomatîk ya Turkiyê. Agirî û kurd di navbera tixûbên Iran, Yekitiya Sowyet û Turkiyê de rojên dijwar dijîn. Turkiyê hukimeta Sowyetê ber bi xwe kişandiye. Hukimeta Sowyetê alîkarî li serîhildanê nake û deriyên xwe ji şervanan re girtiye. Turkiye, niha jî, bi hukimeta Iranê re dipeyive. Hem li Ankarê û hem jî li Tehranê. Tirk dixwazin Iranê jî ber bi xwe bikişînin. Iran jî niha

bi şik li serîhildanê dinihêre. Dewleta Yekitiya Sowyetê gelek leşker li ser tixûb, li hember tixûbên Turkiye û Iranê civandiye. Dewleta Iranê hemû navça Makoyê bi leşker tijî kiriye.

U tiştekî din; Memduh Selîm Beg naxwaze şervanan weha di nav vî şerê germ de bihêle û here. Nabe. Ew nikare here. Lê ew name dinivîse. Bi hêviya ku name bigihên cîhê xwe.

Kurd êrîş dibin ser taximên leşkerî yên tirk û wan dişikînin. Manewiyat xurt e. Bawerî wekî spêdê Agiriyê ye. Ji şerkariya wan re payan tune. Lê, digel vê yekê, weha nabe. Şer divê firehtir bibe. Naxwe, serîhildan dê bixeniqe. Çend eniyên din jî divê vebin. Geliyê Zîlan û Çiyayê Sîpanê. Du şergeh û navendên din. Çiyayên bilind, eşîrên xurt û welatperwer. Navçeyên asê. Li wan deran jî alaya rengîn hildan û tovên serîhildanê çandin divê. Civîneke çend rojan. Bi serokên Geliyê Zîlan û Heyderiyan re. U fermaneke dirêj. Ji aliyê kumandarê hêzên çekdar yên kurd Ihsan Nûrî. Li ser kaxizeke Xoybûnê.

1- Neyar 11 juen 1930 êrîş aniye ser Agrî, Qabaq Tepe, li quncê bakurê rojavayê Agrî dagir kiriye û cîbicî bûye. Şeş firokeyên neyar di vê pelamarê de hevkarî kirine. Di rojên 11 heta 18 juen tenê frokeyên neyar li serê Agrî difiriyan, bom davêtin. Sê froke ji aliyê hêzên Agrî lêdan e û yek ji wan frokan li meydana frokeyî ya Bayzîdê ketiye xwarê, frokevan miriye.

2- Desteyên gerok ên Agrî êrîş û pelamara xwe bi ser bingeyên neyar ku li dor û berê Agrî da ne dest pê dikin.

Bi liqê naverastî ferman dane ku hêzên xwe bişînin çiyayê Tendûrek, pêşiya karwanê bar û benê hateçûyên neyar bigirin. Qolordiyek tirk ku bi mebesta êrîş-

kirina ser Agrî ji nîvroyê rojavayê Anadolê bi rê ketiye, li ber helsoran û pêkbûna mezin a me li malbendên nîvro yên Sûriye û Dersim û Xarpûtê neqediyaye pêş de were.

3- Hevirgeyê yekem ê pêkanîna Xoybûn: bi arîkariya Xwedayê mezin, êrîşê ser hêzên Tirkiyê bike.

a- Qomandarê giştî yê jandermeriya Agriyê Temir Axa, bi hêzên ku li bin destê wî datînin li bervarê 3 juiye 1930, bi arîkariya xêlê xwe şemkan ku li malbenda Qolpê rûdinin, êrîş dide ser navenda qezaya Qolpê, paş dagirkirina bajêr pêşmergeyan heya girtina gundê Pernavot berepêş bişîne.

b- Şeva 4 juiye qomandarê qorxan serheng Velî Beg ji eşîrên Gizkan û Zîlan hêz bigire, bi pelamarek nişkeva bajarê Ixdir dagir ke. Her di vê rojê de hêzên Agrî êrîş dibin ser postên neyar li dor û berên Agrî.

4- Serokên eşîrên ku li nav gundê Deren kom bûbûn, hêzên wan roja înê, 4 juiye, hêzên tirk ên ku li navçeya wan hene rikêb kin, îdareya navçeyê bi dest bigirin, bi ev çeşnê ku li xwarê dinivîsim bi kar bînin.

a- Liqê Ercîş ji Geliyê Zîlan yarmetiyê digire paşdamalina îdareya hikûmet bi aliyê Adilcewaz diçe, pey dagirkirina vî bajarî xeta jor a Çiyayê Sîpan digire, girên nîvroyê Adilcewazê digire û bi aliyê Axlat û Tatwan û Çiyayê Nemrûd desteyên siwar dişîne.

Serokê Geliyê Zîlan: pey dîlgirtin û bêçekkirina hêzên tirk li malbenda xwe rojavayê Çiyayê Aladax bigire, bi aliyê Melazgirt desteyên siwarî bi hêz bişîne ji bo yarmetiya êla Hesenan rêyên Qere Kosê(Tirka îro navê bajêrê Qere Kosê Agrî danîne!) û rêyên Melazgirt, Patnas, Ercîşê bigire!

c- Eşayirên Heyderî ku li malbenda Patnosê rûdinin û ji xêla Melazgirt wan ên ku tev pêkbûna me ne; baja-

rê Patnosê dagir bikin, girên bakur û rojavayê Sîpanê bigirin, aliyên Çiyayê Nemrûd, Mûş û Kopê desteyên siwarî bişînin, bixebitin hateçûyên neyar bizanin!

d- Liqê bargirî: navenda bargirî û Ernisê dagir ke, rêyên ji aliyên Wan, Ercîş û Seray têş bibende!

e- Liqên naverast bi yarmetiya xêlên Celalî, Mîlan û li gel eşayirên ku di alega de rûdinin û tevî yekbûna min navenda Bayzîd-Agrî dagirt, sê sed çekdar bi Çiyayê Tendûrek şand ji bo ku hêzên din ên şerkarên Bargirî bihêztir ke, ji bona tirsandina Wan û Serayê bixebite, ji aliyên Wan, Tarp, Seray, Başqele û Hekarê zanînê bi dest bîne, xeber bide!

f- Liqên Ercîşê: çi qas dikare bi liqê naverast yarmetî bide!

g- Reîsê xêla Adaman Qaymeqam Hezretî Ibrahîm Axa bi zûtirîş kat li gel Elî Begê Mîrza Axa û Resûl Begê Zilî û serokên eşîretên Qotan û Hesesorî gotûbêj bike li gel van eşayir, li ber warê 4 juiye 1930 roja înê êrîş bikin ser bajarê Diyadînê, rêya Qere Kose-Bayzîdê bi temamî hildewşînin, bi taybetî hêz û xebatên neyar li Qere Kosê bi tevahî berewurd bikin, bi desthênana çend û çûna li gel Hemîd Beg têbikoşin, rêya hateçûnê li neqeba Tahir bixin metirsiyê!

h- Paş dagirkirina van ciyên ku min diyar kirine, liqên Ercîş, Patnos û Geliyê Zîlan beşa zor a hêzên xwe li pişta xeta Dutax-Melazgirdê, liqê Bargirê tevahiya hêzên xwe li Ernis-Norşatê kom bikin!

5- Şûna fermandeha giştî li Agrî ye; paş diyarbûna wez'ê şer vê ciyê re xeber bidin!»

Fermaneke dirêj û bi rêk û pêk. Hêviya dawîn ya biserxistin û firehkirina serîhildanê. Gava esasî. Fermaneke tarîxî li ser riya tarîxê.

Kurd tarîxa xwe, bi xwîna xwe, dinivisînin.

8

Evar. Di bin ronahiya stêrkan de straneke zîz. Li nik konên vegirtî. Li ser zozanan. Ew, dengbêjê hezar salan. Stran, dengê milletekî kevnar. Di nav şer de musîk. Dastana Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê.

«Cembeliyê Hekkarê hebû, li çiyayê Hekkêr bû, reîsê hezar û pênc sed xortê herdemlawîn bû. Pir axakî baş bû; du jinê wî hebûn bi kêrî şixolê malê û mêvana nedihatin. Aşiq Hemo hebû, ew jî stranvanê Cembelî bû, hema xortekî spehî bû Aşiq Hemo, kêf ji Cembelî re dikir...»

Memduh Selîm Beg û dengbêj. Wî jê tika kiriye. Dengbêj hêdî hêdî dibêje. Pêşî wekî çîrok, paşê jî wekî stran. Ew jî lê guhdarî dike. Musîk; dastanên kevn, kemançe, resîtal û konçertoyên nûjen. Dengê musîkê. Dengekî ji wan çar dengên ku Memduh Selîm Beg jê hez dike. Dengê musîkê dermana kul û birînên dilê wî ye. Dengê musîkê wî vedijîne, zînde dike, deriyê dil û ruhê wî vedike. Dengê musîkê jî, wekî dengê spêdê Agiriyê, abadîn, yekta û xurt e. Meriv pê re dere, sermest dibe, dikeve nav cîhanên rengîn û ji kahniyên hûnik ava evînê dadiqultîne. Dengê musîkê hez û coşeke mezin dide wî. U tiştê balkêş, herçend stran û dastanên kevn kêfxweşî didin Memduh Selîm Begê, ewçend jî musîka nûjen kêfxweşî didiyê. Bi qasî dastana Binevşa Narîn, musîka Yvette Gilberts û Eric Satie jî dilê wî bi firê dixe. Ew ji dengê vî dengbêjê kal jî hez dike, ji dengê kemançа Xezalê jî. Li gor wî, stranên eşîran û musîka salonan hevûdu temam dikin. Ew mîna hev in û her du jî kêfxweşî didin. Bê guman, her yek bi awayê xwe.

Xwezî ew jî bibûya aşiqekî eşîran! Wekî aşiq Hemo yê Cembelî. Ew jî di nav eşîrên koçer de bigeriya, we-

kî wan rabûya û rûnişta, bistra, deng bida edet û torên kevnare. Lê siûd!

«Hezar mixabin ku ez baş bi zimanê xwe nizanim û hê di xortiya xwe de ji welatê xwe bi dûr ketim û bi tirkî perwerde bûm.»

Dîsan lîstikên siûdê...

Bîhneke xweş ji axa nûvejiyayî radibe. Bîhna axê, bîhna dar û kulîlkan û bîhna çiyayê serbilind ketine nav hev. Li her alî, şervanên westiyayî, peregende, li ber konên xwe rûniştine û bi hev re dipeyivin. Şev hêdî hêdî dadikeve. Stêrk diçirûsin. Ji derine dûr, dengê tifingan tê. Li nik Memduh Selîm Beg jî dengbêjekî kal dastaneke kevn, bi dengê xwe yê melûl, tîne zimên... Yarebiyo! Ev çi dinya ye! Efsane, dastan, stran, şîîr, sewda, evîn, şer, mirin, kuştin, dijminahî... her tişt, her tişt ketiye nav hev...

Memduh Selîm Beg, guh li ser stranê, li nik dengbêj, li ser axa nerm dirêj bûye û li stêrkan dinihêre. Ev dastana kevn, ev stêrkên bêdeng, ev axa nerm... Eger haya yekî ji şerê malkaınbax nebûya û niha bihata vê derê, wî dê bawer bikira ku ew hatiye bihuştê. Stêrk dilîzin. Tirmê Mexilan, ew heft stêrkên stûr û ronî asman dineqişînin. Stêrka Qurux li spêdê Agira mezin dibişire. U Leyl û Mecnûn, ew her du stêrkên stûxwar jî li hev dinihêrin. Yek li rojhelat, ya din li rojava.

Cembeliyê Hekkarê û Binevşa Narîn. Leyl û Mecnûn...

«Xwediyo... Çima ev eziyet? Ma ev stêrên stûxwar dê tu carî negihên hevûdu?..»

## 9

Ji kêfa Ruhistîn re payan tune. Wî konê xwe di navbera çiyayên Agirî û Tendûrek de vegirtiye û kêf dike.

Şûrê wî, bêrawestan, dişixule. Her gav. Li her derê Agiriyê. Meriv dikevin. Xwîn dirêje. Birîn vedibin û Agirî, ev çiyayê serîbilind, reş girêdide.

Karwana mirinê ketiye rê. Di rêberiya Ruhistîn de.

Ruhistîn rûyê xwe yê bi xof nîşan dide. Mirin, wekî qirdekî, dikene û dikene. Havîna 1930 an bi xwînê tê avdan. Agirî xwîn dirijîne, xwîn digirî, xwîn vedirişe.

Dewleta tirk bi hemû quwetên xwe tê ser Agiriyê. 60 hezar piyade, deh batarî top, pênc sed û pênce mitralyoz û pênce balafirên şer. Serokê hêzên tirk qumandarekî navdar e; Salih Paşa. Kurd jî li ber xwe didin. Bi îmkan, çek û cebirxanên kêm. Roja 11 hezîranê. Roja êrîşa tirkan ya herî mezin. Rojeke xedar. Daweta Ruhistîn. Şer. Ordiya tirk dil dike ku warên kurdan rapêçe. Kurd dil dikin ku Agiriyê biparêzin û hêzên ku li pey ordiya tirk mane, ji paşiyê werin û li tirkan xînin. Ji Deyadîn, Tendûrek, Patnos, Ala Dax, Sîpan û Zîlanê.

Qiyamet radibe. Erd dinale, çiya digure. Rawir û teyr direvin. Dengê leşker û şervanan hawirdor digire.

20'ê hezîranê tirk şikest dixwin. Ew bi şûn de direvin. Tevî xesareteke mezin. Mirî, birîndar, dîl, çek û cebirxanên li cîh hîştî, pênc balafirên xistî. Kurd dikevin pey wan û wan ji gundan bi dûr dixînin. Lê tirk nahewin. Ew, car bi car, bi balafiran gund, cîh û warên kurdan bombebaran dikin. Balafir, ref bi ref, tên û bombeyên xwe berdidin ser kurdan û dîsan vedigerin. Kon û xanî hildiweşin. Ji her alî bîhna barûtê tê. Hevaljina Ihsan Nûrî Begê Yaşar Xanim birîndar e. Diya Biro Heskî Paşa mirî ye, bombayekê li ber pîrejina sed û deh salî diteqe û wê hûr dike. Kurdan xwe spartiye çeper, kozik, qelaş û şikeftên çiyê.

Memduh Selîm Beg tênagihê ka ew di nav vê agir û

xwînê de çawan dijî. Wext pir bi lez diherike. Meriv tên nik wî. Kom bi kom. Ew direve vê derê û wê derê. Ji bo alîkariyê. Ew rûdine name û belavok dinivîse. Bi kurtebirî; di van rojên xedar û giran de wext lê kêm bûye.

Niha jî, ew di şikefta birîndaran de, li nik birîndaran e. Birîndar di şikefta tarî de, li ser ka û pûşê raxistî, qor bi qor, dirêj bûne. Bergeheke nexweş. Serî, stû, sîng, çîp, pî, ling, zikên pêçayî. Keser, axîn, nalîn. Daxwaza av û dermanê. Daxwaza mirinê.

Memduh Selîm Begê çi divê? Ew li nik birîndarekî ye. Birîna birîndar pir xedar e. Zik qelişiye. Hûr û rûvî li derve ne. Zik bi libasekî spî pêçayî ye. Serê birîndar li ser cogê Memduh Selîm Begê ye. Xortekî çeleng. Simbêlbadayî. Rû û enî di nav xwînê de. Memduh Selîm Beg, bi destmalekê, rû û eniya wî paqij dike. Şervanê xort li ber xwe tiştina dibêje. Tiştine ku fahm nabin. Dengê wî ji deng bêtir xirexir e.

Memduh Selîm Beg çi bike, çi dikare bike?.. Bijîşk, nexweşxane, derman tune. Hacet û firaxên tenduristiyê tune. U li ber çavên wî jî, xortekî nûgihiştî li ber mirinê ye. Mirin rûyê xwe yê kirêt nîşan dide. Kincên li ser şervan lîme-lîme ne. Bîhneke giran ya barût, titûn, xwîn, ax û xwîdanê ketiye ser wî. Pêlavên çerm yên li lingan jî bûne qul-qulî. Şervan hay ji Memduh Selîm Begê tune. Li milekî ew xwîdan dide û li milê din jî diricife. Bîhn lê çikiyaye. Rûyê wî vedikişe, carina axîn dikişîne, carina jî dinale. Memduh Selîm Beg, hêdî hêdî, xwîdana li ser rû û enî paqij dike û bi dû re jî, destê xwe dirêjî milê wî dike. «Xorto!.. birayê hêja, li ber xwe bide, tu'ê zora birînê bibî...» Xort çavên xwe vedike, pêşî li destên Memduh Selîm Begê, paşê jî li rûyê wî dinihêre. Çavên wî yên stûr û reş westiyayî

ne. Eşa xedar û tirsa mirinê li ser çavan dixuyin. Hinarik û gumên wî sor bûne. Wekî ku ew dişewitin. Lêv jî terikîne, bûne reş û zuha.

«Xîret xorto, xîret...»

Şervan careke din li Memduh Selîm Begê dinihêre. Ken. Ken li ser rûyê Memduh Selîm Begê. Ew bi nêrîna şervan kêfxweş dibe. Şervan wî dibihîse. Niha, xort dixwaze tiştekî bibêje. Lê tiştê ku ew dibêje, fahm nabe. Dengekî tenik û şikestî jê derdikeve. Dengekî êştijî. Ew diricife. Di vê havîn û şikefta germ de, ew bi tayê ketiye. Bêyî ku Memduh Selîm Beg xwe bilivîne, ew bi hêdîka, çaketê li ser xwe ji xwe dike û davêje ser şervanê xort. Şervan jî, wekî ku pê qayil be, xwe dilivîne. Hingê ji devê wî tiştekî ku fahm dibe, derdikeve:

«Ax li min... Xwedeyo!»

Lê, piştî bîskekê, ew dîsan diheze û xirexir pê dikeve. Deng tê birîn. Lêvên wî, bi lez, dilivin. Bedena wî çend car, pihêt, vedikişe û diheze. U paşê... paşê jî ew bêhereket dimîne. Ew di bihara umrê xwe de ji dinya şer û pêveçûnê xatir dixwaze û dimire. Ruhistîn bi ser dikeve. Careke din. Bi bêbextî. Bi neheqî...

Mirin. Rûyê mirinê. Ev mirina rûreş çi ye? Çima ew weha bêwext û bêwar tê? Çima ew dê were û li qefesa singa xortekî weha rûne? Ev bedena ciwan û germ, niha, piştî çend deqîqan, bû meyit. Sar, bêruh, bêhereket. Ev çi ye?.. Du hêstir, wekî libên lûlûyan, ji çavên Memduh Selîm Begê ber bi jêr dibin. Ew porê şervanê xort mist dide û digirî.

## 10

Xewn.

Di xewnê de du kes. Kalemêrekî rîhspî û zarokekî biçûk.

Ji wan du kesan pê ve, goristanekê. Di xewna tariya şevê de goristaneke fireh wekî deryakê. Li dor goristanê darên têkel û stûr. U gor. Qor bi qor. Têkel. Mezin, biçûk. Nû, kevn. Xwe şlêkirî, xirbe.

Ew di goristanê de dimeşin.

«Kalo, çima em hatin vira?..»

«Memduhê min, çavreşê min... bav û kalên me li vê derê dinivin. Ev cîh warê me yê ebedî ye. Piştî ecelê em tên vê derê, nik mezin û qedirgirên xwe...»

«Kalo ecel çi ye?..»

Kalo dikene, neviyê xwe hembêz dike û dikene.

Dinya hûnik e. Hawirdor di nav hêşinahiyeke bedew de ye. Çivîk li ser daran difirin û vîçevîç dikin. Ji dûr ve kewroşk dixuyin û winda dibin. Goristan xweş û rengîn e.

«Memduhê min, goristana Wanê, yanê ev goristan yekta ye. Ev cîh hem xweş e û hem jî ji bo xewa ebedî wekî cennet e...»

«Kalo... xewa ebedî çi ye, kengê meriv dikeve vê xewê?»

Ecel, xewa dawîn, goristan û zarokekî biçûk.

«Kalo, heyra Kalo... ev der xweş e, min jê hez kir, em ji vir nerin...»

Destê biçûk di nav destê Kalo de ye. Ew bi hev re derin, di nav qebr û goran de digerin. Hêdî hêdî. Li dor wan, li ser goran kesine dixuyin. Kesine ku hatine serîlêdana miriyên xwe.

Bîhneke xweş. Bîhna hêşinahî, gul, kulîlk, dar, axa nerm û goran. Bîhna goristanê. Li dor goran gul û kulîlk. Reng bi reng. Kêfa lawikê biçûk di dewsê de ye.

«Kalo, ev însan çi dikin? Çima ev li ber wan mezelan rûniştine?»

Kalo jê re dibêje. Hêdî hêdî. Bi zimanekî xweş û

nerm. Bi zimanekî ku lawikê biçûk dikare têbigihê.

Li ber wan, li aliyê rastê çend jin. Ew li ber gorekê rûniştine. Di destên wan de kitêbine hene. Ji yekî pê ve, yên din hemû di nav kincên reş de ne. Ji yekî pê ve, yên din hemû serîgirtî ne. Ew yeka hanê jî di nav kincên spî de ye. Kincekî tenik û tûlîn lê ye. Ew serîvekirî û pordirêj e. Porê wê jî zer, rûyê wê spî wekî dilopeke şîr û bedew e.

«Kalo, ev jin çi dikin? Ev kî ne?..»

«Ez nizanim çavreşê min.»

Kalo û zarok riya xwe diguherînin û ber bi jinan dibin. Jin jî vedigerin û li wan dinihêrin. Li ser rûyê jinan tu tişt naxuye. Lê jina porzer li wan dinihêre û dibişire. Mîna ku ew wan dinase. Nêrîna jinikê germ e. Kalemêr û zarok jî lê dinihêrin û dibişirin. Kalemêr û zarok ber bi wan dilezînin.

Lê ji nişkekê ve tiştekî diqewime. Berî ku kalemêr û zarok xwe bigihînin wan, balafirine ji asmên dixuyin. Balafirine kesk yên leşkerî. Dengê balafiran. Her kes vediciniqe. Çi dibe?.. Balafir li ser goristanê difirin û bombe berdidin ser goristanê. Bombe diteqin. Ji axê toz û dûman radibe. Şênî belav dibe. Her kes ber bi alîkî direve. Koma jinan jî belav dibe. Ew direvin. Jina ku kincên spî lê ye, direve ku xwe bigihîne bin darekî. Jinên din ber bi milê bervajiyê direvin. Bombeyekê, bi dengekî pir bilind, di navenda wan de diteqe. Her yek ber bi alîkî dipengizin. Qîrîn û hawar. Lê kî dê were alîkariyê?..

Kalemêr û lawikê biçûk jî ber bi aliyê jina kincspî direvin. Diyar e, wan jî dil heye ku xwe bigihînin bin eynî darê. Lê nabe. Bombeyekê li ber wan diteqe. Kalemêr ber bi milekî, lawikê biçûk jî ber milekî din difirin. Axîn. Qîrîn. Dengekî zîz. Barût. U tiştekî germ û

ron. Xwîn. Nefesa lêwik tê birîn. Bîhna wî diçike. Çav lê giran dibin.

Mirin û Ruhistîn rûyê xwe nîşanî lawikê biçûk dide. Di goristana xweşik û rengîn de Ruhistîn li dor lêwik digere.

Di xewna Memduh Selîm Begê de mirin, ecel, Ruhistîn govend digirin...

## 11

Ihsan Nûrî Paşa, Biro Heskî Paşa, qumandarê cendirman yê wîlayeta Agiriyê Temir Axa, qeymeqamê Korhonê Mele Husên, berpirsiyarê nehiya Ortîlî Hesen Efendî, berpirsiyarê nehiya Korî Musa Axayê Berkî, qumandarên kurd Ferzende Begê Hesenanî, Xalit û Nadîr Began, Demir Paşa, Emîn Paşa, Mamoyê Heyderanî, Seyid Resûl û Husên Axa û niwênerên partiya ermenî Taşnaqê, gelek qumandar, serok û berpirsiyarên din yên hêzên kurdan. U Memduh Selîm Beg.

Rojev; em çi bikin?

Ordiya tirkan êrîş dibe ser gundên doralî, gund dikin kavil û xirbe û rûniştevanên gundan dikujin. Ew bi vî awayî tola xwe ji hêzên leşkerî yên kurdan hiltînin. Heta niha, li doraliyê Agiriyê sed û sîh û li doraliyê Zîlanê jî bi qasî du sed gund hatine şewitandin. U hejmara kuştiyan jî li ser deh hezarî ye. Deh hezar zarok, jin, kal û pîr. U bi hezaran gundî jî ber bi Anatoliyê hatine koçkirin.

U tiştekî din; dewletên tirk û îranî li hev hatine. Dewleta tirk li doraliyê Wanê hin erd dane Iranê da ku ew bikaribin li hev bikin. Li gor vê peymanê, êdî tirk dikarin niha bikevin erdê Iranê û ji paşte werin û li hêzên kurdan xînin. Iran hew rê dide kurdan. Tixûb li wan hatiye girtin. Ordiya tirk dor li wan girtiye. Ji der-

ve tu alîkarî nayê. Xwarin, zexîre û terzad li ber qedandinê ne. Cebirxane vala dibe. Birîndar yek bi yek dimirin. Zar û zêç birçî ne.

Çi dive?

Pêşniyara niwênerê Taşnaqê; «heke ta 24 saetan em ji Agrî dernekevin, hemû hemû bi destê tirkan dikevin...»

Yanê pêşniya valakirina Agiriyê. Kurd li hev dinihêrin. Çawan dibe! Ev zehmetî, dijwarî, şer, mirin û kuştin ji bo vê yekê bû? Çawan alaya rengîn ya serbestî û azadiyê dakeve? Çawan ew dîlbûn û bindestiyê, ji nû ve, qebûl bikin? Na, weha nabe. Evçend sivik û erzan nabe. Dijmin dê nikaribe, zû bi zû û evçend erzan, navenda şoreşê vegire.

Ihsan Nûrî, tilî li ser simbêlê badayî, hêdî hêdî, bi dengekî zîz dipeyive.

«Rast e, di nav ev deryaya neyar de nexeniqîn dijwar e, belam em kurd in, ji gemarobûn natirsin. Her an dil bikin û gemaro çiqas tengtir û zortir be jî dikarin wê bişkênin. Ji xwe em naxwazin ji Agrî derkevin!..»

Gotina daxwaza dilê kurdan. Şer divê, heta dawîn şer divê. Lê niwênerên Taşnaqê li ser pêşniyara xwe israr dikin. «Qe nebe, fermandarê kurd nefsa xwe li gel xanima xwe ji Agrî derkeve...»

«Ev pêşniyara te ji bo gotin nahêj e: ez ji bona jiyana şexsê xwe ji azadiya netewî dest nakêşim, giyanê min ezîztir ji hevalên min, ji ev qaremanan nîne, jiyan û mirina min yek e, ez tu car ji wan naqetim! Heke teqdîr be, em tevî hev dimirin! Tu bi xwe dibînî, sî-çil hezar hêzên neyar dor li me girtine, li pêşiya yek pêşmergê me ji sed û pêncî esker kêmtir nîne, hê helqeya gemaro bi temamî li dora Agrî nekêşane, hêzên tirkan ku teze hatine Serdar Bulaxê, îşev nikarin aliyên xwe qors bi-

kin, ji vê derfetê kelk bigirin, şarezayên xwe jî hildin, îşev ji Agiriyê derkevin!..»

Gotina Ihsan Nûrî ya dawîn. Kurd Agiriyê naterikînin. Ihsan Nûrî Agiriyê naterikîne. Ew dê li ber xwe bidin û şer bikin. Lë niwênerên Taşnaqê dikarin herin.

Memduh Selîm Beg?

«Iskender Beg jî dikare bi we re here.»

«Na, mîrê min, ez naxwazim... Ez dê we li vê derê bihêlim û herim!.. Na, na, nabe. Ez dimînim.»

«Birayê Iskender, êdî tiştekî ku tu li vê derê bikaribî bikî, nema... Çêtir e ku tu herî û hal û hewalê me ji dinyê re bidî zanîn...»

«Na, mîrê min, na... nabe, welle nabe, ez'ê li nik we bimînim.

## 12

Nîvê şevê. Her der tarî. Heyv çûye ava. Stêrk li spêdên çiyayên Agiriya mezin û biçûk dilîzin. Ji dûr dengê wawîk û çeqelan tê. Şeva avis li ber welidanê ye. Piştî niha bi bîskekê, rojeke nû dê bizê.

Lê berî ku roj bizê, divê hin tişt bi ser kevin. Di navenda qumandariya hêzên kurdan de lebateke bêdeng. Çûyin û hatin. Hazirî. Haziriya terkkirinê. Pênc ermen û Memduh Selîm Beg warê serîhildanê û navenda qumandariyê terk dikin. Tevî çend şervanan. Ew dê herin. Bi hêviya ku ew riyekê bibînin û xwe bigihînin Iranê.

«Mîrê min, ev neheqî ye... Hûn neheqî li min dikin. Hûn min bi zor dişînin...»

Iskender Beg, weha çêtir e. Tu bawerî bi qisê min bîne. Weha, ji bo me hemûyan, çêtir e...»

Xatirxwestin. Hevûdu hembêzkirin. Gotinên xweş yên dawîn. Ken. Qumandarên hêzên kurd. Yek bi yek.

Merivên jêhatî, xurt, bîrewer û fedakar. U serfiraz; ji bo welatê xwe çekhildayî. Rûyên wan yên bi ken. Bi bawerî, dilsozî û dilovanî li Memduh Selîm Begê nihêrîn.

«Heyra... li xwe binihêrin... Bila tiştekî bi we nebe. Hûn qehremanên vî milletê belengaz in. Hûn hêviya me ne. Ezbenî, bila tiştekî bi we nebe...»

Yaşar Xanim. Hevaljina dilsoz. Jina xurt û bedew. Ew jî li nik mêrê xwe, Ihsan Nûrî dimîne.

«Yaşar hanim, bari siz de bizimle gelseydiniz?..»

Memduh Selîm Beg jê, bi tirkî, tika dike ku ew jî bi wan re here. Lê belê, na. Ew naxwaze. «Her meteris be, Ihsan Nûrî hebe ez jî hevbeş im, qet di nav agir de nahêlim, xwe xelas nakim, hûn herin, Xwedê yarê we be!..»

Ew jî nayê. Tu kes nayê! Lê Memduh Selîm Beg divê here, divê van merivan di nav agir de berde û here! Ew xelas be, ev jî di nav agir de bimînin!

Siûda xirab!

«Di xweşiyê de bimînin. Hûn bijîn. Hûn serfiraz bin. Ez derim... hûn min dişînin, lê dilê min bi we re ye, dilê min bi we re ye. Ez dê her li we bifikirim, saet, roj û mehan bihêjmêrim û li we bifikirim... Bi xatirê we...»

«Oxir be, Iskender Beg, oxir be...»

Oxira te ya xêrê be Memduh Selîm Beg.

# ŞİKESTİNA MİRAZAN Û WEXT

# 1

1931. Dawiya zivistanê. Ber bi êvarê. Bajarê kevnare, Antaqiye. Bajarê Memduh Selîm Begê.

Kolanên şil û vala. Mij. U Memduh Selîm Beg. Ew vegeriyaye. Edî şerê xopan li pey maye. Naxêr, şer li pey nemaye, lê Memduh Selîm Beg ew li pey xwe hîştiye. Ew ji agirê şer bi dûr ketiye. Agirê evînê, niha, dewsa agirê şer girtiye.

Ew li ser riya mala xwe ye. Ew, hêdî hêdî, di kolanên kevn û şil de, ber bi mala xwe dimeşe û li dor xwe dinihêre.

«Xwedeyo... Qederê!.. we weha li min kir. Ez dîsan hatime bajarê xwe... ez derim mala xwe... bajarê min, mala min... ev warê xerîb bûye yê min. Berî heşt salan min welat, bajar û mala xwe li pey xwe hîştin û ez hatim van deran. Niha jî ev der bûne warê min, bûne welat, bajar û mala min... qederê, qederê...»

Xerîbî, hîsên xerîbiyê... Lê belê, ew. Digel xerîbiyê ew heye. Yanê Ferîha. Xezalê... Edî wext hat. Payin û payandin nabe. Keça reben evçend pa, evçend li hêviya wî ma. Bi evîn. Bi axîn û nalîn. Digel ku her tişt li dijî payinê bû. Niha, êdî wext wexta perûkirinê ye. Payin û

dilsoziya evînê divê perû be. Belê, êdî Memduh Selîm Beg zewac divê. Zar û zêç divê. Dukesbûn, ducanbûn divê. Jiyaneke ku her roj bi evînê tê avdan divê.

Ew dê, niha, here mala xwe, li mala reben û bêkes binihêre, xwe bişo, gemariya mehan ji ser xwe bavêje, xwe kur bike, kincên paqij li xwe bike û paşê jî berê xwe bide mala bavê Xezalê. U ew dizane ka qisa wî ya pêşin dê çi be:

«Li min bibuhirin ku ez weha bi derengî ketim. Li min bibuhirin ku her tişt weha bi derengî ket. Lê niha, êdî tu kesp û kosp neman. Em hema, bi carekê, zewac û dawetê bi ser xînin. Iroj, sibê, dusibê... rojeke zûtirîn...»

Lê ew çi ye?

Do zarok. Kurekî û keçekê. Li kolana vala. Li ber mala Memduh Selîm Begê. Deriyê mala wî jî vekiriye. Zarok dilîzin, lotikan davêjin. Fîstanên li ser wan heta çogan şil bûye. Baranê kolan şil kirine. U jinikek ji derî dixuye. Ji deriyê mala Memduh Selîm Begê!.. Jinik bang li zarokan dike. Bi tirkî. Keçika biçûk direve û dere hundir, dikeve mala Memduh Selîm Begê.

Ev çi ye? Rv çi tişt e? Ev kî ne?

Memduh Selîm Beg, bi lez, nêzîkî li derî, li jinikê dike. «Hûn kî ne? Hûn li vê malê rûdinin?..» Pirsine. Bi tirkî. Bi heyecan. Bi lez.

Belê. Malbateke ermen. Wan nû ji Turkiyê koç kirine. Belê, zarok jî yên malê ne. Mêrê malê mamoste ye. Ew ne li malê ye. Berî şeş mehan ew hatine vê malê. Bi alîkariya dostekî wan yê çerkez. Lê ew ji malê zêde ne razî ne. Mal biçûk e. U tiştekî din; wan tiştên nebaş di derheqê kiravanê kevn de bihîstine. Dilê wan pê dişewite.

«Çi... we çi bihîstiye? Hûn wî dinasin?»

Rewşeke balkêş. Tiştê ku Memduh Selîm Begê nedipa. Pirs li pey hev tên... Naxêr, ew kiravanê kevn nenasin. Ne jinikê û ne jî mêrê wê ew tu carî nedîtine. Wan bihîstiye ku ew merivekî hêja, dilsoz û pak bûye. Lê hinekî dînek... Wan li ser evîna wî jî pir tişt bihîstine. U berî niha bi demeke dirêj, camêr, kiravanê kevn çûye rehmetê.

«Çawan? Te got, ew çûye rehmetê? Li kû? Kengê?»

Belê, ew çûye rehmetê. Jinik baş pê nizane ka kengê, çawan û li kû. Lê li gor gotinan, camêr di şerekî de hatiye kuştin.

«Camêr hatiye kuştin...» Ecêb. Ecêba giran. Memduh Selîm Beg li Antaqiyayê, li ber mala xwe dibihîse ku Memduh Selîm Beg hatiye kuştin.

2

Li mala bavê Ferîha'yê. Li mala dostê çerkez. Eynî roj. Evar. Memduh Selîm Beg û dostê wî li odê rûniştine. Bêdeng. Bi qahr û keser. Ji derve dengê baranê tê. Bêdengiya hundir ewçend zîz e ku meriv derzî bavê erdê, dengê derzî dê were bihîstin.

Evareke tahl, kirêt, zîz, ji agirê dûjehê xirabtir. Evareke ewçend dilsoj ku bi peyvan nayê salixdan. Ma Memduh Selîm Beg ji vê êvarê xirabtir êvar jiyaye? Ew niha mirinê dil dike. Di dewsa vê êvarê de mirinê. Xwezî ew, bi rastî, li ser çiyayê Agiriyê bihata kuştin, bombeyeke balafirê, bi rastî, bihata û li ser serê wî biteqiya...

Vê êvarê dinya wî hilweşiya. Miraz û daxwaza wî ya herî mezin, herî xweş, herî muqeddes şikest. Dinê li ber wî reş bû. Mala hevalê çerkez bû cehenem. Dilopên barana derve bûn pêtên êgir û ketin pêsîra wî...

Ew çi bibêje, çi bike? Ji destên wî çi tê?

Ferîha tune. Ferîha çûye. Ferîha zewiciye. Belê, rast e, wê mêr kiriye û çûye Urdinê.

Hin demên kin û kurt hene ku dikarin jiyanekê, bi carekê, ser û bin bikin. Hin roj, şev yan jî demên bûyeran hene ku di jiyanekê de şopin kûr, pir kûr dihêlin. Hin xeber hene ku wekî berikekî, tîrekî dadicike dilê meriv û di dilê meriv de birînên kûr û ebedî vedikin.

Ferîha wekî stêrkekê firiyaye û ber bi deverekî nenas çûye, winda bûye. Ken û çirûskên li ser çavên wê hew ronahî direşînin ser malê. Bedena wê ya bedew hew dixuye. Bîhna wê hew malê tijî dike. Dengê kemançê hew tê. Di dewsa wê de, niha, li mala bêdeng pisîngekê heye. Pisîngeke biçûk û belek. Pisîng li quncikeke odê dirêj bûye û bêdeng dibihnije, -wekî ku wê jî hay ji rewşê heye.

Dê, pezkoviya mader, li holê naxuye. Niha, bi zewaca Ferîha'yê, miraza dilê wê bi cîh bû? Qise û gotinên wê xelas bûn? Gelo ew niha çi difikire? Dilê dê! Dilê malkambax!

«Tiştê bû, mekeve dû.» Gotina kurdan. Lê niha ev gotin ne rast e. Çawan mekeve dû?.. Tiştê ku bûye, jiyana Memduh Selîm Begê ser û bin dike, di jiyana wî de şopin kûr dihêle. Ew bi vê yekê dizane. Tiştê ku bûye, windabûna evînekê ye. Evîneke paqij, delal, xweş. Qederê! Siûda xirab!.. Sersariya Memduh Selîm Begê. Ne qeder, ne jî siûd. Sersariya, gêjahiya wî bi xwe. Sebeba esasî ev e. Ma evîn bergeheke bêruh e ku her û her di dewsa xwe de bimîne? Ma Memduh Selîm Begê nizanîbû ku evîn jîndar e? Ma meriv lê xwedî dernekeve, wê neparêze, jê hez neke, ew dikare bijî û geş be? Ma gul bê av, ax û tavê dibe?

Sersariya Memduh Selîm Begê bû sebebê windabûna evîn û evîndara wî. Ev yeka weha ye. Ew divê li xwe

gilî bike, ne li kesekî din. U ew dê her û her bikeve pey tiştê bû. Ew dizane, tiştê bû dê her û her pê re be. Wekî nexweşiyeke bêeman. Wekî kuleke xedar. Wekî siya wî.

Di bêdengiya şeva Antaqiyayê de, Memduh Selîm Beg, li oda tarî, li nik dostê xwe rûniştiye û bi van yekan dihese.

Eger Memduh Selîm Beg hinekî zûtir, berî du-sê mehan bihata, tiştê bû, dê nebûya. Hingê jî wext û keys hebû ku meriv rê li tiştê bû bigirta. Yan jî Memduh Selîm Begê xeberek bigîhanda dostê xwe, bi awakî nîşan bida ku ew dijiya.

Name? Nameyên ku Memduh Selîm Begê şandibûn?

Ne name, ne jî xeber. Tu name negîhane destê dostê wî. Tiştê ku wan bihîstine, şehîdbûna Memduh Selîm Begê bûye. Ji her kesî, li her derî. Hevalên Memduh Selîm Begê jî welê bihîstibûn, ew heta niha jî welê dizanin.

Kî dizane ka çi bi serê nameyan hat? Ew li kû man û ketin destê kê? Ma kevir dê bibariya, eger nameyekê bigîha Antaqiyayê!.. Ma riyeke din û çêtir tunebû ku Memduh Selîm Beg xeberek bigîhanda dostê xwe? Ma hevalên wî, Partiyê nikaribû xwe biêşanda û rastiyê hîn bibûya? Ma Ferîha'yê nikaribû hinekî din jî bipa? Ma çima Memduh Selîm Beg hinekî zûtir nehat? Çima dengê mêjî zora dengê dil bir? Çima dil weha qels derket, dengê xwe bilind nekir?.. Ma, çima, eger...

Di êvara tahl, kirêt û zîz de fikir û gumanên têvel. Hawara bêdeng ya dilê şewitî. Hêstirên hilweşîna miraz û hêviyan.

## 3

**«Lê binihêrin, dê û xwîngên min, lê binihêrin...»**

«Wî diya min, ma kê dizanibû ku ew dê weha be.»

«Belê, belê... lîstika siûdê. Xwedê dike, diya min, Xwedê... binihêrin Memduh Selîm Begê keserkûr çawan dimeşe, çawan pê li kevirên kolanê dike.»

«Mirazkoro mêro! Bextreşo mêro!»

«Lê gunehê wî bi xwe bû, diya min. Ma Xwedê jê girtibû? Ma çavên wî nedidîtin? Ma wî nedidît çawan Ferîha vedimire, diçelmise?»

«Axir... heyf bû, xwişka min, heyf. Mirazên vî mêrê hêja qurmiçîn û Ferîha reben jî ket çolan û ket hembêza kalemêrekî qozikxwar.»

«Tifû li te bextê reş...»

«Hûn dibînin Memduh Selîm Beg çawan kal bûye... Rûyê wî hûr bûye, çavên wî ketine kortê, pişt û stû lê xwar bûye.»

«Wele diya min, ew dîsan baş li ber xwe dide. Ma kî bûya, piştî evçend tişt û bûyeran, ew dê bêtarê bêtaran bihata serî.»

«Dev jê berdin lê, heq û misteheqê wî ye.»

«Wer mebê, diya min, wer mebê. Guneh e. Me, her kesî bawer dikir ku ew miriye. Lê ew vegeriya û hat. Bi daxwaza zewacê... Ew çi bike! Di qedera wî de weha hatiye nivisîn.»

«Xwedê merivan ji bêtarên giran star bike.»

«Lê halê wî tu ne hal e. Welatê wî çû. Mal çû. Destgirtî çû. Kar çû. Heval û dost çûn... Ne rehet e, diya min.»

«Xwedê pê re be, Xwedê piştgirtî lê bike.»

«Ew niha çi dike, li kû dimîne?»

«Dibêjin, ew niha li otelekê dimîne, bi şev û roj li wir e. Ew ji otêlê dernakeve. Bi şevan, heta sibê lampa wî vêketiye...»

«Ew niha ber bi kû dere?»

«Kî dizane diya min, heye ku ew bi xwe jî pê nizane.»

«Ka ew Memduh Begê ku nû hatibû û bi rêçûyina xwe kolan dihejand.»

«Xwedê mezin e, diya min. Rûyê wî jî dê, rojek, bikene. Xwedê dê deriyeke xêrê jê re jî veke.»

«Xwezî, diya min, xwezî... tu xirabiya vî camêrî ji kesî re nebûye. Her kes jê hez dike. Ma çima ev derd û bela tên serê wî?»

«Bav û diya Ferîha'yê jî pir li ber xwe dikevin, pir pê dieşin.»

«Ma kê texmîn dikir, diya min, ku Memduh Beg dê vegeriya!..»

«Eger Ferîha pê bihese ku Memduh Beg dijî, ew dê dîn be.»

«Rebena Ferîha'yê, bextreşê, belengazê...»

«Xwedê sebir û taqet bide wan.»

4

«Monsieur Memduh Selîm, mixabin ji destê min tiştekî nayê. Biryar ji jor e...»

Li makama Major Collet. Major Collet; kumandarê hêzên eskerî yên fransizan li Antaqiyayê. Serokê heremê. Hukimdarê Iskenderûn û Antaqiyayê. Fransizekî navsal, bejndirêj, pozmezin, porspî û rûtirş.

Darbe li ser darbê tên. Memduh Selîm Beg di bin darban de dihinciqe. Niha jî darbeyeke giran ji fransizan tê; kar ji destê Memduh Selîm Begê tê girtin. U ne bi tenê ev, herweha, ew divê dev ji Antaqiyayê jî berde. Yanê dîsan sirgûnî, penahendegehî. Ber bi Şamê. Di welatê xerîbiyê de jî sirgûnî.

«Monsieur Memduh Selîm, tu diviya bi siyasetê bilî nebûyayî. Di destpêkê de, gava tu hatî Sûriyê, qewlê

me, bi te re, welê bû. Lê te ev qewl xist bin lingan. Li gor raporan, tu yek ji serokên organîzasyona siyasî Xoybûnê yî. U bi qasî demeke dirêj, tu li Araratê mayî. Weha nabe, Monsieur, weha nabe...»

Fransa, fransiz, hukimdariya wan ya Lubnan, Sûriye û Antaqiyayê, major Collet û siyaset. Siyaset... Memduh Selîm Beg divê siyaset neke... Memduh Selîm Beg niha çi bike? Bigirî yan bikene? Ken. Bê guman, ken. Pêşî hêdî hêdî. Wekî ku ew dibişire. Ken li ser rûyê Major Collet jî. Paşê, piştî kena nerm, coşa kenê. Berz. Pir berz... Haaa... haaaa... haaaaa... Bi dirêjahiya deqîqan. Demeke dirêj. Major Collet niha nakene. Ew, bi heyret, li Memduh Selîm Begê dinihêre. Lehiya kenê bi ser Memduh Selîm Begê re hatiye. Ew dikene, dilerize, dest û piyên xwe dilivîne. Kenê kel daye.

Belê, Memduh Selîm Beg divê li ser ken û celebên kenê bixebite û tiştekî dirêj binivîse. Wekî ronakbîrekî kurd. Ew divê trajedî-komediya ku li welatê kurdan berpêş dibe teswîr bike... Ken; babeteke cîddî. Kena kêfê, kena kerbê, kena rik, kena serbestiyê, kena bindestiyê, kena maxrûrî û biserketinê, kena têkçûn û hilweşînê. Kena Major Collet û Memduh Selîm Begê... Memduh Selîm Beg divê li Aristoteles vegere, Molier bixwîne û tarîxa kena rûgeş û kena rûreş derxîne û tarîxa kena rûgeş û kena rûreş ya Kurdistanê li wan zêde bike. Ken. Kena ku ji tirsê pêk tê, ji nezaniyê pêk tê, ji bêçaretî û bêgaviyê pêk tê... Memduh Selîm Beg dikene.

«Monsieur Collet, li min bibuhirin, min nema dikaribû xwe ragirta. Hûn behsa siyasetê dikin. Em li kû, siyaset li kû? Siyaset karê we mezinan e. Em xelkên hûr, reben û nezan ji siyasetê çi fahm dikin? Siyaset di mit-

baxa we de bi kel dikeve. Para me jî bîhnkirina wê ye.»

Piştî kena berz û dirêj, li ser siyasetê jî gotareke dirêj. Bi dengekî nerm. Bi edeb û terbiye. Lê her peyvekê ji berikekî xurttir. Di oda fireh û xweşraxistî de, niha kerb, kîn, hêrs û rik dipeyive. Ji tiştê windabûyî pê ve, ma tu tiştên ku Memduh Selîm Beg, êdî, winda bike, mane?..

«Welatê me perçe bûye, her tiştê me hatiye qedexekirin, xelkê me di bin eziyet û zulmeke ecêb mezin de ye... Eger hûn, belê hûn di rewşeke weha de bûna, we dê çi bikira?»

Bêdengî. Li Memduh Selîm Begê nihêrîn. Lê bêdengî.

«Em jî ew tiştên ku her kes mecbûr dimîne û dike, dikin, monsieur Collet. Ne zêde, ne kêm. Em dixwazin welatê xwe biparêzin. Em siyaset nakin, xwe diparêzin, dixwazin xwe biparêzin. Siyaset ne karê me ye...»

«Ez dizanim, monsieur Selîm, ez dizanim, rewşa we ne baş e.»

Dîsan ken. «Rewşa we ne baş e...» Pêşî hêdî hêdî. Paşê wekî rûbarekê, wekî lehiyekê. «Rewşa we ne baş e...» Peyvên kîbar û nazik. Lê sar. Bê ruh. Ji rastiya germ û dijwar ya kurdan pir bi dûr. Rastî, rastiya kurdan. Rastiya merivê kurd. Rastiya jiyana Memduh Selîm Begê. Jiyaneke tevlihev, têkel, bi lez û bez, bêdaxwaz û miraz, tijî tehlûke, her gav nêzîkî mirin û kuştinê. Wekî gerekê, meşekê di newala mirin û kuştinê de. U peyvên ku doralî li jiyana Memduh Selîm Begê girtine; mirin, kuştin, bidarvebûn, bidarvekirin, zîndan, girtîxane, zor, zordarî, bindestî, sirgûnî, hawar, şer, liberxwedan, fedakarî, xebat û h.w.d...

Gava jiyanek bi van peyvan were rapêçandin, hingê çi dibe? Ev sereskerê fransizî ku li hember rûniştiye û fer-

manan direşîne, dikare jiyaneke weha fahm bike? Ken... haaa...haaaa...haaaaaaaa...

Esebiyet.

«Monsieur Collet, ez bi gotinên we bawer im. Bê guman, hûn bi rewşa me dizanin. Lê ez baş ne bawer im ku hûn wê têdigihên. Ma hûn, bi rastî têdigîhên, hûn dikarin têbigihên?.. Hûn jî dizanin, zanîbûn tiştekî ye, têgihîştin jî tiştekî din e. Têgihîştin ji zanibûnê dijwartir e. Pir dijwartir e. U hin tişt jî hene ku meriv divê wan bijî da ku wan têbigihê...»

5

«Berî min wext tunebû, piştî min jî
wext dê nebe
Wext bi min re dest pê dike
U bi min re diqede...»

Çend rêz ku ji rojên Parîsê û xwendinê mane û hê jî di heşê Memduh Selîm Begê de ne. Çend rêz ji Daniel von Czepko, Sexcenta Monodisticha Sapientum, ji sala 1655 an. Ax ew roj! Rojên xwendin, tarîx û felsefê. Rojên şêt yên xortiyê. Rojên hînbûn û haziriyê. Rojên germ, zelal û pak. Ji wan rojan çi man? Çima wextê, wexta malkambax weha kir?

Tola wextê. Belê, gotinek rast û di cîh de. Wext tola xwe distîne. Wext şopa çewtî û şaşiyan hildide û tê tola xwe digire.

Memduh Selîm Beg û wext. Tola wextê û Memduh Selîm Beg. Xezeba wextê û Memduh Selîm Beg. Li meyxana ermenan. Di navîna şeva reş de. Li ber xezeb û tola wextê. Birîndar. Stûxwar. Bîhnteng. Dilşikestî. Hêvîşikestî. Ferî çavan vemirî. Lê keneke qurmiçî li ser rû.

Bi serê xwe, tenê. Li ser masê çend texlîd xwarinên

ermenî. Dost û yara jibîrkirin û teseliyê; şûşa araqê. Cacix. Pakêteke cixara Gitane. Li koşa meyxanê, wekî her carî, bilûrvanê kal. Dengê bilûra wî ya melûl. Çend kesên din li dora çend maseyan.

U wext... û tola wextê.

Memduh Selîm Beg divê dev ji Antaqiyayê jî berde. Di nav du heftan de. Ew divê jiyana xwe ya sirgûniyê hilde pişta xwe û here deverekî din yê sirgûniyê; Şamê. Merivdewletên fransiz ronakbîr û xebatkarên kurdan ji ser tixûbên Turkiyê bi dûr dixînin... Piştî evçend tiştên tahl, niha jî, pêşerojeke nexuya.

Wext niha li dijî Memduh Selîm Begê diherike, dilê wî digivişîne, mêjiyê wî dike warê şerên dijwar. Wexta malkambax niha her tişt guhertiye; reng bi tenê bûne rengên bed û mirdar, bîhn bi tenê bûne bîhnên genî, tahm bi tenê bûne tahmên tahl, tûj û tirş, deng bi tenê bûne dengên nexweş û hîs bi tenê bûne hîsên mirî...

Memduh Selîm Beg çi divê? Ev divê çawan xwe li hember êrîşên wextê rabigire?.. Wext divê neherike. Wext divê bi wî dest pê bike û bi wî biqede, -wekî ku di ew rêzên rojên Parîsê de hatibû nivisîn. Lê çawan? Meriv çawan dikare zora wextê bibe?.. Wî di destpêka 1900 an de kitêbeke H.A.Giles xwendibû; Chuang Tzu. Di kitêbê de, berî 2500 salan Chuang Tzu xewnek dibîne. Di xewnê de ew pepûlekeke biçûk e û difire. Gava ew ji xew hişyar dibe, ew nizane ka ew pepûlek e ku di xewna xwe de merivekî dîtibû yan jî, ji bervajiyê, ew merivekî bû ku di xewna xwe de pepûlekek dîtibû. Chuang Tzu weha digot;

«Min di xewna xwe de didît ku ez pepûleyek bûm ku li asmanan difiriyam û min tu tişt di derheqê Chuang Tzu de nizanîbû.»

Chuang Tzu hosteyê xewnan bû. Bê guman. Wî wext

li gor xwe eyar dikir. Ew serdestê wextê bû. Reng, bîhn, tahm, deng û hîs li gor daxwaza wî şekil digirtin. Ew hosteyê peyv, gotin, qise û terman bû jî. Wî bi xwe naverokek dida wan. Gava wî dixwest, ew dibû pepûle û gava dixwest jî, ew dibû meriv.

Memduh Selîm Beg jî divê bibe serdestê wextê. Wext divê li gor daxwaza wî şekil bigire, ne ku ew. Gava bîhn lê teng dibe, nefes lê diçike, ew divê bibe pepûleyek û bi firê bikeve. Do, îro û sibe divê bikevin nav hev û ew di nav wan de, li gor daxwaza dilê xwe, here û were. Ew çar deng, ew çar dengên pir hêja divê winda nebin. Ew divê xwe ji xezeba wextê bide alî û li hember lîstikên qederê xwe rabigire û bikene. Yan na, yan na...

Hingê Memduh Selîm Beg nabe Memduh Selîm Beg. Hingê ew têk dere û hew ji navîna şeva reş derdikeve. Meriv di nav wextê de dijî, di rûbara wextê de diherike. Lê Memduh Selîm Beg divê, bi xwe, bibe rûbar. Wext agir e ku dişewitîne. Lê Memduh Selîm Beg divê, bi xwe, bibe agir. Dinya heye. Wext heye. Lê Memduh Selîm Beg jî heye.

Yan na... Yan na...

Lê çawan?

6

«Ferîha'yê, Xezalê,
Li te difikirim,
Li evînê, evîna me difikirim.
Li rastiya can, dil û ruh difikirim,
Li tesîrên wan, li ew demên me yên kurt, lê xweş û hêja difikirim.
Ez, hevalê te, evîndarê te yê bêheş di nav valahî û bêdengiyeke boş de rûniştime û difikirim,

Li wext û xezeba wextê difikirim, li wexta bihu-
rî.
Ew demên xweş bihurîn, ew çûn, êdî ew bi şûn
de venagerin,
Edî dereng e, pir dereng...
Lê ez heme, ez dijîm, mixabin, ez heme, ez dijîm.
Li Şamê, di nav dilkeseriyeke malkambax de.
Ez li te difikirim,
U difikirim ku ez dê, tim û tim, li te bifikirim...»

Memduh Selîm Beg ne şaîr e. Ew bi tenê evîndarê şiîran e. Ev cara yekemîn e ku Memduh Selîm Beg rahiştiye penûsê û bi awakî şiîrî kerb û keserên xwe tîne zimên. Bi tirkî. Ne ji bo kesekî din. Ji bo xwe. Ew dizane; nivîsîn jî derman e. Dermana dilên bi birîn. Dermana li dijî xezeba wextê.

Wekî pir tiştên din, niha Antaqiye û jiyana Antaqiyeyê jî li pey wî man. Niha Şam heye. Şama şerîf. Bajarê kevn. Yek ji navendên kultura îslamê. U li Şamê jî taxa kurdan. Belê, taxa kurdan. Warê kurdên Şamê. Taxeke peregende, neçar, belengaz. Di quntara çiyan de. Xanî li ser hevûdu. Kolan û kuçên biçûk û tevlihev. Taxek ku ji jiyana bajêr bi dûr e. Warê kurdan; warê kesên bêwelat, warê kesên ji welatê xwe reviyayî, warê kesên ku nikarin li tu deveran bi cîh bin û rehên xwe biçînin erdê.

Memduh Selîm Beg li mala dostekî xwe dimîne. Bê guman di taxa kurdan de. Ji Memduh Selîm Begê pê ve, gelek kesên din jî sirgûnê Şamê bûne. Piraniya wan jî hevalên Memduh Selîm Begê ne; Celadet Bedirxan, Qedrî, Ekrem û Mihemed Cemîlpaşa, Hemzeyê Miksî, Dr. Nafîz û birayê wî Nureddîn Usif. Ew jî li taxa kurdan, li mala Elî Axayê Zilfo dimînin. Herweha Haco

Axa û zarokên wî jî.

Hevalên wî, niha, dizanin ku Memduh Selîm Beg nemiriye û dijî. Niha Memduh Selîm Beg jî dizane ku hevalên wî pir xwestine ku alîkarî li Agiriyê bikin û xwe bigihînin şoreşê. Lê ji ber sebebên dûr û dirêj tu tişt bi dest neketiye. Niha ew dizane ku hevalên wî, serokatiya Xoybûnê hewl daye ku ji ser tixûbên Sûriyê jî serîhildanek pêk bînin û êrîş bibin ser Turkiyê. Wan xwestiye bi vî awayî jî alîkarî li şoreşa Agiriyê bikin. Lê mixabin, ev jî bi ser neketiye. U ji ber vê yekê ye ku fransizan kurd ji tixûbê bi dûr xistine û ew anîne Şamê. Niha ew dizane ku navbera Turkiye û Firansê ji her carî çêtir e.

U Memduh Selîm Beg niha bi tiştekî din jî dizane; şoreşa Agiriyê bi temamî têk çûye, Ihsan Nûrî Paşa û hevalên wî xwe spartine Iranê, ji şervanan gelek li der û dorên Agiriyê mane û hinan jî xwe gîhandine Sûriyê û ordiya tirk her der vegirtiye û gundên doraliya Agiriyê kavil dikin... U dinya jî, bêdeng, li vê bûyerê temaşe dike.

Bûyerên nexweş û tahl yek li pey yekî tên. Her der tarî ye. çilka hêviyê li tu derî naxuye.

Memduh Selîm Beg jî li mala dostê xwe rûniştiye û li xwe, li siûda xwe, li Ferîha'yê, li şoreşa Agiriyê, li Ihsan Nûrî Paşa û Yaşar Xanimê, li Xoybûnê, li hevalên xwe yên din, li wextê û li pêşeroja xwe difikire...

## 7

Memduh Selîm Beg, Celadet Bedirxan Beg, Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa Began. Bi hev re. Hevalên Memduh Selîm Begê hem kêfxweş in, hem jî xemgir in. Ew kêfxweş in, ji ber ku Memduh Selîm Beg nemiriye û dijî. Ew xemgir in, ji ber ku Memduh Selîm Beg negîha mi-

rada xwe. Ew Memduh Selîm Begê bi tenê nahêlin û her pê re ne, pê re dipeyivin.

Lê belê, tiştekî heye ku ne Memduh Selîm Beg têdigihê û ne jî hevalên wî; çima Ferîha'yê zewaceke weha dil kir? Çima wê weha xwe feda kir? Ew bi çerkezekî Urdinî re zewicî ye. Bi çerkezê dewlemend Edîb Aswar re. Lê belê, çi zewac! Edîb Aswar li ser 50 salî ye. Edîb Aswar berê jî zewiciye û xwediyê du jinan e. Edîb Aswar qozikxwarekî û rûtirşekî ye. Edîb Aswar nexwenda ye. Edîb Aswar jiyaneke bedewî dijî... U Ferîha di nav evçend mêran de Edîb Aswar hildibijêre! Çima? Çawan keçeke welê delal, xwedî zewk û tahm, xweşperwerdebûyî, musîkşînas, xwedî hîsên zirav bi merivekî wekî Edîb Aswar re dizewice? Çawan ew dikare xwe weha qetl bike û êşeke xedar têxe dilê Memduh Selîm Begê, nas û dostên xwe?

«Mîrên min, ez jî fahm nakim. Ev celebeke qetl e, xwekuştin e. Bi vî awayî, wê xwe jî kuşt, ez jî kuştim. Ez dizanim, evîna me li ber dilê wê pir bi qedr û qîmet bû. Ez dizanim, wê ji min pir hez dikir. Lê ma wê tu ferq di navbera min û Edîb Aswar de nedîtin? Çima wê weha kir?..»

## 8

Destpêka 1933 an. Hê jî li Şamê. 1923 û 1933. Deh sal. Di welatê xerîbiyê de deh salên xerîb û ecêb. Gava Memduh Selîm Beg ji Turkiyê derket, ew bi niyeta salek-du salan derket. Salek- du sal bûn deh sal. Hê çend salên din divên? Ma ew dê rojekê venegere welatê xwe?

Reng e ku ew vegere. Niha îmkanek derketiye ser riya wî. Keysekê lê dixuye. Lê ew nikare biryar bide. Ew vegere yan bimîne? Dudilîtî. Fikir û gumanên nezaniyê. Ew hem dixwaze vegere û hem jî naxwaze.

1933 di eynî wext de dehsaliya damezrandina Komara Turkiyê ye. Gava Komara Turkiyê hat damezrandin, Memduh Selîm Begê jî dev ji Turkiyê berda... Niha, piştî deh salan, Turkiye e'fuyeke giştî derdixe. Ji bo kesên ku ji Turkiyê hatibûn derkirin. Ji bo kesên ku li derveyî welêt, li dijî Turkiyê xebitîne. Bê guman Memduh Selîm Beg jî yek ji wan e.

Berî niha bi sê heftan, yanê roja 21'ê meha 12 an ya 1932 an, sefîrê Turkiyê Memduh Selîm Beg dît. Sefîr xwestibû wî bibîne. Sebebê hevûdudîtinê ev bû; eger Memduh Selîm Beg vegere Turkiyê, ew dê efû bibe û bikaribe wekî hemwelatiyekî Turkiyê, bi awakî serbest bijî. Ev danezan, herwekî Memduh Selîm Begê, gihîştiye kurdên din jî.

Niha çi divê? Ef derdikeve. Imkana vegera welêt tê pê. Hesret û derd û kulên xerîbiyê dikarin li pey bimînin. Ew dikare, ji nû ve, piştî deh salan, bav û xwişka xwe bibîne, eger bixwaze li Stembolê yan jî li Wanê bi cîh be. Ew dikare here û di nav gelê xwe de, bi însanên xwe re bijî.

Lê li milê din jî hin rastî hene; di biryara e'fûyê de ji bo kurdan, li ser kurdan tu tişt nayên gotin. Rejîma nû, niha, tewr hebûna kurdan jî nenase. Zor û zulim li welêt her berdewam e. Ma evçend xebat, evçend zehmetîkêşan, derd û keder ne ji bo azadî û serbestiya kurdan bû? Gelo ew niha vegere, ew dê li xwe mikur neyê? Ew dê îxanet li xwe, li jiyana xwe, li doza xwe û li gelê xwe neke? Ew dê, bi vî awayî, siyaseta rejîma nû ya Turkiyê nepejirîne? U digel van yekan; ma kî garantî dike û garantî dide ku ew dê li Turkiyê neyê kuştin? Ma wî hindik bêbextiya rejîma nû dîtiye? Paşê, ji bav û xwişka wî pê ve, tu heval û dostên wî li Turkiyê neman. Piraniya wan hatin kuştin, yên mane jî li der-

veyî welêt, pardarê siûda Memduh Selîm Begê ne. Di nav van deh salan de pir tişt guherîn. Ew jî, hinekî, hînî jiyana nû bû. Li Sûriyê heval û dostên ku ew bikaribe pê re be, hene.

U tiştê herî girîng; Ferîha. Ew dê çawan Ferîha'yê, evîna xwe ya abadîn li van çolan berde û rûyê xwe jê bade? Bila Ferîha zewicî be, bila Ferîha'yê kuleke bêderman xistibe dilê wî. Lê Ferîha evîna wî ye. Her û her. Heta mirinê. Ew dev jê bernade...

Çi divê? Çûyin yan mayin? Di nav zîncîra pirsan de helqa esasî. Heyameke nû, gaveke nû di jiyana Memduh Selîm Begê de. Biryar divê li gor vê yekê were girtin.

9

21. Nîsan, 1934. Antaqiye.

«Miri aziz ve muhteremim Efendim,

... Şükrü Mehmet'in son mektubunu zati alinize gönderecektim, fakat kalinca bir mazruf teşkil edecegi için kitabina ve bana ait kısmını aynen istinsah ediyorum.»

Name. Nameyeke dirêj. Ji Celadet Bedirxan Begê re. Bi tirkî. Kesê ku namê dinivîse; bê guman Memduh Selîm Beg. Peyvên wî. Qiseyên wî. Bi kurdî weha:

«Mîrê ezîz û efendiyê min'ê muhterem,

... Min dê nameya dawîn ya Şukrî Mihemed ji we re bişanda, lê ji ber ku ew dê bibûya zerfeke mezin, ez beşê ku li ser min û kitêba wî hatiye nivisîn, ji we re dinivîsim û dişînim...»

Belê, Memduh Selîm Beg li Antaqiyayê ye. Ji nû ve. Ew venegeriya Turkiyê. Herwekî hevalên wî yên din, wî li xwe dananî vegere. «Mîrên min, veger jî divê li gor hin qayidan be. Gava me her celeb qayide û bawerî dan bin lingên xwe, hingê mana jînê çi ye?..» Qiseyên

wî. Baweriya wî. Awayê fikirîn û jiyîna wî. Xwediyê qayide û prensîban. Yek ji wan; her celeb bûyer, mezin yan biçûk, girîng yan negirîng, divê bibin helqeyên zîncîra jiyanê. Rojên kin û kurt divê bibin helqeyên zîncîra jiyanê. Wext, tevî her celeb encamên xwe, divê rê li zîncîra jiyanê negire. Eger meriv nikaribe vê yekê bike, hingê bûyer, roj, wext mana xwe winda dikin. Yanê jiyan mana xwe winda dike.

U tiştên din ku di vê navberê de bûn helqeyên jiyana Memduh Selîm Begê; daxwaza wî ya vegera Antaqiyayê qebûl bû, - ji ber sebebên tenduristiyê. Wî dest bi karekî nû kir, mamostetî. Wî ji xwe re maleke hûr, du ode, peyda kir û ew niha tê de rûdine. Wî ji nû ve peywendî bi heval û dostên xwe re danî. Herweha bi bav û xwişka xwe re jî. U tiştê herî girîng; wî bi alîkariya dotmama Celadet Bedirxan Begê, Rûşen Xanimê xeberek ji Ferîha'yê re şand da ku ew ji mêrê xwe veqete, dev ji Urdinê berde û vegere, were bi Memduh Selîm Begê re bizewice. Wî ev yek ji bavê Ferîha'yê re jî got. Ew niha li benda bersîva Ferîha'yê ye.

Niha, îroj roja naman e. Ew rûniştiye û name dinivîse. Dora nama Celadet Bedirxan Begê ye. Li ser dostekî wan yê kevn; Mihemed Şukrî Segban. Bijîşk û welatperwerekî kevn. Endamê Xoybûnê. Niha li Fransê. Wî kitêbokek li ser kurdan û doza kurdan nivisiye. Kitêbeke çewt û şaş. Kitêbeke ku li gor daxwaza dijmin hatiye nivîsîn. Jê re bersîv divê. Bersîveke bi rêk û pêk. Bersîveke li ser rastî û belgeyan avabûyî. Bi zimanekî xweş û cîddî.

Niha, ew rûniştiye û van tiştan ji dostê xwe yê kevn Celadet Bedirxan Begê re dinivîse.

Memduh Selîm Begê reben! Li milekî ew name dinivîse, li milekî jî ew li bûyer, wext û siûdê difikire...Ew

dê hê çi bibîne! Çavên wî yên bi ken dê hê şahîdên çi bibin, çi nebin! Her weha ye; di rojên teng, tarî, dijwar û malkambax de heval, dost û hogir kêm dibin. Her weha ye; şikestin, biserneketin bi xwe re qurbanên xwe û şikestinên nû tînin. Her weha ye; di rojên dijwar û şikestxwarinê de, ji kêfa îxanet, durîtî, fetbazî, berberî, sextekarî û hesûdiyê re payan tune. Gur ji mij û dûmanê, îxanet û durûtî jî ji rojên teng û dijwar hez dikin.

Kurd rojên weha dijîn. Hêvî têk çûn. Miraz qurmiçîn. Siûda xirab neguherî. Serîhildana Agiriyê şikiya. Bi dû şikesta Agiriyê re, partiya Xoybûnê jî şikest xwar. Berberî, dijîtî û dijminahiyên stûr hatin pê. Gelek kes çûn û teslîmî Turkiyê bûn. Gelek kesî rû ji heval û dostên xwe yên kevn, ji doza xwe bada. Niha jî hevalekî wî yê kevn kitêbokek li dijî wan û doza wan nivisiye. Niha dostiyeke din ya kevn jî şikest xwar...

«Malmîrato!.. Ma ev bêbextî bi te diket? Ma qet qedr û qîmeta rojên me yên Stembolê jî li nik te tunebû? Ma merivekî zana û têgihîştî evçend xwe biçûk dike?.. Heyf.»

## 10

Ferîha. Xezalê. Zimanşêrîna ber dilê Memduh Selîm Begê. Stûxwarê. Siûdreşê. Memduh Selîm Beg li dijî wextê şer dike, ew dixwaze bibe serdestê wextê. Ew dixwaze bijî, bi her awayî bijî. Ew naxwaze xwe û mesûliyetên xwe ji bîr bike. Lê birîna ser dilê wî nacerîbe. Ew her teze ye. Ew bi êş û jana birîna evînê dikeve xew û bi wan hişyar dibe. Ferîha bûye agir û ketiye pêsîra wî. Ferîha her pê re ye. Li her derî. Her saniye û deqîqe. Ew çawan dikaribû weha kor û kerr bûya! Wî çawan dikaribû evîneke weha paqij û zelal, keçikeke weha delal û narîn ji destê xwe birevanda!..

Evîn yekta ye. Evîn her roj nayê ber deriyê merivan. «Ew bi sîparişê jî nayê dîtin.» Di hemû jiyana xwe de meriv carek-du caran bi taya evînê dikeve. Ne zêde. Hingê?..

Hingê çima Memduh Selîm Beg li evîna xwe xwedî derneket, bi her tiştê xwe, bi her awayî lê xwedî nebû? Çima?

Lê Memduh Selîm Beg hêvî heye. Ew hêvî dike ku pêlên kêfxweşî û serfirazî yên siûdê dê rojekê lê vegerin. Evîna wî dê lê vegere. U ew dê, dîsan, xwe bidin ber beroşka evînê. Yan na, ev birîna xedar dê wî bikuje.

Ew li hêviya xeberên pîroz e.

## 11

1935, rojeke germ ya biharê. Şam. Li taxa Muhacirîn. Li mala Celadet û Rûşen Bedirxanê. Her du bi hev re ne. Wan jiyana xwe yek kirine. Celadet Bedirxan bi dotmama xwe re zewiciye. Jiyaneke mesûd û xweş hatiye pê. Li welatê xerîbiyê.

Her kes dizewice, dibe xwedî mal, dezgeh, zarok û jiyaneke netenê. Lê ji Memduh Selîm Begê pê ve, Herwekî ku tê gotin; keviren Xwedê li serê wî barîne. Pêlên kêfxweşî û serfirazî yên siûdê lê venagerin. Ji bervajiyê, her ku dere ew jê bi dûr dikevin.

Nebû. Xeberên pîroz nehatin. Evîna wî lê venegeriya. Ferîha nehat. Ferîha dê neyê. Edet û tore rê lê digirin. Edet û toreyên kevnare; belayên serê wî. Dijminên eşq, evîn û hîsên xweş.

«Ma ez naxwazim?.. Ev zewac kozeke agir e û ketiye dilê min. Jîn ji min re bûye heram. Ez her li kek Memduh difikirim... Lê mixabin, ez nikarim dev ji van deran berdim. Ji dilê min nayê. Ez nikarim. Ma xelk dê çi

bibêje? Ez bi vî halê xwe çawan vegerim nik bav û diya xwe?.. Nabe... Min xwe kuşt, xwîngê, min xwe kuşt. Ez êdî nikarim ji kek Memduh re jî bibim yar. Lê ez ji kekê Memduh re nebûm yar, herweha ji kesekî din re jî nebûm...»

Gotinên Ferîha'yê. Ji devê Rûşen Xanimê.

Rûşen Xanim; jineke zane, ronakbîr û dilsoz. Dilê wê bi Memduh Selîm Begê dişewite. Ew dixwaze alîkariyê bike. Lê çawan? Wê çû û Ferîha dît, pê re peyivî, pir dil kir û xwest dilê wê bigire, wê razî bike. Lê nebû.

«Mallesef, Ferîha pir li dûr e. Eger ew nêzîkî me bûya, me dê, hêdî hêdî, ew razî bikira... Tevî vê yekê, meriv divê teseliya xwe nexîne. Heye ku ew di rojên pêş de xwe biguherîne.»

Gotinên Rûşen Xanimê. Jê re. Memduh Selîm Beg li mala wan e. Bi mêvanî. Ew ji bo serîdanê hatiye. Herwekî piraniya caran, mesele dîsan evîna Memduh Selîm Beg û Ferîha'yê ye. Sal dibuhurin, lê mesele, pirs û birîn her wekî xwe dimînin. Çima? Çima weha bû?

Rûşen Xanim tiştekî ku her kes lê difikire, ji Ferîha'yê pirsiye: çima ew bi kalemêrekî xwediyê du jinan re zewicî? Bersîva wê di gotinên wê de ye. «Ez ji kekê Memduh re nebûm yar, lê ez ji kesekî din re jî nebûm...»

«Ax Memduh Beg, ne tu û ne jî mêrên kurd, hûn kes ji halê jinan fahm nakin. Qet hûn nizanin, têngihên ew çi difikirin, çi hîs dikin... Icar tu dizanî, Memduh Beg, ev fikir ji kû ketiye serê Ferîha'yê?»

«Naxêr, ez pê nizanim...»

«Binevşa Narîn, Memduh Beg, Binevşa Narîn... Te dastana Binevşa Narînê hînî Ferîha'yê kiriye. Ew ji Binevşa Narînê hîn bûye ku xwe bi saxî biçîne axa reş.»

Binevşa Narîn... Binevşa Narîn û Cebeliyê Hekkarê.

Dastana kevn, dastana evînê. Belê, di wan rojên xweş de, gava Memduh Selîm Begê di bin siya evînê de bedena Xezala xwe dinasî, wî jê re behsa Binevşa Narînê jî kiribû. Wî xwestibû ku Ferîha wê dastanê hîn bibe. Evîna Binevşa Narînê, evîna keça koçeran. Evîna serokeşîrê çiyayên Hekkarê. Evîneke xweş, bi kul û birîn, kevnare. «Delorî Cembeliyê min delorî, emrê min bi heyran, serê min bi gorî!..»

Lê kê dizanîbû ku jiyana Ferîha'yê dê bibe jiyana Binevşa Narînê? Kê dizanîbû ev gotinên hanê yên Binevşê dê bibin hedîs û bikevin devê Ferîha'yê.

«Bila mêrê meriya bi dilê meriya bî, bila nan hebî û dew tune bî, bila xwarina meriya garisê bi gilgil bî; bila lehêfa meriya ezmanê bilind bî; bila doşega meriya ji erdê şil bî; bila belîfa meriya ji kevir bî; bila tûrê parsê tim li mil bî; bila binê tûrê meriya bi qul bî; bila cîhê meriya ne li vir bî, li sînorê Ecem û gêwir bî; bila mêrê meriya ne bi dilê meriya bî, bila sibê heya êvarê ne kar bî, ne şixul bî, xwarin û libas pir bî; dilê meriya tim bi kul bî...»

Jiyan dubare dibe. Derd û keserên dastanan îroj jî bi car dibin. Peyvên Binevşa Narînê, ji nû ve, ji devê Ferîha'yê derdikevin...Jiyan! Jiyana nenas, jiyana piralî!..

12

Berbanga Antaqiyayê. Li aliyê Rojhelat, di nav çiyayên hêşîn û berz de tav hiltê. Giran, giran. Li aliyê rojava, tîrêjên jar yên tavê pêlên deryayê hembêz dikin û li ser diçirûsin. Tariya şevê winda dibe. Yek-du stêrkên mayî jî koç dikin û derin. Wext reng diguherîne. Rengeke ronî, hêdî hêdî, hawirdor vedigire. Di nav bêdengiyeke zîz de.

Ji dengê pêlên avê pê ve, tu deng tune. Pêl jî, hêdî

hêdî, xwe radigihînin qeraxê. Pêl di nav lîstikeke şêrîn de ne; dinya hişyar dibe û ew dikenin, distrên. Bi awayê xwe, bi zimanê xwe.

Li qeraxa avê jî Memduh Selîm Beg. Ew ji rengguherîna tebîyatê hez dike. Di demên weha xweş, bêdeng û balkêş de ew xwe zînde û jiyayî hîs dike. Gava rengên ronî hawirdor vedigirin, ronahiyekê di nava wî de jî hiltê. Hingê bedena wî germ dibe û dilê wî bi germiyeke taybetî hildavê. Digel her celeb derd, kul û keserî...

Niha, ew, dîsan, li ser riya biryarên girîng e. Niha, wî, dîsan, koçeke nû divê. Mixabin. Dinya ber bi rojên germ dilezîne. Antaqiya jî ber bi rojên biryarên girîng dilezîne. Isal, yanê 1937, qedera Antaqiyayê diyar dike. Turkiye doza Antaqiya, Iskenderûn û Kirikxanê dike. Piştî têkçûna dewleta Osmanî, ev dever, herwekî Lubnan û Sûriyê, ji aliyê Franseyê dihat îdare kirin. Niha, 17 sal bi dû peymana Lozanê re, Turkiye ji Fransê daxwaz dike ku ev dever bibin deverên Turkiyê. Par Fransê azadiya Sûriyê qebûl kir. U serokatiya nû ya Sûriyê jî dixwaze ev dever di nav tixûbên Sûriyê de bimînin û dawe dike ku ev dever ereb in.

Franse? Franse jî, wekî her carî, carina li ba tirkan, carina jî li ba ereban e. Ew carina dixwaze ev dever xweser bin, carina bibin tirk û carina jî bibin ereb. Lê serokamîrê van deveran General Collet(belê, ew bûye general) bi ser tirkan e. Ew wekî tirkekî dixebite da ku ev dever tevî tixûbên Tirkiyê bin.

Yanê bi gotineke din, rewş baş naxuyê. Memduh Selîm Beg ji tecrubên xwe, ji tecrubên tarîxa gelê xwe dizane; welatên bêkes, bêpişt, bêhêz nikarin xwe li hember hêz û welatên stûrtir ragirin. Ew dibin para şûrê Ruhistîn. Ew masiyên biçûk in û di şerê masiyan de ew dibin para masiyên mezin... Tu pêşeroj ji van deveran

re tune. Ew dê yan tevî Turkiyê yan jî tevî Sûriyê bibin. U eger fransiz, bi her awayî, xwe bidin aliyê tirkan, hingê qedera Antaqiya, Iskenderûn û Kirikxanê jî belî dibe. U hingê gaveke nû ya qedera Memduh Selîm Begê jî diyar dibe. Hingê ew divê, dîsan, koç bike û ji xwe re warekî nû bibîne.

Di berbanga ronî ya Antaqiyayê de, li ber qeraxa deryayê, Memduh Selîm Beg hêdî hêdî dimeşe û careke din li siûda xwe, li pêşerojê difikire. Bi dilekî germ û zîz.

## 13

Rojên reş. Di nav rojên reş de roja reş. Roja şînê. 1939, rojeke ji rojên gulanê. Tarîx û siûdê, bi hev re, biryara xwe dane; rûyê Memduh Selîm Begê dê nekene.

Antaqiya, Iskenderûn û Kirikxan tevî Turkiyê dibin. Qedera wan diyar bû. Di bin çavnêriya heyeteke Koma Netewan de hilbijartin çêbûn. Meclîseke nû hat pê. Ji 40 endamên meclîsê 22 tirk, 9 erebên elewî, 5 ermen, 2 ereb û 1 yewnan. Ev meclîs û pêkhatina wê qedera Antaqiyayê nîşan dide. Antaqiya hê jî xweser e. Lê di bin wesayeta Turkiyê de. Turkiye li fersendê digere ku Antaqiyê bi temamî vegire. Hêzên çekdar û eskerên tirk ketine bajar û gundan. Ew hêdî hêdî îdarê dixin destê xwe.

U Memduh Selîm Beg. Dîsan li ser riya koçeke nû. Ji welatê xerîbiyê ber bi welatekî din yê xerîb.

Lê îroj!..

Roja şînê. Roja ji du dostên kevn xatirxwestin. Ji bav û diya Ferîha'yê xatirxwestin. Belê, ew jî çûn. Wan xatireyên xwe li pey xwe hîştin û ew çûn. Ji nişkekê ve. Bê xeber, bê gotin, bê gilî û bê gazin. Bi hev re.

Ew şewitîn. Nîvê şevê agir bi mala wan dikeve. Kes nizane çawan. Lê ew pir dereng bi xwe dihesin...

Hê berî çend rojan Memduh Selîm Beg û bavê Ferîha'yê bi hev re bûn. Ew li ser bûyerên dawîn yên Antaqiyayê û halê Ferîha'yê peyivîbûn. Ew careke din li ber xwe ketibû ku Memduh Selîm Beg û Ferîha negihîştibûn miraza xwe. Wan jî hazirî dikirin ku dev ji Antaqiyayê berdin û herin Urdinê, nik keça xwe... Heyhat. Niha, tevî gelek kesên din, li hewşeke fireh ya maleke çerkez, ew li şîna wan rûniştiye. Memduh Selîm Beg du nasên xwe yên nêzîk winda dike. U ji dara evîna wî ku ber bi hişkbûnê dere, du pelên gewher û jîndar diweşin. Mixabin, dar rût dibe.

U ew... kesa ku av dida darê. Kesa ku dar hişîn kir, dar mezin kir... Ferîha. Xezalê. Li koşeyeke hewşê. Ew tevî çend jin û mêran rûniştiye. Serîgirtî. Di nav kincên reş yên şînê de. Çavên wê yên xweşik ji girînê werimîne. Qermîçek li ser enî û rû zêde, pir zêde bûne. Stû xwar bûye. Ferê çavan winda bûye. Derd, keder û keseran ew pîr kiriye. Ew, bêhereket, bêruh, li ber xwe dinihêre.

Ax wext! Wexta xopan, wexta dîn. Agirê xezebê, berfendeyê derd, kul û xeman.

Ew ji bo şîna bav û diya xwe hatiye. Ew, niha, sêwî û bêkes ma. Gelo haya wî heye ku Memduh Selîm Beg jî di tahziyê de rûniştiye?.. Piştî evçend sal, ev cara yekemîn e ku Memduh Selîm Beg wê dibîne. Cara yekemîn. Memduh Selîm Beg divê pê re bipeyive, xwe bigihîne wê. Lê çawan? Di nav vê şêniyê de nabe. Ew nikare, niha, here ba wê jî. Eger ew here ba wê jî, ew nikarin bi hev re bipeyivin. Di nav vê şêniyê de, di vê roja reş de, ew dê ji hev re çi bibêjin?..

«Siûdê, bela serê minê... tu dîsan li min hatî xezebê.

Piştî van salên reş, te ez û ew di rojeke weha reş de anî rûyê hev.»

14

«Bigirî, bi têra xwe bigirî. Kî dibêje tu dê negirî? Kî dibêje girî şerm e? Bigirî, hinekî din bigirî. Bigirî ku tu hinekî rehet bikî...»

Lê belê, ew bi xwe jî digirî. Hêrs ji çavên Memduh Selîm Begê jî gêr dibin. Ew jî, Ferîha jî xwe ranagirin. Kela giriyê bi ser wan re tê.

Memduh Selîm Beg fersend dît ku bi Ferîha'yê re bipeyive. Ew niha li mala dostekî wî ne. Li odeyeke biçûk û xweşraxistî. Her du bi serê xwe. Bi tenê. Li hember hevûdu. Gava ew hevûdu dibînin, ew nizanin çi bikin, çawan hereket bikin. Ew bêdeng li hember hevûdu rûdinin û li hevûdu dinihêrin. U girî. Pêşî girî. Pêşî bi çend hêstirên zelal derd û kulên roj, meh û salên bêhejmar îfadekirin. Pêşî bi çavên şil hesreta abadîn salixdan. Paşê jî bi dengekî nizm û zîz, bi awakî xemgîn çend peyv.

«Ferîha... hevala ezîz,.. siûda xirab dev ji me bernade. Çima me dê di rojeke weha de hevûdu bidîta?.. U çima te weha li me kir? Min xeber jî şandibû...»

«Memduh abi... ez çi bibêjim? Ma kê dixwest bila weha be? Ez gazinî li kesî nakim, li te jî nakim. Lê, te ez sê car kuştim... Cara pêşîn, gava min bihîst ku tu şehîd ketiye, ez mirim. Cara duwemîn, gava ez zewicîm, ez mirim. Cara siyemîn, gava min bihîst ku tu sax î û vegeriyayî Antaqiyayê, ez careke din mirim... Ez mirî me, Memduh abi, mirî...»

«Na Ferîha, tu divê weha nebêjî, li xwe neheqî nekî. Tu dijî, tu dê bijî... Ez, şev û roj, li te difikirim. Min dînîtiyeke mezin kir, na ne dînîtî, kerîtiyeke mezin.

Ez dê rojeke zûtir bi te re bizewiciyama. Min dê nehîşta tu ji hinên din re bibûya yar.»

«Memduh abi, ez ji kesî re nebûm yar. Eger min quwet û hêz hebûya, min dê xwe bikuşta. Lê ez tirsok derketim û min xwe bi awayekî din kuşt. U niha, piştî mirina dê û bavê min, ez hinekî din jî mirim.»

«Na, Ferîha, tu dê nemirî... were, dev ji wê jînê, ji wan deran berde û were. Tu roniya çavê min î, li ser serê min cîhê te heye. Were...»

«Nabe, Memduh abi, nabe. Ez mirim. Bedena min çelmisî, dilê min kizirî, mêjiyê min perçe bû. Ez hew dikarim ji te re bibim yar...»

«Weha mebêje, ez heyran. Were, em bi hev re derd û kulên xwe rapêçin, em serî bidin serê hev, bi hev re jîneke basîd, lê bextiyar bijîn. Were Ferîha... ez li hêviya te me. Ez dê heta mirinê li hêviya te bim.»

Dîsan girî. Lehiyek ji hêstiran. Her du bi hev re.

# PAYİZA UMİR

## 1

Kî?..

Rûyekî hûr, jar û zerbûyî. Li eniyê qermîçekên salan, qermîçekên umirekî têkel û rengîn. Porê spî û şehkirî. Çavên reş û li ser çavan du helqeyên gulover û hesinîn; berçavik. Li ser lêvan simbêl. Livîna lêvan, bi awakî esebî. Li ser lêvan ken. Keneke paqij, keneke ebedî.

Belê, ew; Memduh Selîm Beg. Jiyaneke dirêj. Keneke kurt. Axîneke dilsoj. Rûpeleke bi keder. Peleke zerbûyî û bi evînê neqişandî.

Belê, ew. Merivekî ziravbihîstiyar. Bi qayide û prensîbên jiyanê perwerdebûyî; rindî, qencî, ji merivan hezkirin, ji jiyanê hezkirin, evînwelatî, evîndarê evînê bûyin, dilsozî, fedakarî, sebir, nefsbiçûkî... Qayide û prensîbên jiyanê; helqên zîncîrekê. Zîncîrek ku bedena wî, mêjiyê wî pêçaye.

Xwediyê kevokên evîna qurmiçî. Xwediyê xewnan. Xwediyê gotinên kin û kurt, lê xweş.

Ew; tava rojhelat, şewqa rojava, nivîskarên do û îroj, medeniyeta do û îroj, şiîr, pexşan, huner û musîk. Dengê musîkê. Nemaze dengê kemançê; tray, trayy, layyyy... Dengê avê, dengê jinan û dengê dil. U siyaset.

«Jîn... jînê, digel her tiştî jî tu dîsan xweş î.»

Lêv, bi ken, dilivin. Çav li dora xwe dinihêrin. Memduh Selîm Beg li otêlê, li der û dora xwe dinihêre.

Roniya lampan li ser lêvên wî yên bi ken dilîzin. Aliyekî rûyê wî di bin siyê de ye. Çermê qermiçî yê rû dilive. Li ser bîbûkên çavan jî bi dehan, bi sedan fikir. Çav baş nabînin, fêrê çavan roj bi roj, kêmtir dibe.

Rûyekî weha dewr û dewran dîtî çi nabêje! Li milekî meraq, li milekî jî aramî. Li milekî kîbarî, li milekî jî bêhuzuriya dil. Li milekî bawerî, li milekî xem û şik. Li

milekî bihêziya zanîn û tecruban, li milekî bêhêziya derd û kulan. Li milekî bextiyariya jiyîna jiyanê, li milekî jî birîndariya dil.

Belê, dilekî bi keder û birîndar. Dilekî ji mirazan bi dûr. Dilekî kal.

Sal bihurîn. Wextê, dîsan jî, wekî xwe kir; dilê Memduh Selîm Begê şewitan, pişta wî xwar kir, porê wî spî kir û berçavik xist ber çavên wî. Gelek dost û hevalên wî çûn rehmetê. Ew yên mane jî hêdî hêdî derin. Di nav kesên çûyî de du kesên ku şopên kûr di dilê wî de berdan; bavê wî û Celadet Alî Bedirxan. Belê, ev her du merivên ku li ber dilê wî yekta bûn, jî çûn rehmetê. Celadet Alî Bedirxan di 1951 an de, bavê wî jî 1953 an de çûn rehmetê.

Wext diherike, dewr diguhere. Guherînên nû tên pê. Memduh Selîm Beg jî gihîşt payiza umirê xwe. Sal ber bi 1960 an hildikişin, umirê wî jî ber bi jêr dadikeve. Ew ber bi welatê ebedî ketiye rê.

Ji 1940 an û vir ve, salên bihurîn, kêm, zêde, vekhev bûn. Salên şêt, mirdar û xirab... Dinya kal û malkambax şerekî din yê dijwar jiya. Bi milyonan ketin ber pêlên şerê û çûn. Niha jî dinya birînên xwe radipêçe. Di jiyana Memduh Selîm Begê de guherînên cîddî nebûn. Wî salên bi hesret, kahr û jan bihurandin...

Hesret, qahr û jan; sê sitûnên esasî yên payiza umirê Memduh Selîm Begê.

Ew, bi hêdîka, radibe pê. Hevalê ku ew dipê, tê. Ermenekî; krikor Mazlumiyan. Xwediyê Hotel Baron li Helebê. Dostekî kevn yê Memduh Selîm Begê. Ew carina tê ba wî û çend rojan li otêla wî dimîne.

Her du bi hev re, li salona otêlê rûdinin.

«Monsieur Memduh, em kal dibin...»

Kal, kalitî, kalbûn... peyvên ku Memduh Selîm Beg,

roj bi roj, hîn zêdetir dibihîse.

«Belê, mîrê min... wekî her tiştî, wekî her kesî, em jî kal dibin.»

Bi fransizî. Bi ken, lê bi keser.

«Hema li otêlê binihêre. Ka ew rojên kevn? Ka ew rojên ku Werner Otto von Hentig, Wilhelm Wasmus yên aleman, Lawrence yê îngiliz li vê salonê rûdiniştin û siyaseta duwelê dipeyivîn?.. Di dawiya 1930 an de, nivîskar Agatha Christie dihat. Oda wê li qata jorîn bû. Ew sibê zû radibû, li balkonê xwirîniya xwe dikir û paşê jî dest bi nivîsînê dikir. Ka ew roj, monsieur Memduh, ka?..»

2

Odeyeke Hotel Baronê. Li Helebê. Li koşa odê textekî fireh, ji bo du kesan. Du mase, çend kursî, li ser dîwaran lewhe û tablo û balkoneke fireh. Odeyeke ronî. Li ser maseyekê xwarin û vexwarin. Bê guman, araq jî.

Li ser textê du kes. Memduh Selîm Beg û jineke esmer, xweş, bedew.

Gava daxwaza bedenê li Memduh Selîm Begê tê xezebê, ew xwe davêje otêlên Şam, Heleb û Beyrûdê. Mixabin, ew nikare xwe li ber daxwaza bedenê ragire. Nabe. Daxwaz dilê wî, mêjiyê wî dihejîne. Daxwaz dilê wî dîl digire. Ruhê wî dikeve nav newalên bêbinî. Hingê ew dil dike bedena xwe bigihîne nik bedeneke nerm, bedeneke din li nik bedena wî dirêj be û her du beden bi hev re yek bin...

Li Şam, Heleb û Beyrûdê dostên wî henê; ermen, yewnan, îtalî, fransiz, tirk. Ew daxwaza bedena wî dadixînin, tiya goştê wî dişkînin.

Niha jî li oda Hotel Baronê, dosteke wî ya ermen be-

dena wî ya kal hembêz dike. Bedeneke nerm û germ li ser bedena wî strana hez, coş û şehwetê dibêje. Memikên stûr û ciwan pirçên sînga wî radimûsin. Lêv li ser rûyê wî digerin. Destên narîn porê wî, bedena wî mist didin. Berzik, qudret û quweta ecêb agireke nedîtî dadixe dilê wî. Dengin xweş, dengên hezkirin û şehwetê besta wî digihîne spêdên zewkê.

«Tu çi xweşik î, tu çi rindik î...»

Di nav coşa nalînê de çend peyv. Çavên wî girtî ne. Wî xwe daye ber pêlên şehwetê. Bîhna beden, sîng, stû û gerdana keçikê ew sermest kiriye...

Memduh Selîm Beg li vê derê, bedena xwe teslîmî bedeneke narîn dike, bi bîhna yekbûna bedenan sersem dibe, ji zewk û heyecanê difire. Lê belê, mêjî jî ber bi alîkî din difire; ber bi Ferîha'yê. Ber bi Xezala narîn. Ew li wê difikire û wê xeyal dike. Wekî ku bedena wî bi bedena wê re yek dibe. Wekî ku ev bîhn bîhnên bedena wê ne. Wekî ku ev germî ji bedena wê radibe. Wekî ku ew xwe berdide nav kûrahiyên wê...

Ew rojên Antaqiyayê ku wan xwe dabûn bin siya evînê, tê bîra wî. Wî kincên wê jê dikirin, li bedena wê ya tahzî dinihêrî, bedena wê ya nerm mist dida, her aliyê bedena wê radimûsî û bi germî û daxwaza bedena wê difirî.

«Bedena te çi xweş e, çavên te çi xweş in, porê te çi xweş e, hêtên te çi xweş in. Tu xweşikê, axxx tu...»

## 3

Şam. Taxa Muhacirîn. Li ser kaşa taxê maleke kevn. Du qat, du ode û hewşeke hûr. Di hewşê de bîrekê. Li kêleka dîwêr çend darên gulan. Dîwarên ji kevirên reş. Qata jorîn oda razanê. Qata jêrîn kitabxane.

Warê Memduh Selîm Begê. Piştî ku wî ji Antaqiyayê

bar kir, ew hat û li Şamê bi cîh bû. Wî li Şamê jî, heta demeke dirêj, mamostetî kir. Paşê wî dev jê berda. Niha, destpêka 1960 an, ew teqawît e.

Ew çi dike?

Ew dê çi bike? Ew dikare çi bike? Ew li mal e, pir kêm ji malê derdikeve. Ew li mal, di nav kitêbên xwe de ye. Gava ew derdikeve der jî, ew dere nik heval û dostên xwe. Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa, Rûşen Bedirxan û gelek kesên din jî di vê taxê de rûdinin. Ew hevûdu dibînin. Ji hevûdu pê ve, tu kesên wan tune.

U tiştekî din; Memduh Selîm Beg hê jî xebata xwe ya siyasî didomîne. Hê jî peywendiyên wî yên siyasî hene. Lê bê guman, ew hêvî, şewk û heyecana 1920-30 an nemaye. Ji wan rojan tiştê ku ew pir meraq dike, kite-kitên şoreşa Agirî û serpêhatiyên Ihsan Nûrî Paşa ne. Şoreş têkçû. Ihsan Nûrî Paşa û pîreka wî xwe spartin bextê Iranê û ew niha li Tehranê dijîn. Lê belê, Memduh Selîm Begê tu carî keys nedît ku bûyerên têkçûnê û rewşa Ihsan Nûrî û xanima wî bizanibe. Wî û Ihsan Nûrî Paşa, ji wê rojê pê ve, tu caran hevûdu nedîtin. Ew wan meraq dike.

Ferîha venegerî. Ew hê jî li Urdinê ye. Birîna Memduh Selîm Begê sax nebû. Ew her diêşe. Ew hê jî li hêviya hatina Ferîha'yê ye.

Memduh Selîm Begê ku tu carî nedixwest bi tenê bijî, hê jî, tenê dijî. Memduh Selîm Begê ku mal, jin û zarok dil dikir, di vê payiza umirê xwe de jî, bi tenê xwediyê kitêban e. Kitêb bûn zarokên wî. Ew her xebitî ku dinya bibe dinyayeke çêtir. Wî xwe westan ku jiyan hîn çêtir be. Lê niha, di payiza umirê xwe de, ew pê dihese ku jiyana wî bi xwe dere.

Wî xwend, pir xwend. Wî dil kir ku pir tişt hîn be, pir tişt bizanibe. Ew bi klasîkên kurdî, rojhelat û roja-

vayê mezin bû. Di salên zanîngehê de jî, wî nivîskar û feylesofên nûjen xwendin. Ew bû hevalbendê kitabxanan. Li Parîsê, li odeyeke pir biçûk û sar, di bin ronahiya çirayeke jar de, wî çand û edebiyata fransizî hîn çêtir nasî, şoreş û medeniyeta Fransê hîn çêtir hîn bû. Kitab, kovar û rojname li ber serê wî riziyan. Li Galatayê, di nav dengên qahpik û serxweşan de, wî serê xwe bi siyasetê û teoriyên siyasetê êşand. Li Antaqiyayê, cîhê ku bîhna wî lê derdiket, kitabxana wî bû. Wî nedixwar, kitab dikirîn. Wî venedixwar kovar dikirîn. Wî li xwe nedikir, rojname dikirîn. Ew li ser riya zanînê bû derwêş, bû dîn.

Lê mixabin, hezar mixabin... Ev xîret, zanîn û ked ji derdê evînê re nebûn çare. Digel evçend zanînê, wî dermana birîna evînê nedît.

Niha jî, ew li kitabxana xwe rûniştiye û van tiştan dinivîse. Wekî nameyekê. Ji dostê xwe yê gorbehîşt Celader Bedirxan re.

Belê, ji Celadet Bedirxan re.

Memduh Selîm Beg her hefte ji sê kesan re name dinivîse. Ji sê kesên mirî re; bavê wî, Celadet Alî Bedirxan û Ferîha. Roja sêşemê, piştî nîvro ji bavê xwe re. Roja çarşemê, piştî nîvro ji Celadet Alî Bedirxan re. Roja pêncşemê, piştî nîvro jî ji Ferîha'yê re. Gerçî Ferîha nemiriye. Gerçî Memduh Selîm Begê hê jî hêvî heye ku Ferîha dê vegere. Lê bi alîkariya nameyan, ew pê re dipeyive, wê bi bîr tîne.

Mixabin ku Memduh Selîm Beg ne nivîskar e. Eger wî bikaribûya, wî dê romanekê li ser evînê binivîsa. Romanek ku bi kêfxweşî û serfirazî diqede, evîndar digihên mirazên xwe û dibin mesûd. Lê ew nikare tu romanan binivîse. Di dewsa romanan de ew name dinivîse. Bi vî awayî, ew bi xwe re û bi qedirgirên xwe re di-

peyive.

«Belê, mîrê min... evîn û sewda dînîtiya herî mezin e. Lê dînîtiyeke welê ku meriv bê wê jî nabe...

Mîrê min, ez jî li rê me, ber bi te têm. Di demeke kurt de, ez li nik te me. Li hêviya min be...»

4

Destpêka 1965 an. Rojeke şilî. Li der baran dibare. Iroj kêfa Memduh Selîm Begê di cîh de ye. Wî ji xwe re desteyek diran dane çêkirin û îroj roja yekemîn e ku ew wan bi kar tîne. Ew bi ken e. U di ser de jî, ew îroj henekî dike. Tiştekî ku meriv zû bi zû lê rast nayê.

Ew li mala Qedrî Cemîlpaşa wan e. Ew û Qedrî Beg di oda rûniştinê de, li dor maseyeke raxistî rûniştine û vedixwin. Wekî her carî; araq. Lampayeke stûr ji jor ronahî direşîne ser masê û rûyên wan. Li paş Memduh Selîm Begê, li dîwêr xalîçeyeke xweşik, bi dest hûnandî, dixuye. Li ser xalîçê sê siwar li ser hespên kihêl in. Libasên neteweyî li wan in û di destên wan de jî tifing hene. Hesp, du spî, yek belek, wekî lehiyekê diherikin. Li pey siwaran jî çiya, dar û hêşinahî dixuyin. Bergeheke xweş. Bergeha azadî û serbestiyê.

Memduh Selîm Beg jî îroj xwe azad û serbest hîs dike. Derd, kul û keserên ku her lê tên xezebê, îroj jê bi dûr ketine.

«Mîrê min, tu dizanî çima ji araqê re araq tê gotin?.. Ez bi xwe jî baş bi vê yekê nizanim, lê li gor gotinan, ew ji peyva araqî ya erebî tê. Yanê xwîdan. Yanê vexwarina ku meriv pê xwîdan dide. Tiriya bedew û şêrîn kiras diguherîne, dikeve nav şûşê, di nav qedehê de bi avê reng diguherîne, dibe spî û gewriya me dişewitîne. Gewrî ewçend dişewite ku meriv xwîdan dide...»

Araq, vexwarina araqê, rewşa kurdan, nezanî, dijîtî û

berberî, hukimeta nû ya ereb li Sûriyê, hal û hewala dost û hevalan, rewş li Turkiyê û li Kurdistana Iraqê û hwd... Tiştên ku di şeveke weha de tên peyivîn, pir in. Bê guman, şeveke weha xweş ji bo gotina daxwaza dilên hevalên wî jî fersend e; Memduh Selîm Begê zewac divê.

«Memduh Beg, tu hew dikarî bi tenê bihewî. Sal derbas dibin, êdî em dibin kokim... Tu divê bizewicî. Jinek divê li mala te be, li te binihêre, xwarin û vexwarina te hazir bike, nivînê te germ bike û şevên te ji tenêtiyê xelas bike. Xanimên pak û delal pir in. Tu divê bi yekî re bizewicî...»

Memduh Selîm Beg çi bibêje? Umir gihîşt dawiyê. Miraz şikestin. Evîn winda bû. Rewşa malkambax hat qebûlkirin. Taxa Muhacirîn bû taxa payiza umirê wî û herweha taxa wî ya dawîn li jiyanê. Welat bû xeyal. U niha jî, piştî van tiştan zewac. Zewaceke ku ji evîn û evîndariyê pir bi dûr e.

«Mîrê min, êdî zewac bi min nakeve, ji min re nabe. Meriv carekê dijî... carekê tê dinê, carekê mezin dibe, carekê li ser jîna xwe biryar dide, -tevî rastî û çewtiyan, carekê kal dibe û carekê dimire... Min piraniya van tiştan bihurandin û li pey xwe hîştin. Tiştê ku ez divê niha bikim, li hêviya mirinê bûyin e. Ne zewac... Em çawan bikin! Qedera min jî weha bû. Eger yek ji ew nameyên ku min ji Agiriyê şandibûn, bigihîşta cîh, niha ez jî zewicî û xwediyê zar û zêç bûm. Eger hevalekî ji we xwe bigîhanda çiyê, eger rê li min nehata girtin, eger Ferîha û dê û bavê wê nelezandina, eger edet û toran çavên Ferîha'yê kor nekirina, dîsan, ez niha zewicî bûm Lê nebû... Em çawan bikin?»

Xwezî «eger»ên ku ew behs dike, bihatina cîh. Xwezî her roja wî bi evînê bihata neqişandin. Xwezî dax-

waz û mirazên wî nequrmiçîna û jiyana wî bibûya bergeheke rengîn. Lê ew niha, di payiza umirê xwe de, baş dizane ku jiyan ne bergeheke rengîn e û ne jî şênahiyeke bêdawîn e. Ew dizane, li hember jiyana sedsala bihîstan her û her kemîn hene... heye ku di ser de jî, jiyan bi xwe bûye kemîn.

Mixabin, piştî evçend lez, bez, xebat û keda salên dirêj, wî kemîn qebûl e.

Lê belê, ew naxwaze îşev, şeva xwe bi xeberdanên weha bibuhurîne. Ew dixwaze îşev kêfa gurê Manço bike.

«Mîrê min, dev ji zewacê berde. Tê bîra te, gava em li Stembolê bûn, em diçûn Beyogluyê û li wê derê me malên yewnanan zîyaret dikirin? Ew çi keçên spehî bûn! Tê bîra te, şevekê, ez, tu û çend hevalên din çûn malekê. Digel ku me pere tunebû. Li wê derê me têr xwar, vexwar, kêfa xwe kir, bi keçan re man û paşê jî destê sibê, em ji wê derî revîn... Tê bîra te?.. Haa, haaa haaa...»

5

Şeveke bihara 1966 an. Antaqiya. Li ber qeraxa deryayê. Li asmên, heyveke gulover û stêrkên çirûsî. Heyveron. Şewqa heyvê li ser avê. Dengê avê...

Li qeraxê ew; Memduh Selîm Beg.

Ew bi pasaporteke sexte hatiye deverê xwe yê kevn. Ji bo cara dawîn. Ji bo xatirxwestinê. Tu kes wî nenase. Ji heval û dostên wî, ji nasên wî tu kes nemane. Her tişt guheriye. Di dewsa mala wî ya kevn de, niha, apartimaneke stûr dixuye. Di dewsa mala malbata Ferîha' yê de, niha, parqeke zarokan heye. Di dewsa meyxana ermenan de, niha, pasajeke navnetewî û di dewsa bexçê Zîrahî de jî, niha çend karxane dixuyin.

Kalemêrê porspî Memduh Selîm Beg hatiye bajarê xwe yê kevn. Ji bo bibîranînê.

Ew hemû roj li bajêr geriya û bi bîr anî. Çi û kê?

Rojên xwe yên kevn û wê, Xezalê.

«Min dengê kemançа wê ji vê derê dibihîst... Cara yekemîn min ew li vê malê dît... Mala min li vê derê bû û min deriyê malê jê re vekir. Ew û bavê wê dihatin vê derê... Dîsan rojeke weha biharê bû, gava ew û diya xwe hatin bexçê... Gava bav û diya wê mirin, ev jî hat vê malê... Kî dizane, lingên wê yên narîn çend car pê li van kolanan kiriye!.. Eger em bi hev re bizewiciyana, min dê li vê taxê xaniyek bikiriya... meyxana ermenan li vê derê bû û li meyxanê ez bi bavê wê re li ser zewacê peyivîm... Li vê derê qahwexaneyek hebû ku ez û bavê wê diçûnê... Xwendegeha ku min û bavê wê tê de mamostetî dikir, li vê derê bû...

Ew jî niha li vê derê bûya û em bi hev re bimeşiyana!..»

Ka, ew roj li kû!..

Memduh Selîm Begê careke din ji Ferîha'yê re xeber şand ku ew were. Lê ew nehat.

Niha jî, ew li ser riyeke nû ye; riya zewacê. Belê, ew dê bizewice... Di dawiya dawîn de, hevalên wî ew razî kirin ku -qet nebe- payiza umirê wî bi tenê derbas nebe. Wan jê re jinebiyekê dîtin. Jinebiyeke çerkez. Ew çûn û bi jinikê re peyivîn, jinik jî razî kirin. Di demeke kin de, ew dê bi hev re bizewicin.

Lê belê, berî zewacê, Memduh Selîm Begê dil hebû were Antaqiyayê. Pêşî Antaqiya û di nav xatirên kevn de meşîn, paşê jî zewaca edetî.

Antaqiya tu carî, bi Memduh Selîm Begê evçend xweş nehatibû. Antaqiya îşev wekî bûkekê xemiliye. Bajar û kolanên bajêr di nav ronahiya lampayên elek-

trîk de dilîzin. Dengên xweş ji bajêr radibin. Pêlên deryayê dengên bi dûzan tînin pê. Dinya germ û heyveron e. Li asmanan jî ken û lîstika stêrkan heye.

Stêrkên nazdar Leyl û Mecnûn jî di nav koma stêrkan de duxiyin. Yek li rojhelat, ya din li rojava. Ji hevûdu dûr. Ew li hev dinihêrin û dibişirin. Evîndar nagihên hevûdu. Tim û tim, yek li milekî, yê din jî li milê din.

Memduh Selîm Beg jî li wan dinihêre û dibişire. Bi keser. Kelgirî. «Xwediyo!.. Çima tu weha dikî? Çima te ev neheqî qebûl e? Çima tu evîndaran, van stêrkên delal nagihînî nik hevûdu?..»

6

Şeveke payiza 1966 an. Li mala Memduh Selîm Begê. Qata jorîn. Cîhê razanê, textê wî yê fireh. Di derengiya şevê de du meriv. Kalekî û pîrekê. Memduh Selîm Beg û Wîldan Xanim. Şeva wan ya yekemîn. Bi hev re. Piştî zewacê. Mêr û jin.

Li ber serê wan, li aliyê Memduh Selîm Begê, li ser masê çireyekê. Di bin ronahiya jar ya çirê de du bedenên pîr. Her du jî porspî. Memik, hêt, sîng, zik û stûyê çelmisî yên Wîldan Xanimê. Bedena biçûk û qermiçî ya Memduh Selîm Begê. Bîhna bedenên pîr. Heyecana yekbûna bedenên pîr. Her du jî şermok û bêdeng. Li nik hevûdu dirêjbûyî. Destên wan di destê hevûdu de.

Zewaceke weha! Bi dû 25 salan re Wîldan Xanim careke din dizewice û li nik mêrekî dirêj dibe. Tahzî, bi best û daxwaz. Ji bo Memduh Selîm Begê jî, ev cara yekemîn e ku ew dizewice, dibe xwediyê jinekê... Zewaceke ku bi daxwaz û xîreta heval û dostan hatiye pê. Zewaceke ku ji tirsa tenêbûn û bi tenê mirinêhatiye pê.

Memduh Selîm Begê dil tunebû ku bizewice. Wî di-

xwest her û her li hêviya evîna xwe bûya. Heta mirinê. Lê heval û dostan gelekî zor danê. U di ser de jî ji Stembolê, ji xwişka wî nameyeke dirêj li ser mesela zewaca wî hat. Xwişka wî dixwest bila ew bizewice û wê dil dikir were û birayê xwe ziyaret bike. Ev name bû dilopa dawîn. Wî hew xwe ragirt... û bi çerkezek re zewicî. Ne bi Xezala çerkezan re, lê bi çerkezeke din re.

«Wîldan Hanim hoşgeldiniz...»

Memduh Selîm Beg, bi tirkî, lê xêrhatin dike. Weha bêdeng di nav nivînan de dirêjbûn nabe. Memduh Selîm Beg dipeyive, jê re behsa umirê xwe yê dirêj dike. Wan, Stembol, Ewrûpa, Stembol, Kurdistan, Misir, Sûriye, Antaqiya, Şam. Di nav çend peyvan de umirekî dirêj. Dostên wî, hevalên wî. Xwişka wî, ezîza ber dilê wî. Jiyana wî ya Şamê. Rojên wî. Kitêbên wî. Bîr û baweriyên wî. Biryara zewacê... her tişt bi çend qisan, bi kurtebirî.

«Me serên xwe danîn ser bahlîfekê. Em divê li hev xwedî derkevin, rêz û rêzdariyê kêm nekin, bibin heval û hogirên hev...»

Belê, amanca vê zewacê; heval û hogir bûyin. Ne evîn. Ne agirên evînê. Ne ew taya dijwar. Ne dînîtiya sewdayê. Lê heval û hogir bûyin.

Xeberdan alîkarî dike. Bedenên wan hîn bêtir nêzîkî li hev dikin. Germiya bedenên pîr hîn bêtir diguheze hev. Wîldan Xanim destê xwe dibe ser sînga wî û sînga bêpirç mist dide. Hêdî hêdî. Çermê bedena Memduh Selîm Begê wekî çermê bedena zarokekî nûjidayikbûyî nerm e. Paşê dest, hêdî hêdî, ber bi jêr dibe û li ser zik û bi dû re jî li ser berzik digere. Tilî di nav pirçên berzik de digerin. Lê li wê derê tu jiyan tune. Jiyan li wê derê vemiriye.

Dil pihêt hildavê. Ew destê Wîldan Xanimê digire û datîne ser sînga xwe û bi xwe jî, bi destan, wê hembêz dike.

«Bedenên me dê hevûdu, hêdî hêdî, binasin. Hêdî hêdî, Wîldan Xanim...»

«Belê, Memduh Beg, tu rast dibêjî.»

7

Wîldan Xanim; jineke rûpak, bejndirêj, porspî, xwenda û ji maleke dewlemend hatî. Berî 25 salan mêrê wê yê çerkez bi nexweşiyeke xedar dimire. Wîldan Xanim; rûpela nû ya jiyana Memduh Selîm Begê.

Di demeke kurt de ew hînî hevûdu bûn. Her du jî ji tenêtiya şevên tarî rizgar bûn. Ew bedenên xwe yên pîr digihînin hev û şevê bi germiya bedenan tijî dikin. Ew bi hev re dipeyivin, derd û kulên xwe ji hev re dibêjin. Lê ji derdekî pê ve; Memduh Selîm Beg tu carî behsa Ferîha'yê û evîna xwe nake. Wî biryar daye, tu kes nikare dewsa Ferîha'yê bigire, tu kes nikare nêzîkî lê bike. Cîhê wê kûrahiyên dilê Memduh Selîm Begê ye.

Wî dest pê kiriye, ji nû ve, porê xwe yê weşiyayî şeh dike, kincên xwe yên xweşik û kirasên xwe yên spî li xwe dike, pêlavên xwe boyax dike û hîn bêtir hevalên xwe dibîne. Wîldan Xanim lê dinihêre; şîva wî çêdike, serê wî dişo, kincên wî dişo, li dora wî wekî perwaneyekê dere û tê.

Lê îroj, bi dû zewacê re heft meh, tiştekî nû qewimî. Memduh Selîm Begê Ferîha, dîsan, dît. Li mala Qedrî Cemîlpaşa wan. Dîsan ew bi tayê ket, dîsan dilê wî ji qefesa xwe derket, dîsan axîn jê rabû, dîsan hêstir ji çavên wî gêr bûn. Ji lewre, Ferîha vegeriyaye. Ji binî ve. Mêrê wê Edib Aswar wefat kiriye. Wê jî dev ji Ur-

dinê berdaye û hatiye Şamê, nik merivanên xwe. U Qedrî Cemîlpaşa jî dil kiriye ku ew hevûdu bibînin.

Wan hevûdu dîtin, çend gotin ji hev re gotin û paşê jî xwe ranegirtin û li nik şênî giriyan. Wan li hev nihêrî û giriyan... Wan dê ji hev re wekî din, çi bigotina? Ew careke din li ber siûda xwe ya xirab ketin. Memduh Selîm Beg evçend sal li hêviya wê sekinîbû, wexta xwe bi xem û xeyalên wê bihurandibû, li hember wext û xezeba wextê şer kiribû. U di dawiyê de, gava tixûbên navbera wan li ber rabûnê bû, hingê Memduh Selîm Beg zewicîbû. Edî ne Memduh Selîm Beg, ne jî Ferîha teqet hebû ku behsa evîn û yekbûnê bikirana...

Iroj jî yek ji wan rojên xedar e. Bîhn li Memduh Selîm Begê çikiyaye, wekî ku ew divetise. Wî xwe, ji kerban, avêtiye kuçe û kolanên Şamê, gopalek di destan de digere.

Lê kes, tu kes hawara dilê wî nabihîse.

## 8

Name ji Ferîha'yê re. Bi tirkî, bi tîpên erebî.

«Canım Ferîha, ev bû demekê ku ez ji te re name nanivîsim. Piştî hevûdudîtina me ya dawîn, min taqet nebû ku ez rahîşim penûsê. Bi gotineke din, birîneke nû di dilê min de vebû. Lê ez hê jî li ber xwe didim... Xwezî min tu, cara dawîn, nedîta. Tu bi qasî mistekê mabûyî. Tu ji min jî pîrtir dixuyayî... Ez çi bibêjim? Min jîna te herimand. Tu nebûyî xwediyê mal, zarok û jîneke baş. Ne tu û ne jî ez, em di vê dinya malkambax de nebûn mesûd û bextiyar. Evîna me xweş, paqij û zelal bû. Ew bi me re bû, li nik me bû. Lê mixabin, ji ber dînîtiya min, me xwe gîhand ber siya wê. Bi tenê ber siya wê. Ne wê bi xwe.

Ez niha li ser riya koça dawîn im. Jîna min bû koçe-

ke bêdawî. Lê niha, êdî ez digihêm dawiyê. Tiştekî heye ku tu divê pê bizanibî; ez çavvekirî derim...»

Name ji Celadet Alî Bedirxan Begê re. Bi fransizî, bi tîpên latînî.

«Mîr'ê min'ê ezîz, birayê min'ê axretê,

Tu dibînî, jîn çi bi me dike? Ez hê jî li vî aliyê dinê me, hê jî ji te bi dûr. Lê zêde nema. Te hinekî din jî sebir divê. Ne zêde. Pir caran ez li te, li jîna me difikirim. Ev çi jîn bû? Me çi kir?.. Gava ez li jîna xwe vedigerim û lê dinihêrim, ev tişt tê ber çavan; ez jiyîme. Min pir çewtî kirin, min dilê hinan ji xwe hîşt. Min dilekî zelal û reben hûr hûrî kir. Lê tu carî min ji qayide û prensîbên jîna xwe rû baneda. Min bi zanîn, tu carî, xirabî nekir. Min bêbextî nekir. Min sextekarî nekir. Min derew nekirin. Min zordarî nekir. Ez ji bo xelkê xwe yê belengaz xebitîm. Min xwe kir berdevk û kolê wî. Ez hê jî ji bo wî dixebitim û lawê wî me.

Belê, rast e, jîna min, jîna te bi derd, keser, kul, dijwarî û zehmetiyan derbas bû. Lê ez bawer im, tu jî wekî min difikirî. Eger em careke din bihatina vê dinya malkambax, me jîneke weha, dîsan, qebûl bû. Bê guman, me dê hewl bida ku çewtî zêde nebin. Em dê, dîsan, xwediyê eynî qayide û prensîban bûyana...»

Name ji bavê xwe re. Bi tirkî, bi tîpên erebî.

«Bavo,.. Ez nizanim ev nama çendan e ku ez ji te re dinivîsim. Namên ku min ji te re nivisîne, li vê derê, li nik min in. Ew bûn çend tomar. Ez wan wekî çavên xwe diparêzim. Ji 1923 an û vir ve, me hevûdu nedît. Mixabin, bêyî ku em hevûdu bibînin, tu çûyî rehmetê. Ez jî niha ber bi we têm. Ez jî li mirinê difikirim. Ruhistîn li dora min dere û tê. Lê Ruhistîn min natirsîne. Herwekî yekî navdar gotiye; ez hatim dinê, min dît, ez jiyîm û ez derim.

Xwînga min li Stembolê ye. Ew zewicî û niha xwediyê çar zarokan e. Haya me ji hevûdu heye. Em ji hev re dinivîsin. Wê dil hebû were Şamê. Lê mixabin dewletê pasaport nedayê. Min pir bêrî lê kiriye. Herwekî ku min bêrî li te kiriye.

Bavo, min gotinek heye; tu dikarî, bi rehetî, bi Memduhê xwe serbilind bî. Memduhê te jiya. Eynî bi dilê te. Jînê, dinê çi dayê, wî wergirt. Wî bîhn kir, tahm kir, hîs kir. Derd û keser jê kêm nebûn, lê wî dizanîbû ku meriv ji bo guherînan e û meriv bi xwe tarîxa xwe dihûne. U guherîn û tarîx jî tu carî bê derd û keser nabe. Nabe.

Ma gul bê sitirîh dibe?..»

9

«Kal, nexweş, jar
Bi derd û kulan tijî,
Westiyayî,
Jiyaneke dirêj, tarîxeke dirêj, tecrubên dewlemend li pey,
Kitêb; jiyana wî, dewlemendiya wî, her tiştê wî...»

Memduh Selîm Beg, kovar di destan de, dibişire. Sal 1972. Nivîskarekî kurdê Iraqê li ser wî nivîsareke dirêj nivisiye. Ew nivîsara li ser xwe dixwîne. Bi dengekî berz. Ji nivîskar û lêgerekî hollandî re. Nivîsar bi erebî ye, lê ew wê ji lêger re werdigerîne fransizî.

Mala Memduh Selîm Begê bûye celebek ziyaretgeh. Nivîskar, rojnamevan, lêger û ronakbîr tên, pê re dipeyivin, jê tiştine dipirsin, li kitêb û kovarên wî dinihêrin. Ew niha bûye tarîx. Tecrubên wî, tiştên ku wî jine, niha, bûne tarîx. Kitabxana wî bûye şahîda demên rabirdû. Wan, qetliyama ermenan, Stembol, komela HEVI'yê, kovara ROJI KURD, teşkîlata Kürt Tealli

Cemiyeti, kovara JIN'ê, partiya XOYBUN'ê, serîhildana Agiriyê û hwd... niha bûne babetên lêger û kitêban.

Memduh Selîm Beg bi dest dipeyive, bi qasî xwe, ronahî direşîne ser tarîxê û dixwaze bîr û baweriyên serok û rêberên wê demê biguhezîne nifşên nû.

«Ev yeka muhîm e, monsieur. Tarîxa dewletên cîran di derheqê kurdan de, li ser derewan ava bûye. Ew ne rast in. Meriv divê nêrîna kurdan jî bigire da ku bigihê encameke, observationeke objektive.»

Nivîsar behsa wî, jiyana wî û kitêbên wî dike. Qedrî Cemîlpaşa Beg bi navê «Doza Kurdistan» kitêbek nivîsiye û tê de, bi firehî behsa wî dike. Lê belê, ne bi navê Memduh Selîm, bi navê Iskender Beg. «Hey gidiyo!.. Iskender Begê Xoybûnê, Iskender Begê çiyayê Agiriyê...» Akademiya Kurdî li Iraqê ew kiriye endamê şerefê. Serokên nû yên tevgera kurd tên û wî ziyaret dikin. Gelek rêkxistinên çandî, civakî û siyasî wî dezimînin civîn û konferansan.

Bi dû salên dijwar re, ev qedir û qîmetgirtin wî kêfxweş û serfiraz dike. U ev yeka nîşan dide ku cefa û eziyetên ku wî û hevalên wî xwarine, vala neçûne û ji bîr nebûne. Lê mixabin, kêfxweşî û serfirazî dereng hatin. Ji lewre ew niha ji jiyanê bêtir li mirinê difikire. Bêyî ku ew baweriya xwe ya esasî ji dest berde.

«Monsieur... doza kurdan bi heq e. Neheqî li kurdan bûye. Ev neheqî dê ji holê rabe, mesela kurdan dê hal be û kurd dê mafên xwe bigirin. Me nikaribû... Di dema me de «pouvoir et connaissance» di nav kurdan de pir kêm bû, welat nû perçe bûbû, xelk ji hev ketibû, conflit pir bûn, îmkan kêm bûn, dewletên din li me guhdarî nedikirin û hwd... Lê îroj hem rewş û hem jî dinya guheriye. Kurd dê di welatê xwe de azad û serbest bijîn. Bê guman...»

## 10

1974. Rojeke germ ya havînê. Roja biryareke nû. Memduh Selîm Beg textê xwe yê razanê dibe kitabxana xwe. Wîldan Xanim dê li jor, li ser textê fireh razê. Ew jî li jêr, li ser textekî biçûk. Ew bi hev xweş in. Ew dizanin, jiyana wan ya yekbûyî dê heta mirinê dewam bike. Heta mirana ku li ber derî ye.

Memduh Selîm Beg dil dike, mirin wî di kitabxanê de bigire, Ruhistîn ji nav kitêban derkeve û were. Ew vedigere nav zarokên xwe. Ew li dinya rengîn ya kitêban vedigere. Dinya kitêban ku ji bo wî deriyê her tiştî bû.

Niha jî ew dinya dê bibe deriyê axretê. Memduh Selîm Beg dê derî veke û here.

# Lİ SER RİYA KOÇA DAWÎN

1976, payiz.

Koç. Bi dû payiza jiyanê re koça dawîn. Koçeke bêdeng, bêpejn. Koçeke rengîn, xweş, bê lez û bez, bê teşqele, bê westan û xwîdan... Koçeke xweş li gor daxwazên dilên xweş. Koçeke li gor mirazan.

Memduh Selîm Beg.

Kalemêrê hûr Memduh Selîm Begê Wanî koç dike. Li ser textê xwe dirêjbûyî. Çavvekirî. Rûken. Lê belê, ker û lal...

Oda kitêban, oda dinyayên sihêrîn dibe warê koçê jî. Li odê her tişt wekî xwe ye; refên kitêban, kitêb, kovar û rojname, textek, qenefeyek, çend kursî, maseyeke biçûk, lewhene.

Wîldan Xanim, pîrejineke îmam ku Qur'an dixwîne û sê xort. Ew jî li dor Memduh Selîm Begê civiyane. Li milekî Memduh Selîm Begê pîrejin, li milê din jî Wîldan Xanim. Xort jî li pê. Çavên Wîldan Xanimê li wî û devê wê jî li ber guhê wî ne.

«Memduh Beg hişyar be, devê xwe veke...»

Lê Memduh Selîm Beg ne hişyar dibe û ne jî devê xwe vedike. Wî dest bi koça xwe kiriye.

Ew li ser riya koçê rastî newaleke kûr tê. Na, ne bi her awayî newal. Carina newal, carina qelaşeke zinaran, carina pireke şikestî û carina jî wekî porê keçekê. Aveke boş dixuye. Av pir pihêt diherike. Ji derina, ji qelaşan şelale ber bi jêr dibin. Tîrêjên tavê li ser avê û şelalê şewq didin. Rengên zer, şîn û kesk ketine nav hev. Lê deng tune. Memduh Selîm Beg şaş dimîne. Ev ava boş, ev şelala gur çawan weha bêdeng diherikin? Gelo ew av û şelale ne? Ew ne avdayên dirêj, zer yên porekî bedew in? Gelo ew ne por be ku wekî lehiyeke boş diherike û diçirûse?.. Memduh Selîm Beg fahm nake. Di nav wê kûrahiya newêl de, hûnikahiyeke xweş jî

heye. ew pê dihese û pê sermest û fereh dibe û dikare çêtir nefes bigire. Niha jî di nav avê de masî dixuyin. Masiyên têkel. Masiyên ku wî qet tu carî nedîtine. Masî cot bi cot xwe dilivînin û gava ew xwe dilivînin, ew bi rengekî zêrîn dibiriqin. Lê masî jî reng û şekil diguherînin. Carina ew masî ne, carina jî wekî cotên çavan... Xwediyo, ev çi koçeke nedîtî ye ku tê de tu tişt baş û zelal naxuyê!..

Lê belê, Memduh Selîm Beg ji koça xwe razî ye. Eş û jan tune. Qahr û keser tune. Xem û endîşe tune. West û xebat tune. Ked û xwîdan tune. Memduh Selîm Beg li ser textê xwe dirêjbûye û tişt, wext, cîh, bûyer, meriv û heywan û rawir bi ser wî re tên. Bi awakî sakîn, bêdeng, bêteşqele û bê xire cir.

«Wîldan Xanim, eger hûn dixwazin, ez herim bang bijîşkekî bikim... lê ez ne bawer im ku bijîşk bikaribe bigihê ser. Halê apê Memduh ne baş e... Mixabin ew li ber mirinê ye.»

Wîldan Xanim destê Memduh Selîm Begê pêdigire û diguvişîne. Ji girtin û dayina nefesê pê ve, ew ji wî tu bersîvê nagire. Ew jî baş têdigihê; halê Memduh Selîm Begê bêhêvî ye... Ew destê xwe davêje ser eniya wî. Enî germ e.

Taya mirinê. Taya dawîn. Bi dû taya hêviyê, taya welatê xerîbiyê, taya evînê, taya bêkesî û bêgaviyê, taya bêhêvîtiyê re, niha jî taya herî dawîn...

Rûyê wî sakîn û hinekî jî bi ken e. Tu êş û jan li ser rû naxuyin. Lê rû biçûk bûye. Ew bûye bi qasî mistekê. Rûyekî biçûk, neçar û reben.

«Ew dê here rehmetê... mala minê!..»

Wîldan Xanim hêdî hêdî dest bi girînê dike. Xort jî pê re. Bêyî ku ew bizanibin Memduh Selîm Beg çi jiyaye, ji serê wî çi derbas bûne. Ew dizanin ku Memduh

Selîm Beg kurdekî xebatkar û cefakar bûye, pir xebitiye, pir tişt dîtine û jiyaye. Lê ew nizanin ka çi...

Memduh Selîm Beg jî dil tune ku ew ji koça xwe vegere û ji wan re bide zanîn. Di koça yekta de, ew niha dikeve derekî ku agir jê radibe. Deverekî seranser sor. Na, carina sor, carina kesk. Li her alî agir. Wekî hûtan. Bi xezeb û xof. Deryayek ji êgir. Gelo ev çi dever e? Ew dûjeha ku di kitêban de hatibû nivisîn û qal lê dibû, ev der e? Agir û deverê ji agir nêzîkî li Memduh Selîm Begê dike. Ew rûyê xwe jê banade. Ew, bi çavên vekirî, dikeve nav êgir. Heyret... Tu germî tune. Na, carina heye, carina tune. Carina germ, carina hûnik. Ew agirê xopan ku her kes jê ditirse, ev e? Ew di nav gulokên êgir de, hêdî hêdî, digere. Na, ew nagere, difire, hem difire, hem digere. Agir. Agirî?.. Gelo ev gulokên êgir ne darên çiyê ne? Ev keskahî ne hişinahiya çiyê ye? U ev hûnikahiya ku ew carina pê dihese, ne hûnikahiya zozanên çiyakî serbilind be?.. Ew tênagihê. Tişt û cîh reng û şekil diguherînin. Ew jî pê re dere, bêyî ku fahm bike...

«Kesekî wî jî nema ku tova wî bidomîne. Ne zar, ne zêç. Bi tenê xwişkeke wî heye. Lê ew jî li Turkiyê, li Stembolê ye... Memduh Beg, Memduh Beg, çima te li xwe weha kir?.. tu bê şop û eser derî, deriyê xaniyê te tê girtin, ocaxa te vedimire. Çima, çima?..»

Nalîn. Hêstirên çavên Wîldan Xanimê. Kezebxuriya xortan. U di nav bi hezaran nas û dostan de, bêkesiya Memduh Selîm Begê.

Tîrêjên tavê ji pencerê diçirûsin û di oda nîvtarî de, li erdê, ronahiyeke gulover tînin pê. Tîrêj di navbera pencere û erdê de wekî sitûneke zêrîn dixuyin. Toz û gemariyên biçûk yên odê jî di nav sitûna zêrîn de dilîzin.

Dinya malkambax rojeke germ ya payizê jî li rojên xwe yên bêhejmar zêde dike. Rojeke wekî rojên din; bi keft û left, bi hêsir û ken, bi qencî û xirabî, bi xêrhatin û xatirxwestin... Memduh Selîm Beg jî di vê roja germ ya payizê de, xatir ji haziran û ji dinya malkambax dixwaze û koç dike. Ew dev ji dinya teşqele û bûyeran berdide û dere dinya xewnan. Evîndarê xewnan dere deverên nexuyayî yên xewn û xeyalan. Ma jiyana wî bi xwe jî ne xewneke dirêj bû?.. Xewneke dirêj ku tê de kes, bûyer, deng, hîs û pejn hebûn. Xewneke dirêj ku carina tahl û kirêt, carina jî xweş û dilşad bû...

Jiyaneke dirêj di babilîskeke nexweş û şêt de. Babilîska har! Sedsala daf û nêçîrê! Sedsala kemîn û tirsê! U tiştê ku niha li pey her tiştî maye; rûyekî bêçare, kalemêrekî biçûk, bi qasî mistekê û dilekî bêkes.

Belê, dilekî bêkes.

Niha jî daristaneke rengîn. Memduh Selîm Beg, li ser riya xwe, daristaneke hûr û li nik daristanê jî çend xaniyên biçûk, lê xweş dibîne. Li pey daristanê jî av dixuye. Di navbera daristan û xaniyan de du kes. Ne mezin, du zarok. Kurekî û keçek. Destên wan di destên hev de. Kirasekî spî li lêwik û kirasekî rengîn jî li keçikê. Pêxwas. Ew dilîzin, lotikan davêjin. Porê keçikê yê dirêj difire. Bihar e. Her cîh di nav hişinahiyeke nûvejiyayî de ye. Zarok dikenin. Rebiyo! Rebiyê xweşiyan... Memduh Selîm Beg dike, nake, nikare zarokên kêfxweş binase. Ew kî ne? Digel ku zarok pir nêzîkî wî ne, dîsan jî, ew wan nas nake. Bi qasî bîskekê, ew li wan dinihêre. Bi dil û can. Bi kêfxweşî. Lê paşê, zarok jê bi dûr dikevin. Hêdî hêdî. Zarok winda dibin. Na, ew winda nabin, lê di nav daristanê de, li pey darine xwe vedişêrin. Lîstik. Lîstika dinya zarokan ya pak û delal. Piştî demeke dirêj, zarok, dîsan, dixuyin. Ew

hêdî hêdî nêzîkî li Memduh Selîm Begê dikin. Lê ew niha ne zarok in. Na, ne zarok! Du kesên mezin. Keçeke xort û bedew û mêrekî navsal. Kincin reş li mêrik û fîstaneke dirêj û hewreşîm li keçikê. Destên wan di destên hev de. Rûyên wan bi ken. Ew dilîzin û lotikan didin xwe. Wekî zarokan. Gelo ev merivên mesûd kî ne, ji kû ne?.. Rûyên wan ne xerîb in, lê Memduh Selîm Beg jê dernaxe ka ew kî ne. Du merivên bextiyar di nav çîçek, kulîlk û hişinahiya biharê de. Rebiyo!.. Ew du kes li wî dinihêrin û dikenin. Lê bêdeng. Tu deng tune. Bi dû bîskekê re, ew destên xwe hêldikin, ji wî xatir dixwazin û derin dikevin xaniyekî spî ji wan xaniyên biçûk. Ew wî bi tenê dihêlin û winda dibin.

Memduh Selîm Begê bêkes.

Rengê wî bûye wekî rengê xweliyê. Wekî rengê bahlifa ku serê wî li ser e. Rîhê wî hinekî dirêj bûye. Por, rîh û simbêl wekî berfê spî ne. Carina lêva wî ya jorê û simbêlê wî yê zirav dilive, wekî ku ew dixwaze tiştekî bibêje. Lê deng jê dernakeve.

«Memduh Beg, binihêre, li vê sûretê binihêre. Min ew di nav kaxizên te de dît. Tu û çend hevalên te ne. Sal 1927 e. Hûn li Beyrûdê ne. Tu dikenî. Por, simbêl û çavên te dibiriqin... Xwezî min tu hingê binasiya! Binihêre...»

Li oda Memduh Selîm Begê, her tişt di nav neçariyeke dilsoj de ye. Feqîrî li her alî dixuye. Feqîrî, keser û janên salên dirêj. Di nav kitêb, kovar, rojname û kaxizan de tarîxekê. Tarîxeke kevn, birîndar û jibîrbûyî. Şahîdekî din ji şahîdên tarîxa kevn dere, koç dike. Ew kitêbên xwe, zarokên xwe li pey xwe dihêle û dere. Wî ew wekî zarokên xwe parastibûn, bi salan li wan miqayite bûbû, ew xwendibûn, di şevên dirêj û tenê de xwe avêtibû hawara wan, ji her kesî bêtir qedrê wan girtibû,

ji her kesî bêtir bi wan re bûbû heval û bi wan re peyivîbû... Lê mixabin, riyên wan, niha, ji hev vediqetin.

Koça Memduh Selîm Begê koçeke welê ye ku meriv bi tena serê xwe dere. Meriv her tiştî li pey xwe dihêle û bi tena serê xwe dikeve rê. Çawan ku dinya malkambax û siûda wî ya reş ew bi tenê û bêkes hîştibû, niha jî, ew her kesî, her tiştî di dewsê de berdide û bi tenê dere.

«Memduh Beg, deqeyek... ez serê te rast bikim...»

Wîldan Xanim serê wî, bi hêdîka, radike û bahlîfeke nû tîne û datîne bin serê wî. Di wê navberê de, zerfekî biçûk ji bin bahlîfê dikeve erdê. Zerfekî biçûk û spî. Lê zerbûyî. Kevn. Tê de çi heye?

«Memduh Beg, zarfekî ji bin serê te ket...»

Deng nariyê. Wîldan Xanim zerfê vedike. Bi hêdîka. Bi meraq. Xort jî bi meraq lê dinihêrin. Ji zerfê kaxizeke biçûk derdikeve. U avdayeke dirêj. Belê, avdayeke por.

Li ser kaxiz rêzine. Tev li hev. Bi tîpên pir hûr. Wîldan Xanim nikare rêzên hûr bixwîne. Ferê çavan têr nake. «Gurgîn, hele li vê kaxizê binihêre ka tê de çi nivisî ye.»

Sê rêz. Bi kurdî. Bi tîpên erebî.

«Kurmanc di dewleta dinê de
Aya bi çi wechî mane mehrûm?
Bîl cimle ji bo çi bûne mehkûm?»

Sê rêzên şa'îrê navdar ya sedsala hufdan Ehmedê Xanî. Ji tarîxa kurdan dengekî. Pirsiyara esasî ya tarîxa kurdan; «Bil cumle ji bo çi bûne mehkûm?» Pirsiyara ku kurd, bi dirêjahiya sedsalan, nikarin bersîv bidinê.

Sê rêzên tarîxî; kurtebiriya jiyana dirêj ya Memduh Selîm Begê.

«Heyra, ev çi ye, ev çi qise ne? Çima Memduh Begê ev nivisîne û parastine?..»

Çima... Kî dê bizanibe ku hemû jiyana Memduh Selîm Begê ji bo bersîvdana vê pirsiyarê bihurî û çû. Kî dê, niha, bizanibe ku ew çavvekirî, bêbersîv û bêmiraz dere. Kî dê bizanibe ku ew, her gav, li pey bersîva xebat û jiyana xwe bû...

Sê rêzên sedsala XVII an; wesiyeta Memduh Selîm Begê. Bi dû sê sed salan re eynî pirsiyar. Di sedsala har û lez û bezê de jî eynî daxwaz û hîs.

«Ev avda?.. Ev çi ye? Ev ya kê ye?.. Belê, belê... ya xwişka wî ye. Wî ji xwişka xwe pir hez dikir, her gav qala wê dikir... Heyf, pir heyf... Wî pir dixwest xwişka xwe bidîta. Ev avda divê ya xwişka wî be. Mala minê!.. Memduh Beg, mêzeke, em li vir in, ez û ev xortên ku te jê hez dikirin. Em giş li vir, li nik te ne. Tu ne bi tenê yî...»

Avdayek. Avdayeke dirêj wekî têlekî hewreşîm. Avdayeke zer. Avdayeke dirêj, xweş û zêrîn. Avdayek ji rojên jibîrbûyî û wextên kevnare. Lê belê, nîşandeka bibîranînê. Avdayek ji porekî dirêj û spehî wekî lehiyên boş. «Avda divê ya xwişka wî be...»

Hey lê gidiyê qederê hey! Hey lo gidiyo mirazê kor hey!..

Kî dê, niha, bizanibe ku avda ji wan rojên xweş yên Antaqiyayê yadîgar maye? Kî dê bizanibe ku Memduh Selîm Beg bi taya evîna keçikeke bextreş ya çerkez ketibû?

Avdayek ji rojên bextiyar û mesûd. Avdayek; xatira mayî ji evîneke dilsoj...

Di odê de wext rawestiye, naherike. Tîrêjên tavê li

ser pencerê dibiriqin. Ji derve dengin zîz tên. Jiyan, herwekî berê, li derve dewam dike. Zarok li kuçê dilîzin. Di odê de jî, ji pise pisa pîrejinê pê ve, tu deng tune. Kesên odê, bêdeng, li Memduh Selîm Begê dinihêrin. Ew jî li ser textê xwe, bêdeng, sakîn, çavvekirî û stûyê wî li ser bahlîfê xwarbûyî, dirêj bûye.

Ew, ji dinya derve bêxeber, di nav xewn û xeyalên xwe de koç dike. Ew niha li deverekî, li ber pêlên spî yên aveke spî sekiniye. Pêl, bi lez, bi ser wî re tên. Ew natirse. Ji bervajiyê, ew kêfxweş dibe. Pêl tên û wî dadiqultînin. Ew niha di nav pêlan de ye. Her alî spî ye. Spiyeke xweş û dilgerm. Ew tî ye. Bi hêdîka, ew devê xwe vedike. Dev û gewriya wî tijî av dibe. Nefes lê diçike. Ew devê xwe digire. Tahm. Tahma avê ecêb e. Na, ew ne av e. Şîr e. Na, ne şîr e jî. Araq e. Ew carina av, carina şîr û carina jî araq e. Memduh Selîm Beg kêfxweş e. Bi destan ew çelpe çelp dike. Ew di nav pêlan de dilîze. Ew dîsan devê xwe vedike ku hinekî din av vexwe. Gewrî dîsan tijî dibe, nefes lê diçike.

Wîldan Xanim jî dibîne ku nefes li Memduh Selîm Begê diçike. Ji nişkekê ve, ew radibe pê û destê wî dixe destê xwe.

«Gurgîn, Gurgîn, Memduh Beg can dide!..»

Memduh Selîm Beg, bêhereket û çavên wî wekî kab vekirî, li banê dinihêre. Nefes lê hatiye birîn. Xort jî dilezînin ser wî. Lê piştî bîskekê, ew dîsan dest pê dike û nefes digire. Hêdî hêdî. Kesên doralî li hev dinihêrin û dibişirin. Lê piştî çend nefesên pêşîn yên baş, dîsan, bîhn lê diçike. Ew dixwaze pihêt, pir pihêt nefes bigire û bide. Sînga wî radibe û dadike. Ev yeka, bi qasî çend saniyan, dewam dike, lê paşê, dîsan, ew giran dibe û nefes lê tê birîn.

«Çû rehmetê, mala minê, çû rehmetê!..»

Lê na, Memduh Selîm Beg, dîsan, dest bi nefesgirtinê dike. Icar hîn çêtir û bi dûzan. Lêvên wî vedibin. Lêv hêdî hêdî dihezin. Ew dil dike tiştekî bibêje. Lê nabe. Li eniya wî dilopên xwîdanê civiyane. Wîldan Xanim bi destmaleke spî eniya wî paqij dike.

«Bibêje, bipeyive Memduh Beg... xîret bike, tiştekî bibêje...»

Çavên Memduh Selîm Begê wekî ku ne yên wî bin. Wekî ku kesekî coteke çav danîbin ser kortika çavan. Ew ewçend vekirî û bêhereket in. Bi tenê ew li bana odê dinihêrin. Nêrîneke sabît û sakîn. U westiyayî. Pir westiyayî.

Lê belê, ew di koça xwe de, di nav pêlên ava spî de masiyeke stûr dibîne. Masiyeke stûr û zerik. Masî li dor wî dere û tê. Masî pir xweşik e, pûlên bedena wê dibiriqin. Memduh Selîm Beg jê dernaxe ka ew çi celeb masî ye. Lê wî tu carî masiyeke evçend xweşik nedîtiye. Lê tiştê ecêb, masî jî şekil û reng diguherîne. Gava ew nêzîkî li Memduh Selîm Begê dike, ew masî ye, lê gava ew jê bi dûr dikeve, ew dibe keçikek. Keçikeke bedew, pordirêj û bedenxweş. Keçik jî dibiriqe. Memduh Selîm Beg kêfxweş e. Ne bi tenê kêfxweş, ew sermest e jî. Ne bi tenê sermest, serxweş e jî. Digel ku ava spî nefes lê diçikîne, ew xwe ranagire û carina devê xwe vedike û ava spî vedixwe. Masî li pêş, ew li paş, bi hev re, di nav pêlên spî de, ew derin. Masî rêberî lê dike. Bi qasî demekê, ew bi hev re derin. Paşê, ji nişka ve, deriyek li ber wan dixuye. Deriyekî pir stûr û neqişkirî, wekî deriyê keleheke stûr. Her du milên derî, hêdî hêdî, li ber wan vedibin. Masî li pêşî, ew li paşî, ew ber bi derî derin. Lê berî ku ew bigihên derî, Memduh Selîm Beg, dîsan, bi kêfxweşî, devê xwe vedike.

«Gurgîn, Gurgîn... Memduh Beg dere!..»

Rûyê Memduh Selîm Begê diguhere. Rûyê wî wekî xweliyê sor dibe.

«Em çi bikin, çi bikin?»

Tiştê ku meriv bike, nemaye. Her tişt êdî bêkêr e. Memduh Selîm Beg koç dike, dere. Devê wî, bi awakî ecêb, vedikişe. Ew dixwaze nefes bigire, lê nefes lê tê birîn. Çavên wî niha hîn bêtir vekirî ne. Ji devê wî tu peyv dernakeve, digel ku ew dil dike. Edî qefesa sîngê jî ranabe. U xire xir pê dikeve. Xire xir dewsa nefesê digire. Xire xireke nerm. Wekî ku ew, merivê nerm û ziravbihîstiyar lawan bike û xatir bixwaze.

Bi dû xire xirê re jî bêdengiya ebedî. Ne nefes, ne deng, ne peyv, ne pejn û ne jî hîs. Perda bêdengiya ebedî bi ser her tiştî de tê kişandin. Her tişt wekî xewneke şevê, ji nişka ve, winda dibe. Bi tenê bêdengiya ebedî dimîne.

Bi tenê bêdengiya ebedî.

PİRTÛKÊN WEŞANXANA ORFEUS

ORFEUS YAYINLARI

**Mirina Kalekî Rind,** ***Mehmed Uzun***

Çîrokên Kurdî, *Roger Lescot*

Gundikê Dono, *Mahmud Baksı*

Textên Kurdî, *Stig Wikander*

Rêzana Zimanê Kurdî, *Kamran* ***Bedirxan***

Şanoyên Kurdî, *Memo Yetkin*

Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni Kürt
Ilişkileri, *Garo Sasuni*

Kürdistan Tarihinde Dersim, ***Nuri Dersimi***

NAVNÎŞANA XWESTİNÊ
İSTEME ADRESİ

ORFEUS BOKFÖRLAG
Vanadisvägen 18, 2TR.
113 46 Stockholm — Sweden



**Mehmed** Uzun, 1953, ji Kurdistana **Bakûr e.** Piştî cunta eskerî li Tirkiyê, **1970, ew** hat girtin. Bi qasî du salan, **ew li girtî**xanên Diyarbekir û Ankarê **ma. Di sala** 1976 an de, gava kovara ***Rizgarî*** **dest** bi weşînê kir, Mehmed **Uzun bû** berpisiyarê kovarê. Ji ber **vê yekê** jî ew hat girtin û 8 meh li **girtixanê** Ankarê ma. Di dawîya **1977 an** de, ew hat Swêdê û li wir **cîwar bû.** Li Swêdê, wî berpirsiyariya **kovara** *Rizgariya Kurdistan*'ê kir, 1979-81.

**Siya Evînê** romana Mehmed Uzun ya **sêyemîn e.** Romana wî ya yêkemîn **Tu di sala** 1985 an de û romana duwemîn **Mirina Kalekî Rind** ji di sala 1987 **an de** derketin.

**ISBN 91 87074 16 8**

NAVNÎŞANA XASTÎNÊ

---

İSTEME ADRESİ

ORFEUS BOKFÖRLAG
VANADISV. 18, 2TR.
113 46 SROCKHOLM – SWEDEN

"Sal 1922. Pencereyek û merivekî li ber. Kî? Rûyekî gulover, çavên reş wekî komirê, porê kin û şehkirî, eniyeke fireh, guhên stûr, bîvileke xweşlihevhatî, simbêlê zirav û lêvên kentijî. Kî? Bejna zirav, kincên xweş, qiraweta hewreşîmî û dûmana cixarê. Kî? Fikir û guman, bîr û şik.
Kî?.. .
Memduh Sêlîm. Ronakbîrê kurd, bîrewerê gelê bindest û evîndarê xweşiyan Memduh Sêlîm Beg. Nivîskar û berpirsiyarê kovara *Jîn*'ê Memduh Sêlîm Begê Wanî...

......................

Iskender Beg?
Delaliyê bav û kalikê xwe. Xortê bejnzirav yê bajarê kevn û rengîn Wanê. Efendiyê xortên kurd yên Stembolê. Pêxasê meyxanên Galatayê. Dilovanê dengên xweş. Hosteyê araqvexwarinê. Yek ji damezravanên Komela Xwendekarên Kurd li Stembolê, *Hêvî*, 1912. Nivîskar û berpirsiyarê kovara *Jîn*'ê. Yek ji damezrevanên rêxistina kurdî *Teşkilat-î Içtimaiye*. Aware û derbederê welatê xerîbiyê. Dildarê evînê. Xwediyê kevokên aşqê. U niha jî yek ji damezrevanên *Partiya Xoybûnê*...
Ronakbîrekî nûjen di navbera rojhelat û rojava de.
Yanê Memduh Selîm Beg.

...................................

Orfeus